# <u>BESTA BIHUŞTA ŞEHÎDAN</u>

**(Cenga 13-15´ê Sibata 2012´an)**

**Weşanên Komîteya Xebatên Şehîdan a PKK´ê**
**2021**

***Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!***

**Ji Çapê Re Amadekirin: Komîteya Xebatên Şehîdan a PKK"ê**
**Cihê Çapê: Çapxaneya Azadî**
**Dîroka Çapê: 2021**

**_Rêber Apo: “Şehîd  Jiyankirine”_**

- **_Ev belge li ser berxwedana 13-15’ê Sibata 2012’an ya 15 rêhevalan hatiye nivîsandin._**



***Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!***

1-Heval Hemze Şirnex (Evdulmecîd Îke)

2-Heval Reşo Welat (Remezan Mistefa): Li Qamişlo jidayîk bûye.

3-Heval Ronahî Murad (Gulnaz Ekîncî): Bi esil ji Mêrdînê ye, li Konyayê jidayîk bûye.

4-Heval Felat Zagros (Bêhnam Ezîzîwend): Li Ûrmiyê jidayîk bûye.

5-Heval Azad Çiya (Murad Karataş): Li Sêrt, Misircê jidayîk bûye.

6-Heval Zîlan Ararat (Aygul Emîne): Li Bedlîs, Adilcewazê jidayîk bûye.

7-Heval Serhed Binasan (Zanyar Merdan): Li Hewraman, Sineyê jidayîk bûye.

8-Heval Gezgor Pîrsus (Servet Dogan): Li Ûrfa, Pîrsusê jidayîk bûye.

9-Heval Aysel Dijwar (Aysel Bartu): Li Wan, Şaxê jidayîk bûye.

10-Heval Mehsum Bagok (Ehmed Aktaş): Li Mêrdîn, Mîdyadê jidayîk bûye.

11-Heval Şerda Gever (Ferzane Kina): Li Geverê jidayîk bûye.

12-Heval Demhat Şervan (Mehmed Türken): Li Wan, Payîzavayê jidayîk bûye.

13-Heval Havîn Cudî (Ayşê Îşçen): Li Şirnex, Gundikê Melê jidayîk bûye.

14-Heval Rojvan Sîpan (Selamî Kaya): Li Wan, Erdîşê jidayîkbûye.

15-Heval Simko Amara (Derwêş Çakmak): Bi esil ji Semsurê ye, koçberî Edeneyê bûne.

Pêşgotin....................7
Du Xewnên Cewaz....................9
Tenê Li Ser Rêhevaltiyê Biponijin....................13
Heval Hemze Şirnex....................21
Heval Reşo Welat....................47
Heval Ronahî Murad....................55
Heval Felat Zagros....................67
Heval Azad Çiya....................73
Heval Zîlan Ararat....................81
Heval Serhed Binasan....................91
Heval Gezgor Pirsus....................105
Heval Aysel Dijwar....................111
Heval Mehsum Bagok....................129
Heval Şerda Gever....................135
Heval Demhat Şervan....................143
Heval Havîn Cudî....................149
Heval Rojvan Sîpan....................157
Heval Simko Amara....................173
Kombûna Taxima Şehrîbanê....................181
Li Taxima Hêzil....................203
Kombûna Taxima Besta Navîn....................209
Dewreyên Şervanên Nû Yên Sala 2011´an....................213
Kirêtiya Îxanetê....................227
Pratîka Aso Ya Li Botanê....................227

**Kombûna Hêzan Li Besta Navîn ................................................... 235**

**Bername, Xebat Û Rewşên Payîza 2011´an .................................. 245**

**Zivistana 2012 – Ketina Kampan.................................................. 255**

**Şehîd Felsefeya Me Ya Jiyanê Ne ................................................. 277**

## Pêşgotin

Mirov bi xwendin û hînbûna cîhana mirovên din re dikare cîhana hest û ramanên xwe mezin bike, xwe di warê hizrî, hestiyarî û giyanî de dewlemend bike. Dewlemendiya mirov hêza xurtbûna hizrî, kûrbûna hest û giyanî ye.  Vala nehatiye gotin ku, "her mirov gerdûneke" û bi hînbûna jiyana her mirovekê re mirov hînî tiştên nû dibe, cîhana xwe ya hizrî û giyanî fireh dike.

Pirtûka di destê we de jiyana bi dehan lehengên têkoşîna azadiya Kurdistanê hildigire nava xwe. Di her rûpelek vê pirtûkê de hûnê şahidiyê ji kêliyeke dîroka vê têkoşînê, qehremanî, lehengî û dilsoziyê bikin.

Hûnê di vê pirtûkê de carna bi kenê panzdeh lehengên Kurdistanê re bikenin. Carna bi wan re xwêdana li eniya xwe bimalin, bi wan re li ser girek Botanê li ber bayek hênik bêhna xwe vedin. Carna hûnê bibin şahidên bawerî, girêdan, dilsoziyên di serdema me de kêm tên dîtin, carna jî hûnê li hember asta xwe fedayîkirina van mirovan a bilind pêwîstiya lêpirsîna wîjdana xwe bibînin.

Hevala Jînda Besta di vê pirtûkê de cih daye bûyerek ku di sala 2012'an de li Botanê, herêma Besta rû dayî. Di 12-13'ê Sibata 2012'an di encama operasyonekê de 15 gerîlayên tevgera azadiyê jiyana xwe ji dest dan. Jiyan û kesayetiya van lehengan di vê pirtûkê de bi zimanek zelal tê vegotin. Jînda Besta, di nivîsandina vê pirtûkê de neketiye pey xemilandina peyvan, bi zimanek sade jiyan û kesayetiya van lehengan raxistiye pêş çavên xwendevanan.

Di vê pirtûkê de, di serî de di kesayeta fermandarê gerîla Hemze Şirnex de dilsozî, pakî, fedakarî,  dilnizmî û baweriya bi dozê ya gerîlayên Kurdistanê, hezkirina wan a ji bo axa welat, dilsoziya bi gel re bêyî li ser tiştek were zêdekirin hatiye nivîsîn. Mirov di vê pirtûkê de rêhevaltiya şoreşgerên PKK'ê ya ku li hember her zorî û zehmetiyê heta roja îro PKK li ser piyan girtî û bûyî hêza wê ya sereke dibîne.

Hûnê di jiyana her yek ji van lehengan de şahidiyê ji vîna mezin ya ku dikare li hember her  awayê teknîka dagirkeran, zorî û zehmetiyan li ber xwe bide, baweriya bi serkeftina armancê û xwebexşiya giyana şoreşgerî bikin.

*Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!*

Hûnê carna li ber agirek gerîla rûnin û çayekê vexwin. Carna guhdarî bîranîn û serpêhatiya gerîlayekê bikin û pê xemgîn bibin. Carna jî hûnê li gel komek gerîla rûnin, bi pilqînî bikenin û dê dengê kenê we li zinaran vede. Hûnê di her rûpelek vê pirtûkê de wan deman bijîn. Dê carna bêhna we biçike, mereqa we bigihêje lûtkeyê, carna jî hûnê henaseyek kûr bikişînin û bi wan re hesta serkeftinê bijîn.

Serkeftina nîvîskara vê pirtûkê ewe ku xwendevanan dibe wan dem û wextan, dike heval û hogir ji wan kesên bûne mijara pirtûkê. Kesên di pirtûkê de ji we re zindî dibin, dibin nas û heval. Hûn her hestê bi wan re dijîn û parve dikin, dibin hevparên hestên ku wan jiyane. Hûn bi wan re hêrs dibin, bi wan re keyfxweş dibin, bi wan re diwestin, bi wan re bêhna xwe didin. We ew nedîtibin jî, girnijîna li ser lêvên wan mîna perperîkekê tê li ser rûyê we datîne û dilê we dike gulistanek ji giyana wan pakrewanan.

Her şehîdeke têkoşîna azadiyê bêmirine, ronahiya jiyana gelê me, şanaziya pêşeroja me ne. Destxweşiyê li Jînda Besta dikim ku, ev pakrewanên Kurdistanê di cîhana wêjeya Kurd de jî bêmirin kirine û weke belgeyek dîrokî ji pêşeroja gelê me re ev pirtûk kiriye diyarî. Her gel, her netew dixwaze hêz û gêwlê ji paşeroja xwe wergire, bi hêza ji nirxên xwe yên manewî yên paşerojê digire pêşerojek serfiraz bijî. Lewma berhem û xebatên wisa xwedî nirx û girîngiyek mezinin. Di wê baweriyê de me wê nifşên nû ji van lehengiyan hêz werbigirin û ji bo pêşerojên azad û serfiraz lehengî, qehremanî, dilsozî, vîn û baweriya wan ji xwe re bikin alên serkeftinê. Gel û neteweke xwedî van nirxên mezin û hêja dikare di her armancê de bi vê hêzê bigihêje serkeftinê.

**Nûgiyan Derya**

**Du Xewnên Cewaz**

Sedema nivîsandina vê belgeyê du xewin bûn. Di xewna yekem de: Zivistan bû û berf bi qasî du metreyan barîbû. Ez û çend hevalên din ku xwendevan bûn ji perwerdeyê re dereng mabûn. Me dixwest beriya ku mamoste bikeve hundir xwe bigihînin dibistanê. Rêya ku di berfê de hatibû vekirin pir nexweş bû û em her diketin nav de. Dema lingê me diket çalê de pêlavên me ji lingên me derdiketin û em mijul dikirin. Bi zorî jî be me xwe gihand dibistanê. Me dît ku Heval Hemze ji pişt dibistanê ve tê. Mamosteyê me Heval Hemze bû. Taqimeke reş û şiq li xwe kiribû. Lênûseke A4 di destê wî de bû. Dema dît em hê li ber derîne got; "Heval, hûn dereng mane!" Em bi lez ketin hundir û rûniştin cihê xwe. Li aliyeke dibistanê gel rûniştibû, li aliyê din jî heval rûniştibûn. Em li aliyê hevalan, li rêza herî dawiyê rûniştin. Heval Hemze hat ket hundir. Em hemû ji ber rabûn û bi "Kerem kin" a wî re rûniştin. Heval Hemze derbasî pişt maseya xwe bû, lênûsa xwe vekir û li min nêrî. Demekê çavên xwe li ser min kilîd kirin, bêyî ku çavên xwe ji ser min rake bi tiliya xwe lênûs îşaret kir û got; "Berf pir bariye. Sibate. Ev, lênûsa berxwedaneke mezine!" Piştre şiyar bûm.

Di xewna duyemîn de: Ez li Kato Jîrkayê, li noqta Şehîd Şervan bûm. Min dixwest pirtûka berxwedana kampa Heval Hemze binivîsim, lê min nedizanî bûyer çawa qewimiye. Di korîdorê de rûniştibûm, min pişta xwe dabû tehtekê, pênûs û lênûs xistibûn destên xwe û difikirîm ku çawa binivîsim. Ji nişkave hat fikra min ku biçim ji Rêbertiyê bipirsim. Çûm ba Rêbertiyê. Min got; "Rêberê min, ez daxwaza we pêk tînim, lê nizanim çawa bikim." Rêbertiyê bi awirên xwe Heval Hemze ji min re nîşan kir û got; "Herî baş ew dizane. Biçe ji wî bipirse." Dema min li aliyê ku Rêbertiyê îşaret kir nêrî, min dît ku Heval Hemze ji korîdora pişte ve hilkişiyaye ser tehtekê û ber bi me ve tê. Min di dilê xwe de got; "Her tim Serok aqil dide me. Heya niha çima nefikirîm biçim ba Heval Hemze, jê bipirsim! Ma ne ew şahidê herî zindî yê bûyerê ye?" Çûm pêşiya wî. Heval Hemze lez dikir ji bo ku xwe bigihîne platforman. Min ew rawestand û jêre got; "Heval Hemze, demjimêr çend bû hun ji kampê derketin? Demjimêr çend pevçûnê dest pêkir? Te destpêkê kîjan hevalan derxist derve? Heval Simko û Havîn li ba te bûn?..." Pênûs û lênûs di destên min de bûn û min dixwest hemû

bersîvên ku Heval Hemze bide bi lez binivîsim û not bigirim. Lê Heval Hemze dema dît pirsên min dirêj dikin ji ber ku dema wî kurt bû bi meş bersîv da: “Her tişt zelale. Biçe hemûyan binivîse. Yên din jî ezê piştî platforman ji te re bêjim.” Ez li pey wî dimeşiyam. Heval Hemze hilkişiya ser tehteke bilind û zirav. Ew teht dîwarê mangeke kêlekê bû û banê mangê şemitok bû. Heval Hemze destê xwe bi banê mangê girt û çû ba hevalên din ku li ser banî rûniştibûn. Ez jî hilkişiyabûm ser wê tehtê û min jî xwest hilkişim ser banê. Lê şemitîm û min nekarî xwe bigihînim wan. Ji tehtê daketim û ser çîmenê rûniştim û li hêviya vegera Heval Hemze mam. Bi vî awayî şiyar bûm.

Bandora van xewnan bi demdirêjî li ser min ma. Qet nivîsandina bûyereke wisa nehatibû hişê min. Jixwe min qet li ser Şehîdan nenivîsandiye. Tenê min dema şehadet bihîstine, yan jî di salvegera şehadeta hin hevalan de di rojnivîsa xwe de hestên xwe nivîsandiye. Weke din ez ne ser Şehîdan axivîbûm, ne min nivîsandibû, ne jî fikirîbûm kareke wiha bikim, ji ber ku pir girane. Taybet vegotina awayê berxwedan û şehadetan hemû birînên dilê mirov vedikin. Gelek heval li ba min şehîd ketibûn lê hewldana min zêdetir ji bo vê bû ku bi bîranînên wan re bijîm. Ti car nefikirîbûm ku ji boy berxwedaneke evqas mezin weke belgeyek ji dîrokê re bimîne pêwîste bê nivîsandin. Lê belê şîroveyên ku hevalan li ser xewnên min kirin balkêş bûn û ez matmayî hiştim. Min bixwe wateya wan dernexist. Dema min xewna yekem ji hevalan re vegot, Şehîd Gulan Çekdar, Şehîd Zozan Kobanê û Heval Sosin Alan wiha wate jê derxistin: “Heval Hemze îfadeya hemû şehîdên vê kampê ye. Çavên wan vekirî mane. Dixwazin bûyera wan bê nivîsandin da ku bê zanîn...” Ev şîrove li min pir giran hat.

Çend meh şunde dema min xewna dûyemîn dît û min ji hevalan re vegot, vê carê jî Heval Bêrîvan Mêrdîn û Şehîd Sema Efrînê wiha şîrove kirin: “Heval Hemze rexne dike û ji te re dibêje ku tiştek nezelal tineye, berxwedan û îxanet têra xwe eşkere û zelalin, li benda çiyî?” Ev şîrove hê girantir hat.

Piştî van şîroveyan heval ketin hewldana teşvîqkirina min da ku biryara nivîsandinê bidim û ji bo şêwaza nivîsandinê jî gelek şêwaz û rêbazan danîn pêşiya min. Pêvajoya nivîsandinê di aliyê hest de pir giran û zor derbas bû. Pêwîst bû hemû tiştan ji nû de bînim ber çavên xwe û tiştên ku bixwe şahid nebûme û min tenê bihîstine jî di serê xwe de zindî bikim. Vegera wan roj û bûyeran pir giran bû. Lewre min hin

cihan bi ken, hin cihan jî bi girî û hêsir nivîsand. Teşvîq, eleqe, alîkarî û hêzdana hevalan nebûya gengaz nebû ku bikaribim binivîsim. Heta hevalan xebatên min ên rêxistinî jî sînordar kirin da ku karibim binivîsim. Keda hemû hevalan, taybet jî hevalên ku di sibata 2012’an de li Bestayê bûn di vê xebatê de heye.

Dizanim ku ev kar hêjayî mezinahiya berxwedan û rûmeta Şehîdan nîne û pir qelse. Dizanim ku Şehîd tu car bi temamî nikarin bên danasandin. Dizanim her tişt li hember Şehîdan kême û heta eger berhemek pir xûrt be jî ev, ne ji ber hunermendiya xwediyê berhemêye, berovajî, ji ber mezinbûn û heybeta Şehîdan e. Dizanim ku ev belge tişteke pir mezin nîne. Tevî zanîna hemû van tiştan jî li ser şîroveyên ku di derbarê xewnên min de hatin kirin min xwest çawaniya bûyerê ji arşîva Partiyê re û ji dîrokê re bimîne, ji bo ku her kes bizane di Dola Tûşîmyayê (ango Dola Şehîdan) de roja 12 û 13’ê Sibata 2012’an çi qewimî, berxwedan û îxanetê çawa şerê hev kirin.

Di belgeyê de ti tişteke xeyalî (kurgusal) tineye. Bûyer, tevger, axaftin, gotin û hema her tişt temamen bi awayê ku şahid bûme, yan jî rû dane û hevalên din ji min re vegotine hatine nivîsandin.

Hêvîdarim Heval Hemze û çardeh rêhevalên din ên Şehîd vê belgeyê weke pêkanîna erkeke biçûk bipejirînin.

Jînda Besta
19.03.2016

***Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!***

**Tenê Li Ser Rêhevaltiyê Biponijin Bes e**

Rêheval Hemze tam meh û nîvekê beriya pevçûnê notek ji hevkara xwe, ji fermandara YJA STAR’ê ya Bestayê Evîn re şand û wiha got: TENÊ Lİ SER RÊHEVALTIYÊ BIPONIJIN...

RÊHEVALTÎ! Ew tova ku Rêber APO çand û şitla PKK jê şîn bû. Ew raz û sirra ku tevahî PKK kir yek giyan di deh hezaran bedenan de. Ew peyva ku Fermandar Hemze ji 14 saliya xwe ve pê rabû û 24 sal temenê xwe jêre gorî kir. Ew evîna ku dilê şoreşgerên berxwedana Bestayê dagir kiribû. Ew hêza ku berfa nêzî yek metre û sermaya dijwar a sibatê ji 15 evîndarên azadiyê re kir gulistan û germî. Ew agirê ku hest û ramana wan germ û geş kir û biiir, biiir heya gihand ROJê. Ew hunera ku rêwiyên rûken erkdar kirin da ku ji bo parastina rêhevalên xwe canê xwe feda bikin. Ew gotina ku di ronahiya wê de bi xeyal û hesreta dîtina azadiya Rêberê xwe her kêliyeke jiyana xwe hunandin. Ew armanca ku ji bo wê pişta xwe li hemû xweşiyên şêweyî û şematîka pergala serdest zivirandin. Ew xemla ku binirxtirîn û hêjatirîn sermayeya şoreşgertiya wan bû. Ew xelata zêrîn ku ji Rêber APO wergirtin û tevahî jiyana xwe pê xemilandin. Ew wateya ku rûyê reş ê xiyanet û radestiyê qelişand û parçe parçe kir. Ew peyva tijî hest ku her yek ji wan kir tîrêjek ji Tava bi tîn a Mezrabotan. Ew wateya bilind ku bû zerdekeneke şirîn li ser lêvên wan. Ew hesta bêhempa ku her yek ji wan kir neqiş û nîgarek li ser eniya Rojê û pêteke geş a agirê azadiyê. Ji ber ku ew zarokên AGIR û ROJ’ê bûn...

RÊHEVALTÎ! Ew peyva ku di dibistana Apoyî de deh hezaran beden li dora yek giyan, yek armanc, yek wate, yek şêwaza jiyan, yek bawerî, yek hest û yek ramanî kom kir û vîneke hevpar da hemûyan. Ew peyva ku deşt û çiya, gelî û newal, dar û kevir, ba û bahoz, berf û baran, mij û moran, gul û strî, çûk û perperik, mişk û mar, pêşû û morî, zozan û daristan, teht û zinar û hema her tiştek ku di vê xwezayê de heye kir dost û heval ji bo gerîlayan. Gerîla evîndara wan bûn û ew, evîndarên gerîla...

Reh, bingeh û jiyana PKK’ê bi peyva pîroz a RÊHEVALTIYÊ hatiye hunandin. Ev peyv bûye şahreha PKK’ê. Di hemû zorî û zehmetî, şadî û kêfxweşî, ken û girî, qahqaha û îsk, xweşî û janan de ev peyv hêz dide şoreşgeran û çîrok, bûyer, bîranîn û efsaneyên wan dixemilîne. Ji ber

vê, ev peyv pîroze. Ji ber vê, di nav PKK'ê de rasterast nav nayê gotin; her tim peyva ´Heval´ di destpêka nav de tê ser ziman. Ji ber ku di vê peyva tijî manewiyat de dirustbûn, sadebûn, pakbûn, rûrastbûn, hezkirin, evîn, rêz û jidilbûn veşartiye. Dema kesek bi vê peyvê gazî keseke din dike van hemû wate û hestan jî bêyî ku rasterast jêre bibêje diyarî wê/wî dike.

Heval Hemze bi naveroka tijî ya van peyvan re û di dinyaya wateyan de dijiya. Wî, ev peyv û wate pir baş nas, fêm û hîs dikir û pir baş dizanî ku bingeha rêhevaltiyê rast û sadebûne û tê de cî ji xiyanet, radestî, berjewendî û xirabiyan re nîne. Dizanî ev peyv rê nade ku ji bo parastina canê xwe pişt li armancê bê zivirandin. Yekane armanca wî ev bû ku bibe rêhevaleke baş ji bo Rêber û rêhevalên xwe yên Şehîd û zindî, bibe şoreşgereke serkeftî û hêja ji bo gelê xwe û bibe kelemeke mezin li pêşiya xiyanet û radestiyê. Bibawer bû ku yên ji peyva rêhevaltiyê fêm nekin û vê peyvê bi navê xwe qirêj bikin nehêjane ku di tevgera pîroz û rêhevalane ya Apoyî de cih bigrin; ji ber ku Heval yanî Hev + Al; yanî ala hevbeş. Yanî têkoşîn û armanca hevbeş. Yanî rê û daxwazên hevbeş. Yanî hest û hizrên hevbeş. Yanî hesret, hêvî û xeyalên hevbeş. Hev + Al, yanî li dora yek al kombûn û dest ji wê alê bernedan. Al sembola fikre û peyva HEVAL xeta bîrdozî û felsefîk, şêwaza jiyana hev reyî û komînal a PKK'ê destnîşan dike. Rêheval Hemze ev peyv weke nirx û rûmeta hevbeş a tevgera şoreşgeriya Apocî didît. Lewre evîndar û şeydayê vê peyvê bû. Ji ber vê yekê bibawer bû ku yên bêpar bin ji vê nirx û rûmeta hevbeş, yanî yên li şûna ku xwe ji bo parastina rêhevalên xwe feda bikin, rabin bikevin derdê xelaskirina canê xwe û hevalên xwe ji bo xwe feda bikin wê têkevin tenekeya gemarên dîrokê. Û dîrok wê tif li rûyê wan bike...

Aso Berxwedan û Dengtav Amed bi vê rûreşî û xiyanetê mil bi milê dijmin çûn ser rêhevalên xwe; ew rêhevalên ku bi salan di ber wan de ked dabûn û bi bihayê canê xwe her tim ew ji dijmin û neyaran parastibûn û canê wan xelas kiribûn. Aso û Dengtav ji 15.12.2011'an heya Newroza 2012'an li Cudî û Bestayê mil bi milê dagirkeran êrîşê rêhevalên xwe kirin. Di êrîşa 12 û 13'ê sibatê de pênc hezar tîmên taybet, komando û payebilindên artêşa dagîrker a Tirk + Aso bi tonan çekên giran û ferdî cih girtin. Yek leşkerê asayî di vê êrîşê de cih negirt; hemû tîmên taybet, komando û payedar bûn. Ya Aso? Ew çima di nav wan de bû û bi wan re tev digeriya! Aso rê û cihê hevalan nîşanî

leşkeran dida, ew anîn ser çiyayê Mêrgûmarê û bihust bi buhust di vê axê de bi wan re li gerîlayan ku êdî ne hevalên wî bûn geriya. Tevlî pevçûnê bû û ji bo ku xwe têxe çavê dijmin de, di çavên dijmin de nirx û qîmeteke wî hebe û li ba wan cihek jêre çêbibe çi ji destê wî hat kir. Kê/î dizane, belkî bi vê mebestê ji dijmin zêdetir gule teqandiye. Bi teqandina her fîşekekê re aliyeke din ji mirovbûna wî diriziya û tine dibû; tovê xiyanetê zêdetir giyanê wî dagîr dikir û di hinav û hebûna wî de zêdetir şitil dida û Aso kirêttir dibû. Bestayê ji ber ku ewqas jêre dayîktî kiribû û wî di himêza xwe de hewandibû şerm dikir...

Aso di pevçûneke dawiya sala 2011’an de li Cudiyê Miradan ji tirsa canê xwe dest ji Rêber, Şehîd û birîndarên xwe, ji rêheval û gelê xwe, ji armanc û mirovbûna xwe berda û radestî dijminên xwe bû, hem jî li Cudiyê ku hesreta Rêberê gelê Kurd ê bindest, wargeha vejîna mirovahî û xweza di nav keştiya Nûh de, rawestgeha dawiya Lawkê Xerîb û cihê berxwedan û lehengiya hezaran şoreşgerên APOyî ye radest bû. Li Cudiya ku bin her kevir, zinar û dareke wî bi xwîna geş a keç û kurên hêvîdar ên gel hatiye avdan rûmet, şeref û nasnameya mirovtiya ku ji PKK’ê girtibû firot...

Rojên dawiya sala 2011’an leşkerên Tirk li Cudî di nav berf û sermaya zivistaneke dijwar de bi ser kampeke hevalan de girtin. Hemû hevalên kampê bi hêzeke mezin ku ji rêhevaltiya Rêber û Partiya xwe girtibûn xwe ji bo parastina hevdû feda kirin û li hember hemû çekên giran ên dijmin bi çeka “vîn û baweriya bi azadî û doza xwe” li ber xwe dan. Hin heval di vê berxwedanê de şehîd ketin, hin heval jî giran birîndar bûn. Wan hevalan ji bo parastina Aso û Dengtav jî xwe feda kiribûn. Di vê xwefedakirinê de ti carî dudilî jiyan nekirin.

Di vê serdegirtinê de dijmin li hember berxwedana bêhempa ya hevalan bêçare ma û ji bo ku wan sax dîl bigre hin madeyên kîmyewî, hişber avête nav şkefta wan. Madeyên kîmyewî hewa û oksîjena hundirê şkeftê qirêj kir û heval pê gêj bûn.

Artêşa Tirk heya hingê ti car li gorî rêse û desturên şer li hember gerîla şer nekiribû û gelek car rêbaz, taktîk û madeyên ku di peymanên navnetewî yê şer de qedexene jî li hember wan xebitandibû, gelek car bi termên Şehîdan lîstibû û ew parçe parçe kiribûn, serê wan jê kiribû û pêre wêne kişandibûn, organên nav bedena wan derxistibûn, termên wan xistibû nav gorên komî, madeyên qedexe yên kîmyewî û

hişbir xebitandibûn, jehrî kiribûn, ji bo kuştina wan sîxur û ajan şandibûn nav refên wan, dehfik bi termên wan ve girêdabûn ji bo ku dema hevalên sax biçin termê şehîdên xwe rakin dehfik bi wan de biteqe û ew jî bên kuştin û hwd... Cur bi cur rêbaz û taktîkên ne li gorî pîvanên gerdûnî yên şer li hember gerîlayên Kurdistanê xebitandibû. Heval vê yekê dizanin û ji bo tedbîr li hember vana her tim aveke zêde di nav kampê de radigirin, ji ber ku av heya astekê bandora madeyên kîmyewî dikuje.

Di vî şerî de jî avêtina madeyên kîmyewî rêbazek bû di destê dijmin de. Dema ku dijmin madeyên kîmyewî avête nav şkeftê heval beziyan ser ava ku ji bo tedbîra van ya ji berê de di kampê de amade kiribûn. Aso ku hîn di destpêka şer de tirs û xofê hemû rih û hebûna wî dagîr kir wexta ku her kes beziya ser avê, fersenda revê dît, her du destên xwe rakir hewayê, hewara leşkerên dagirker ê Tirk kir û got: “Abi abi teslim oluyorum, vurmayın, teslim oluyorum” (Keko keko ez radest dibim, min nekujin, radest dibim). Wisa ji şkeftê derket û destên xwe da destên her du leşkerên ku li rast û çepê devê şkeftê bûn û tevî avêtina bombeyên gazê û fîşekan, ser hev banga radestbûnê li gerîlayên nav şkeftê dikirin.

Aso piştî radestî û xiyanetê ku li doz û hevdozên xwe kir, ser daxwaza dijmin çend narincok avêtin nav şkeftê. Fermandarê kampê, endamê Konseya Leşkerî ya HPG’ê Rêheval Rubar Mêrdîn bi parçeyên narincokên Aso pir giran birîndar bû. Parçeyeke mezin li qirika wî ket, çend parçe jî li bedena wî ketin. Aso har bibû û ranediwestiya, vê carê jî yeko yeko banga radestî û xiyanetê li hemû hevalên ku li ber xwe didan kir. Ji bo ku bandorê li berxwedana hevalan bike û baweriya wan bişkîne di nav bangên xwe de propagandayeke dûr û dirêj di derbarê “dadweriya dewlet û artêşa Tirk!!” û “bêwatebûna berxwedanê!” de kir.

Piştî banga Aso, Dengtav jî ket kemîna fersendekê. Demeke kurt şunde, wexta ku hemû heval bi birînên giran ên Heval Rûbar re mijûl dibûn reviya û destê xwe da dijmin. Dema ku Dengtav bi banga Aso li xiyanetê difikirî Heval Rûbar bi zorî henase digirt. Nedikarî rehet biaxive. Dîsa jî zorî da xwe û gotinên xwe yên dawiyê ji rêhevalên xwe re gotin: “Min şehîd bixin, ez giran birîndarim, êdî sax nabim... Hûn min bihêlin, dema tarî bû û dijmin hinekê ji devê şkeftê xwe paşve da yeko yeko bi navber derkevin biçin, kê/î ji we pêşiya kê/î derkeve bila

yên li pey xwe biparêze, hevdû tenê nehêlin...” Ew bi birîndarî jî tenê li xelasbûna hevalên xwe difikirî û ji ber ku êdî nedikarî wan biparêze xemgîn bû. Di van wextan de ku êdî ber bi şehîdbûnê ve diçû jî her dilê wî bi dilê rêhevalên wî re lêdida.

Aso û Dengtav tevî hemû hevalan li hemû axaftinên ku Heval Rubar her ji destpêka operasyonê ve kiribûn û hişyariyên ku dabû guhdar kiribûn. Taybet Dengtavî li wan axaftinên dawiyê jî guhdar kir. Lê belê fikra xiyanet û tirsa ji mirinê ewqas rihê wan fetih kiribû ku qet ji van axaftinên wî bandor nebûn û tiştek jê wernegirtin.

Kêliya ku Dengtav rabû bireve, hevalên din li ser Heval Rubar kom bibûn û birînên wî dipêçan. Lewre dereng pê hesiyan. Berxwedan Roboskî dema serê xwe rakir û wî dît ku ber bi devê şkeftê ve diçe zivirî çeka xwe rakir û çend fîşek avêtinê. Lê fîşek lê neketin, ji ber ku heya Berxwedanî çeka xwe rakir leşkerên ber derî êdî destên Dengtav girtibûn û ew dikişandin derve.

Li pey xiyaneta her duyan dema dinya tarî bû dijmin ji tirsa êrîşên fedayiyane ya hevalan deriyê şkeftê berda û hinekê dûr ket. Hevalên sax mabûn jî pilana derketinê danîn û ketin tevgerê. Hin heval bi berxwedaneke gelek mezin, bi awayê ku hevdû biparêzin ji şkeftê derketin. Heval Zîlan Bagok û Heval Sema Selmas jî li pey hevalên xwe derketin, lê di ciheke şaş re çûbûn û rastî zinareke pir bilind hatin û negihiştin hevalên xwe. Lewre ji bo ku nekevin destê dijmin bi çanda ku ji Rêheval û Fermandara xwe ya efsanewî Bêrîtan Hêvî (Gulnaz Karataş) girtibûn destê hev girtin, bi diruşm û tilîlî xwe ji wê zinara bilind avêtin û bi lehengiya cengaweriya xwedawendîtiyê şehîd ketin. Ew, bi vî awayî hem xwedî li rûmeta xwedawendiya Mêzopotamyayê û çanda berxwedaniya PKK’ê û jina Kurd derketin, hem xiyanet û radestî têk birin, hem jî careke din rewabûna doza azadiya gel û jinên Kurd bilêv kirin. Heval Zîlan û Heval Sema bi van hestan û bi hesreta dîtin û himêzkirina Rêberê xwe bask vekirin û bi diruşma Bijî Rêber Apo li ser latên Cudî firiyan.

Aso û Dengtav piştî radestî û xiyanetê êdî ji dijmin aktîftir tevlî hemû şerên din ên li Cudî û Bestayê bûn. Aso çû operasyonên Bestayê jî, pêşengtî ji dijmin re kir. Wî Besta nas dikir, ji ber ku li wir mabû û nû ji wê derê bi Heval Rûbar re (bi tevî Dengtav jî) çûbû Cudî. Cihên ku li Bestayê heval bawerî dabûnê û nîşanî wî kiribûn wî jî tevan nîşanî

leşkeran da û wan bir hemû deverên ku nas dikir, an jî guman dikir heval lê hene. Ev her du kes par ji mirovbûn, nirx û hestên rêhevaltiyê negirtibûn. Kê/î dizane çend hevalan ji bo parastina canê wan xwe dane ber fîşekên dijmin û xwe feda kirine?!

Aso ku ji Rojhilatê Kurdistanê, bajêrê Sineyê bû, di rastiyê de êş û janên gelê xwe pir dîtibûn, lê ti car ji dil de hîs nekiribû. Hemû taybetmendî û bêrûmetiyên ku pergala serdest a Îranê dabûn, wî di xwe de çandibûn. Lê civaka wî wisa nebû û bi nirxên xwe dijiya. Lewra Aso li gorî pîvanên civaka xwe nebû û ti carî di nav civaka xwe de cih jêre venebibû. Derdora wî ji taybetmendiyên wî hez nekiribûn û ew nepejirandibûn. Ji ber vê, dema ku tevgera azadiyê nas dike ji bo ku xwe xelas bike yekser dibeze nav wê û xwe davêje ber bextê Partiyê. PKK jî ji bo ku wî ji qirêjiyên ji pergalê girtiye paqij bike û wî bike mirov û şoreşgereke baş ji bo gelê xwe, dipejirîne û perwerde dike. Lê Asoyê ku rih û hebûna wî ji aliyê pergala dagirker û tepisîner a Îranê ve hatibû fetihkirin ti carê nefikirî xwe biguherîne û bi armancên PKK'ê û gel re xwe bike yek. Ji ber ku ew bi armanca bibe mirov û ji bo rizgarkirina gelê xwe tevlî PKK'ê nebibû. Sedema tevlêbûna wî ya nav rêzên tevgera azadiya gelên Kurdistanê rewşeke macerawarî û bêhedefî bû. Yanî di dema tevlêbûnê de exlaq û çanda mirovhezî, azadiya gelê Kurd, rizgarî û xelaskirina Kurdistanê ji bindestî û parçebûnê û xizmet ji pêşketina civaka Kurd re, ji xwe re nekiribû armanc. Destan ji vê berdin; heta êşên malbat, cîran û nasên xwe hîs nekiribûn. Ti carê ji gelê xwe hez nekiribû, lewra gel û nasên wî jî jê hez nekiribûn. Hê di civakê de jî miroveke bêdost û bêheval bû.

Aso çawa ku di malê de ti carê rêz li keda dayîk û bavê xwe û nirxên civakî yên gelê xwe negirtibû, jê hez nekiribû, ti carê ked nedabû û tenê li ser keda malbatê xwe dabû jiyankirin, di nav tevgera azadiyê de jî ti carê ji rêheval û hevdozên xwe hez nekir û bi wan re nebû yek. Rêhevalên wî çiqas ji bo pêşxistin û guhertina wî hewl dan, wî jî ewqas ji bo parastina taybetmendiyên xwe yên çewt û paşverû hewl da û li ber xwe da. Gelek caran ji ber uslub û pêkanînên çewt, neyînî û derveyî exlaqê PKK'ê di rojevê de bû. Dîsa jî hevalan bi sebir û dilsoziyeke mezin hewl didan kesayeta wî biguherînin û taybetmendiyên nû û hestên azadîxwazî pê bidin qezenckirin. Lê çi sûd? Aso her weke xwe bû û diyalektîka guhertin û pêşketinê di xwe de rawestandibû. Dema hevalan ev bêrêzî û xwesepandinên wî didîtin

jê sar dibûn. Hin heval çûn gumana ku "gelo dibe ji aliyê dijmin ve hatibe şandin û bi zanabûn xirabiyan bike?"

Di sala 2009'an de rêxistinê şanseke nû da wî û ji bo ku fêrî ked, hevaltiya rast û xweşikahiyên jiyana şoreşgertiyê bibe Aso şand Bakurê Kurdistanê, herêma Botanê. Tevahî qadên Bakurê welat, taybet jî qada Botanê xeyal û hesreta bi hezaran hevalê/î bû. Her sal bi hezaran pêşniyar û daxwaza çûna wir ji aliyê pêkhateya rêxistinê ve ji rêveberiyê re dihatin ragihandin. Her kesê dixwest biçe Bakur şer bike, tola rêhevalên xwe yên şehîd ji dijmin bistîne û heya bi dawîhatina dîlbûna Rêber APO ji çeperên şer dernekeve. Lê PKK ji viya jî mezintir fikirî; li şuna wan derfet da Aso ji bo ku wî bike miroveke rast û kesayeta wî sererast bike. Şansa çûna Bakur-Botanê ji wî re derket.

Rêxistinê di sala 2010'an de heman tiştan ji bo Dengtyav jî fikirî. Dengtav ji Ameda paytexta welat bû. Bi çanda welatperweriya malbatê hatibû mezinkirin. Malbata wî ji dijminê faşist ê Tirk pir êş dîtibû û ji bo parastina nirx, rûmet û çanda welatparêziyê gelek ked dabû. Lewra dema kurê wan Dengtav tevlî refên şoreşa Kurdistanê dibe xwe pir serbilind hîs dikin. Lê dema ku Dengtavî xiyanet kir û di êrîşên ser kampên hevalan de tevlî dijmin bû ev malbata hêja ji dil birîndar bû, xayîneke wisa di hizura gel de ji ewladiyê avêtin, lêborîn ji gelê Kurd û PKK'ê xwestin û sonda berdewamkirina xeta Şehîdan û têkoşîna li hember îxanetê dûbare kirin; malbatê şerm kir ku xwedî zarokeke wisa nankor û neyare û ew lanet kirin... Dengtav hê salek bû derbasî Botanê bibû. Hê bi çavên xwe dijmin nedîtibû. Di vê yekemîn dîtina dijmin de tirsiya û hemû nirxên xwe ji bîr kirin. Şerm kir ev tirs û kurmên nav dilê xwe ku hundirê wî dixwarin ji rêhevalên xwe re bibêje da ku alîkariya wî bikin û wêrekî û cesaretê bidinê, lê şerm nekir dema radestî dijminê xwe bû û bi tevî leşkeran fîşek avête rêhevalên xwe...

Erd û ezmanan ji dîtina vê dîmenê şerm kirin, lê belê Aso û Dengtav bêşermane di salona dadgeha bêdad a dijmin de ketin pêşbirka agahîdanê; her yekê hewl dida ji yê din zêdetir agahiyan bide dijmin, da ku di çavê dijmin de ciheke baştir jêre çêbibe, bêyî ku bizanin piştî hemû agahiyên dizanin dane dijmin û piştî ku dijmin îşê xwe bi wan qedand û tam ji mirovbûnê derxist wê cihê wan bibe quncikeke tarî yê zîndanê û wê heya hebin di wir de bimînin û birizin.

*Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!*
Çi nezan û cahîl bûn! Nedizanîn ku Dadgeha Wijdanê ya Dîrokê jî wê rojekê wan bidarizîne...

Roja 13 û 15’ê sibata 2012'an li Besta du xet, du raman, du hest û du helwestan li hember hev şer dikirin; li aliyekê berxwedan, giyana fedayî û cangorî, xeyala azadî, wîjdan, qehremantî û girêdana bi nirx û destkeft û rûmeta mirovahiyê, li aliyê din radestî û xiyanet, nemirovtî, zilim, dagîrkerî, hovîtî û êrîş li ser exlaq û pîvanên mirovahiyê... Heq û neheq, rewa û zilim, dad û bêdadî, wîjdan û hovîtiyê êrîşî hevdû dikirin. Tevahî Besta, tevahî Mêrgûmarê di bin botên qirêj ên dagirkeran û bêhna xiyanetê de êş dikişand, jan girtibû û dinaliya...

Her wiha Besta û Mêrgûmarê bi irz û serfiraziyeke mezin berxwedan û cengaweriya zarokên xwe temaşe dikirin. Wê rojê Besta careke din aşiq û evîndarê fedakarî û wefadariya şoreşgerên xwe bû. Wê rojê Cudî, Gabar, Çirav, Pîro, Hecî Musa, Gizîngê, Herekol, Kato, Kaplan, Kêla Memê û Şanstêr serî tewandin li hember fedayîtiya van 15 şoreşger, 15 efsane û 15 zarokên wefadar ên Xwedawendan. Wê rojê mîtolojiya şerê navbera XWEDAWENDÊN EVÎN û XWEDAYÊN XEDAR ji nû de zindî bû û ji nû de vejiya. Wê rojê destaneke nû di nav rêzepirtûkên berxwedana xeta APOyî de hat nivîsandin.

Roja 14’ê sibatê 15 bedenên ciwan bi awirên tijî hesret û hêvî li morga Meletiyê razabûn. 14’ê sibatê, yanî rojek beriya salvegera komploya navneteweyî ya li dijî gelê Kurd, mirovahiya bindest û jinên cîhanê.

15’ê sibatê perdeya reş li Kurdistan, Rojhilata Navîn û cîhan...

15 term li Meletî... 15 bedenên qelişî û ji organên hundirîn valabûyî...



**Nasnav: Hemze Şirnex**
**Nav û Paşnav: Abdulmecît Îke**
**Dîrok û Cihê Jidayîkbûnê: 1974/Şirnex**
**Navê Dayîkê: Fatma**
**Navê Bav: Abdulkerîm**
**Dîrok û Cihê Tevlêbûnê: 1988/Şirnex**
**Dîrok û Cihê Şehadetê: 13-15’ê Sibtê 2012- Di Operasyona Li Bestayê De**

**Heval Hemze Şirnex**

Zivistaneke sar bû. Hêdî hêdî sala 2010’an bi dawî dibû. Li Dibistana Şehîd Mezlum Doğan perwerde germ derbas dibû. Hundirê dibistanê germ û derve pir sar bû. Xwezayê xemla xwe guhertibû. Çiya û zozanên Kurdistanê weke her sal tijî berf bibûn. Li zozanan, dol û gelî tijî berf bibû. Jixwe erdnîgariya Kurdistanê bi awayeke ku eger berf bi qasî çokekê bibare bayê li zozanan wê berfê hingî digerîne û radike heya dike çend qatî berfa ku bariye. Kevir, gunî, giyayên bilind, teht, zinar û şikêrên bilind jî li zozanan di bin berfê de winda dibin. Zozan mîna meydaneke rast lê tên. Ba û bahozên zozanan êdî ti astengiyekê li pêşiya xwe nabînin, lewra berf hemû deran wek hev lê dike. Dengê bayê mîna dengê balafirên şer tûj û gurre. Ku li guhê yekê bixe dibê qey guhê wê/wî jê dike û kerr dike. Ku li rûyê mirov ket wekî ku kêreke tûj lê bikeve ye. Jixwe mirov bi dest û lingên xwe nahese. Tiliyên dest hişk û ji hev belav dibin. Dest, guh, poz û rû sor û şîn dibin. Kum û lepik heya astekê mirov diparêzin, jê şûnve vîn dikeve dewrê.

***Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!***

Li daristanan rewş nermtire. Axa daristanan weke axa zozanan hişk nîne, ji ber ku dar ax û erdê sist radigirin. Mar, mişk, kurmik, morî û gelek ajalên mezin û biçûk ên din jî ji ber ku tim axê dikolin û hêlîna xwe têde çêdikin axa daristanan li gorî zozanan sist, nerm û germtire. Lewma berfa ku bibare jî zûtir dihele; jixwe berfa daristanan ti carê bi qasî ya zozanan bilind nabe. Bayê ku digere li daran diqelibe û hêza wê parçe dibe. Di dolikên serberjêr, şîv û palên bilind de aşût tim hene. Aşût eger bilind û xurt be gelek dar û tehtan ji binî ve radike û bi xwe re heya rawestgeha dawiyê dibe. Jixwe eger mirov bikeve ber aşûteke wisa mezin, beriya gihîştina berfa aşûtê, li ber ba û hajûhuja wê diçe û digindire. Dengê aşûtê û dengê bahozên zozanan hundirê mirovan dihejînin. Dar eger stûr, xurt û qayîm bin wê bi berfa giran re şer bikin û li hember wê li ber xwe bidin. Darên ziwa, hişk, rizî, ciwan, zirav û hundirvala jî wê ji binî ve ji axê qut bibin û bikevin erdê. Li ser darên şîn û qayîm eger şaxên hişk hebin ewê di bin berfê de bişkên û hûr bibin...

Hemze li van dîmenan dinêrî û kûr û dûr diçû, diket nav bîranînên kevin û xeyalên di pêşerojê de. Gerîllayeke kevin bû û her awayê şert û mercên xwezayê jêre nas û hêsan bûn. Zarokatiya xwe li çiyayên Şirnexê jiyabû. Di çardeh saliya xwe de biryara jiyaneke nû û azad dabû û bibû şoreşger. Salên dirêj li tevahî deverên Botan, Garzan û Zagrosê; ji Slopî û Cizîr heya Norşîn û Xîzan û Qubînê, ji Dihê û Berwarî heya Şax û Payîzava û Elbakê, ji Elkê û Colemêrgê heya Gever û Şemzînanê li her derekê mabû. Ji sala 1988´an heya 1994´an li hemû qadên Botanê; li Cudî, Gabar, Besta, Herekol, Garisa, Kêla Memê, Kato Jîrka, Kato Xelîla, Artos, Kato Marînos, Ferașîn, Berwara Sêvdînê û Çêle Cengê bihust bi bihust geriyabû û salên dirêj têde jiyan û şer kiribû. Zarokê Botanê bû û tevahî deverên wê weke kefa destê xwe nas dikirin. Ji Botanê pir hez dikir. Botanê jî ji wî. Hem zaroktî, hem ciwantiya xwe li wir derbas kiribû. Ji sala 1994’an heya 1996’an li Garzanê mabû, ji 1996’an heya 2000’an li Zagrosê û jê şûnde jî heya sala 2011'ê ku careke din ew û Botan bi hev şa bûn li Herêmên Parastina Medyayê mabû. Rastî jî Hemze li Botan, Garzan û Zagrosê dihat, ew jî li wî dihatin.

Wî li Botan, Garzan û Zagrosan ked dabû û xwêdan rijandibû. Bi hevalên xwe re rêhevaltî kiribû û rêhevaltiya wan dîtibû. Di nava ewqas salên dirêj ên şer de tevlî bi sedan çalakî û şeran bibû. Bi sedan rêhevalên xwe li wir şehîd dabûn. Bibû şahidê ken û awirên geş ên

dawiyê yên bi sedan hevalên xwe yên şehîd. Awirên wan ên geş û tijî hêvî û bawerî di dilê xwe de neqişandibûn. Termên gelek ji wan bi destên xwe veşartibûn. Hilma henaseya dawî ya gellek şehîdan kişandibû hinavên xwe. Gelek rêhevalên wî çav vekirî şehîd ketibûn û Hemze bi destên xwe çavên wan girtibûn. Bi sedan carî li ber termê hevalên xwe yên şehîd zêrevanî kiribû. Birîna hezaran rêhevalên xwe pêçabû û fîşek û parçe ji bedena gelek ji wan derxistibû. Bêyî ku bi westandina xwe bihese gelek caran termê şehîdan, birîndar û hevalên jitaqetketî û bêhalbûyî bi saetan, bi şevan li pişta xwe kiribû. Gelek caran ji bo xelaskirina canê hevalên xwe, xwe avêtibû nav metirsî, zorî û zehmetiyan. Heta pir caran ji bo parastina wan xwe kiribû hedef ji fîşekên dijmin re.

Gelek caran ji bo ku ji hevalên birîndar re kulmek savar, ard an jî çend kevçî şekir û ava bacanan bibîne rêya bi şevan meşiyabû. Mehên dirêj bi xwarina berû û berhemên din ên xwezayê debara xwe kiribû. Arxavk û mirtoxe, hevdel, goştê bêxwê û kelî, piştî çend meh bênanî qetek nan û çaya tarî ji xwe re luks dîtibû û spas kiribû. Cil û bergên pînekirî, gore û pêlavên kun û qetiyayî û şutikeke parçe parçe weke rûmeta şoreşgertiya xwe dîtibû. Fêrî îmkan û derfetên luks û dewlemend nebû. Êşa hejarî û xizaniya gelê Kurd hê ji zaroktiyê ve dîtibû û hîs kiribû. Lewre bibawer bû ku şoreşgerên geleke xizan û welateke bindest, parçe û talanbûyî nabe ji gelê xwe dewlemendtir bijîn, berovajî, divê her tim sade bijîn.

Hemze Rêber Apo ji zimanê hevalên ku di zaroktiya wî de diçin gundê wan nas kiribû û ji jiyana sade û rêhevaltiya wan pir hez kiribû û jê bandor bibû. PKK sala 1981'ê dikeve herêm û gundê wan. Şehîd Mehmed Sevgat, Şehîd Erdal (Mistefa Yondem) û Şehîd Seadet (Rehîme Qehreman) bandorê li gelê wê herêmê dikin. Dema ku fermandarê efsanewî yê gerîlla Rêheval Egîd (Mehsum Korkmaz) pêngava 15'ê Tebaxê li Botanê (Dihê-Gabar) dest pê dike, ew zarokeke deh saliye. Di zarokatiya xwe de her tim çîroka lehengiya Heval Egîd û bîranînên gundiyan ên bi wî re guhdar dike. Rêz û heybeta Fermandar Egîd li tevahî Botanê dev bi dev tê vegotin. Hemze jî di vî temenê biçûk de mîna tevahî Botaniyan aşiq û evîndarê vî fermandarê mezin dibe û di dil de tim dixwaze bibe kesayet û fermadareke weke wî. Bixwe car caran hevalan dibîne, li wan guhdar dike û şêwaza jiyana wan

dişopîne. Ji kesayet û taybetmendiyên wan fêm dike ku ev hemû taybetmendî, çand û edeba Reberê tevgerêne. Bi vî awayî bêyî ku Serok Apo bibîne wî nas dike û jê hez dike.

Bi naskirina PKK'ê re gelek şervan ji malbat û herêma wan derdikevin serê çiya. Şehîd Fehîme ku keça apê Hemze ye, yekemîn jine ku ji Botanê tevlî refên PKK'ê dibe. Malbata ÎKE û herêma Şirnexê her ji destpêkê ve rihê welatparêziya xwe tevlî şoreşa azadiyê dikin û gelek gerîla û bedelên hêja xelat dikin. Lewre her ji wan deman ve dikevin ber bala dijmin û dibin hedefa sereke ya hemû êrîş û zilmên wî. Gel, gundî û jinên Gabar, Şirnex û giştî Botanê bi bandora hevalên ku di herêma wan de xebatên PKK'ê dest pêkirine, pêngava 15'ê Tebaxê, tevlêbûnên herêmî û taybet jî tevlêbûna Hevala Fehîme hê zêdetir nêzî PKK'ê dibin û li dora PKK'ê kilîd dibin. Gel çiqas zêdetir bi PKK'ê re dibe yek, dijmin jî ewqas zêdetir êrîşî wan dike. Ebdûlmecîd ÎKE jî di malbatek welatparêz û dilsozê doza PKK de mezin dibe.

Hemze her cara ku tûndûtîjiyên dewleta Tirk li ser Kurdan dibîne kîn û nefreta xwe li hember wî mezintir dike. Hê ji zaroktiyê ve li aliyekê tûndûtîjî, jixwebiyanîkirin, talankirina malan, avêtina girtîgehan, êşkence, kuştinên kiryar nediyar, şewitandina gundan û hovîtiyên cur bi cur ên din dibîne. Li aliyekê jî girî, qêrîn û hewar, xizanî, berxwedan û kîna gel... Her duyan bi hevdû re dibîne û dibeşahid. Evana birîneke kûr di dilê wî de vedikin. Lewra hember dijmin hêrs dibe û nefretên xwe mezin dike.

Çîrokên raperîn, komkujî û qirkirinên li Amed, Ararat, Dersîm, Geliyê Zîlanç Tendurek û Botanê dibihîse û tiştên li derdora wî diqewimin dişibîne wan. Bi mezinbûna hêrs û kînê re lêgerînên wî jî di dil û mêjî de xurttir dibin. Lêgerînên wî êdî digihîjin asta biryarekê ku tevahî jiyana wî biguherîne. Zilma dijmin her tim wî dehf dide. Li hember wê fikir, jiyan û sadebûna şoreşgerên PKK'yî her tim wî dikişînin xwe. Ji ber vê yekê êdî bawer dike ku bi vî awayî nikare jiyan bike û pêwîste li pey nakokî û lêgerînên xwe bikeve. Lê belê ji ber ku temenê wî biçûke tam nizane biryara têkoşîneke bi çi awayî bide. Temenê wî biçûk û tenê çardeh sal be jî, fikir û dilê wî mezine û dixwaze gelê xwe ji vê rewşê rizgar bike. Ji bo vê jî li rê û rêbazên wê digere. Di sala 1987´an de bi hejmarek ciwanên din re bi qanûna leşkerî tê derxistin û diçe çiya. Piştî wê, rêxistin ji ber rewşa malbatê û temenê wî yê biçûk wî paşde dişîne malê. Lê piştî demekê li malê

dimîne li ser daxwaza xwe di destpêka sala 1988'an de dubare beşdarî nava refên gerîla dibe. Her çiqas di temenê çardeh saliya xwe de be jî, ne biyaniyê çiya û jiyana gerîla ye û zêde zehmetiyê najî.

Jiyana şoreşgertî pir giran û zehmet bû lê rewşa bindestî û zilma ser gelê Kurd hê girantir û zehmetir bû. Ji ber vê, Hemze ti carê li hember van zorî û zehmetiyên jiyana şoreşgerî dûdil û poşman nabe û bin nakeve. Ji zorî û zehmetî, ked, xwêdan, fedakartî, hevaltî û hemû tiştên vê jiyana nû hez dike û ji dil pêre dibe yek. Bawer dike ku azadî rehet nayê bidestxistin, ji ber vê jî pir zû fêrî zehmetî û keda nav jiyana gerîllayî dibe. Jixwe jiyana xwe ya malê jî her di nav ked û zehmetiyan de derbas kiribû, mîna hemû zarokên din ên Kurd zaroktiya xwe jiyan nekiribû û di nav xizanî û kar de mezin bibû. Lewre gengaz nebû ku zû fêrî jiyana gerîllatiyê nebe.

Her ji destpêka jiyana şoreşgerî ve bi eşq û evîn xwe li gorî hemû şert û merc û hemû erdnîgariyan amade dike. Di germaya dijwar de ne kêm car dişewite û ji xwêdanê şilûpil dibe. Di sermayê de jî ne kêm car direcife. Hemû kêliyên jiyana xwe û hevalên xwe bi hev re par dike. Bi tevî wan li hember hemû cure zehmetiyên xwezayê li ber xwe dide. Bi wan re diweste, birçî û tî dibe, bêxew dimîne, şer dike, dikene, dîlanê digire, hez û nefret dike û... Ji ber vê yekê jiyana rêhevaltiyê ji bo wî dibe sermayeya herî mezin di jiyanê de.

Pir caran bi hevalên xwe re zivistaneke sax di bin qetek naylonê de derbas dikin û jiyana bin vê qeta naylonê ji Koşka Spî û hemû qesr û serayan xweştir û hêjatir dibînin û pê razî dibin. Dilê wan ê nizim û dewlemend nahêle xwe xizan û hejar bibînin. Hêza wateyê di vê jiyanê de keşf dikin û bi van zor û zehmetiyan digihîjin wateya jiyanê.

*****

Payîza sala 2010'ê bû. Dîsa weke her car pêjna berfê xwe dida hîskirin. Hewa baş sar bibû. Hemze dîsa ketibû bîra wan demên zor û zehmet ên li Botan, Garzan û Zagrosê. Her ku diçû ber sobeyê, naylonên kevin û çarberên tijî pelên kozê yên demên pratîka germ a beriya sala 2000'î dihatin bîra wî. Axîneke kûr dikêşand. Zivistanên sar û dijwar ên zozan û daristanên Kurdistanê gelek dîtibûn. Bi sermaya wan re hevaltî kiribû û jê hez kiribû. Diket bîra Cudî, Gabar, Çirav,

Besta, Herekol, Garisa, Kêla Memê û Katoyan. Ew demek bû her pêşniyara çûyîna Bakur, taybet jî Botanê dikir.

Meha Gulana 2009'ê ku fermandarê herêma Heftenînê bû, tevlî konferansa duyemîn a qada Botanê bû û li pirsgirêkên bermayiya tesfiyekariyên ku çeteyên bi navê Dîcle Andok û Dr. Elî xwestibûn li Botanê pêk bînin û bi vî awayî gerîla marjînal bikin guhdar kir. Ew bixwe zarokê vî şerî bû, ji 14 saliya xwe ve di nav germahiya vî şerî de cih girtibû. Gelek berxwedan û lehengî, di heman demê de gelek pratîkên tesfiyekariyê jî ji nêz de dîtibûn. Lewra armanc û niyeta tesfiyekarî û çetegeriyê baş nas dikir. Herweha wate, girîngî û taybetiya Botanê di nava temenê şerê çekdarî yê gelê Kurd de bi başî dizanî.

Yekemîn fîşek bi pêşengtiya Fermandar Egîd li Botanê hatibû teqandin. Yanî Botanê ji gerîlatî û şerê çekdarî re derguştî kiribû. Yanî kelha artêşa gerîla Botan bû. Lewre Botan di warê leşkerî de her ji destpêkê ve hedefa sereke ya dijmin û neyaran bû û rûxandina vê kelheya şer her tim xewn û xeyala wan bû. Dîcle û Elî dizanîbûn ku eger Botanê bixin wê hemû qadên din ên gerîla ji vê yekê neyînî bandor bibin. Ji ber vê, hewl dabûn şêwaza jiyana gerîla li vê qadê seqet û felc bikin û bi vî awayî hemû artêşê bi dest bixin da ku di rewşeke wiha de êdî PKK nemîne.

Ev pirsgirêk bûn rojeveke sereke ya konferansa duyemîn a Botanê. Dîcle û Elî sala 2006'ê dest bi vê pratîka tesfiyekariyê kiribûn. Sala 2007-2008´an rêxistinê destwerdana rewşê kiribû û ketibû hewla sererastkirina şaşitiyên heyî. Lewre di sala 2009´an de hejmareke zêde heval ji bo vê qadê hatin şandin.

Di nirxandinên nav konferansê de ji bo têkoşîna li hember tesfiyekariyê daxwaza Hemze ya çûyîna Botanê hê zêdetir pêşket. Daxwaza xwe di çarçoveya çûna Botanê de ji rêveberiya jora xwe re ragihand. Xeyala Bakur hemû hebûna wî dagirtibû. Ya rast ku dera Bakur be ji bo wî cihêwaz nebû, ji ber ku tevahî qadên Bakurê Kurdistanê qadên şer bûn. Dîsa jî eger Botan bûya wê hê çêtir bûya. Ji ber ku hem erdnîgariya wir baş nas dikir, hem jî pirsgirêkên wir baş dizanî.

Pir hewl da pêşniyara xwe bi rêxistinê bide pejirandin, lê çi kir wê salê fermandariya HPG´ê pêşniyara wî nepejirand; ji ber ku hem pilansaziyên rêxistinê ji bo xebatên qadan û vebûnên nû hebû, hem

pêkhateya şervanên li Herêmên Parastina Medyayê gelek nû û ciwan bû û pêdiviyeke wan a pir cîdî bi perwerdeyê hebû, hem jî bernameyên cuda ji bo Hemze bixwe hebûn û hwd. gelek sedem li pêşiya pêşniyara wî asteng danîn. Di encamê de ji bo pêkhatina van pilanan pêwîstî bi kadroyên weke Hemze hebû.

Sala 2010´an Pêngava Şerê Gel ê Şoreşgerî ji aliyê HPG´ê ve hat ragihandin, lê di pêkanînê de gelek kêmasî derketin. Li hemû akademiyên bîrdozî û leşkerî û li Dibistana Mezlum Doğan jî wê zivistanê bi berfirehî û kûr û dûr li ser naverok, pêdivî û sedemên ku pêngav tam fêm nebû û encam negirt lêkolîn, nirxandin û şîrove hatin kirin. Di nav perwerdeya çend mehî ya dibistanê de pratîka qada Botanê jî di çarçoveya vê pêngavê de rojeva serekeya guftûgoyan bû.

Hemze, ji dil dixwest tevlî pratîka vê pêngavê bibe. Tevahî lêhûrbûn, hest û xeyalên xwe pêve girê dabûn û kilîd kiribû. Dixwest careke din li axa zaroktî, ciwantî û şervantiya xwe vegere. Li wê Botana kelheya berxwedanê şer bike û vê pêngavê li wir bibe serî. Dixwest Rêberê xwe li Navsera Cudiya Miradan, lûtkeya Herekola Mîran û Katoyan, li ser sînga Besta û Gabarê pêşwazî bike û hesreta dilê xwe û bi deh hezaran rêhevalên xwe yên şehîd pêk bîne.

Hema careke din vegeriyaba axa pîroz a Botanê û henaseyek ji kûrahiya dil û hinavê xwe tê de bikişanda. Hema kêliyekê çavên wî bi rengîniya dîmenên wê biheştê şa bibûyana, bêhna wê bikişanda nav kezeba xwe. Hema careke din destên xwe li ser ax û kevirên wê bianiya û bibira, xwe bitewanda ew maç bikira, kulmek ax rakira danîba ser dil û eniya xwe û piştre silavên germ û hesreta dilê hezaran rêhevalên xwe jê re bigota... Hesretên Hemze dawî lê nedihatin. Xwe li hember şerê ku li Bakur birêve diçû berpirsiyar didît. Zarokê zorî û zehmetiyan bû û dixwest di nav zorî û zehmetiyên pratîka şer de careke din cî bigire. Êşa ku ji şehadeta şehîdên wê salê dikişand hê zêdetir wî dehfî Bakur dida. Bi taybet şehadeta Heval Qehreman Erdal û Heval Mezlum Mamxurî pir li wî giran dihat, ji ber ku ew ji nêzve nas dikirin û salên dirêj di pratîkên zor û zehmet ên beriya sala 2000'î de li Botan û Zagrosê pir bi hev re mabûn.

30’ê puşpera 2010´an li Sêrtê, navçeya Berwariyê hevalan avêtibûn ser payîgeh û tepeyên dijmin ên li gundê Aqîrê. Ji ber

kêmasiyên ku rû dabûn di vê çalakiyê de tevî hejmarek kuştî û birîndarên artêşa Tirk, deh heval jî şehîd ketibûn:

Heval Qehreman Erdal (Evdurehman Bozdak) ji gundê Zengilok a Hezexê bû û di sala 1993´an de tevlê bibû.

Heval Silav Serkeftin (Gurbet Gokal) ji gundê Nerexê yê girêdayî Şirnexê bû û bibû penabera wargeha Mexmurê.

Heval Havîn Çiyayî (Nefîse İşik) ji Gûrdila Gabarê bû.

Heval Hebûn Azad (Eylem Demîrpençe) ji navçeya Mazgirt a Dersîmê bû.

Heval Azad Hebûn (Xelîl Kaya) ji navçeya Bêgirî ya Wanê bû.

Heval Şahîn Cîlo (Hesen Ceiferî Heyderanlu) ji herêma Çildêran a bajêrê Mako, Rojhilatê Kurdistanê bû.

Heval Herekol Sîlip (Halis Qudayî) ji Slopiyê bibû penaberê Duhokê.

Heval Mehsum Gabar (Perwîz Emînî) ji Ûrmiyê bû.

Heval Elî Çîçek (Efşar Reşadeduz) ji Rojhilat bû û Heval Kemal Ûrfa di vê çalakiya Aqîrê de şehîd ketibûn.

Di heman havînê de heşt heval bi hev re di çalakiyekê de û çar hevalên din jî bi hev re di kemînekê de li Şemzînanê şehîd ketibûn. Roja 8’ê Îlona heman salê jî li herêma Kato Marînos a girêdayî Colemêrgê fermandarê hêzên bejahiya artêşa Tirk Erdal Ceylanoglu koordînetiya şerekê kiribû ku tê de hejmareke zêde leşker miribûn û birîndar bibûn. Di heman şerî de bi pêşengiya Fermandar Mezlum Mamxurî 10 heval jî di berxwedaneke mezin a nav pevçûneke pir dijwar de birîndar bibûn. Birînên hemûyan pir giran bûn. Dema fêm kiribûn ku nikarin bi vê rewşa birîndariya giran xwe ji nav bazina dijmin derxin, 9 ji wan hevalan bombeyên ser xwe bi xwe de teqandibûn, da ku bi birîndarî dîl nekevin destên dijmin. Tenê yek ji wan ku birînên wî li gorî hevalên din siviktir bû karîbû xeleka dijmin bişkîne û xwe bigihîne hevalên din, lê ew jî ji ber giraniya birînên xwe piştî sê çar rojan şehîd ketibû.

Bi giştî di van şeran û gelek şerên din ku li qadên din ên Bakurê Kurdistanê qewimîbûn de artêşa Tirk pir windahiyên giran û zêde dabû. Li beramberî viya windahiyên HPG'ê jî her çiqas li gorî windahiyên dijmin pir kêm jî bin lê ji bo rêxistinê kêm û sivik nebûn. Pirsgirêkên taktîkî, deşîfrasyon û gelek lawaziyên din bedelên mezin û giran ji gerîlla stendibûn.

Di operasyona Kato Marînos de destên xiyaneta Kurd her ji cehşên Mamxuriyan bixwe, rola sereke lîstibû. Heval Mezlum tîrmeha 2010´an, yanî du meh beriya şehadetê ji Herêmên Parastina Medyayê derbasî Botanê bibû. Cerdewan û xwefiroşên nav eşîra Mamxuriyan beriya çûna wî ya Bakur agahî girtibûn û vê agahiyê ji dijmin re ragihandibûn. Ser van agahiyan û alîkariyên din ên cerdevanên Mamxurî, dijmin ji nêz ve Heval Mezlum bi wan dabû şopandin heya dema ku operasyon kirin. Ji bo şehîdxistina Heval Mezlum, fermandarê hêzên bejahiyê yê artêşa Tirk Erdal Ceylanoglu bixwe çûbû operasyonê koordîne kiribû.

Dîsa xiyanet! Dîsa ji xwe biyanîbûn! Dîsa li hember gel, şoreşger, welat, tevger û nirxên xwe xizmet ji dijmin re! Hemze ev bûyer yek bi yek dibihîst û ji dil birîndar dibû pê. Nedizanî ku salek şûnde destên xiyanetê wê dirêjî jiyana wî û 14 rêhevalên gel wî jî bibe! Hem jî li Botana evîna wî... Li Bestayê... Hem jî xiyaneta şervanekî wî!

Evqas şehadetên ser hev li Botan û qadên din ên Bakur -kuştiyên dijmin çiqas zêde dibe bila bibe- bandoreke neyînî li serkeftin û fêmbûna pêngava nû kiribû. Herwiha artêş û dewleta Tirk jî di warê leşkerî û siyasî de ji ber berxwedanên Rêber Apo û gerîla pir tengav bibû. Ji neçarî dewleta Tirk li Îmraliyê bi Rêber Apo re dest bi hevdîtinê kiribû. Ji ber vê, HPG´ê ji bo ku şanseke nû bide çareseriyeke demokratîk di 13’ê Tebaxê de “bêçalakîtî” ragihandibû. Li gorî vê yekê eger derfetên dirêjkirina bêçalakîtî ji aliyê dijmin ve ji holê bihata rakirin, li ser bingeha pîvanên Pêngava Şerê Gelê Şoreşgerî wê dîsa şerê çekdarî yê gerîla têketa meriyetê. Yanî şer ji bo demekê hatibû rawestandin. Li Dibistana Ş. Mazlum Dogan guftûgo li ser vê mijarê jî pir germ û gurr bûn. Li hember her eger û îhtîmalekê



pêkhateya partiyê dihat amadekirin; ji bo aştiyê jî, ji bo şereke germ jî...

Hemze endamê desteya rêveberiya dibistanê bû û hewl dida tevî xwe, hevalên xwe jî ji bo vê mebestê amade bike. Xurt tevlî perwerdeyan dibû. Hem hêzeke mezin dida hevalên xwe, hem jî ji wan hêz digirt. Ji ber ku dinyaya fikir, hest û derûniya xwe bi çûna Bakur tijî kiribû, di perwerdeyan de car caran ponijîn û daxwaza xwe ya çûyîna Bakur bi rêhevalên xwe re parve dikir. Ji guftûgoyên wî her kesê/î fêm dikir ku giyan, hest, derûn û hizrên wî li Bakur in, xwe temamen bi wir ve kilîd kiriye, ji ber ku vê yekê di her fersendê de xwe dida der.

Ji bo Hemze jî mîna hemû hevalên din pêşwazî û himêzkirina Rêbereke azad di welateke azad û bêşer de ji xeyal û hêviyê wêdetir, sond û peyman bû. Di dilê xwe de tim sond dixwar ku hesret û xeyalên xwe li Botanê bike rastî. Ew evîndarê Botanê û şeydayê gerîlatiya li wir bû.

Botanê ji bo wî her tiştî bilêv dikir; Botan, yanî her tişt!

Li Botanê hatibû dinyayê. Lê mezin bibû. Li wir tevgera azadiyê nas kiribû û li wir di wê temenê xwe yê zaroktiyê de gelek zilim, dagîrkerî, hovîtî, talan, komkujî, qirkirin, şewitandina gundan, lêdan, êşkence û mişextîkirinên (sirgun) dewleta faşist a Tirk dîtibû. Dîmenên şewata gundan û bax û baxçeyan, rûxandina malan, koçberiyên gel, qêrînên zarokan li ser termê dayîk û bav, lorîna dayîk û bav li ser bedena biçûk a şewitî û parçe parçebûyî ya zarokan, pêxwasî, tazîtî, tî û birçîtiya bêsînor a gel yeko yeko ji nû ve li ber çavên wî zindî dibûn û diboriyan.

Dema ku axa Gundik Remo, Spîndarok, Biriyan, Naviyana Şêxa, Xirbik, Ramuran, Dêriyan, Hiriyan, Hîlal, Aviyan, Mêhrê, Pîran, Germav, Girgavê, Sîxur Paşa û sedan û hezaran gundên din di bin botên qirêj ê leşker, polîs û cendirmeyên Tirk de jan digirtin û dinaliyan Hemze jî mîna wê axê, ji dil jan girtibû û naliyabû. Ew bûyerên nemirovane dilê wî yê biçûk hê ji zaroktiyê ve bi hest û fikra pêdiviya şoreşgertî û şoreşa azadiyê hesandibû. Piştî ewqas sal hê jî dema ew bûyer dihatin bîra wî vedigeriya wan deman, henaseyeke kûr dikişand û sonda têkoşînê nû dikir.

Ji ber van hovîtiyan tevlî şoreşê bibû. Li ba wî rêseyeke şoreşgertiyê hebû: DIVÊ JANÊN GELÊ XWE HÎS BIKÎ! Kesekî ku bi janên gelê xwe nehese nikare bibe şoreşger. Yanî li ba wî sond, peyman û

biryara şoreşgerbûnê li ser girêdana bi nirxên gel ve û ji bîr nekirina êş û janên gel bilind dibû!

Di wan pêvajoyên şerê giran de dema ku di salên 1990-91-92-93'yan de bi hejmareke zêde gerîla êrîş dibirin ser payîgehên Xirbikê Bestê, Aviyan, Mezra, Usyan, Çêla Bûka, Xawişta û gelek payîgehên din ên li Şirnex, Silopî, Cizîr, Dihê, Gabar, Cudî, Besta, Berwarî, Kato, Colemêrg û hwd. Hemze jî weke şoreşgereke ciwan û ezmûngirtî roleke girîng di gelek ji wan çalakiyan de lîstibû û bi berpirsyartî weke fermandareke şer pêşengtî ji mangeh, taxim, yekîne û herêmên xwe re kiribû.

Niha dem dema Şerê Gel ê Şoreşgerî bû. Diviya dijmin bi tevî polîs, leşker, cendirme, navendên leşkerî û sivîl û hema her tiştên xwe ve ku dijî gelê Kurd di têkoşînê de ne bi tevahî ji axa Kurdistanê bihata qewitandin. Biryar ev bû. Rêgeza vê biryarê jî “azadî nayê xwestin û hêvîkirin, tê stendin” bû! Biryar, qewitandina dijmin ji ser axa Kurdistanê bû; ji ber ku esareta Rêber APO pir dirêj kiribû, hemû rêxistinê rexnedayîna vê dida, dijmin hewl dida bi mijulkirin û dirêjkirina dîlbûna Rêbertî, gel û jinên Kurd û tevgera azadiyê fêrî bêrêberbûn, bêxetbûn, bêîdeolojîbûn û bêsiyasetbûnê bike. Lewre metirsî mezin bû.

Ji ber ku dijminê di Kurdistanê de bicihbûyî erênî bersîva banga PKK'ê ya çareseriya demokratîk nedida; ji ber ku civaka Kurd bi tevahî, neslê ciwan jî bi taybetî her diçû zêdetir xira dibû û di gêjavê bêexlaqî û bêhêvîtiyê de dixeniqîn; ji ber ku bi şêwaz û taktîkên şerê heyî encama pêwîst ji aliyê gerîlla û gelê Kurd ve nedihat girtin. Ji ber vê bû ku “azadî nedihat xwestin û hêvîkirin, dihat stendin!”

Bihara 2011'ê dewreyên perwerdeyên zivistanê yên hemû akademiyan bi dawî bûn. Dibistana Ş. Mazlum Dogan jî wisa. Dema vesazî û belavbûna kadroyên akademiyê li ser qad û xebatan bû. Hemze ji bo çûna Bakurê Kurdistanê ji rêveberiya Partiyê re pêşniyar kiribû, lê belê careke din jî Partî di gelek xebatên din de pêdivî bi fermandar û kesayetên pêşeng ên mîna wî didît. Lewre vê carê jî pêşniyara wî nepejirandin. Dema Heval Cuma vesaziyên giştî yên dibistanê xwend, qada xebata Hemze jî li Rojavayê Kurdistanê destnîşan kir.

***Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!***

Hemze bi viya kêfxweş nebû. Bi bihîstina vê vesaziyê re hemû bedena wî tevizî, mîna ku aveke sar ser de rijiyabe. Bi çavên xemgîn û melûl û bi dileke hêvîdar li Heval Cuma nêrî. Li bendê bû bê gotin ku "cihê wî şaş hatiye xwendin. Ewê biçe Bakur." Lê na... Her çiqas li bendê jî ma viya nebihîst. Di dilê wî de pevçûnek hebû. Rêxistinê digot; "Rojava", wî digot; "Bakur." Rêxistin digot; "pêdiviyên xebatên siyasî û civakî", wî digot; "pêdiviyên şer û Pêngava Şerê Gel ê Şoreşgerî li Bakur." Dilê wî dikeliya. Xwest rabe ji wê vesaziyê re îtîraz bike. Lê belê çand û edeba ku ji Rêbertî û Rêxistina xwe wergirtibû destûr nedayê tişteke weha bike.

Ji ber ku Heval Cuma ji damezrîner û kadroyên pêşeng û rêveberên rêxistinê bû, bi ti awayî nekarî sînorên rêzdariyê bişkîne. Îtîraz li hember gotina Heval Cuma û hevalên weke wî ji bo Hemze dihat wateya derbaskirina sînorên rêzdarî, an jî bêrêziyê. Ji ber viya destûr neda xwe rabe pêşniyar û daxwaza xwe bisepîne. Jixwe di nava bîst û çar sal temenê xwe yê şoreşgertiyê de ti carê ti sînor û pîvaneke rêxistinî paşçav nekiribû, berovajî, di hemû mijaran de bi taybet jî di mijara vesaziyan de tim hestiyar û berpirsiyar tevgeriyabû. Gelek caran bêyî daxwaza xwe, tenê ji ber ku pêdivî heye çûbû hin qadan û di xebatên ne li gor daxwaza xwe de jî cîh girtibû. Her çiqas bêdil çûbe jî pir ji dil ew xebat pêşve biribûn û ser xistibûn.

Di dil û mejiyê wî de pevçûneke dijwar hebû. Ne dikarî li hember biryara rêxistinê derkeve, ne jî dikarî xeyal, hesret, hêvî, daxwaz û lêhûrbûnên xwe yên ji bo Bakur bide aliyekê û dest jê berde. Di navbera daxwaza rêxistinê û daxwaza xwe de hat û çû. Di rastî de biryara xwe zû de zelal kiribû û dabû; ewê biçûya Bakur! Tenê erêniya rêxistinê jê re pêwîst bû. Nedizanî viya çawa bi rêxistinê bide pejirandin. Li ba xwe biryara xwe dabû, lê eger ji aliyê Rêxistinê ve nehata erêkirin wê pêk nehata. Ji ber vê jî ewê biketa hewldana girtina erêniya Rêxistinê.

Dewre bi merasimeke biheybet belav bû. Hevalan kom kom ji hevdu xatir xwestin û ber bi qadên xebatên xwe yên nû ve bi rê ketin. Hemze jî ji bo ku biçe Rojava derbasî herêma Behdînanê bû.

Beriya ku biçe Biryargeha Xebatên Rojava, yekser çû serdana Biryargeha Navendî ya HPG'ê. Li wir biryar, bawerî, qenaet, asta ponijîn û pêşniyara xwe ya ji bo çûna Bakur bi fermandariya giştî ya HPG´ê Heval Zozan Çewlig û Heval Nuredîn Sofî re parve kir. Bi

awayeke eşkere û bi ûslubeke bibiryar ji wan re got: “Min li gel Heval Cuma nekarî îtîraz bikim. Lê ji bilî Bakur ji bo tu xebatekê amade nînim. Tevahî hizirîna min a van çend salan, taybet jî ya vê zivistanê li ser Bakur bû. Pêşniyara min Botan e, lê hûn min rêkin kudera Bakur ez amademe.”

Vê carê jî Hevala Zozan û Hevalê Nuredîn ketin tengasiyê; ewê çawa  vesaziya ku li gor pêwîstiya rêxistinê çêbûye biguherandana! Bi Hemze re pir axivîn. Hewl dan wî razî bikin ji bo çûna Rojava. Lê belê her çi kirin bêencam bû. Nedikarîn agirê nav dilê Hemze vemirînin û dilê wî aram bikin, ji ber ku wî biryara xwe dabû ku bi ti awayî ji HPG´ê dernekeve û ji bilî Bakur neçe ti derekê.

Hemze dizanî ku pêwîstiya rêxistinê li kîderê hebe kadro divê biçe li wê derê xebat bike. Lê armanca wî ji çûna Bakur jî pir pir mezin bû; dixwest li Bakur şereke dijwar û bêaman bimeşîne da ku azadiya Rêber Apo misoger bibe û wî li ser axa Kurdistana azad pêşwazî bike. Lewma tevî ewqas guftûgoyên dûr û dirêj ên Fermandariya Biryargeha Navendî jî dest ji pêşniyara xwe berneda û gavek paşde neavêt. Di dawiyê de karî rêxistinê razî bike û erêniya wê bigire.

*****

Hemze piştî salên dirêj careke din vedigeriya Botana ku zaroktî, ciwantî, pêvajoya nasîna PKK´ê û salên destpêka jiyana şoreşgertî tê de derbas kiribû. Botana ku weke kefa destên wî jêre nas û aşîna bû. Botana ku tevî ewqas sal dûriya bedenî, ti carê di dil û mejî de jê dûr neketibû, jê qut nebibû û her pêre jiyabû. Botana ku ji bo wî dihat wateya her tiştî û hemû “wate” û “xweşikahî”yên vê jiyanê tê de veşartîbûn. Botana ku tê de ked dabû, xwêdan rijandibû û bi her tiştê wê re rêhevaltî kiribû. Botana ku li ber çavên wî bi xwîna sedan şehîdan hatibû avdan. Botana ku piştî çend heyvan wê bi xwîna geş û şîrîn a wî û çardeh şervan û rêhevalên wî şitlên bihareke nû daba... Erê, ew Botan! Li wê Botanê vedigeriya Hemze.

## Dîrok Û Erdnîgariya Botanê

Serpêhatiya Kurdistanê bi tevahî li Botanê jî rû daye. Ji ber ku di naverasta erdnîgariya Kurdistanê de cih digire hemû bûyerên li welat qewimîne bi ser wê re derbas bûne. Li ser axa Botanê pir gelên mîna Kurd, Aşûr-Keldan, Ermen û Ereb û komên baweriyên mîna Zerdeştî, Êzîdî, Nesturî, Mesîh û Misilman hezaran sal bi hev re bêpirsgirêk jiyane. Yanî Botan bi serê xwe qadeke navnetewî û Kurdistaneke biçûk bûye. Mozaîka çand û baweriyan bû di wexta xwe de. Ya rast eger desthilatdar û dagîrker jê bigerin hê jî wisaye.

Gelek efsane û mîtolojî hene li ser çiya, çem, deşt û hema hemû xwezaya Kurdistanê. Botanê jî tim di navenda wan efsane û mîtolojiyan de cihê xwe parastiye. Her çiqas ji bo navê hin çiyayên bilind ên Kurdistanê tê gotin ku navên Yunanîne û Îskenderê Mezin ev nav li wan kiriye, lê rastî ewe ku efsane û mîtolojiyên Mêzopotamyayê ji hatina Îskender pir kevnartirin, lewre navên wir jî ji hatina Îskender pir kevnartire. Li gorî van efsane û vegotinan çiyayên Botanê di dema Hezretê Nûh de, Zagros jî di dema Mîtra de navê xwe girtine. Yanî



navên Kurdî û bi zimanê şêniyên herêmê ne. Zagros û Botan bi hev ve girêdayî nînin, lê belê ji hevdû dûr jî nînin û di gelek çîrok û bûyeran de navê wan bi hev re derbas dibe. Çîroka Îskender mînakeke vê ye.

Efsaneya Nûh li Botanê rû daye (ya rast hin vegotin jî dibêjin li Agiriyê rûdaye) û vedigere dîrokeke derdora 3000 sal beriya zayînê. Yanî di pêvajoya hiyerarşiyê de ku pêgeha Dayîk-Xwedawend dikeve destê xwedayên xedar de û çerxa jiyanê ji xwezayî û komînalbûnê derbasî çîn û desthilatiyê dibe rû daye. Lehiya ku tê qalkirin bi gumaneke mezin sembola zilma xweda-şahên wê demê ye. Tê gumankirin ku Nûh heman Zerdeştê yekem be. Nûh peyveke Kurdiye û sembola jiyaneke nûye. Ev peyv heya niha jî weke “nû” di Kurmancî de û weke “nwê, new” di Soranî de tê xebitandin. Şir=Şehr, bajêr; Nex=Nûh. Şirnex=Şehrê Nûh, bajarê Nûh.

Li gorî efsaneyê; lehiyeke pir mezin radibe û hemû tiştan dide ber xwe, tine dike. Ji ber ku jiyan ji mirov, şînkahî û ajalan çêdibe Nûh ji bo parastina jiyan û jîneweran jin û zilamekê, ji her giyayekê şitlek û ji her cure ajalekê mê û nêrekê dixe nava keştiya xwe û dixwaze keştiya xwe ji tufanê birevîne û bibe ciheke wisa bilind ku lehî û bahoz bandorê lê nekin. Lewre qîr dike dibêje: “Kaaaa tuuuu?” Yanî “ka, tu li ku derê yî?” Lê ew çiya di bin lehiyê de maye û nikare bersivê bide. Navê wir heya niha weke Kato maye.

Çiyayê Herekol bersiv dide banga Nûh û dibêje: “keştiya xwe bîne deyne ser serê min.” Nûh jê re dibêje: “here, erda te kol(kort û çalik) e.” Bi vî awayî navê vî çiyayî jî bûye Here=Biçe, Kol=Kort. Yanî Herekol. Di Kurdî de “her” herwiha tê wateya war, welat jî. Li gorî vê, Herekol tê wateya “erd û warên kort û çalik.”

Çiyayê Pîro bersiv dide: “keştiya xwe bîne li ser serê min deyne”. Nûh dibêje: “tû pîrî, nikarî rakî.” Navê wir jî wisa dibe “Pîro.”

Piştre Nûh keştiya xwe dibe lûtkeya Cudî datîne û dibêje: “min ji keştiya xwe re CÎ DÎT!” Yanî Cudî ji “cî dît” tê. Niha jî keştiya ku Nûh jiyan ji tinebûnê pê rizgar kiriye li ser serê çiyayê Cudîye. Ji vî çiyayî re “Sefîne” (bi Erebî tê wateya keştî) tê gotin. Ereban ji bo rêzgirtin li Lawikê Xerîb ku ciwaneke Erebe û heft salan pey Nuh ketiye û her li biniya vê çiyayê jî jiyana xwe daye, vê derê pîroz dîtine û navê Sefîne lêkirine. Êdî Kurdan jî heya îro her ev nav bi kar anîne.

Destana çiyayê Zagros jî wihaye: Zag=Agirgeh, perestgehên agir; Ros=Roz, Roj, Bilind. Yanî “agirgeh û perestgehên agir ên li çiyayên bilind” ango “çiyayên bilind ku agirgeh û perestgehên agir lêne.” Herwiha tê wateya gelê çiyayên ku ji agir û rojê bawer dikin. Agirgeh

cihê îbadet û komên civakbûna Xwedawend Mîtra û Mîtrayiyan, Zerdeşt û Zerdeştiyan bûye. Dayîka Zerdeşt rahîbeyeke Mîtrayî bûye. Zerdeşt jî ser rêça dayîka xwe dibe rahîb(ango Mag)eke Mîtrayî û baweriya xwe bi felsefa Xwedawend Mîtra tîne. Zilamên Medyayî yên ku êdî dikevin taya desthilat û milkdariyê îxanetê li baweriya Mîtrayî dikin. Ev koma zilamên fêlbaz û komploger di demên pêşiyê de bi pilangeriyekê dayîka Zerdeşt ji çiyayên Zagrosê davêjin û mişext(sirgun) dikin. Zerdeşt rêça dayîka xwe berdewam dike û pêre sadiq û dirust dimîne.

Heya niha jî Agirgehên Mîtra û Zerdeşt li tevahî rêzeçiyayên Zagrosê hene. Mîtrayiyan, perestgehên xwe li cihên wisa asê çêkirine da ku kes nekaribe êrîşî wan bike û wan têk bibe. Aniha jî her kes nikare rehet biçe li wan deran bigere û bibîne.

Bi êrîşên fethê yên Îskenderê Mezin re çîrokên nû li ser mîtolojiyên Kurdistanê zêde bûne. Îskender çavê xwe berdide Kurdistanê û dixwaze bixe destê xwe. Heya Herekol, Kato û Zagrosan tê, lê nikare van çiyayan derbas bike û tê de tengav dibe. Neçar dimîne paşve bikşe û têk dişkê. Hejmareke zêde leşkerên Îskender ji ber serma, seqem û bahozên dijwar ên wê derê dimirin.

Îskender dema ji Kurdistanê vedikişe bîranînên şerê li çiyayên Herekol, Kato û Zagrosan wiha dinivîse: “*...Li wir em ji çiyayên wisa re derbas bûn ku kevirên wê weke şûr tûj bûn. Leşkerên me di nav van keviran û şikêrên bilind de diman. Gelek leşker ji wan bilindahiyan ketin û mirin... Şêniyên wir naşibin mirovên me yên van deran. Pir cengawerin. Xwe û çiyayên xwe pir diparêzin. Me kir nekir me nekarî wan qaneh bikin ku rê bidin em derbas bibin. Me xwe li kuderê dida derdiketin pêşiya me. Bi roj qet xûya nedikirin, bi şev jî ser hev êrîşî me dikirin. Weke cina bûn, bi roj winda dibûn û bi şev derdiketin holê...*

*Jin jî di nav wan de hebûn. Destpêkê me nezanî jin in, ji ber ku neqşên li ser rûyê hemûya dişibiya hev, pora hemûyan dirêj bû û wek hev şer dikirin. Dema yek ji wan hat kuştin me dît ku sîngên wê hene. Ji vêya me fêm kir ku jin jî bi qasî zilam di nav şer de hene û pir jî cengawerin. Hin fermandar jin bûn...*

*Armanca me ne ew bû ku em pir kesan ji wan bikujin û hêza wan têk bişkînin; me dixwest yek dû kes ji wan bi saxî dîl bigirin da ku em hîn bibin ku ew çawa şer dikin...*”

Li gorî hin vegotinan, Îskender ji ber vê binketinê nifir li xwezaya Kurdistanê kiriye û bi vî nifirî nav lê kiriye. Navê rêzeçiyayekê kiriye Zagros=Çiyayên mîna dojeh, navê rêzeçiyayeke din jî kiriye Kato=Çiyayên bi lenet! Jixwe tê gotin ku Marînos navê fermandareke Îskenderê Mezine ku li Çiyayên Kato Marînosê hatiye kirin. Navê Zagros û Kato û hin deverên din ên Kurdistanê bi zimanê Yunanî bi van wateyan be jî, di dîroka vî welatî de efsaneyên ji dema hatina Îskender kevnartir hene.

*****

Botan di naverasta erdnîgariya Kurdistanê de cih digire. Her çar parçeyên welat li wê derê digihîjin hev. Bi ser Colemêrg (Gever) û Wanê re bi parçeya Rojhilat ve; bi ser Çelê, Elkê, Qilaban û Silopyayê re bi Başûr ve; bi ser Silopî, Cizîr, Nisêbîn, Mêrdîn û Qoserê re jî bi Rojava ve girêdayî ye. Yanî Kurdistana parçe parçebûyî li dora Botanê hatiye parçekirin. Dagirkeran Botan kirine çar parçe û her parçeke wê bi dewletekê ve girê dane.

Hemû talan, kuştin, qirkirin, parçekirina erdnîgarî, raperîn û serhildanên li welat bandor lê kiriye û li wir bixwe jî hemû ev bûyer rû dane. Bedirxan Beg ku bi “Mîrê Botanê” û “Mîrê Mîran” tê naskirin ji wir rabûye. Eyşê Dînê ya ku dîroka nû hewl dide wê ji bîr bibe û qet qala wê nake fermandareke mezin û xurt a Botanê bûye û li hember dagîrkerên Osmaniyan li ber xwe daye û ax û warê xwe parastiye. Raperîna Şêx Mehmudê Berzencî, Mîr Mihemmed, Simkoyê Şikak û Şêx Seîdê Pîran bandoreke mezin lê kiriye û di rastiyê de Botanê tevlî rabûnên xwe kirine. Çiyayên Cudî, Gabar, Herekol, Kato'yan û Kêla Memê di hemû şeran de rola kelheyên berxwedanê lîstine.

Li Botanê gundên Ermeniyan piranî li Basa û Gabarê ne. Gundên Aşûriyan jî piranî li aliyê Colemêrg, Elkê, Sêgirkê, Besta û nêzî Mêrdînê ne. Gundên Aşûrî û Ermeniyan di dema Bedirxan Beg û di fermana sala 1915'an de bi tevahî hatine valakirin û şewitandin. Jixwe ew demek bû hêzên serdest û dewletan, di bin navê nakokî û şerên olî-baweriyê de hemû gelên vê herêmê berdabûn hevdu. Her yek ji wan di qirkirina gel û baweriyên din de xebitandibûn. Hin Kurdên noker û xapandî jî di talan û qirkirina Aşûr û Ermeniyan de bi kar anîbûn. Hemû van awayên qirkirinan li ser Kurdan û Kurdistaniyan di dema hemû raperînan de hatine meşandin. Mînaka herî dawî fermana 1994'ê bû!

***Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!***

Dema "fermana 1994"ê tê gotin dilê hemû Kurdan direcife. Ev sal ji bo gelê Kurd tê çi wateyê û çi tîne bîra wan gelo? Di encama vê fermanê de li tevahî Bakurê Kurdistanê zêdetirî 4 hezar gund ji şêniyên xwe hatine valakirin û şewitandin. Hejmarek ji van gundan li Botanê bûn. Dijmin ji gel dixwest ku li hember tevgera azadiyê çek rake, da ku bi vî awayî hem şoreşgeran ku zarokên gel in bi destê wan bidin kuştin, hem jî wana bi destê gerîla bidin kuştin. Ji her du aliyan ve Kurd wê bihatana tinekirin, berbibûna hevdu, bibûna neyar û biyaniyên hev!

Hejmarek ji tirsa tûndûtîjiyên hovane yên dijmin çek rakirin û bûn neyarê gel û tevgera xwe, destên wan ket xwîna xwuşk û birayên xwe. Lê belê hejmara herî zêde li hember hemû sepandinên çekrakirin û cehştiyê li ber xwe dan; bêwarbûn û koçberî, xizanî û mirin dan ber çav lê daxwaza dijmin pêk neanîn. Dijminî bi deh hezaran kuşt, sed hezaran jî bi zorî ji gundên wan bi der kir. Çima bi zorî? Vî gelî çima nedixwest gund û warên xwe bihêle û ji vê axê derkeve? Hezaran kes çima ji bo ku ji axa xwe koçber nebin mirin û tinebûn dan ber çav? Da ku qet nebe termê wan li axa wan bimîne...

*****

Besta di naverasta Botanê de cih digire. Kê Bestayê bibîne dibêje; "mîna deryayekê ye." Seriyeke wê li Elkê-Kato Jîrkaye û heya Şanstêr, Kaplan, Kêla Memê, Sêgirkê û Qilabanê diçe. Seriyeke din heya Şax-Kato Xelîla û Masîroyê diçe. Seriyeke dî heya Berwariyê diçe û Usyan, Aqêr, Zorava û çiyayê Kor Qendîl û heya ber Herekolê digire nava xwe. Seriyeke dîtir digihîje Basa û Çirava Gabarê. Aliyê din jî navenda Şirnexê û gundên ji milê Bakur û Rojhilat ve pêve girêdayîne digire nava xwe. Çiyayên Pîro, Hecî Musa, Girê Nîskê, Şehîd Diyana, Girê Gîvara, Şehîd Xeyrî, Mêrgûmarê, Girê Sor û Serkê Mihemedê Uso di hundirê Bestayê de ne. Çemên Xuroşan û yê bi navûdeng Hêzil, Usyan, Çeqçeqo, Çemkê Tehlo, Xirbik, Şehîd Armanc, Besta Hincê, Besta Biluzer û Germava Şirnexê bi rêzê ji nava Bestayê re derbas dibin.

Di vesaziyên erdnîgariyê ya gerîla de Herekol û pêve girêdayî Garisa weke eniyeke xweser, Kato Jîrka û pêve girêdayî Kato Xelîla jî weke eniyeke xweser a din xebat dikin. Hundirê Besta bixwe jî ji sê qadên bi hev ve girêdayî bi navên Hêzil, Besta Navîn û Şehrîbanê pêk tên. Şehrîban ji milê başûr ve heya Şirnex, ji rojava ve jî heya Çirav; Hêzil ji milê başûr ve heya Qilaban û Kêla Memê (sînorê Heftenînê); Bestaya Navîn jî ku di navbera her duyan de ye ji milê bakur ve heya

Kor Qendîl, ji milê bakurê rojava ve jî heya Herekol, Deşta Parê û Girê Nîskê diçe.

Besta daristane; daristanên pir fireh, pir tijî lê parçe parçe. Bi gotina Şehîd Qehreman Erdal, “tevî ku dijmin bi dehan caran bi kobra, qazan, hewan û obîsan wir bombebaran kiriye û şewitandiye jî, darên wê bi înad li hember dijmin ji nû de, ji nû de şîn û geş dibin.” Axa saf li Bestayê nîne. Ax û xîz tevlî hev in. Yanî axa wê bi xîze. Erda wê nerme. Ji bilî çar girên bilind ên bi navê Şehîd Diyana, Girê Xanê, Mêrgûmarê û Girê Sor ku çar dora wan daristaneke tijiye, çiya û tepeyên din aliyek daristan, aliyek xîzeke ziwa ye. Ber bi Kato, Herekol, Deşta Parê û Mila Kêrê ve jî zozan dest pê dikin.

Di nav daristanê de şevên tarî mirov pêşiya xwe nabîne û rehet nikare ji nav daran bibuhure. Piranî darên wê berû û mazîne. Lê li hin ciyan darên qaçê, kezwan, karçik û gwîjk jî hene. Li ber çeman hin spîndar hene ku piranî nêzî gundên ser çemê ne. Li hin gundên Hêzil û Şehrîbanê hinek darên mêw, gwîz, tû, hinar û hejîr hene.

Li Hêzil şikêr, teht û zinarên pir bilind hene. Şikêrên wisa li Besta Navîn kêmin, li Şehrîbanê hêj kêmtirin. Bi giştî çiyayên Besta pir bilind û newalên wê jî pir kûrin.

Bestên Bestayê bêhejmarin. Jixwe Besta navê xwe ji van best û bestikan digire. Di gireke biçûk de ne kêmî 20-30 best tên dîtin. Xîzê di dol û bestan de rê nade mirov têde bimeşe û derbas bibe. Dema baran bibare avên wan bestan hemû dadikevin dolê, komek xîz bi xwe re dadixin û av di cih de şilo dibe. Şilotiyeke bi rengê gewir.

Havînên Bestayê pir pir germin. Gelek car mirov ji germaya dijwar nexweş dikevin. Pêşû û gêrikên bi daran ve pir zêdene. Mar, hirç, beraz, perperik, qijik û çûkên rengareng ji ajalên din ên wir ên herî berbiçavin. Ji ber germahiya dijwar marên wir pir bijehr û harin. Hirç û beraz jî mîna hemû dever û herêmên din gelek caran ziyanê didin erzaqên gerîla.

Besta zivistanan pir berfê nagire. Ji ber ku axa wê germ û nerme. Berfa ku dibare di du sê rojan de dihele. Di nîvê zivistanê de giyayên nû yên biharê lê şîn dibin. Hewayê zivistanan bi şev pir sar û ziwa, bi roj jî germ û xweş e. Li Bestayê zêde berf nabare. Lê belê berfa zivistana 2011-12'an her kes matmayî hişt. Wê zivistanê li tevahî Botanê (gerçî li hemû Kurdistanê) berf li gorî salên berê pir zêde barî.

***Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!***

Li her derekê amadekariyên zivistanê li gorî salên berê hatin kirin, lê ji ber barîna berfa zede ya ku di hesabê de nebû bihara 2012'an hemû kamp neçar man dereng ji kampên xwe derkevin. Ev jî ji bo gerîla dezavantaj û metirsîdare.

Kampa Hemze di berfeke evqas giran de ket pevçûnê...

**Rêwîtiya Hemze Ber Bi Bestayê Ve**

Hemze careke din li vê Botana birîndar, lê serbilind vedigeriya. Şarezayê tevahî dîrok û serpêhatiyên vê Kurdistana biçûk bû. Ji ber vê yekê dilê wî tijî hezkirin, irz û serbilindî bû. Di heman demê de kîn, nefret û bêzarî jî ji dilê wî kêm nebû; mîna Bestaya ku ji berxwedan û egîdiya wî û 14 rêheval û şervanên wî serfiraz, lê li hember xiyanetê ku li wan hatibû kirin jî bi kîn û nefret bû.

Havîna 2011´an bû. Li Kurdistanê li cihên nizim û daristanan erd û ezman dikeliya. Li zozanan jî hewa hênik û xweş bû, qet nebe bayê hênik dema li enî û rûyê mirov dixist hemû westandin ji ser mirov radikir dibir.

Koma ku di bin fermandariya Hemze de diçûn Botanê amadekariyên xwe temam kirin. Pêdiviyên xwe pêk anîn, çek û teqemeniya ser xwe nû kirin û kêmbûnên wan temam kirin. Erzaqê ji bo rê hatibû amadekirin di nav xwe de parve kirin û xistin nav çanteyên xwe. Bi merasimeke leşkerî li Heftenînê xatir ji hevalên ku li Başûr diman xwestin û ber bi xeyal û hesreta xwe ya salan Bestayê ve birê ketin.

Ew kom şevek ji şevên hênik a havîna 2011´an ber bi Botanê ve bi rê ket. Komeke xurt û sivik bû. Ji bilî Destîna Kobanê, yên din di warê fîzîkî de zorahî nedikişandin. Fîzîka Destîna hinekê lewaz bû. Tevî vê jî pir zorî dida xwe, xwe diêşand û dest ji xwe bernedida. Hemû hevalên din, taybet jî Hemze pir alîkariya wê dikirin. Hemze dii cihên hewraz de çeka wê radikir û destê wê digirt.

Piştî ku sînorên dijmin di navbera axa Behdînan û Botanê de danîye qut kirin û ketin axa Bakur, henaseyek kûr kişandin. Êdî li axa Botanê bûn! Ji kêfa re hew mabû bifirin. Êdî gihîştibûn xewn û xeyalên xwe yên salan. Herî zêde jî Hemze kêfxweş bû. Hest û hîsên wî yên wê kêliyê ji yên her kesê cudatir bûn, ji ber ku wî li vê derê gelekî xweşî û nexweşî dîtibûn û jiyabû. Hevalên din cara yekê bû dihatin Bakur û tenê kêfxweşiya viya ji dil jiyan dikirin. Lê hêj gelek mabû ji bo ku bigihîjin hevalên xwe yên li Botanê.

Şevekê ku heyv tinebû û pir tarî bû, di evraziyekê de kevirek ji bin lingê Destîna gindirî. Destîna pir hişk, li ser pişta xwe ser kevirekê de ket. Pişta wê pir êşiya. Êşê bandor li lingên wê jî kir. Pişt û ling lê giran

bûn. Nedikarî rabe. Hemze çanteyê wê avêt ser çanteyê xwe. Hevalên din jî rext û çek jê girtin. Destên wê girtin û rakirin ser pêyan. Ji ber ketina Destîna, meşa komê kêmekî giran bû.



Yek ji rênasên komê bi Destîna re li dawiyê dima da ku destê wê bigire yan jî pêre alîkariyê bike. Hevalên din jî pêş de diçûn. Dema didîtin ew hinekê li paş mane û dûrin, li benda wan radiwestiyan û rûdiniştin heya bigihîjin wan. Di rê de, li ciyekê şiv û evrazeke bilind li pêşiya wan hebû. Di vê hevraza xîz a çend demjimêrî de hinekê zorî kişandin û westiyan.

Pişta Destîna di evraziyan de hê zêdetir ling lê giran dikir. Di şiverêyên berwar de rehetir û lezgîntir dimeşiya. Ji ber vê ew evrazî herî zêde ji bo Destîna zor û giran bû. Ji ber ku heval pir li benda wê diman pir ji xwe aciz dibû. Dît ku heval li benda wê pir rûdinin û dema bi zorî xwe digihîne wan dîsa radibin dimeşin. Gerîlaya salan bû û dizanî ku rûnîştin û rabûna zêde di meşa dirêj de mirov ji taqet dixe.

Hemze dema didît Destîna ji xwe diqehire pêre diket axaftinan û bîranînên xwe yên kevin ên girêdayî Botanê jê re vedigot û ew kûr û dûr dibir nav bîranînên xwe de. Carnan jî ew dida kenandin. Armanca wî ew bû ku Destîna westandin û êşên pişta xwe ji bîr bike.

Carekê dîsa Hemze destê wê girtibû, pêre li dawiyê dimeşiya. Hevalên din jî çend gav li pêşiya wan bi tempoyeke pir hêdî ku li gorî meşa wê be dimeşiyan. Wê dizanî ku tempoya hêdî jî mirov ji taqet û hêz dixe. Ji ber vê jî ji hevalan re got: “Heval hûn biçin. Ezê werim. Ez hemû van deran, van rê û cihan nas dikim. Ezê li pey we bêm, xwe bigihînim we.”

Rênasê ku li pêşiya komê dimeşiya bihîstibû ku ev cara destpêkêye Destîna tê Bakur. Lewma matmayî jê pirsî: “Tu ji kuderê eraziya vir nas dikî?”

Destîna bersiv da: “Min wêneyên vê eraziyê dîtine. Di wêneyan de min ev der dîtibûn berê!”

Careke din pilqîna kenê hemû hevalan bilind bû. Demeke dirêj keniyan. Vê henekê coş û ênêrjiyeke zêde dabû wan û kêfa wan jêre hatibû. Heya dema ku gihîştin gel hevalên xwe yên Botanê jî car caran belaya xwe li Destîna dixistin û bi henekî jêre digotin: “Tu van deran jî nas nakî, em te bihêlin biçin? Jixwe berê te wêneyên van deran dîtiye, tuyê werî bigihîjî me...”

Piştî rêwîtiyeke dûr û dirêj a çend şevan gihiştin Kato Jîrkayê. Ji Deriyê Apociyan ve ketin Katoyê.

Erdnîgariya Kato ewqas hişk û zinarên wê ewqas bilind û asêne ku derbaskirina wan, yanî ketina Katoyê wisa rehet nîne. Mirov nikare çawa bixwaze wisa bikeve Katoyê. Tenê çend derî hene ku rê didin çûn û hatinan.

Deriyê Apociyan, Deriyê Kewê, Deriyê Şekal, Deriyê Sedkarê, Deriyê Zerbîl, Deriyê Berana, Deriyê Qaçê û Deriyê Beqê eger nebûna wê ti kesê/î nekarîbûya xwe li navsera Katoyê bixe û jê hilkişe.

Deriyê herî rehet ku piranî koçer û şêniyên binarê Kato dixebitînin Deriyê Qaçê ye. Deriyê herî zor û zehmet ku ji bilî gerîla ti kes hilkişîna wê nade ber çav jî Deriyê Apociyan’e. Dijmin jî rehet nikare ji vî deriyê ve hewa keve û têkeve Katoyê. Hilkişîna vî deriyê zor û zehmet ku hilketina wê çend demjimêran dajo û daketina wê jî ji hilkişîna wê zehmettire, vîneke şoreşgerî dixwaze. Lewre tenê gerîla viya dide ber çav û vî deriyî dixebitîne. Ji ber vê yekê ji kevin de gelê herêma Elkê navê vî deriyî kirine Deriyê Apociyan.

Mîna ku li Herekolê jî navê du deriyên pir zor û zehmet kirine Deriyê Egîdan û Deriyê Doganan. Di salên kevin de gelek caran gundiyan hewl dane ji van deriyan re derbas bibin, lê nekarîne. Yên ku xwestine derbasbûnê biceribînin ji zinarên wan ketine û bedena wan parçe bûye. Piştî çend bûyerên xemgîn ên bi vî awayî êdî ti kes nêzî van deriyan nebûye. Lê belê heval bi salane van deriyan dixebitînin; ew deriyên ku ne Îskenderê Mezin karîbû xwe nêz bike, ne jî mirovên din. Eger vîneke Apoyî, armanceke şoreşgerî, hezkirina gel, bêzarî ji koletî, nefret û kîna ji dijmin re nebûya gerîla jî nedikarî ji van deriyan hilkişe, ango di Herekol û Katoyan de salên dirêj şer bike û li ber xwe bide. Gel ji vê vîna gerîla bandor bûye û ev nav li wan deriyan kiriye; Deriyê Apociyan li Kato Jîrkayê ye, Deriyê Doganan û Deriyê Egîdan jî li Herekolê ye.

Jixwe tê gotin ku Fermandar Egîd jî piştî çalakiya 15'ê Tebaxê vekişiyaye Herekolê û ji deriyê Egîdan ve daketiye Bestayê.

Hemze û koma wî mîna hezaran hevalên din ji Deriyê Apociyan ve ketin navsera Kato Jîrkayê. Di navserê de jî çend demjimêran meşiyan heya gihîştin hevalên wê qadê. Li wir hevalan pêşwaziyeke germ li wan kirin û eleqeyeke mezin nîşanî wan dan. Hemû endamên komê pir kêfxweş bûn û nedikarîn kelecana xwe veşêrin. Lê hestên Hemze cuda bûn; Hemze hem kêfxweş bû, hem hestewar, hem xemgîn! Kêfxweş bû; ji ber ku careke din vegeriyabû Botana evîna xwe. Hestewar bû; ji ber ku hezaran bîranînên wî yên kevin li van deran hebûn û ew bîranîn yeko yeko dihatin ber çavên wî. Hem jî xemgîn bû; ji ber ku gelek rêhevalên wî ku berê bi hev re li van deran gerîlatî kiribûn şehîd ketibûn û niha li gel wî nebûn. Hemû van hestan bi yekcarî di nav hev de dijiya. Tevî vê jî ji kêfxweşiya vegerîna Botanê çavên wî dibiriqîn.

Li Kato Jîrka çend rojan man. Bêhna xwe vedan û westandina xwe ji ser xwe birin. Reşo ku rênasê herêma Bestayê bû hat wan bibe. Destîna ji ber pişta wê, ji bo ku zêdetir neweste li wir hêştin. Hemze û hevalên din bi Reşo re ber bi Besta Navîn ve bi rê ketin.

Hemze tevahî erdnîgariya Kato û Bestayê baş nas dikir. Berê, salên dirêj têde gerîlatî kiribû, lê ev demeke pir dirêj bû ku jê dûr ketibû. Tevî vê jî erazî û navê qadan, tepe, gir, newal, kanî, çem û cihên din ji bîra wî neçûbûn. Di nava wan salên ku ew li Botanê nebû de navê hin cihan hatibû guhertin û navên nû li noqteyan hatibûn kirin. Navê piraniya noqteyan bi navê Şehîdan bû. Lê navê gir û newalên sereke û çeman bi piranî weke xwe mabûn. Ya rast navê şehîdan li hin gir û çeman jî hatibû kirin; girê Şehîd Diyana û çemê Şehîd Armanc yek ji vana bûn. Ev heval di berxwedana sala 2006-2007'an de li Bestayê şehîd ketibûn û navê wan li wan deran hatibû kirin. Ev guhertin ji bo Hemze nedibûn pirsgirêk, ji ber ku tiştê girîng, naskirina erdnîgariya wir bû.

Hevalên ku bi Hemze re hatibûn Botanê diviya ji sifir de dest pê bikirana. Ji ber viya Reşo ku rênas bû û tevahî eraziya wir nas dikir, li cihên ku tê re derbas dibûn her der bi wan dida naskirin û taybetmendiyên erdnîgariyê ji wan re digot.

Dema gihîştin Deriyê Qaçê, li ser derî bêhnekê rûniştin û temaşeyî xwezaya Besta û çiyayên ku wê himêz û dorpêç kiribûn kirin. Besta bi hemû xweşikbûn û rengîniya xwe weke xaliyekê li ber piyê wan raxistî

bû; dibê qey himêz ji wan re vekiribû û ew vedixwendin ba xwe. Reşo piştî danasîna erdnîgariyê, hin hedef û cihên dijmin bi wan da naskirin:

“Ew, Gwîze Korkê ye. Ew, Gundikê Melê ye. Bi Çêla Nimêja re her sê hevdu diparêzin. Ev çiyayê bilind ê beramberî me çiyayê herî bilind ê vê qadê ye. Navê wî Çêla Nimêja ye, ji ber ku dişibe miroveke ku xwe tewandiye nimêj dike jêre gotine Çêla Nimêja. Çêla Nimêja tevahî Besta, Herekol, Gabar, Cudî, Kato Jîrka û heya Kêla Memê, Kaplan û Şanstêrê dibîne. Dijmin li wê derê gelek kozik û çeperên binerd û sererd çê kirine. Rêzeçiyayên navbera Gundikê Melê û Çêla Nimêja jî navê wê Çiyayê File ye. Hin şêniyên wir beriya fermanê File (Ermen) bûne. Lewre bi navê wa ye.”

Gerîlayekê pirs kir: Ev Çêla Nimêja ji zû de hatiye girtin?

Reşo keniya û got: A rast, destpêkê dijmin aqil nekiriye vî çiyayî bigire û tê de bicih bibe. Heval Cemal aqil daye dijmin. Yanî ji xêra Partiyê dijmin ew der girtiye. Me fêm nekir. Heval Cemal qey çi kiriye?

Reşo dîsa nekarî pêşiya kenê xwe bigire û bi ken got: “Ma we ev bûyer nebihîstiye? Di dîroka Partiyê de tê qalkirin... Carekê Heval Cemal di nav hevalan de gotiye ku “ev çiya, ser her derê serwere. Ez bûma şûna dijmin, minê wir girtiba!” Yek ji kesên ku vê gotinê ji Heval Cemal bihîstiye piştre reviyaye û viya ji dijmin re gotiye. Piştî vê, dijmin yekser hatiye gotina Heval Cemal pêk aniye û ev çiya girtiye.”

Reşo di navbera axaftinên xwe de carna hinek henek jî dikirin û digot: “Amman hevalno! Xwe jê biparêzin. Li kîderê bixe mala wir xira dike.” Piştre cîdî bû, çavên xwe biçûk kir û bi nefret li paygeha ser lûtkeya Çêla Nimêja nêrî û ber xwe de got: “Çeka te top û tanke, çeka me jî bawerî û giyana me ye. Ji ber vê jî tu çiqas bilind bî, em ewqas ji te bilindtirin. Tu nikarî bi me serî bidî tewandin. Temenê te li ser vî çiyayê bilind ewê dirêj nebe...”

Ew gotinên Reşo kûrahiya dilê Hemze jî dixwend. Herduyan yek hest di dilê xwe de diperwerandin û yek raman, yek giyan, yek hest û yek hîs parve dikirin.

Piştî ku bêhna xwe vedan û hin agahiyên pêwîst li ser erdnîgarî û dijmin parve kirin ji Deriyê Qaçê daketin û ber bi Bestayê ve rêya xwe domandin.

Di eraziyên Hêzil û Besta Navîn de li ser rêya xwe çend gundên vala û xirabûyî dîtin. Hevalên komê ku ciwan bûn û cara yekê bû ew

der didîtin bi meraqeke zêde sedem, sal û awayê valakirina wan gundan ji Hemze û Reşo dipirsîn. Wan jî bi kêfxweşiyeke mezin û hesteke bilind bersiva wan didan. Hemze ji ber ku di dema koçberiya piraniya şêniyên Botanê de li wan deran şahîdiya rewşê kiribû û bi çavên xwe gelek bûyerên dilşewat dîtibû ji Reşo kûr û dûrtir û rehettir dikarî bersiva pirsên wan bide.

Dema ku ji yek ji wan gundan re dibuhurîn kitek pêlava lastîk a çiryayî ku ya zarokan bû û qetek paç di navbera malên xirabûyî û hilweşiyayî de dîtin. Pêlav ji ber heriya ziwa ya ku pêve bû rengê wê baş nedihat naskirin. Hemze û Reşo axîneke kûr kişandin û di ber xwe de gotin: “ka xwediyê biçûk ê vê pêlavê! Pêlav li vir e, xwediyê wê li ku ye? Ev qeta paçik parçeya kirasê kîjan zaroka tazî û pêxwase?” Her duyan li hev dinêriyan û ji awirên hevdu hestên hev dixwendin. Hevalên din jî li herduyan dinêrîn û hîs dikirin ku yek volqan di hinava wan de pê ketiye.

*****

Li Besta Navîn pêşwaziyeke pir germ li wan hat kirin. Hemze berpirsiyarê nû yê herêma Bestayê bû. Berpirsyara Besta ya berê Xelat Şemsê wê derbasî xebateke nû bibûya. Hemze çû şûna wê. Hem ji bo ku tevahî hevalên Bestayê bibîne û nas bike, hem jî ji bo ku ji nû de eraziya wir bigere û bi navên nû nas bike, serdana her sê alanên Şehrîban, Besta Navîn û Hêzilê kir; geriya û ji rêhevalên xwe re civîn li dar xist û ew ji rewşa giştiya rêxistinê, bi taybetî jî ji rexne û prespektîfên rêxistinê yên ji bo qada Botanê agahdar kir.

Li Besta hin hevalên kevin wî ji berê de nas dikirin, ên nû ku li Bakur tevlê bibûn û li wir mabûn jî navê wî bihîstibûn. Hemû pêkhateya Bestayê ji wî, wî jî ji wan pir zû hez kir. Pir zû rêhevaltiyeke pir germ bi hev re ava kirin. Hemze dilê hevalên xwe zûde fetih kiribû û cihê xwe di dilê her kesî de vekiribû.

*****



***Nasnav: Reşo Welat***
***Nav û Paşnav: Ramazan Mustafa***
***Dîrok û Cihê Jidayikbûnê: 1979/Qamişlo***
***Navê Dayikê: Behiye***
***Navê Bav: Mustafa***
***Dîrok û Cihê Tevlîbûnê: Sibata 1999’an li Qamişlo***
***Dîrok û Cihê Şehadetê: 13-15’ê Sibata 2012’an li Botan-Besta***

**Heval Reşo Welat**

Reşo ji Rojavayê Kurdistanê, ji bajarê Qamişloyê bû. Qamişlo bajareke mezine û ji ber derfetên ku tê de hene ketiye ber bala hem rejîma desthilatdar û hem tevgerên Kurdî. Li kêleka destavêtina rejîma serdest, hemû tevgerên Kurdî jî xwe xistine wir de û tê de xebatên xwe meşandine. Bi taybetî feraset û hişmendiya malbatger û nîjadperest ya PDK´ê li wir bandor kiriye.

Bi giştî her rêxistineke ku derketiye beşek ji şêniyên wir xistiye bin bandora xwe û bi xwe ve daye girêdan. Jixwe rejîma desthilatdar jî dest avêtiye beşek gelê wir. Yanî kî ji wir re derbas bûye şopek li ser hiştiye. Vê yekê jî di feraseta welatparêziyê de tevlîhevî û parçebûneke cîdî bi xwe re aniye û di navbera alîgirên partî û rêxistinan de rê li pêşiya nakokiyên siyasî, malbatî û heta şer vekiriye.

Bi derketina PKK´ê re dawî li van nakokî û hevdu nepejirandinan hatiye. Bi derbasbûna Rêber Apo ji bo qada Suriyê û Libnanê re beşeke zêde ya şêniyên vê herêmê hêviyên xwe di PKK´ê de dîtine, himêz jêre vekirine û pêre tevgeriyane. Rêber Apo dema ji Bakur ser Rojava re derbasî Libnanê dibe gelê Rojavayê Kurdistanê û Kurdên li Libnanê

dijîn weke rizgarkerê xwe wî pêşwazî dikin û wî weke yekane asoya jiyana xwe dibînin. Ango pêşeroja azad di tevgera Apoyî de dibînin. Bi vî awayî ji bo gelê wir feraseta welatparêzî û girêdana bi nirxên netewî re di feraseta PKK´ê de kom dibe û PKK weke kombûna hemû nirxên wan ên manevî lê tê. Bi gotineke din; PKK bixwe dibe nirxa hevbeş a wan hemûyan. Pir malbat hema malbatî tevlî xebatên Partiyê dibin û weke kadro dikevin nav xebatan û ti keseke wan li derveyî xebatan namîne. Heta gelek car malbat zarokên xwe weke xelat û diyarî didin partiyê.

Di nava bîst salên ku Rêber Apo li qada Ereban (Rojhilata Navîn) têkoşîn dike de bi giranî gelê wir Rêber Apo dibînin û diçin civîn, bîranîn, şahî û pîrozbahiyên PKK'ê. Rêber Apo bixwe jî li Rojavayê Kurdistanê li gelek deveran serdana gelek malbatan dike û bi wan re rûdine. Pir kes bi awayê takekes an jî malbatî perwerdeya Rêber Apo dibînin. Kêm kes û malbat hene ku neçûbin ziyareta Rêber Apo. Ew kes jî yên ku bi dewlet an jî PDK´ê ve pir girêdayîne û berjewendiya xwe li ba wan dibînin in. Ji vana hinek kesan bi PKK´ê re neyartî kirine û xwe û malbat û zarokên xwe jê dûr girtine, hinek jî bêdeng di halê xwe de rûnîştine.

Malbata Reşo yek ji malbatên ku her ji destpêkê ve bi PKK ve girêdayîne ye. Pêvajoya ku Rêber Apo li Libnan û Suriyê maye aktîf di nav xebatên welatparêzî de rol lîstine. Lê belê dema Reşo mezin dibe û tevlî refên gerîla dibe malbat dixeyîdin û bi PKK´ê re navberê vedikin. Balkêşe li kêleka malbatên ku zarokên xwe diyarî şoreşê dikin hin malbat jî -her çiqas hejmara malbatên wisa kêm jî be- tevî ewqas welatparêzî û xebatên ku bixwe dimeşînin jî nahêlin zarokên wan tevlî gerîla bibin û ji malbatê qut bibin.

Malbata Reşo jî bi vî awayîne. Naxwazin zarokên wan ji sînor û çarçova ku wan ji bo welatparêziya xwe diyar kirine derkevin. Lewre derketina Reşo ji bo serê çiya û qutbûna wî ji malbatê hezim nakin û napejirînin. Ji ber vê jî piştî ku Reşo tevlê dibe xwe ji PKK´ê qut dikin. Di rastiyê de nikarin di dil û rih de xwe ji tevgerê qut bikin, lê ji gotina xwe jî nayên xwarê û pê li axaftina xwe nakin. Dibê qey bi Reşo re ketine înadê.

Salên dirêj ev rewş bi vî awayî didome û malbat nahêlin PKK’yî, çi kadro û çi welatparêz zêde nêzî mala wan bibin. Bêguman, ew nizanin ku xeyîdîn û aciziya wan ti bandorekê li Reşo nake û bi vê xeyîdandinê



nikarin Reşo ji armanc û têkoşîna wî paşgez bikin, wî ji çiya daxin û vegerînin malê. Nizanin ku kurê wan wê piştî çend salan di rêya armanca xwe de şehîd bikeve û ewê nikaribin careke din wî bibînin û êdî derfeta ku dilê wî bistînin û ji ber xeyîdandinê lêborînê jê bixwazin wê nekeve destên wan. Nizanin ku eger rojekê kurê wan şehîd bikeve, ewê êdî her tim li beramber wî êşa wîjdanî bikşînin...

Bi vî awayî acizî û xwe dûrgirtina malbata Reşo heya dema şehadeta Reşo dewam dike. Piştî ewqas salên dirêj yekemîn gerîlayên ku malbat wan dipejirîne û vedixwîne mala xwe Şehîd Artêş Bokan (Seydo) û Gulistan Erdem (Nûda) in.

Reşo carekê ji hevalên xwe re qala malbata xwe ku ji ber tevlêbûna wî ji Partiyê aciz bibûn kiribû û gotibû: “Evqas sale ez tevlêbûme, lê malbata min hê aciziya xwe derbas nekirine. Ditirsim ku eger şehîd bikevim jî neyên termê min nebin û xwedî li min dernekevin. Ez fêm nakim çima malbatên me, me fêm nakin û her tim dixwazin em di bin çokên wan de bin!...” Piştre keniyabû û gotibû: “Oo, de dest ji wan berdin. Me rêya xwe dîtiye, ev besî me ye. Ewê rojekê her poşman bibin û werin ser rê...” Reşo hîngî bi bawerî axivîbû ku dibê qey ji wê demê ve hîs kiriye ku eger her tevlêbûna wî ya gerîla bandora erênî li malbatê nekiribe jî, şehadeta wî wê bandor bike û careke din wan bi rêxistin û armanca ku Reşo li pey ketiye ve girê bide.

Pilangeriya navnetewî ya 15’ê Sibatê mîna her ciwaneke Kurd, Reşo jî dihejîne û wî dikşîne lûtkeya çiyayên azad ên Kurdistanê. Reşo ku jiyana wî ya zaroktî tev bi kedê derbas bibû, di nav rêxistinê de jî her bi keda xwe mezin bû. Di ber pêşketina xwe û rêhevalên xwe de kedeke mezin dida. Kar û xebat ji bo wî bêferq bûn, a girîng ew bû ku ked bide û xwêdan birijîne. Ji ber ku bi kedê mezin bibû ji kedê hez

dikir û weke parçeyê herî girîng û sereke yê jiyana xwe didît. Ked ji bo wî sermaye û rûmeta jiyanê bû û bêyî ked negengaz bû jiyan bê kirin. Lewre ji ti ked û xebatekê îtîraz nedikir, berovajî, ji bo her tiştekê dilxwaz bû. Ango bi gotineke Kurdewarî, kar ji wî ditirsiya û ji ber wî direviya.

Reşo çend salan di xebatên dirunxaneyê de xebat kir û cilên hevalan dirût. Çend salan jî xebatên rênastiya ser sînorê Bakur û Başûrê Kurdistanê kir. Ji sala 2003'an heya sala 2005´an, ji sala 2008´ê heya 2010'ê li ser sînorê Behdînan û Botanê rênastî kir û komên hevalan ji vî milê sînor derbasî aliyê din kirin.

Di vê xebatê de bi sedan carî dilê xwe xist nav destên xwe û li wan sînorên tijî dehfik û kemîn xist. Sedan caran kefen çirand û ji metirsiyan re derbas bû. Sedan komên rêwî ji Bakur derbasî Başûr, ji Başûr jî derbasî Bakur kir. Sedan şevên xwe li ser wan sînoran di meşê de derbas kir. Sedan carê çante û barên rêhevalên xwe ji wan girt, ji bo ku rehet û bi lez bimeşin û bêyî ku bikevin metirsiyê bigihijîn cihên ewle alîkarî da wan. Sedan caran ji bo ku komên rêwî vehesin û bêhna xwe vekin, ew bixwe şiyar ma û zêrevaniya wan kir. Hezaran carî çav li westandinên xwe girt û ji bo ku hevalên din bandor nebin westandin û heta nexweşiyên xwe veşartin û qet qal nekir û nehişt kes pê bihese.

Tevî ewqas westandin, bêxewî, birçîbûn û metirsiyên rê û tevî ku xebatên rênasiyê di nav partiyê de xebatên herî zor û zehmetin jî, Reşo ev xebat pir bi daxwaz, dilxwaz û ji dil dikir û ti carî jê aciz nebû. Herweha bi xwe re hevalên ciwan û nû jî fêrî rênastiyê dikir û dema komên rêwî di sînor re derbas dikirin, her carê hevaleke xwe yê ciwan û bêtecrube jî bi xwe re dibir da ku tecrube bigire.

Reşo ji sala 2003'yan heya 2005'an ku rênastiya Botan û Behdînanê dikir, di heman demê de dema komên ku derbas bike nebûna jî tevlî xebatên qada Botanê dibû û weke endameke hêzên Botanê rol dilîst. Ji ber xebatên rênastiyê, ser hemû erdnîgariya Behdînan û Botanê serwer bû.

Heman xebatên rênastiyê ji sala 2008'an heya 2010'an dîsa meşand. Ji sala 2010'an şûnde jî êdî vesaziya wî ji bo nav qada Botanê çê bû. Bi vî awayî Reşo êdî li Botanê ma û li herêma Bestayê tevlî xebatan bû. Sala 2011'an di hundirê Botanê bixwe de, di navbera qadên Şehrîban, Bestaya Navîn, Hêzil û Kato Jîrkayê de xebatên rênastiyê bi rêve bir û komên rêwî anîn û bir. Hema roj nebû ku Reşo

di van rêyan de di halê meşê de nebe, yan jî pir hindik rojên wisa hebûn. Sala 2011'ê qet nehat dîtin ku Reşo du sê rojan ser hev li noqtê be û komên rêwiyan derbas neke.

Wê salê şervanên ku nû tevlî refên gerîla dibûn li herêma Bestayê perwerdeya seretayî ya şervantiya nû didîtin. Hejmara tevlêbûyînên wê salê li qada Botanê gelek bûn û qadê nedikarî vê hejmara şervanên nû rake. Lewre zêdetirî sed şervan ji Botanê derbasî Herêmên Parastina Medyayê hatin kirin. Bi vê armancê her carê komek ji Bestayê derbasî Kato Jîrkayê dikirin. Rênasên xeta sînorê Botan-Behdînanê jî ew dibirin Başûr.

Reşo tevahî ev komên şervanên nû ji Besta Navîn birin Kato Jîrkayê û li wir radestî rêveberiya herêma Katoyê kir. Her cara diçû şervanên nû werbigire da ku bi xwe re bibe Katoyê, demekê li ba şervanan rûdinişt û bi wan re guftûgo dikir, henek dikir, qala bîranîn û tecrubeyên xwe ji wan re dikir û li bîranîn û daxwazên wan guhdarî dikir.

Carekê dema komeke şervanan dibir Katoyê, di rê de Berfîn ku şervaneke panzdeh salî bû pir zû westiya û ji taqetê ket. Jixwe germaya havînên Bestayê jî dijware û tansiyonê radike. Kom bi giştî di du şevan de digihîştin Katoyê. Rê bixwe rêya şevekê bû, lê ji ber ku ew nû bûn, ji bo newestin Reşo ew hêdî hêdî dimeşandin û rêya şevekê ji wan re dikir du şev. Yanî di nîvê rê de rojekê navber dida. Tevî vê jî Berfîn pir zû ji hal ket û westiya.

Berfîn li metropolên Tirkan, li Edeneyê mezin bibû û heya wê demê çiya nedîtibû û tê de nemeşiyabû ku fîzîka wê hinekî vebibe. Ew, cara yekê bû di çiya de dimeşiya. Ji ber vê, tiliyên lingê wê di nav pêlavê de zû bûn birîn û bi vê re tam ji hêzê ket. Reşo çante û yelega ser wê jê girt û rakir. Berfînê dîsa jî nedikarî bimeşe. Vê carê destê wê jî girt û wisa xwest wê bimeşîne. Lê vê jî fayde nekir.

*Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!*

Îcar ji bo ku westandinê ji bîra wê bibe û lêhûrbûna wê belav bike, di rê de tevî ku axaftin qedexeye jî hema çi bîranînên wî hebûn û çi bûyereke komîk û biken dizanî tev ji Berfînê re vegotin. Lê ev jî bê fayde bû. Ji bo ku derûniya Berfînê xira nebe û hêviya xwe winda neke, Reşo jêre got: “Heval Berfîn, tu hinekî din bimeşe, li pêşiya me hêstir heye. Dema em gihiştin wir emê te li hêstirê siwar bikin.”

Bi vî awayî Berfîn her bi hêviya hêstirê dan meşandin. Lê her carê Berfînê dipirsî, “Ka hêstir li ku ma? Çima em nagihîjin cihê hêstirê?” Reşo dît ku Berfînê hemû hêviya xwe bi hêstirê ve girê daye û her pirsa hêstirê dike, êdî xwe û rênasê din nîşan da û jêre got: “Were, ez hêstir, ev heval hêstir. Tu diçî ser pişta kî ji me tu dizanî!” Berfîn pê hesiya ku ewqas qalkirina hêstirê hemû çîrok bûye û di rastiyê de ti hêstireke ku bînin pêşiya wê nîne. Ji ber vê aciz bû, qehirî û helwest danî ku bi Reşo re neaxive ji ber ku ew xapandiye.

Lê belê rêwiyên din û rênasê din bi vê heneka Reşo hîngî keniyan zikê wan êş girt. Ev henek di nav hevalan de belav bû. Piştî demekê, dema hevalan ji Reşo pirsîn ku henekeke wisa xweşkalîte çawa hatiye bîra wî, bersiv da: “Ê ma çi bikim? Ji bo ku bimeşe min henekek pêre kir, wê jî bawer kir. Di rê de min ewqas bîranîn û çîrok û tiştên xweş jêre gotin, yek jî di aqlê xwe de negirt, lê belê min tenê carekê navê hêstirê anî ser ziman, ew jî ji bîr nekir û hema hêstir xwest...”



Şervanên nû dema di rê de diwestin çi nifir û dijûnan dizanin hemûyan ji rênasan(qurye) re dibêjin. Reşo jî di dema rênastiya xwe de hemû nifir û dijunên vê dinyayê dixwar, tevî vê nedikarî xwe aciz jî bike, ji ber ku şervan hê nû bûn û fêrî uslûb û çanda rêxistinê nebibûn. Bi gotina Reşo bixwe, “wî di rêyan de bi

qasî av û oksîjenê dijûn dixwarin."

Reşo xwedî kesayeteke pir aram û herwiha bisebir bû. Dizanî wê rojek bê ku ew şervan bi van rojên xwe bikenin û poşman bibin. Lewre çiqas di ber wan de ked bide jî keda xwe bes nedidît û dixwest hê zêdetir ji bo wan kedê bide. Di anîn û birina komên rêwî de tevî ewqas westandinên rê û zêrevaniyê, wexteke kêm jî be vediqetand ji bo guftûgo û elaqedarbûna bi rêwiyan re. Bi taybet jî eger ew rêwî şervanên nû û ciwan bûna.

*****

***Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!***



**Nasnav: Ronahî Murad**
**Nav û Paşnav: Gülnaz Ekinci**
**Dîrok û Cihê Jidayikbûnê: 12’ê Sibata 1984´an/Konya**
**Navê Dayikê: Ayşe**
**Navê Bav: Cemîl**
**Dîrok û Cihê Tevlîbûnê: 2001/Konya**
**Dîrok û Cihê Şehadetê: 13-15’ê Sibata 2012’an li Botan-Besta**

**Heval Ronahî Murad**

Ronahî bi rêça xwe ji Mêrdînê bû. Malbat Torî'ne û welatparêzin. Li gorî dîroka kevnar û mîtolojiya Kurdistanê, Mêrdîn ango Mardîn navê xwe ji navê Xwedawend Mîtra (Xwedawenda Zagrosan a 2000 sal beriya zayînê, Xwedawenda dawî) digire. Mîtra (bi navê din Mêhr) wek navenda ronahiyê tê pejirandin. Jixwe felsefeya Xwedawendan RONAHÎ ye. Heya niha jî di wêjeya Kurdî û giştî Aryenîk de peyvên mêhr, xor, hur, hor bi heman wateya Ronahî ne. Mêhr ango Mar=Mîtra, Ronahî. Dîn=Ol, Bawerî (peyveke Semîtîke). Jixwe Mar jî di mîtolojiya Mêzopotamyayê de pîroze û sembola jinê ye. Mêhir bi demê re bûye Mêr. Yanî Mêrdîn û Mardîn heman *Mêhirdîn* e. Bajarên Mêhrdîn (û Merîwan'a Rojhilatê Kurdistanê) tê wateya herêma gelên Mîtrayî- gelên ku li pey Ronahî û Mîtra ne, bajarê mirovên Mîtra'bawer- Ronahî'bawer, welatê gelên ku ola wan Mîtrayî (Mêhrî) û Ronahî ye.

TOR xwedayê şer ê qebîleke kevin a Mêhrdînê ye. Heya niha jî berdewam û bermahiyên wê qebîleyê, weke eşîra Torî tê naskirin. Jixwe di roja îro de jî Torî (û Goyîyên Botanê) pir şerker û li hember

sînor û tiştên bi zor bên sepandin in. Toriyan nav û karakterê xwe ji navê xwedayê xwe girtine.

Ji sedema şert û mercên zor ên jiyana li Kurdistanê, malbata Ronahî dibin çend parçe; beşek diçin Êlihê, beşek koçî metrepolên Tirkiyê dikin; ji vana beşek li Qonyayê rûdinin. Beşek jî li Mêrdînê li ser ax û warê xwe dimînin. Malbata Ronahî jî bi vî awayî diçin Qonyayê dijîn. Ronahî li wir ji dayîk dibe.

Dîroka ji dayîkbûna wê 12'ê Sibata 1984'an e. Şehadeta wê jî di şerê 12 û 13'ê sibatê deye. Kes nizane ku dawîbûna jiyana Ronahî, ango şehadeta wê jî wê di heman rojê de biqewime... Rojbûn û şehadeta wê di rojekê de ne... Gelo eger mirov bizane kengê dimire yan jî bizane ku jiyan windakirina wê jî di heman roja rojbûna wê de ye, ewê çawa pêşwazî bike û çi bike, nayê zanîn. Lê ev tê zanîn ku şoreşger tim, di her kêliyeke jiyanê de bi mirinê re rûbirûne, pêre dost û hevalin, lewre wek parçeyeke jiyana xwe dibînin û jê natirsin. Ronahî jî wisa... Mirin jêre weke lîstoka zarokan dihat, lê dîsa jî nayê zanîn ku eger bizaniya şehadeta wê, wê di heman roja rojbûnê de rû bide wê çi bigota, çi bikira, çawa pêşwazî bikira.

Ronahî ji zaroktiyê ve ji heyva sibatê aciz bû, ji ber ku ji sermaya dijwar û ziwa ya Konyayê pir cemidîbû û recifîbû. Dema mezin dibe hê zêdetir ji wê heyvê aciz dibe; îcar aciziyeke zanistiyaneye, ji ber ku Rêberê welatê wê di vê heyvê de tê dîlgirtin. Jixwe ew heyv ji ber pilangeriya navdewletî ya dijî Rêber Apo di nav gelên Kurdistanê de weke “heyva reş” tê binavkirin. Berê ji ber bablîsok, bahoz, serma û seqema dijwar a Kurdistanê tenê jêre “sibatoka dînik” dihat gotin, lê vê carê nifir û kîn li hember bûyerên vê heyvê heye. Ronahî aciz bû ku di vê heyvê de, hem jî du roj beriya pilangeriyê ji dayîk bûye. Bi henekî ji hevalên xwe re digot: “Dayîka min bêkar bûye, îş nedîtiye, çûye di nav berf û qeşayê de ez anîme dinyayê...”

Di Kurdistanê de Torîyên Mêhrdîn û Goyiyên Botanê bi asîbûna zêde, nehatina sînor û pergala jiyaneke da sepandî û taybetmendiyên îsyankar tên naskirin. Ev taybetmendî di asteke wisa de ye ku ji wan re “serhişk” tê gotin. Heta eger keseke din ku Torî û Goyî nebe jî, dema pir serhişktî bike jêre tê gotin “ma tu Torîyî?” yan jî dibêjin “Goyî, de li me guhdar ke...”

Ronahî ku Torîye ji zaroktiyê ve pareke zêde ji vê asîbûnê digire. Her carê, di her karekê de, di her derfet û her mijarekê de îla wê xwedî

gotin û nêrîn be. Heya ji gotina beramberî xwe qaneh nebe dest ji ya xwe bernade. Jixwe dema gotina wê rast û di cih de be, serê wê jî biçe gotina xwe disepîne heya ser dixe. Ji bo parastina rastiyekê, yan jî tiştekî ku rast dibîne û jê bawere bi dayîk û bav, xwuşk û bira, der û cîran, dost û heval û her kesekê ku pêre di nîqaşê de ye re şer dike. Dema gotina wê rast derdikeve bi serfirazî û irza kesayeteke asî hewaya xwe ser derdor re davêje. Dema bi şaşbûna nêrîna xwe bihese û qaneh bibe ku şaşe vê carê jî pir dilnizim nêz dibe û aram rûdine li derdor guhdar dike.

Ji ber ku malbat welatparêzin û aktîf di nav xebatên azadîxwaziya gelê xwe de cih digirin, Ronahî bi çanda welatparêzî tê perwerde û mezinkirin. Malbatê bedel dane ji bo azadiyê; kurapeke Ronahî di nav refên gerîla de şehîd e. Hejmarek zarokên xaltîk, met, xal û apanê wê jî di nav gerîla de cih digirin. Evana tev dibin îlham ji bo hestên welatparêziya Ronahî û yeknebûna wê bi xerîbiyê re.

Ew, li Konyayê, dûrî welat, ax û gundê xwe mezin dibe. Lewre jiyankirina li ser axa xurbetê ti carê hezim nake. Li xerîbiyê ji dayîk bibe jî, ew her Mêrdînî ye, her Torî ye, nikare bibe Qonya yî. Ti carê xwe ayîdê Qonyayê nabîne, weke axa xwe nêzî wê nabe û ji dil jê hez nake. Ew bajêrê ku têde ji dayîk bûye û mezin bûye av, hewa, ax, gul, çûk, ezman û hema her tişteke wê derê ji Ronahî re biyanî û xerîb tê. Xuyaye heya mezin bibe jî, wê her tim jêre xerîb û biyanî bê, ti carê xwe ayîdî wir nebîne û her li pey axa ayîdê xwe bigere.

Bi mezinbûna temen û bejnê re rih, dil, mejî, daxwaz, hêvî û lêgerînên wê jî mezin dibin. Êdî dizane ku ji vê zêdetir nikare li ser axeke biyanî jiyaneke ayîdê xwe bijî. Jiyana ku ew ayîdî xwe dibîne hatiye dagirkirin. Lewre li ba wê, jiyaneke dagîrbûyî nabe bê jiyankirin. Ji bo dijbertiya vê rewşê û rizgarkirina vê jiyanê ji bindestiyê, xebatên HADEP'ê ku malbat û gelek mirovên wê têde cih digirin êdî ji vê zêdetir wê têr nakin. Lêgerîn her diçe mezintir dibe. Ev lêgerîn bi temamî awirên Ronahiyê di bilindahiyan de kilîd dikin û berê wê didin çiyayên azad ên welatê wê.

Ronahiyê li ser çiyayên Kurdistanê û di nav jiyana gerîlayî de cara yekê xwe ayîdê derekê û jiyanekê hîs kir... Hîs kir ku jiyaneke ayîdê xwe dijî, li ser axeke ayîdê xwe dimeşe û hewayeke ayîdê xwe dikişîne hinavên xwe.

***Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!***

Di nav gerîla de li gelek deveran gerîlatî kir; li Herêmên Parastinê yên Medyayê, li Xinêre, Karox û Qendîl, Xakurkê, Heftenîn û hemû qadên Behdînanê cih nemabû ku Ronahî lê nemayî. Çend salan weke berpirsyartiya taxim û yekîneyan erk rakir.

Salên ku li qadên Herêmên Parastina Medyayê bû gelek caran pêşniyar kir ku biçe Bakurê Kurdistanê. Pêşniyarên li pey hev ên Ronahî ji aliyê rêxistinêve nedihatin pejirandin, heya sala 2008´an ku êdî pir zêde israr kir ango bi gotina wê bixwe "Torîkî ket nav de." Di encamê de sala 2008´ê rêxistinê daxwaza wê pejirand û vesaziya wê ji bo qada Botanê destnîşan kir. Ronahî piştre dema heval jê dipirsin ku pêşniyara xwe çawa bi rêxistinê daye erêkirin, ji dil dikeniya û digot: "Min pir pêşniyar kir, lê kesî li min guhdarî nekir. Wele min jî ji xwe re got 'Ronahî dilnizmî bi kêr nayê.' Ji ber vê jî Torîkî ketim nav de, min serê rêveberiyê bir. Neçar man min bişînin. Hûn her ji min re dibêjin serhişkî. Binêrin, carna serhişktiya Torîyan bi kêrî mirov tê."

Bi vî awayî Ronahî ket nav koma Botanê û bi tevî Şehîd Qehreman Erdal, Şehîd Hebûn Azad, Şehîd Silav Serkeftin, Şehîd Azad Hebûn û Şehîd Aram Agir û hejmarek hevalên din amadekariyên çûyînê kirin. Piştî demeke amadekariyên berfireh, di nav koma Heval Gulistan Gulhat de ku ewê weke berpirsyara giştî ya qada Botanê derbasî wir bibûya, çû Botanê.

Keçxala wê Heval Berfîn jî di nav refên gerîla de bû. Li Başûr dem dem hevdû didîtin û gel hev diman. Sala 2009´an vesaziya Heval Berfîn jî ji bo Bakur, eyaleta Garzanê çêbû û di nav koma Heval Arjîn Garzan de bi ser Botanê re derbasî Garzanê bû. Li Botan, li Bestayê Ronahî û Berfînê careke din û cara dawiyê hevdu dîtin. Careke din bi hev şa bûn, lê nezanîn ku ew hevdîtina wan a dawiyê ye û careke din hevdu nabînin. Nedizanîn ku tenê heyvek û deh roj dikeve navbera şehadeta herduyan de.

Ronahî li Botanê heya demekê li ba fermandariya qadê ma û xebatên muxabereyê meşandin. Bihara sala 2010´ê Şehîd Hebûn Azad ji Taxima Bitevger derbasî ser tîma Kato Jîrkayê bû, Ronahî jî çû şûna wê û bi vî awayî ket nav Taxima Bitevger. Bi tevî Şehîd Silav, Zîlan û Dîdar Gabarê di tîmekê de cih girtin. Ronahî, Hebûn û Silavê pir ji hev hez dikirin û bi hev ve girêdayî bûn. Di çalakiya Aqêrê de ku Ronahiyê bixwe jî tê de cih girt, deh heval şehîd ketin ku Heval Hebûn û Heval



Silav jî tê de bûn. Vê bûyerê mîna hemû hevalên din, li ser Ronahiyê jî pir bandor kir û ji dil ew birîndar kir.

Piştî vê çalakiyê, Ronahî careke din di taxima xwe de li ser tîma xwe ma û ji bo tola wan şehîdan xebatên xwe hê xûrttir kirin. Di her kêliyekê de bîranînên wê yên bi Silavê re dihatin bîra wê, bi çavên tijî rondik li dûr dinêrî û li wê digeriya. Çavên Ronahiyê li Silav ku tim mîna kulîlkeke rûgeş û rûken dikeniya, digeriya.

Hevaltiya wê bi Hebûn re jî pir xurt bû. Hebûn Zaza bû, Ronahî jî Torî. Hebûn pir hez dikir heval jêre bibêjin Zaza, Ronahiyê jî pir hez dikir jêre bibêjin Torî. Ji ber vê, hevalan car caran di nav henekan de ji wan re wisa digotin û ew kêfxweş dikirin. Lê ev weke adeteke dayimî lê nedikirin. Lê wan her duyan bixwe her dem wisa bangî hevdu dikirin û bi van navên xwe dikeniyan. Niha Hebûn û Silav şehîd ketibûn û ew hevaltiya wan a germ weke bîranînekê mabû. Wan dê êdî hevdu nedîtibana û bi hev re guftûgo, henek û parvekirinên xwe berdewam nekirana. Ji hev re Zaza û Torî negotana.

Bi van şehadetan re Ronahiyê dibê qey xwe di valatiyekê de hîs dikir, çavên wê her li derdor digeriya da ku belkî ji ciyekî ve derkevin û careke din wan bibîne. Zîlanê jî ku di tîma wê de bû ji ber van şehadetan pir zorî dikişand, lewre hestên Ronahiyê fêm dikir û di nebûna Heval Silav de pir hewl dida pêre bibe alîkar û dixwest bi tevî Dîdar hinekê barê wê sivik bikin. Lê vêya qanûna dil nediguherand; qanûn ev e: birînên ku di dil de vedibin ti carê derman nabin û eger bi dehan sal jî ser re derbas bibe weke roja yekê bi jan, giran û dijwarin! Her hevaleke ku şehîd dikeve parçeyek ji dilê mirov bi xwe re dibe. Ma dibe bê jibîrkirin?

Ev dîmen ji ber çavên Ronahî nediçû ku sala pêştir carekê Hebûna Zaza û aşiqa pîvazan ji bo peywirekê çûbû Şehrîbanê û di rê de pîvazek dîtibû û ew pîvaz tam heyvekê di çanteyê xwe de rakiribû heya hevalên wê kom bibin bi hev re bixwin. Di encamê de rojekê ku nêzî

bîst heval kom bibûn pîvaz hûr kiribû û xistibû nav mirtoxeyê de. Hemû heval ku ji ber xwarina zêde ya mirtoxeyê, êdî jê bêzar bibûn, mirtoxeya bi pîvaz a Hebûn pir bi îştîh û zevq xwaribûn û pîçek jê nehiştibûn. Ronahî çiqas qala wan rojan ji hevalên gel xwe re bike jî dilê wê arambûn fêm nedikir.

Havînê, Havîn Cudî jî piştî ku perwerdeya xwe ya seretayî qedand derbasî vê tîmê bû. Ev tîm geh bi serê xwe, geh bi taxima xwe re heya derengiya payîzê li tevahî qadên Besta, Kor Qendîl, Herekol û Garisayê bihust bi bihust geriyan û hedefên dijmin keşf kirin û çend çalakî li dar xistin.

Payîzê ji bo derbaskirina pêvajoya zivistanê derbasî Kato Jîrkayê bûn û bi tevî hevdeh hevalên jin ên din, pênc mehên tijî perwerde dîtin. Rexnedana kêmbûnên ku di pratîka salê de derketine û taybet jî rexnedana şehadetên Aqêrê dan û ser Parêznameyan perwerdeyên kûr dîtin, guftûgoyên kûr meşandin û ji bo tola Şehîdên xwe rabikin, ji bo sala pêşiyê xwe amade kirin.

Di kampê de Ronahiyê jî di rêveberiyê de cih digirt. Hewl dida bi tevî xwe, pêkhateya kadro jî ji bo pratîka Şerê Gel ê Şoreşgerî ya bihara pêşî amade bike. Geh bi guftûgoyên têr û tijî yên nav jiyanê, geh bi xwendin û lêhûrbûnên takekesî, geh bi şahî û henekan, geh jî bi serhişktiya Torîbûna xwe bibû rengeke taybet di nav kampê de.

Arjîn Dersîm, Sosin Alan û Ronahî bi hev re ser kampê radiwestiyan. Sosin sala 1991'ê tevlî Partiyê bibû û Toriya Kerborana Mêhrdînê bû. Bi Ronahiyê re zû de hevdû nas dikirin û hevaltiya wan pir germ û xweş bû. Dema Ronahiyê li ser tiştekê înad dikir û ji ya xwe nedihat xwarê, Sosinê digot: “Binêre Ronahî, ez jî Torîme haa!” Bi vê henekê Ronahî nerm dibû û dikeniya. Wê demê hevalên ku li wir bûna tev bi hev re bi wan dikeniyan û bi vî awayî dawî li tengasiyê dihat. Carekê ku Ronahî ji tiştekê aciz bibû û hevalên din nekarîn wê aram bikin, gotin: “Bila Heval Sosin biçe pêre biaxive, Torî zimanê hevdû fêm dikin.”

Henekên bi vî awayî di nav gerîla de gelek caran nexweşiyan bi dawî dikin û rê li pêşiya xweşiyê vedikin. Li gorî qanûn û rêseyên gerdûn û jiyanê ti tişt weke gul û gulistan nameşe. Gelek caran tengasiyên biçûk û mezin di nav jiyanê de rû didin. Di nav jiyana şoreşgerî de jî wiha ye. Di vir de ya girîng ew e ku mirov kîndar nebe û bi dileke fireh û qayîm tengasiya rû da ye çareser bike. Ronahî jî wisa

bû; aciz dibû, serhişktî dikir, xwe diqehirand lê kîndar nebû. Bi qasî israra di ya xwe de, ewqas jî dilnizim, nerm û guhdarvan bû. Xwedî dileke pir mezin, qayîm û tijî hestên hezkirina mirovan bû. Di rûyê mirovan de piranî rexneyên xwe digot, lê li pişt wan tim bi erênî qala wan dikir, heta eger rexneyên wê pir bin jî. Dema di rûyê mirovan de dikeniya dibê qey gul diyarî wan dikir. Tijî eşqa rêhevaltiyê bû. Ew eşqa wê ya mezin di her kêliyekî de xwe nîşan dida; heta di demên herî teng de jî. Mînaka vê, çalakiya Hêşatî bû.

Bihara 2011'an ku ji kampa zivistanê derketin bi tevî Dîdarê careke din di Taxima Hereketlî de cih girt. Havînê Dîdar derbasî Herêmên Parastina Medyayê bû, Ronahî jî ji taxima xwe derket û bi tevî Şehîd Feraşîn Delîla Wan û Şehîd Vejîn Soran (Nêrgiz Pîrot) li Biryargehê li ba Heval Gulistan man.

Roja 27’ê Rezberê (Îlon) hevalan avêtin ser paygeha gundê Hêşatê ku girêdayî navçeya Berwariyê ya bajarê Sêrtê ye. Ronahî, Vejîn, Azad Felluce, Rizgar Amed, Rojda Tirbespiyê, Berxwedan Muş û Taxima Hereketlî jî di vê çalakiyê de cih girtin. Aso jî wê salê derbasî Taxima Hereketlî(btevger) bibû û bi taximê re di wê çalakiyê de cih girt.

Roja ku ji bo çalakiyê hat diyarkirin di gund de dawet hebû. Hemû hevalên jin û sê hevalên xort ser kincên gerîlayî de kirasên jinan li xwe kirin û wisa nîşan dan ku diçin dawetê. Ronahiyê jî kiraseke reş li xwe kir. Wisa xwe pêçabûn ku nehiştin çek û rextê wan di bin kirasan de xûya bike. Her hevalekê kêr, makêt an jîletek bi xwe re rakir ji bo ku dema bigihîjin paygehê kirasên xwe pê biqetînin û rehet tev bigerin.

Ji ber ku xwe weke mêvanên dawetê nîşan didan, pêwîst nebû xwe dereng bihêlin; êvarê piştî hewa tarî bû bi maşîneyê ketin gund. Di nav maşînê de têra xwe bi halê xwe û dîmena hevdu keniyan. Li beramber dengê dehol û zurneya ku ji mala dawetê bilind dibû wan jî bi awayeke ku dengê wan ji nav maşînê neçe derve sirûdên şoreşê dixwendin û bi xwe dikeniyan.

Maşîna wan ji rêya dawetê qut bû, berê xwe da rêya payîgehê. Heval li nêzî paygehê ji maşînê peya bûn. Heya ji tepeya paygehê hilkişiyan tenê çend gundiyan ew dîtin. Wan jî guman kirin ku mêvanên dawetê ne, lewre pir bi baldarî li wan nenêrîn, derbas bûn çûn. Ji bilî wê, ti kes bi wan nehesiya. Di hilkişîna tepeyê de çeteyek bi

wan hesiya û guman kir ku ew, gerîla bin ne mêvanên dawetê, ji ber ku ti mêvaneke dawetê xwe li vê rêyê nedabû. Çete ji niyeta wan ket gumanê û bi lez çeteyên din agahdar kir.

Dema heval gihîştin ber deriyê paygehê çeteyan bi zanabûn zarok li wê derê kom kirin û pêşiya hevalan girtin, ji ber ku dizanîn gerîla ziyanê nadin zarokan û xelkê medenî. Çeteyek hat namlûya çeka hevalekê dehf da û xwest wan paşde bide zivirandin. Ev dîmen ji hevalan re pir biêş hat, ji ber ku wan jiyan û rihê xwe danîbûn ser kefa destê xwe û bi bihayê canê xwe ji bo azadiya wan kesan şer dikirin, lê wan kesan ew fêm nedikirin û bi qasî dijmin har bûn. Di vî gundê welatparêz de ku xwedî gelek bedelên giranbiha bû û herî dawî jî heyvek beriya wê panzdeh ciwan bi hev re jê tevlî refên gerîla bibûn, ew çete li çi digeriyan?!

Heya hevalên amade bi dûrxistina zarokan û çeteyan ve mijûl bûn, hevalên ku kiras li xwe kiribûn jî kirasên xwe qetandin û di kêliyekê de xwe amade kirin. Hin hevalan çete mijul dikirin heya qolên êrîşê cihê xwe bigirin û dest bi lêdanê bikin. Bi destpêkirina çalakiyê re çete ji tirsan bi zarokan re reviyan û ji paygehê dûr ketin.

Şer û pevçûn di navbera hevalan û leşkerên dagirker ên Tirk de dijwar bû. Heval Vejîn di qola Heval Berxwedan de êrîş kir ser çeperên dijmin. Çeperek bi leşkerên nav de ji holê rakir, çekek ji ser leşkereke mirî rakir û ji Heval Berxwedan re bir, bi ken û kelecaneke bêsînor jêre got: “Heval Berxwedan, Heval Berxwedan! min çekekî anî. Ha ji te re.” Û vegeriya êrîşî çeperên din kir. Ji wir jî çek rakir û dema şarjorên ser çek û rextê wê qediyan êdî bi çekên ku ji ser dijmin rakiriye êrîşî çeperên din kir, heya ku fîşek ji çeperekê li zikê wê ket û ket erdê...

Subayeke Tirkan ku di vî şerî de birîndar bibû ji şerê Heval Vejîn pir bandor bibû û tevlî bernameyeke televîzyona dewletê bû. Dema ev şer vedigot qala Şehîd Vejîn kir û got: “...Di nav wan de jinek hebû. Aman çi jinek bû! Aram nedibû û li cihê xwe ranediwestiya. Bi çeka me li me dida. Ji vê çeperê direviya ser çepera din. Qet aman nedida...”

Heval Azad ku di parastinê de bû, li cihekê çeper girt û bi BKC´ê li hedef xist. Piştî demek pevçûnê bi roketekê ku ji beramber hat li wir şehîd ket. Heval Rizgar jî di nav çeperan de fîşek xwar û ket xwarê.

Heval Rizgar beriya ku kom ber bi hedefê ve bi rê kevin bi tevî hevalên din, her dayîm dev bi ken henekê xwe bi mirinê dikir. Di nav henekekê de ji hevaleke ku pir jê hez dike re gotibû: “Were were em

wêneyekê bi hev re bigirin, jixwe tu yê sibê şehîd bikevî, careke din te nabînim ku bi te re wêne bigirim...” û bi dengê bilind keniyabû. Dema Heval Rizgar bixwe şehîd ket, ev bîranîn weke birînekê ma di dilê wî hevalî û hemû hevalên din de.

Di vê çalakiyê de Aso B7 bi kar dianî. Bi avêtina roketa yekemîn re bi agirê ku ji pişta Bîsifîngê derket rû û çavên Rojdayê şewitand. Bi qîrkirina Rojda re Aso nû bi xwe hesiya ku çi aniye serê hevala xwe. Rojdayê êdî nedikarî tiştekê bike û ji vê zêdetir di çalakiyê de rol bilîze. Lewre Aso ew bir ber tehtekê danî û jêre got ku piştî qedandina çalakiyê ewê biçe wê bibe.

Di çalakiyê de Vejîn Soran, Azad Bedlîs û Rizgar Amed fedayiyane û bi berxwedan û qehremaniyeke mezin şehîd ketin. Çend heval jî birîndar bûn. Ji leşkerên Tirk jî zêdetirî 30 leşker ku hejmarek ji wan fermandar bûn hatin kuştin, hejmareke zêde jî birîndar bûn.

Dema çalakî bi dawî bû Aso, Rojda û Bîsfînga xwe di paygehê de hişt, agahî jî neda hevalên din. Hevalên sax hevalên birîndar li ser pişta xwe rakirin. Yek ji wan birîndaran jî Aso bû ku di çoka xwe de fîşekek xwaribû û li ser milê çend hevalan hat rakirin. Jixwe di çalakiya Aqêrê ya 30'ê puşpera sala beriya wê de jî fîşekek di heman çokê de xwaribû. Wê demê jî Klaşînkofa xwe û Bombavêj li cihê çalakiyê hiştibû û ji kesê re jî negotibû heya gihîştibûn cihê xwe. Ji ber birîndariya çok, li wir jî çend heval pêre mabûn û hêdî hêdî ew bi xwe re biribûn heya gihîştibûn ba hevalên din.

Piştî ku çalakî li Hêşatê bi dawî bû jî heman rewş dubare bû, heta hin pratîkên xiraptir jî ji aliyê wî ve rû dan.

Paygeha Hêşatê di çalakiyê de dema ser hev derbe xwar û nekarî li hember hevalan li ber xwe bide ji Sêrt, Şirnex û Wanê teqviye û alîkarî xwest. Heya teqviye ji hewayê ve gihiştin qada şer, hevalan dest bi paşvekişînê kirin.

Hejmareke zêde kobra hatin destwerdana rewşê. Kobrayan her der dan ber fîşek û rokêtan. Skorskyan jî hejmareke zêde leşker peya kirin û kuştî û birîndarên xwe rakirin birin. Ji ber êrîşên hewayî heval ji hev belav bûn û kom bi kom paşde vekişiyan. Bi her birîndarekê re herî kêm du heval man ji bo ku birîndaran hêdî hêdî derbas bikin. Bi Aso re jî du heval man û hêdî hêdî ew vegerandin cihê xwe.

***Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!***

Piştî ku hemû heval kom bi kom ji alana çalakiyê bi giştî derketin û vegeriyan cihê xwe, civîna nirxandina çalakiyê hat lidarxistin. Di civînê de hemû lehengî û berxwedan, lawazî û kêmasiyên ku hatibûn jiyankirin yek bi yek hatin nirxandin. Aso bi serê xwe bû rojevek. Bi giştî rawestîna wî ya nav çalakiyê; birîndarkirin û piştre hiştina Rojda, derbarê vê de ji hevalên din re agahî nedan, hiştina B7´ê ji dijmin re û hwd. tevahî nêzîkatiyên wî hatin destgirtin. Hevalan ku pir jê hêrs bibûn, pratîka wî pir giran û neyînî nirxandin. Lê tevî vê jî dan ber xatira birîndariya wî, rexnedan jê xwestin û şanseke din danê.

*****

Ronahî ji cihê çalakiyê ango ji paygehêve bi tevî hevalên din birîndaran û çek û rextên wan rakir heya gihîştin Herekolê. Piştî civîna çalakiyê, Şiyar Êlih ku di pişta xwe de birîndar bibû û Aso ji Herekolê, ji deriyê Keperê ve ber bi Bestayê hatin daxistin, ji ber ku payîz bû û zivistan dihat. Herekol jî sar bû. Di sermayê de birîn zû xwe nagirin û çê nabin. Ji bo birîndaran Besta hê çêtir bû, ji ber ku germtir bû. Çend hevalan Aso geh li ser pişta hêstir, geh li ser milên xwe daxistin Bestayê. Ronahî û du hevalên din jî Şiyar daxistin. Deriyê Keper ji deriyên din rehettir bû. Lewre koçer di çûnhatinan de wir dixebitînin û tê re derbas dibin. Ev, metirsiya ewlekariyê kêm dike.

Deriyê Keper jî mîna deriyên din beramberî paygehên Çêla Nimêja, Gundikê Melê û Gwîze Kurkêye, lê ji ber ku tim koçer têde diçin û tên heval zû bi zû, ew jî eger ne ji ber neçariyê be ji wir ve derbas nabin, ji ber ku ji bo wan ev rê dûr dikeve. Dijmin jî dizane ku koçer Deriyê Keperê bi kar tînin. Lewre hem rehettir, hem ewletir bû. Lewre hevalan birîndar ji wir ve daxistin. Bi giştî daketin ji Herekolê ber bi Bestayê ve zore, erazî pir hişk û mîna dîwaraye. Di rewşa birîndariyê de hê zortir e.


Ronahî û hevaleke din ji Herekolê ve heya Besta ketin bin milê Şiyar û giraniya bedena wî rakirin ser xwe. Bejna Şiyar bilind bû, bejna Ronahî jî kurt. Di meşê de Şiyar pê hesiya ku bi vî awayî Ronahî pir zehmetiyê dikşîne. Ji ber vê, jê xwest ku xwe pir bi wî ve newestîne. Ronahî ev daxwaz bi zimaneke hişk û zelal red kir û heya Bestayê wî berneda. Ronahî bi biryar bû ku erka xwe ya rêhevaltiyê nîvço nehêle û bibe serî, ji ber ku di ferhenga wê de hevaltiya nîvço tinebû. Hê êşa şehîdên Aqêrê di dilê wê de bû. Sê rêhevalên wê nû di vê çalakiya dawiyê de şehîd ketibûn. Çawa dilê wê rabikira ku bi birîndaran re

nebe alîkar û wî ji hevalên xwe yên din re bihêle! Ma ne eger pirsgirêk westandin be, hevalên din jî westiyabûn? Çawa li rehetiya xwe fikirîba û li hevalên xwe nefikirîba?

Ronahî û hevalên din bi xwêdan, zor û zehmetiyeke zêde û bi hestên mezin a rêhevaltiyê Aso û Şiyar ji wî deriyê zehmet ku tijî xîz û şemitoke daxistin, bêy ku bi westandin û êşên laşê xwe bihesin.

Şiyar ser milê Ronahî û hevalê din bi saxî gihîşt Bestayê. Di rojên pêşiyê de Şiyar dema qala wê demê dikir her digot: “Min kir nekir Heval Ronahî ez bernedam. Ji Herekolê heya vir ket bin milên min de. Hemû giraniya laşê min ketibû ser wê.”

Piştî vê çalakiyê ku şehadetên têde rû dabûn bi qasî hemû hevalên din bandoreke mezin li Ronahî jî kir, Ronahî ji bo derbaskirina pêvajoya zivistanê li Bestayê ma. Ewê dê ew zivistan di kampa Evîn de derbas bikira.





**Nasnav: Felat Zagros**
**Nav û Paşnav: Behnam Azizivend**
**Dîrok û Cihê Jidayikbûnê: 1986/Urmiye**
**Navê Dayikê: Caziye**
**Navê Bav: Arafat**
**Dîrok û Cihê Tevlîbûnê: 2001/Urmiye**
**Dîrok û Cihê Şehadetê: 13-15’ê Sibata 2012’an li Botan-Besta**

## Heval Felat Zagros

Felat ji Rojhilatê Kurdistan, bajarê Ûrmiyê bû. Zarokê malbateke welatparêz a eşîra Xelîfî bû. Ûrmiye ji dîrokên pir kevnar ve di navbera gelên Kurd, Ermen, Aşurî û Azeriyan de mîna bajareke navnetewî lê hatiye û gelek çandan di nava xwe de dihewîne. Baweriyên Zerdeştî-Êzîdî, Mesîhî û Misilman lê tên jiyîn.

Bi navçeya Geverê ya girêdayî bajarê Colemêrgê re, yanî bi Bakurê Kurdistanê re hemsînor e. Lê belê van sînoran ti carê nekarîne çanda welatparêzî û nasnameya wê ya netewî parçe bikin. Ûrmiyeyê ti carê xwe ji dewleta Îranê nedîtiye û sînorên çêkirî nas nekiriye. Aborî û debara jiyana gel herî zêde ser kolberî û qaçaxçîtiya sînoran dimeşe. Bi rêya qaçaxçîtiyê çand, huner û berhemên vî aliyê sînor derbasî aliyê din dibin. Jixwe beşek ji malbatên hemû şêniyên Ûrmiyê li Colemêrg, Wan û Agiriyê dijîn. Tim qaçax, bêpasaport û bi destûra fermî ya dewletê serdana hevdu dikin. Bi van rêbazan sînorê ku li ser axa Ûrmiyê hatiye avakirin dirûxe û hildiweşe.

Ûrmiyê mîna hemû erdnîgariya Kurdistanê, bilind e. Ûr di zimanê kevnar ê Mêzopotamyayê tê wateya bilind. Miye (Miyah) peyveke Erebiye û bi wateya gelek av'aye; Ûrmiye=Avên Bilind. Xwezaya wê

çiyayî, şîn û hênike. Aliyeke wir daristan, aliyek zozan e. Ji şêniyên Ûrmiyê tenê Kurd qaçaxçîtiya ser sînor dikin û tevî hemû êrîş û qedexekariyên dewleta dagîrker jî vî karî weke çandeke demokratîk û aboriya komînal bi berdewamî dimeşînin. Lê di kêleka vê de, çandinî û berhemên axê, ajaldarî, bazirganî û hunerên destan ên navxweyî jî di asteke girîng de hene. Ji ber vê, Ûrmiye di navbera gelên wir û derdor de weke navendeke bazirganiyê jî tê naskirin.

Ûrmiyeyê welatparêzî weke sermayeya herî birûmet li ser dîroka xwe neqişandiye. Raperîn û berxwedanên Kelha Dimdim, Bedirxan Beg, Şêx Seîdê Pîran, Simkoyê Şikak, Îhsan Nurî Paşa, Komara Mehabad û Doktor Evdurehmanê Qasimlu şopên xwe li wir hiştine. Bi bandora van raperînan gelê Ûrmiyê li hember dewletên Îran, Osmaniyan û Komara Tirkiyê li ber xwe dane û hewl dane nebin amûrê destê hîç yek ji wan. Salên 1979-1980´an Şehîd Kemal Pîr û Şehîd Mihemmed Karasungur serdana vê herêmê dikin. Bi vî awayî gelê wir PKK'ê nas dikin û himêzê jêre vedikin. Bi naskirina PKK´ê re gelek ciwanên xeta sînor a navbera Rojhilat û Bakur ji salên 1983'yan û şûn ve tevlî refên gerîla dibin.

Ji ber vê nasnameya berxwedanê ya Ûrmiyê, dewleta Îranê wir cîdî girtiye û bi siyaseteke taybet nêzî wir bûye. Hewl daye li wir Kurd û Azeran li hember hev rake û wisa bike ku ev her du gel qet pirsgirêka xwe bi dewletê re nebînin, berovajî, bi hevdu re pirsgirêkan jiyan bikin û li hevdu bibin dijmin û neyar. Dewlet dema dibîne ku ev gel bi sedan sale bi hev re bêpirsgirêk dijîn û nasnameya netewî ya hevdu dipejirînin û ji ber vê jî siyaseta wî vala derdikeve, îcar hewl dide bi rêya nakokiyan bixe navabera baweriyên wan gelan de, da ku Kurdên Sunnî û Azerên Şîe li hember baweriyann hev rabin polîtîkayên taybet dimeşîne. Bi rêya cehş û cerdevanên herêmî xwestiye nasnameya Kurdînî bêreng bike û nasnameya “welatîbûna dewleta Îranê” bide pêş. Ji ber ku dewlet bi nermî dilîze hin caran civak bi van lîstokan nahese jî.

Felat di vê Ûrmiyeya dewlemend de, di nav van nakokiyên ku dijmin davêje navbera gelan de mezin dibe. Jiyana wî di nav kedê de derbas dibe. Biçûke û nikare tehlîl bike, lê ji ber ku ji zaroktiyê ve PKK nas kiriye ji stuxwariyên derdora xwe yên li hember dewletê jî razî nîne. Dema ku Rêber Apo di sala 1999'an de bi pilangeriyeke navdewletî hat dîlgirtin, Felat zarokeke sêzdeh salî ye. Di dilê wî yê

biçûk de jî mîna her ciwan, pîr, zarok û miroveke Kurd agirê şoreşê pê dikeve û pêt dide. 15'ê Sibata 1999'an dilê her azadîxwazeke Kurd û ne Kurd birîndar û tijî kîn û nefret kiribû. Dibê qey wê salê tevahî dîrok, tevahî cîhan û tevahî gerdûnê lanet li Kurdan anîbûn. Kurdan jî êşên vê lanetê dikişandin!

Felat wê demê ji gelek tiştan fêm nake, lê ji kûr de hîs dike ku gelê wî jan girtiye; janeke dîrokî û bêderman! Wate nade ku çima li bajarê wî, bajarên derdor, çar parçe Kurdistanê, bajêrên dewletên dagirker, heta li Asya, Ewrûpa û Emerîka jî, li derve û li zîndanan gel dema li dijî dîlbûna Rêber Apo raperîn, serhildan, protesto, xweşewitandin, qêrîn û nalîn dikin dikevin ber zextan û êrîş li ser wan çê dibin. Wate nade van bûyeran. Yekane tişta ku ji dilê xwe yê biçûk qenaetê pê tîne ewe ku dinya hemû dijminê Kurdan e û naxwaze Kurdeke azad li ser axa welateke azad bijî û pêş bikeve. Ev gotin ji zaroktiya wî ve di guhên wî de hatibû xwendin û bibû guharê guhên wî. Lewre bi vê gotinê bersiva pirsên xwe dida.

Ji van rewşan hêrs dibe, kîn digire. Dilê wî ji nefretê tijî dibe û dikele. Dixwaze şer bike. Dixwaze çek rake, êrîşî dijmin bike û hemû dijminên gelê xwe bikuje û ji holê rake. Dixwaze toleke mezin hilde û Rêberê xwe azad bike. Van tiştan tev xeyal dike lê belê hêj biçûk bû û tenê dikarî hêsirên dayîkan û qêrînên nav raperînên 16'ê sibatê di dilê xwe de bikole da ku qet ji bîr neke û bi wan rondik û qêrînan ve girêdayî bimîne. Temen biçuk lê giyan, hest û hîs pir mezin in. Ew dilê mezin her diçe xeyal, fikir û lêgerînên wî jî mezintir dike. Hêviyên xwe bi çiyayan ve girê dide.

Heya sala 2001'ê ku temenê wî dibe panzdeh salî bi zorî xwe digire. Ew du salên derbasbûyî weke temeneke dûr û dirêj tê jê re. Biryara xwe dide: êdî ewê hew sebir bike! Gelek heval û nasên wî tevlî refên PKK´ê bibûn, derketibûn serê çiya û bibûn şoreşger. Ewê jî mîna wan bibûya şoreşger û şervanê Rêber, gel û welatê xwe. Ewê li hember hemû zilm û kedxwariyên dasepandî yên dijmin, herwiha li dijî hemû cure paşverûtî û xiyanetên heyî yên di nav gelê wî de, şer û têkoşîn bikira. Dizanî ku bi qasî hovîtiyên dijminên derve, destê xiyanetkarên Kurdên noker jî di pilangeriya navdewletî ya 15'ê Sibatê de hebûye. Lê belê nedizanî ku çend sal şunde tam di salvegera vê pilangeriya bilanet de, ewê bixwe jî bi destê hejmarek dagirker û

xayînek ku berê jê re “heval” gotibû tevî 14 rêheval û hevdozên xwe wê bê şehîd xistin...

Felat di nav partiyê de di warê leşkerî de zû xurt dibe û pêş dikeve. Li qadên Xinêrê, Qendîl, Behdînan û Botanê dimîne û heya asta fermandariya yekîneyê erk radike.

Di navberê de çend salan li Botanê di şert û mercên pir zor, zehmet û teng de dimîne. Cara duyemîn û dawî di payîza sala 2010´an de  vegeriya Bakurê welat, qada Botanê.

Cara destpêkê di xeta Botan-Garzanê de ji gelek komên rêwî re rênastî(quryetî) kiribû. Ew ji hemû metirsî û xeteriyên xwezayî û dijmin parastibûn. Barê hevalên westiyayî ji wan girtibû û bixwe rakiribû. Li çiyayên Artos, Kato Xelîla, Masîro, Kato Marînos û Kato Jîrkayê pir geriyabû û her der baş nas kiribû. Felat weke dayîkê li çiya û taybet jî li şikêr û tehtan dinêrî, ji ber ku dizanî ew, rêheval û parastgeha gerîlane. Hezaran carê di her demeke pêwîst de mîna zarokekê xwe avêtibûn himêza vê dayîkê. Carna ji bo xweparastina ji têhna bişewat a tavê xwe avêtibûn siya fireh a şikêran. Carna jî ji ber obîs, hawan, balefir, kobra û tankên dijmin xwe avêtibûn nav tehtan. Gelek caran jî kevir ango tehteke biçûk ji xwe re kiribûn çeper û tê de bi dijmin re şer kiribûn, şerê parastina rûmet û nirxên mirovahiyê.

Felat piştî çend sal pratîkên germ ên li Bakur, vegeriyabû Herêmên Parastinê yên Medyayê. Wan deman li wir şerê bîrdozî, rêxistinî û siyasî pir xurt û di asta herî bilind de bû, lê şerê çekdarî li pêş nebû.

Felat jî mîna Hemze bedena wî li Başûr bû, lê hizir û hest ti carê ji Bakur venegeriyabûn. Li Botanê gelek rêhevalên wî li ber çavên wî şehîd ketibûn. Bi wan şehîdan re ji nêz de jiyan kiribû û beşek ji wan li kêleka wî, li ber çavên wî û li ser destên wî can û henaseya xwe ya dawiyê dabûn. Ji ber vê jî pir bêriya Botan û Garzanê û bîranînên wan deman dikir. Erdnîgarî û gerîlatiya Bakur her tim bala wî dikişand û ew evîndarê xwe kiribû.

Hestên netewî pê re pir xurt bûn. Di nav jiyana PKK'ê de li ser bingeha hişmendiya ku ji Parêznameyên Rêber Apo werdigire sînorên herêmî di zîhin û mejiyê xwe de têk dibe. Salên ku li Bakur mabû ji gelên Kurd, Aşur û Ermenên wê derê pir hez kiribû. Hestên welatparêzî û dostaniya wan gelan pir bala wî kişandibû û bandor lê kiribû. Evana hestên wî yên netewî û navnetewî hîn xurttir kiribûn. Êdî sînorên ku

dijminan di navbera çar parçeyên Kurdistanê û gelên Kurdistanî de danîbûn li ba wî ji zû de wateya xwe winda kiribûn.

*****

Sala 2010'ê bû. Pêngava Şerê Gel ê Şoreşgerî di rojeva rêxistinê de bû. Berxwedan û şehadetên li Aqêr, Kato Marînos, Çelê û Şemzînanê bibûn mijara hemû guftûgo û civînên rêxistinê. Vana Felat zêdetir germ dikir û dehfî Bakur dida. Dema ku ew li Başûr bû, her tim pêşniyara vegera ji bo Bakur kiribû. Armanca wî serxistina pêngava nû û binxistina dijmin bû; ji ber ku dizanî dawîhatin li dîlbûna Rêber Apo, azadiya Kurdistanê û damezrandina Netewa Demokratîk bi binxistina



dijmin ve girêdayî ye. Lewre kudera Bakur be ji bo wî ferq nedikir. Di encamê de, sala 2010'ê pêşniyara wî ji aliyê rêxistinê ve hat pejirandin û payîzê ji bo cara duyem derbasî Botana hesreta xwe bû.

Di vesaziya ku li Botanê çê bû de, cihê wî li Kato Xelîla hate destnîşankirin. Ew Katoya ku nas û dostê wî yê kevin bû û gelek caran jê re dayîktî kiribû. Katoya ku bi çiyayê Artos re hezaran sal beramberî hev rawestiyabûn li hevdu dinêrîn, lê ti carê negihîştibûn hev. Ew Artosa ku bi bilindahiya xwe dilê ezmanan kun dikir.

Pêvajoya ku Felat çû Botanê qonaxa bêçalakîtiyê bû. Derengiya payîzê bû û di demeke kurt de ketin kampa zivistanê. Di kampê de guftûgoyên kûr û dûr ser pratîka sala 2010´an hatin meşandin, rexnedayîn hatin pêşxistin. Vana bi giştî ji bo Felat jî bûn ezmûn û prespektîfên pratîka sala pêşiya wan.

Wê zivistanê ji hin mijaran re watedayîn ji bo wî zehmet hat. Ji ber vê, hin tengasiyan jiyan kir. Lê bi alîkariya hevalên din hewl da wan zehmetî û tengasiyan derbas bike. Ji ber wan pirsgirêk û tengasiyan, li hember Rêbertî û baweriyên ku Rêxistinê dabûyê xwe tewanbar didît. Bi van hestan hê zêdetir hêrsa serkeftinê di wî de bilind dibû; serkeftina di jiyanê de wê di şer de jî serkeftin bi xwe re bianiya. Biharê li ser van bingehan soza xwe da û derket pratîka sala 2011'an. Di vesaziyên nû de cihê wî ji bo eniya Besta, alana Şehrîbanê, li ser taximê hat destnîşankirin.

Taxima Şehrîbanê ji sê tîman pêk dihat; tîmek hevalên jin û du tîm jî hevalên xort bûn. Taxima wî wê ji van hevalan pêk bihata: Rewşen Sêrt, Zîlan, Havîn, Hêvî, Serhed, Azad, Mehsum, Demhat, Rênas Mehabad, Cudî Sêrt, Dilsoz Wan, Çekdar Beşîr.

*****



**Nasnav: Azad Çiya**
**Nav û Paşnav: Murat Karataş**
**Dîrok û Cihê Jidayikbûnê: 1975/Sêrt**
**Navê Dayikê: Hilye**
**Navê Bav: Medeni**
**Dîrok û Cihê Tevlîbûnê: 2002/Mêrdîn**
**Dîrok û Cihê Şehadetê: 13-15’ê Sibata 2012’an li Botan-Besta**

**Heval Azad Çiya**

Azad ji navçeya Misircê ya girêdayî bajêra Sêrtê bû. Dewleta Tirk weke hemû deverên din ên Kurdistanê navê wir jî guhertiye û kiriye Kurtalan. Navê gundê wan jî kiriye Gürgöze Ayak. Gundeke şîn, geş, tijî kaniyên xuroşan, bi bereket û bi berheme û bi van bereketên xwe tê naskirin. Azad li vî gundî ji dayîk dibe.

Sêrt bi giştî û di nav de navçeya Misircê jî ji destpêka şerê gerîlayî ve bi tevgera azadiya gelê Kurd re ne. Gelê wir pir welatperwerin û rihê xwe spartine nirxên ku li çiyayê Gabarê bişkivîne. Weke qiblegeha xwe li Gabarê meyzandine. Ew Gabara ku hêvî, evîn û bawerî di wan de careke din vejinand û şoreşa vejînê dest pê kir! Bandora pêngava 15’ê Tebaxê li ser tevahî herêma Sêrtê bi lez belav bûye. Gelê navçeya Misircê jî ji hîngê ve bi bandora wê tevlî şoreşa azadiyê bûne; malên xwe jê re vekirine û zarokên xwe weke şervan danê.

Malbata Azad jî yek ji wan malbatên welatperwere ku êşên giran ji dijmin û neyaran dîtine. Ne radestî dewleta dagîrker bûne, ne radestî çete û xwefiroşên herêmê û Kurdên xayîn û paşverû bûne. Ji dil nêzî tevgera azadiyê bûne û hewl dane ku di erkên xwe yên welatperweriyê de li paş nemînin.

***Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!***

Azad bi waneya welatparêziya malbat û herêma xwe mezin dibe û tê perwerdekirin. Sala 1994'an ku pilana tevkujî û koçberkirina Kurdan li Bakurê Kurdistanê giran dibe, Azad ku ciwaneke Kurd e, hê zêdetir tevgera Apoyî nas dike, xwe nêzî wê dike û li herêma xwe hêdî hêdî dikeve nav xebatan. Bersiva ku ew li hember van kiryarên kirêt ên dijmin dide himêzkirina ala xebat û têkoşînê ye. Heşt neh salan di nav baskê ciwanan ê HADEP û DEHAP'ê de aktîf rol dilîze û berpirsiyartiyê radike. Çend salan li herêmên cihêreng van xebatan dimeşîne.

Ji ber aktîfbûna zêde hem di xebatên rêxistinkirina ciwanan û hem di çalakiyên dijî polîsan de dikeve ber bala polîsan û tê lêgerandin. Çend caran dikeve binçavan, çend caran jî tê girtin û dikeve ber dadgehan û nav girtîgehan. Lê belê tevî ewqas zext û êşkenceyên ku lê tê kirin jî, ne di binçavan de, ne jî di girtîgeh û dadgehan de qet gotineke mikurhatinê ji devê wî dernakeve. Dijmin bi heman rêbazên ku li hember hemû ciwanan bi kar tîne pir hewl dide ji wî îtîrafkar û sîxûrekê derxe ango wî di xebatan de lawaz, bêreng û marjînal bike. Lê hemû hewlên wan vala derdikevin; çi dikin nikarin bi kesayeta wî bilîzin, kesayeta wî xira bikin û bişkînin, tîpekê ku dixwazin ji wî derxin, gotinekê ji devê wî bikşînin û tu tiştekê ser wî îsbat bikin; ji ber ku ew ne tenê nahêle polîs bi çarçova kar û xebatên ku ew bixwe aktîf di nav de cih digire bihesin, herwiha ser ti kesê û ti xebatekê ti agehiyekê jî nade wan. Lewre demdirêj di binçavan û girtîgehan de namîne û di demên kurt de tê berdan.


Piştî ku ji binçavan ango girtîgehê derdikeve bêyî dudilî careke din dikeve nav xebatên xwe û ji cihê ku dijminî bi dîlgirtin pê daye berdan, karên xwe berdewam dike. Piştî demekê careke din tê binçavkirin an jî girtin, lê careke dî nahêle tiştek ser îsbat bibe û tê berdan. Piştre dîsa vedigere ser xebatên xwe. Çend caran ev bûyer bi vî awayî ser wî dubare dibin. Lê ev, qet bandor li biryardarî, têkoşîn û xebatên wî nakin. Berovajî, li şûna lawazkirinê, wî xûrttir, bibiryartir û qayîmtir dikin.

Pilangeriya navdewletî ya 15'ê Sibatê ku di kesayeta Rêber Apo de li dijî tevahî gelê Kurd hat pêkanîn, mîna her Kurd û ciwaneke dilsoz û nîştimanperwerên din bandoreke giran li Azad jî dike û wî dikşîne têkoşîneke hê xûrttir û çalakiyên hê radîkaltir. Bi demê re êdî çalakî û xebatên ku di bajêr de dimeşîne çiqasê aktîf jî be wî têr nakin û kula dilê wî yê ciwan sivik nakin. Lewra biryara tevlêbûna nav refên gerîla û

hilkişîna çiyayên bilind ên Kurdistanê dide. Ser vê bingehê sala 2002'yan xebatên xwe yên bajêr derbasî qonaxeke nû ku tê de hê aktîftir be dike; ji bo şer bi dijmin re gaveke hê mezintir û radîkaltir ber bi têkoşîna azadiyê ve davêje û bi ser Mêrdînê re tevlî refên gerîla dibe.

Di nav refên gerîla de salên dirêj, yanî ji sala 2002 heya 2009´an li herêma Heftenînê ma. Di nav rêxistinê de di perwerde û xebatên leşkerî de bi aktîfbûn, atîkbûn û zekaya pratîkî, di nav perwerdeyên îdeolojîk-siyasî û jiyanê de jî bi rawestîna dirust, pîvanên partiyê, giyana rêhevaltiyê, exlaq û dilsoziya xwe hat naskirin. Exlaq ji bo her takekes û civakekê pîvana sereke ya jiyanê ye û bêyî wê ne gengaze mirov karibe kesayeta xwe ji xirabûnan biparêze; taybet di nav pergalekê de ku kêlî bi kêlî êrîşên herî dijwar û xedar ser kesayetan pêk tîne, hest û zîhna mirov bi tevahî ditevizîne û bêbandor dike, hem jî di nav civakeke mîna civaka Kurd de ku hatiye parçe parçekirin û tu rûmeteke mirovî tê de nehatiye hiştin! Parastina exlaq û cewhera xwe ya mirovî di civakeke wiha û di bin êrîşên pergaleke wiha de kareke hêsan nîne. Ked dixwaze ji bo ku mirov evqas xweşik, sade û paqij bimîne. Ji lewre ye ku di nav PKK'ê de ji xweşikbûna cewhera mirov re girîngiyeke taybet tê dayîn û xweşikbûn bi azadiyê re hemwate tê destgirtin.

Jixwe exlaq bixwe ev cewher û giyana ku sade û paqij maye û xira nebûye ye. Rêber Apo çand û exlaq weke pîvana herî sereke ya şoreşgerî daniye pêşiya tevgerê û bi vê gotinê feraseta xwe aniye ziman: “Ya şer dike azad dibe, ya azad bibe xweşik dibe, ya xweşik dibe tê hezkirin.” Li gorî vê; gerîlabûn yanî xwedî pîvan û exlaqê şoreşgerîbûnê û şerkirin bi aliyên xirabûyî yên kesayeta xwe re. Lewre derketina ser çiya û çek rakirin ji bo mirovekê têrê nake, piştî derketina çiya fêrbûna çand û exlaqê şoreşgerî şert û erka yekemîne ji bo gerîlayeke Apoyî.



***Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!***

Azad jî li ser bingeha van rêgezan kesayeta xwe wisa perwerde dike ku her dem li beramber Rêber, gel û rêhevalên xwe di rewşeke xwe lêpirsînkirinê de be. Li beramber tevgera azadiya jinê tevî ji xwe lêpirsînkirinên kûr û xurt tim pêdiviya rexnedayînê didît û xwe li hember pîvan û rêgezên jina azad berpirsiyar didît. Ji ber ku qenaet pê anîbû ku koletiya zilam pir kûre û azadiya wî ji azadiya jinê derbas dibe. Lêhûrbûnên wî di xeta Bîrdoziya Rizgariya Jinê de di asteke pir jor de bûn. Di vê mijarê de pir hewl dida Rêbertiyê bixwîne û fêm bike da ku karibe hevalên jin fêm bike û wan hîs bike.

Bi van lêgerînên xurt, di rih de bingeha rêhevaltiyeke rast bi jinê re danîbû û diket hewldana pêkanîna lêhûrbûnên xwe. Ev lêhûrbûn û lêgerînên xwe di rojnivîsa xwe de wiha anîne ziman: “Ez wisa difikirim ku jiyana herî watedar û birûmet ew jiyane ku tê de zilam xwe ji bo azadiya jinê feda bike.”

Azad dem dem di nav vê jiyana herî xweşik, hêja û pîroz a cîhanê de hin jin û xort didîtin ku dixwestin lekeyê li rûyê vê jiyanê bixin. Ji nêzîkatiyên dudil, bêîstîqrar û behanewar pir aciz bû. Ji rawestînên kolewar nefret dikir û pir pê têşiya. Li hember vana, ji bo parastina rêxistinê lêgerînên wî xûrttir dibûn. Tehlîl û şîroveyên Rêber Apo pir dixwendin. Di şîroveyekê de Rêbertî wiha digot: “Hûn ku bi rêxistinê re şer dikin gelo amadene ji bo ku rêxistin bi we re şer bike? Gelo hêza we heye ku vî şerî rakin?” Azad di çarçova lêgerînên xwe de ser van şîroveyan pir dihizirî û jê îlhama têkoşînê werdigirt.

Ji kesên wisa nefret dikir û ew hêjayî peyva “Heval” nedidîtin. Di rojnivîsa xwe de, hebûna wan kesan ya di nav vê jiyanê de pir bêwate nirxand û ser wan rawestînên lawaz, dudil û bêrêgez bi sernavê “Gelo Azadî Hêsan Bi Dest Dikeve?” helbestek nivîsand. Di dawiya helbesta xwe de jî nîşeyeke wiha danî: *“Milyonların gönlünde özgürlük savaşçısı olmak varken tek bir gönülde sevgiyi arayan zavallı ve aşağılık tüm erkek ve kadınlara.--Ji bo hemû jin û zilamên belengaz û ketî yên ku dewsa di dilê milyonan de bibin şervaneke azadiyê, tenê di dilekê de li hezkirinê diğerin...”*

***Ma Azadî Hêsan e? (Özgürlük Kolay Mı?)***

*Rehet bidest neketina azadiyê (Özgürlüğün kolay olmadığını)*
*ma Zîlanê nîşan neda (göstermedi mi Zilan)*
*bi xwe teqandinê? (kendini patlatarak)*
*Ma Semayê îsbat nekir (kanıtlamadı mı Sema)*
*bi xwe şewitandinê? (kendini yakarak?)*
*ma qey Berîtanê îsbat nekir (ispatlamadı mı Beritan)*
*bi xwe avêtina ji zinaran? (uçurumdan atlayarak)*
*ma nîşanî me neda nehêsanbûyîna azadiyê ? (göstermedi mi bize özgürlüğün kolay olmadığını?)*
*Spartakus bi raperînê (Spartaküs isyan ederek)*
*ma nîşan neda? (göstermedi mi?)*
*Îsa bi li çarmixê hilawîstinê (İsa çarmıha gerilip)*
*qey bedel neda? (ödemedi mi?)*
*Qey Musa 40 salan nemeşiya (Musa 40 yıl yürümedi mi)*
*Tenê ji bo ku nîşan bide hêsannebuna wê? (sırf kolay olmadığını göstermek için?)*
*Ma Eyub sebrên mezin nîşan neda? (Eyüp büyük sabırlar göstermedi mi?)*
*qey Elî dadê fêr nekir (Ali adaleti öğretmedi mi)*
*ma qey Manî nebû gerdunî (Mani evrenselleşmedi mi)*
*ji bo nehêsanbûyîna azdiyê (özgürlüğün kolay olmadığını)*
*nîşan bide? (göstermek için?)*
*Ma heval Egîd fîşeka yekem li îxanetê neteqand (Egid yoldaş ihanete ilk kurşunu sıkmadı mı)*
*qey heval Mezlum bi mirinê li ber xwe neda (Mazlum yoldaş ölümüne direnmedi mi)*
*tenê ji bo azadiyê û jiyaneke azad? (sırf özgürlük ve özgür bir yaşam için?)*

Zimanê Azad jî mîna Aysel di helbestê de bi qasî wêjeya rojnivîsê xurt bû. Pir girîngî dida nivîsandina lêhûrbûn û bîranînên xwe û lênûsa xweya rojnivîsê, ji ber ku dema hest û hîsên xwe dinivîsand xwe pir azad hîs dikir. Hez dikir hemû hizir û hestên xwe bi rêya nivîs û helbestan bîne ziman, ji ber ku dizanî mirovên herî bihest ên vê dinyayê şoreşgerin; ti kes, ti hozan û hunermend, ti wênekêş û

nîgarkêş, ti helbestvan, ti romannivîs û wêjevanek nikare hestên şoreşgerekî ne bijî, ne bîne ziman, ne binivîse, ne bistre, ne biteyîsîne ser pelan.

Azad bi van taybetmendiyên xwe kesayeteke pir bihest û tijî bû. Gelek caran lêhûrbûn, helwest, red û pejirên xwe bi zimanê helbestê bilêv dikir û helbestên delal û tijî naverok û wate dinivîsand. Kesayet, bûyer û tiştên ku jê bandor dibû vediguhest nav rojnivîsa xwe û ew diteyîsandin ser naveroka helbestên xwe. Ji kesayet û şehadeta Heval Qadir Usta pir bandor bibû û gelek helbest û gotinên Heval Qadir ên girîng ku pir bala wî dikişand û jê hez dikir di rojnivîsa xwe de nivîsand. Herweha çend helbest ser şehîdan, evîna mezin û rast, gerîla, evîna qirêjbûyî û hwd nivîsand. Hin helbestên wî taybet ser Şehîd Zîlan (Zeyneb Kinaci) in û di hemû gotinên xwe de qala bandora ku kesayeta Şehîd Zîlan li ser wî danîye dike. Hemû bandor, fêmkirin û hestên xwe li hember wan bi awayê helbest û nivîsan dianî ziman. Di rastiyê de qala evîna xwe ya li hember jinên wisa mezin dikir û dixwest xwe bigihîne asta wan:

***ZÎLAN***

*Ez ji hemû şaxên jiyanê re derbas bûm (Yaşamın her dalından geçtim)*
*Min temenê xwe da azadiyê (Ömrümü özgürlüğe verdim)*
*Zîlan min navê te (Zilan ben senin adını)*
*Di pelên dîrokê de dît (Tarihin yapraklarında gördüm)*
*Tu hatî vegotin mîna dîrokê (Anlatıldın tarih gibi)*
*Di herikîna her demî de (Her zamanın akışında)*
*Rastiyekî ku nayê ji bîrkirin (Unutulmaz bir gerçeksin)*
*Di hemû pêşbirkên jiyanê de (Yaşamın her yarışında)*
*Ya tarîtiyê ronî dike (Karanlığı aydınlatan)*
*Ya tim xweşikbûnan diafirîne (Hep güzellikler yaratan)*
*Ji bo jiyaneke azad (Özgür yaşam için)*
*Canê xwe dide ber mirinê (Canını ölüme yatıran)*
*Zîlan Zîlan Zîlan (Zilan Zilan Zilan)*
*Her kêliyê di rêya te de ye gelê te (Halkın yolunda her an)*
*Tu rastiya ku neyê ji bîrkirin (Sen unutulmaz bir gerçek)*
*Kêliya herî xweşik a di jiyanê de (Yaşamdaki en güzel an)*



Azad di dawiya hemû helbestên xwe de çend gotinên Rêber Apo û kesayetên mezin ên din dinivîsandin û ev ji bo xwe weke adet lê kiribû. Di dawiya vê helbestê de jî gotinên Rêber Apo yên li ser kesayet û çalakiya Şehîd Zîlan nivîsandin û ew kirin çavkaniya îlhamê ji bo jiyana xwe ya şoreşgerî. Lêhûrbûn û lêgerînên wî ser jiyana rast û azadiya kesayetê her diçû kûrtir û xûrttir dibûn. Ji bo vê, gotina Rêber Apo ya “Çalakiya Herî Mezin Li Gorî Azadiyê Jiyankirin e” kiribû bingeha lêgerînên xwe, ser dihizirî û ji xwe re digot: “*Li şûna ku bibim şahê biheşta koletiyê, bila bibim agirê ku şeytan tê de dişewite.*” Ev gotin jî xist nav rojnivîsa xwe.

*****

Azad li rex lêhûrbûnên kûr ên îdeolojîk û jêhatîbûna xwe ya di warê wêjeyî de, di hunera wergeriyê de jî xwe pir pêşve biribû û di vî karî de serwer û jêhatî bibû. Zivistana 2009-2010'an li Akademiya Şehîd Heqî Karer Parêznameyên Rêber Apo ji bo pêkhateya Akademiyê ji Tirkî wergerandin Kurdî. Dizanî ku ji bo karibe rast wergerîne, pêwîste destpêkê bi xwe Parêznameyan rast fêm bike. Lewre hemû lêhûrbûna xwe bi Parêznameyan ve kilîd kir û hemû hêza xwe ji bo fêmkirin û kûrbûna di Parêznameyan de xist tevgerê, da ku vî karî serkeftî bike û heqê wê bidê. Bi şev û navbera nîvroyan ji wextê xwe ya şexsî vediqetand û Parêzname carekê ji xwe re dixwend, da ku di perwerdeyê de karibe rehet bi hevalan bide fêmkirin.

Ji bilî vê, ji bo ku hem bixwe Parêznameyan baş fêm bike û hem jî karibe bi hevalan bide fêmkirin, li pey lêkolînan diket û li rex kûrbûna îdeolojîk û rêxistinî asteke zanistiya bilind bi dest xist. Lêkolînkirin ji bo wî evînek bû. Li pey diket, lê digeriya û mejiyê xwe diteqand heya tişta ku dixwest bi dest dixist. Bi awayeke ku cihê ew lê be dilê hevalan ji vê mijarê rehet bû ku perwerde wê kûr û xûrt derbae bibe.

Di kêleka ewqas zanabûn û kûrbûnê de pir jî dilnizim bû; di jiyan û perwerdeyê de bi hevalên xwe re dibû alîkar, meraqên xwe venedişartin û bi rêya pirs û guftûgoyan daxwaza xwe ya fêrbûneke hê zêdetir ji hevalan re diyar dikir. Li ser bingeha çand û exlaqê rêhevaltiya PKK´ê fêr nebibû xwe di ser kesî re bibîne. Bi vî awayî pêşî li wê digirt ku hevalên wî bi çaveke zana û mamoste lê binêrin û xwe li hember wî kêm hîs bikin.

Di dawiya dewreya Akademiya Şehîd Heqî Karer de pêşniyara çûyîna Eyaleta Amedê kir. Demek bû li ser Amedê lêhûrbûn dikir. Vê carê ev lêhûrbûn û daxwaza xwe weke pêşniyar ji rêxistinê re pêşkêş kir û li ser pêşniyara xwe pir israr kir. Tevahî giyan, hest, hizir û xeyalên xwe bi Amedê ve kilîd kiribûn. Ya rast eger Amed nebe jî kudera Bakurê welat bûya jê re ferq nedikir. Ji bo hemû qadên Bakur amade bû, lê eger Amed bûya jê re hê xweştir bû. Di encama israrên zêde de pêşniyara çûna Bakur bi rêxistinê da pejirandin. Lê vesaziya wî li gorî pêwîstiyên rêxistinî ji bo qada Botanê çêbû, ne ji bo Amedê.

Azadî bi şahî û kêfxweşiyeke mezin ev vesazî pêşwazî kir. Ha Amed, ha Botan. Ferq nedikir jê re. Di encamê de her du jî qadên şer bûn. Li gorî ku dijmin hemû axa wî dagîr kiribû, wê demê ferq nedikir li kuderê bi wî dijminî re rûbirû bihata. Armanca wî derbasbûna qadên şer û cihgirtina di nava şerê dijwar û germ ê li hember wî dijminî bû. Lewre Botanê şûna Amedê dadigirt ji bo wî.

Bi vî awayî bi erka fermandariya taximê derbasî qada Botanê, herêma Bestayê bû. Sala 2011'ê di taxima Şehrîbanê de cih girt.

*****



**Nasnav: Zîlan Serhat**
**Nav û Paşnav: Aygül Emine**
**Dîrok û Cihê Jidayikbûnê: 1982/Bitlîs**
**Navê Dayikê: Fidan**
**Navê Bav: Fahrettin**
**Dîrok-Cihê Tevlîbûnê: 1.10.2003/Wan**
**Dîrok û Cihê Şehadetê: 13-15’ê Sibata 2012’an li Botan-Besta**

**Heval Zîlan Ararat**

Zîlan ji bajarê Bedlîsê, ji navçeya Adilcewazê bû. Sala 1982'yan di malbateke welatparêz û oldar de ji dayîk dibe. Bi hestên welatparêzî, hezkirina gel, mirovhezî û di bin bandora kevneşopî û nerîtên hişk ên Îslamê de tê mezinkirin. Zîlan hê zarokeke yazdeh salî bû ku birayê wê yê mezin bi navê Selîm tevlî refên gerîla dibe. Ev dibe sedem ku welatparêziya malbata wê zêdetir bala dewletê û cerdewanên herêmê bikşîne.

Hê ji temenê zaroktiyê ve “jinbûn” û “Kurdbûn”ê her tim êş dabûnê. Di civakê de nasnameya jinbûna xwe nedîtibû. Li dibistanê jî nasnameya Kurdbûna xwe. Dema Zîlan zarok bû gelê herêma wan hinek pir welatparêz û xwedî gelek şehîd û gerîla bûn. Hinek jî çeteyên xwefiroş bûn ku dijî tevgera azadiya gelên Kurdistanê çekên dijmin rakiribûn û tevî leşkerên artêşa dagîrkera ya Tirk gelek caran çûbûn şerê gerîla. Heta li vê herêmê hin çete hebûn ku bêyî leşkeran jî pir caran diçûn ji gerîla re kemîn datînan û destên xwe têkilî xwîna şoreşgerên gelê xwe kiribûn.

Zîlan van nakokiyan baş dibîne û êşa wan ji dil hîs dike. Li ba wê, jan û azarên Kurdbûnê çiqas zêde bin, ên welatparêzbûnê hezar carê jê zêdetirin. Lê jan û azarên jinbûnê ango “bûna jina Kurd” ji vê jî kûrtir bûn. Zilma pergala zayendperest a zilam li ser jinê di destpêka jiyana wê de, ango ji zaroktiyê ve wê birîndar dike û dihejîne. Bêyî ku zarokatiya xwe têr jiyan bike, dikeve nav kemîna sînorên olî ya ku li pêşiya jiyana wê hatibû danîn. Zincîrên zayendperestiya zilam bi navê ol, edeb û exlaq yekemîn kemîn bû ku ji aliyê civak û dibistanê ve li mejî û hebûna wê hatibû gerandin.

Çanda xwezayî ya gund heya astekê wê serbest û di halê xwe de dihêle, lê piştî ku ling davêje dibistana talanker û derewîn, êdî ji bo wê her tişt diguhere; li dibistanê sînor ji dîtin, bihîstin, nas û fêmkirin û dinyaya wê ya zarokane re tên danîn. Dibê qey Zîlanê pêyê xwe avêtibû zîndanê ne fêrgeh û dibistanê! Ev, dibe nakokiyek ku mejiyê wê yê zarokane rehet bernade û xewnên wê dike kabus. Hêdî hêdî fêm dike ku di vê civakê de wê ti carê nekaribe wekî ku ji dilê wê tê azad bijî.

Rêber Apo piştî pilangeriya navdewletî bi armanca zemînvekirina ji bo aştiyeke mayînde di 2’yê Tebaxê de banga paşvekişîn û derketina ji Bakurê Kurdistanê li hêzên Bakur kiribû. Selîm'ê birayê Zîlanê jî wê demê li Bakur e. Koma wan dema dixwazin ji Bakur vekişin dikevin kemîna dijmin. Pevçûneke dijwar derdikeve. Selîm birîndar dibe û bi birîndarî dikeve destê dijmin. Di girtîgehê de Zîlan pir car diçe serdana wî. Bi rêya guftûgoyên ku di wan hevdîtinan de bi birayê xwe re dike tevgera azadiya gelê Kurd û jina Kurd baştir nas dike û nakokiyên wê bi pergala desthilatdar re kûrtir dibin. Di encamê de biryara xwe zelal dike û sala 2003'yan tevlî refên gerîla dibe. Bi vî awayî êdî ji pencên dijminê tepisîner û qirker û hemû zilmên ku heya wê demê ser wê hatibûn sepandin rizgar dibe û meydaneke nû ji bo jiyanê di rûyê wê de vedibe.

Zîlanê di nav partiyê de li ser daxwaza xwe her di nav xebatên leşkerî de cih girt. Tevî rêhevalê xwe Serhed çend salan di hin xebatên taybet ên rêxistinê de cih girt. Demekê li ba Heval Cuma jî li navenda rêxistinê bi hev re man. Lewre di warê rêxistinî û leşkerî de pir pêş ket û di xebatan de serwer bû.

Zîlan xwedî karaktereke bêdeng û kesayeteke tijî bû. Kêm diaxivî lê dema diaxivî bandor dikir, ji ber ku axaftinên wê xwedî naverok,

zelal û hîndekar bûn. Carna pir nerm, bi henek û rûken bû û derdor bi henekên xwe ji dil dida kenandin. Carna jî cidî, pêgihîştî, têgihîştî û asî bû. Li hember rastiyan dilnizim, li hember şaştiyan pir bêsebir û hişk bû. Ji rastgotin û dirustbûnê pir hez dikir. Rexneyên xwe bêyî fikarên şexsî, rasterast di rûyê hevalan de digotin. Li ba wê, rûrastbûn bingeha rêhevaltiya rast û xurt bû.

Gotina Rêber Apo ya “Rêhevaltiya herî rast ewe ku mirov eniya rêhevalên xwe bigihîne stêrkan” jê re bibû çavkaniya hest û îlhamê. Hezkirina xwe ya li hember hevalên xwe li ser vê rêgezê damezrandibû. Her tim amade bû serê xwe bide, lê ji gotin û parastina tiştên rast paşgez nebe.

Ji ber vî rihê germ, paqij û bêfikar carna bêrêbaz diket navê û uslûba wê hişk derdiket. Ya rast, Zîlanê hişk jî axivîba hevalên ku ew nas dikirin bi dil nedigirtin, ji ber ku dizanîn ew bi armanca parastina berjewendiyên rêxistin û dozê wisa dike. Dema bidîta hevalek ji uslûba wê êşiyaye jî yekser diçû lêborîn jê dixwest, rexnedayîna xwe didayê û dilê wê distend. Eger a ku jê êşiyaye hevaleke jin bûya mîna zarokeke saf û dilpak diçû eniya wê maç dikir û bi rexnedayîneke dilsozane her tişt ji bîra wê dibir. Gelek caran Zîlanê dema bi mebesta rexnedanê eniya hevalan maç dikir ji aliyê hevalên din ve hat dîtin. Ev dilnizmiya wê cihê wê di dilê her kesê de vedikir û nedihişt ti kes di dil de jê aciz bibe.



Zîlan hin caran zarokeke pak, netebitî û saf bû. Hin caran jî derwêşeke xwedî ezmûn, zana û lêgerînvan. Carna pir dilnizim, carna serhişk. Carna weke guleke geş û zarokeke rûken, carna weke mamosteyeke cidî û kûr û dûrçûyî. Hem mîna perperikeke temenkurt ku

dixwaze hemû xweşikahî û wateya jiyanê di temenê xwe yê çend roj û çend demjimêran de bijî, tijî evîn û hezkirin, hem jî mîna kêliya teqîna volqanekê tijî kîn û nefret! Baş dizanî kîjan wextê li kîjan derê, kîjan ji vana be.

Taybetmendiya welatparêziya malbatê, ew fêrî serhişktî, lêgerîn û îsyankariyê kiribû. Oldariya wan jî exlaq û edebeke civakî tê de pêş xistibû. Xwedî dinyayeke hûndirîn a pir mezin, rengîn û dewlemend bû, lê wê her tim xwe kêm didît. Murîdeke sade û girêdayî, rêhevaleke tijî hezkirin, şoreşgereke berpirsiyar, fedayiyeke bibiryar, zarokeke netebitî, ciwaneke bicoş û pêgihîştiyeke xwedî fikir û bername bû.

Sala 2007 û 2008´an li Botanê dijminî pir operasyon li dar xistin û gelek heval bi berxwedanên mezin şehîd ketin. Di şerên li Gabar û Bestayê de Heval Ekîn Sêwas, Heval Ararat, Heval Nûda Karker, Heval Gulbihar, Heval Dîdar Lêgerîn û hejmareke zêde hevalên din şehîd ketin. Zîlan bi van hevalan re mabû û ew ji nêz de nas dikirin. Ji şehadeta wan pir bandor bû û pir lê giran hat. Şehîd Ararat beriya biçe Botanê demekê fermandara taxima wan bû, lewre Zîlan pir pêve girêdayî bû û navê Şehîd Ararat weke paşnav rakir. Zîlan Bedlîs, bû Zîlan Ararat.

Bihara 2008´an dixwest biçe Botanê û tola Şehîdên Botanê hilde. Lê belê vesaziya wê ji bo Zagros, herêma Çarçêlayê(Gever) hat destnîşankirin. Zîlan li hember vê vesaziyê derneket, ji ber ku ew der jî Bakur û qada şer bû. Li wir tevlî gelek çalakiyan bû û di şer de tecrubeyeke girîng girt. Vê carê ji bo pratîka Botanê hê amadetir bû. Di her warekê de xwe ji bo Botanê amade kiribû û xwe bi vê hedefê ve kilîd kiribû.

Destpêka sala 2009'an pêşniyar kir ji bo ku rêxistin wê rêke Bakurê welat. Pêşniyara wê hat pejirandin. Bi tevî Serhed, Aysel û hejmareke zêde hevalên din tevlî duyemîn konferansa Botanê bû û ser bingeha prespektîfên ku ji wê konferansê derketin bi hev re derbasî Bakur, qada Botanê bûn.

Dema jê re hat gotin ku pêşniyara wê hatiye pejirandin ji kêfxweşiyan çavên wê birîqîn, lê di vê kêliya kêfxweşiyê de jî karî xwînsarbûna xwe biparêze. Hevalên ku pêre diçûn Bakur ji kêfxweşiya vesaziya xwe bênavber qîj û vîj kirin, keniyan, virde wirde beziyan û nekarîn di cihê xwe de birûnin, lê belê Zîlan mîna her tim pir xwînsar nêz bû û hemû kêfxweşî û hestên xwe di awirên xwe yên geş û çavên

xwe yên birîqî de dan der. Xwînsarî û birîqîna çavên wê bala her kesê dikişand. Her kes mat mabû ku di kêliyeke wiha de Zîlan çawa dikare mîna kevireke giran û bêdeng, lê asî be û hebûna xwe bi van taybetmendiyan diyar bike. Her kesê di awirên wê de didît ku eşq û evîna çûna Botanê di wê de biryara têkoşînê hîn xûrttir kiriye.

*****

Zîlan û Rojbîn Mahîr bi hev re di nav komekê de derbasî Botanê bûn. Ji ber ku fîzîka Rojbînê hinek lawaz û temenê wê jî hinekî mezintir bû beriya ku koma wan bi rê keve hevalên dî Zîlan di derheqê Rojbînê de hişyar kirin da ku di rê de alîkariyê bide Rojbînê û nehêle Rojbîn pir zoriyê bikşîne.

Lê belê di rêya ku çend şevan ajot de berovajî gumanan, Zîlanê pir zorî kişandin. Pir zorî dida xwe, lê her li paş dima. Car caran ji bo ku bikare rehet bimeşe û zêde neweste Rojbînê û hevalên din çek, rext û çenteya wê jê digirtin. Heta demekê hingî zorî kişand ku bi zorî bêhin digirt û dida. Vê jî giranî li gurçikan û kezaba wê dikir û jan didayê. Dibê qey dê gurçikên wê biteqiyana. Ji bo ku karibe rehet bêhin bistîne û rehet bimeşe hevalên din yeleg û şutika wê jî jê girtin. Dema ku şutik û hemû giraniyên ser wê jê hatin girtin, sivik bû û henase û bêhna wê rehet bû.

Koma wan ji Deriyê Apociyan ve ket Kato Jîrkayê. Hilkişîna Deriyê Apociyan ji bo hevaleke wisa westiyayî û bêtaqet pir zor bû. Ji ber ku hevalên din hemû bi barên giran bûn û tevî vê barê wê jî rakiribûn pir şerm dikir. Dema barê hevalên din dît çend caran xwest tiştên xwe ji wan bigire lê hevalên ku didîtin çokên wê nagirin, nedanê û her bixwe rakirin. Zîlan ji vê hevaltiya ku di van demên teng de bi wê re dihat kirin pir bandor bibû û di dilê xwe de hem şerm dikir, hem spas dikir, hem jî girêdana wê ya bi rêgeza rêhevaltiyê ve hê xûrttir dibû. Hîngî bandor bibû ku ji wê şûnde jî di her kêliyekê de rêgeza “hevaltiya demên teng” dida pêş, ji ber ku ji kûrahiya dil û bi hemû hebûna xwe ji vê rêgezê bawer dikir û pêve girêdayî bû.

A rast fîzîka Zîlanê pir xûrt bû û heta wê demê ti carê neketibû. Li çiyayên Zagrosê ku erdnîgariya herî hişk a Kurdistanê ye jî meşên dirêj û barên giran qet di xema wê de nebûn, ji ber ku ji fîzîka xwe bibawer bû, hevaltiya fîzîka xwe dîtibû û qet fîzîka wê ew tenê nehiştibû. Lewra ne ew bixwe, ne hevalên ku ew nas dikirin guman nedikirin di rêya

Botanê de zêde zoriyê bikşîne. Zîlanê berê pir caran di meşê de alîkariya hevalan kiribû û barê wan rakiribû. Lê vê carê hevalên wê alîkarî didanê. Ji ber vê pir ji xwe aciz bû. Taybet jî li hember Rojbînê pir şerm dikir, ji ber ku di vê rêyê de pir caran, taybet jî di rampeya Deriyê Apociyan de Rojbînê çek û rextê wê jê girt û bi vê fîzîka xwe ya lawaz bi demjimêran jê re rakir.

Zîlanê ji ber viya hem êşa wîjdanî dikişand, hem jî bi halê xwe û Rojbînê dikeniya; Rojbîn hem bi temen çend salan ji wê mezintir bû, hem jî fîzîka wê lawaz bû û bi vê sedemê heya sala 2009´an pêşniyara wê ya ji bo çûna Bakur ji aliyê rêxistinê ve nehat pejirandin. Pir şerm dikir ji ber ku bixwe jî qet guman nedikir ku têkeve rewşeke wisa ku hevalên din, taybet jî Rojbîn alîkariya wê bike, hem jî di rampeya Deriyê Apociyan de.

Ji bilî alîkariyên fîzîkî, car caran jî hevalan bi rêya henek, vegotina bîranîn, xeyal û bernameyên xwe hewl didan westandinê ji bîra wê bibin. Henek û moraldana hevdu di rewşên herî tengav de rêheval û alîkariya herî başe ji bo mirov û zorî û zehmetiyan jê re hêsan dike. Gerîla di van mijaran de xwedî pir ezmûn û tecrûbeyên mezin in. Lewra hesasin û dema bibînin hevalek çi di aliyê fîzîkî, çi di aliyê derûnî û hizrî de bi tengasiyekê re rûbirûye hewl didin bi rêbazên cihêreng mîna henek, bîranîn, parvekirina nêrîn û hwd. westandin û tengasiyan ji bîra wê/wî bibin. Ev, nîşana hezkirin, hevdu hîskirin û rêza li hember hevaltî û hevdu ye û hevaltiya navbera wan xweşiktir, germtir û tijî manewiyat dike. Hevalên ku bi Zîlanê re derbasî Bakur dibin jî wê hîs dikin û hewl didin erkên rêhevaltiyê li hember wê pêk bînin.

Hê li Başûr vesaziya Zîlanê ji bo Taximeke Hereketlî hat diyarkirin. Zîlan sekvan û nîşangireke xurt bû û qernas radikir. Heya bihara 2011'an ku çû taxima Şehrîbanê her di Taxima Hereketlî de bû.

*****

Zivistana 2010-2011'an di kampê de li kêleka perwerdeya rojane û bipergal a bîrdozî, hefteyê du şevan jî perwerdeya xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî, zaravayê Kurmancî dihat dîtin. Fermandariya kampê Heval Qehreman Erdal, Arjîn Dersîm û Ezîme Denîz bûn. Heval Azad Hebûn û Heval Herekol Sîlip jî di vê kampê de bûn.

Carekê Zîlan pêre negihîştibû xwe ji bo waneya ziman amade bike. Heval Evîn Zana jê pirs kir ku gelo xwe amade kiriye û ferhengoka ku



cara berê mamoste dabûn jiber kiriye yan na. Zîlan amadenebûna xwe qet bi rûyê xwe neanî û got: “Erê heval Evîn. Çawa! Min xwe amade kiriye.”

Evîn: “Ê... ka were em peyvan ji hevdu bipirsin beriya perwerde dest pê bike. Em binêrin ka di bîra me de maye yan na.”

Zîlan: (bi awayeke ji xwebawer) Destpêkê tu ji min bipirse. Ez bersiva te bidim. Piştre ezê bipirsim, tu bersiv bide.

Evînê dest bi pirsan kir. Zîlan heya bersiv dida çend saniye derbas dibûn, hinek jî qet nedizanîn û şaş bersiv dida. Evînê got: “Eger nizanî bersiv nede. Bêje nizanim, lê şaş bersiv nede.” Lê Zîlanê dîsa jî nezanîna xwe bi rûyê xwe neanî û got: “Ez hemûyan dizanim. Carna tevlîhev dikim, lê hemûyan dizanim.” Hevalên ku li wan guhdar dikirin ji vê gotina Zîlanê ji kenan mirin.

Evînê pirseke din kir: Wêne çiye?

Zîlan: Fotograf.

Evîn: Wane çiye?

*Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!*

Zîlan hinekî bêdeng ma û im im kir, wateya wê nedizanî. Fikirî ku wêne û wane peyvên nêzî hevin û dişibin hev. Naxwe wateya wan jî pêwîste nêzî hev be. Bi kêfxweşiya ku bersiv dîtiye ji nîşkave got: Fotograf makînesî (wênegir)!

Êdî bi vê bersivê re ji hevalên li derdor bûn kesê nekarî xwe bigire. Dengê pilqîna kenê hevalan bilind bû. Evîn ku pir bi tinaz bû û her tim dikeniya bi keneke bilind got: “Ey xwedê bela xwe nede te. Te îşev em ji kenan kuştin. Mamoste ji derdê te întîhar nekin başe...”

*****

Zîlan û Norşîn Efrîn, birayên wan herduyan di girtîgehên Tirkiyê de bûn. Qet bernameya Tîrêjên Rojê ku rojên çarşem û pêncşeman di Radyoya Dengê Mêzopotamyayê de dihat weşandin ji guhdarkirinê nedidan û her tim dişopandin. Geh nameyên birayên wan û girtiyên din ji wan re dihatin, geh navê xwe di nameya hin hevalan de dibihîstin û silavên wan werdigirtin. Eger jî bixwe name şandibana nameya xwe dişopandin.

Navê birayê Zîlanê Mihemmed Siddiq (Selîm), navê birayê Norşînê jî Mihemmed Îsmal bû. Carekê Norşîn ku pêre negihîştibû rêznava nameyên ku wê bên xwendin bişopîne ji Zîlanê pirs kir ku gelo wê guhdar kiriye yan na. Zîlanê dîsa henekên wê girtin û got: “xwedê, Mihemmedek derbas bû, lê nizanim Mihemmedê te bû yan yê min.” Hevalên li wir pir kêfa wan ji vê heneka Zîlanê re hat û keniyan. Piştre Zîlanê dewam kir û got: “Ezê ji birayê xwe re nameyekê bişînim. Ezê bibêjim Serokatî di Parêznameyê de qala Şoreşa Wîjdan dike!” Heval êdî nekarîn xwe bigirin, ji kenan re zikê xwe girtin. Zîlan bixwe jî têra xwe keniya.

Carekê jî payîzê beriya bikevin kampê her yekê nameyeke din şandin. Name bi hev re şandin, lê zivistanê tenê nameya Zîlanê di radyoyê de hat weşandin. Rojekê di destpêka bernameyê de dema pêşkêşvan rêznava nameyên rojê dixwend, navê Zîlan jî derbas bû. Hê gotina pêşkêşvan neqediyabû ku Zîlan ji kêfxweşiyê rabû dîlanê. Du şervanên nû û ciwan bi navê Sarya Botan û Hebûn Têkoşîn li ba wan hebûn. Zîlanê mîna her tim destê herduyan girt û rakirin dîlanê. Bejna herduyan kurt bû, bejna Zîlanê jî pir bilind bû. Hebûn û Sarya heya nîvbejna Zîlanê dihatin. Zîlan ket navbera wan de û dest bi govendê kirin. Di navberê de strana “Bijî Bijî Partiya Karkerên Kurdistan” digot û

dîlan geş dikirin. Tenê sê kes bûn lê dibê qey ew kamp tev dîlanê dike, wisa deng derdixistin.

Evîn û Norşînê gazî wê kirin û gotin: “Were nameya te niha tê xwendin.” Zîlan bilez hat rûnişt ber radyoyê û li nameya ku ji birayê xwe re şandibû guhdar kir. Dema name qediya got: “Ê, jixwe min bixwe nivîsandibû. Min dizanî çi tê de ye. Min çima guhdar kir?” Bi vê henekê careke dî serket ku hevala bide kenandin. Hinekê bi Norşînê re ser vaya ku “name bi hev re çûn, çima nameya Norşînê nehat xwendin” axivîn. Piştre Zîlan kûr çû û got: “Tu bêjî niha Selîmê min çi dike! Ev nû du heyve em ketine kampê û nikarin derve bibînin, sebra me nayê. Serokatî û hevalên girtî çawa dikarin hêz bînin!”

Norşînê got: “Niha Selîmê te li nameya te guhdar kiriye û kêfxweşe. Tu bêjî Mihemmed Îsmaîlê min çi bike...” Hevalên din ku hemû bi wan re rûnîştibûn jî li wan guhdar kirin û hestên wan parve kirin.

*****

Zivistana 2010-2011'an pratîka sala derbasbûyî, serkeftin û kêmasiyên wê, naveroka Pêngava Şerê Gel ê Şoreşgerî û gelek mijarên din li Kato Jîrkayê jî mîna hemû qadên din berfireh hatin nirxandin û prespektîfeke xurt ji bo pratîka 2011'ê hat derxistin. Zîlan, Ronahî û Serhed tevlî çalakiya Aqêrê bibûn û şehîdên vê çalakiyê nas dikirin. Ronahî sala 2008´an bi Şehîd Qehreman, Şehîd Silav, Şehîd Hebûn, Şehîd Azad û Şehîd Aram re bi hev re ketibûn nav komên rêwiyên Botanê. Lewre ew ji nêz ve nas dikirin û hevaltiyeke germ çi li Başûr, çi li Bakur bi wan re parve kiribû. Zîlan jî sala 2009'ê bi Şehîd Herekol, Şehîd Şahîn, Şehîd Mehsum û Şehîd Elî re derbasî Botanê bibû. Bi Şehîd Qehreman û Şehîd Azad re berê demdirêj di xebatan de mabû. Li Bakur jî tevî Şehîd Silav sala 2010´an heya dema vê çalakiyê di Taxima Hereketlî de cih girtibû. Êş û jana van şehadetan çendî dilê Zîlan û Ronahî birîndar kiribe, ewqas jî kîn û nefreta wan li hember dijmin rakiribû û hêrs û peymana tolhildan û serkeftinê di wan de xurt kiribû.

Vê hestê dilê Serhed jî kiribû agirgeh. Wî jî ev şehîd hemû nas dikirin. Şehîd Qehreman, Şehîd Azad, Şehîd Şahîn, Zîlanê û Serhedî beriya ku biçin Botanê bi hev re di hin xebatên taybet de cih girtibûn, bi hev re li bal Heval Cuma jî mabûn û perwerde dîtibûn. Naskirin û rêhevaltiya wan bi hev re diçû salên kevin.

*****

Zîlan li Botanê heya bihara 2011'an  di Taxima Hereketlî de ma. Wê biharê piştî ku li Kato Jîrka perwerdeya kampa zivistanê derbas kirin, bi amadekariyeke xurt a rêxistinî û leşkerî bi tevî Ronahî û Havîn (ku di Taxima Hereketî de bi hev re bûn), Aysel û Arjînê daket Bestayê. Zîlan û Havînê li Şehrîbanê, Ayselê li Hêzilê, Ronahiyê jî dîsa di Taxima Hereketî de wê xebatên xwe domandibana.



**Nasnav: Serhat Binasan**
**Nav û Paşnav: Zanyar Merdon**
**Dîrok û Cihê Jidayikbûnê: 1985/Sine**
**Navê Dayikê: Behiye**
**Navê Bav: Muhammed**
**Dîrok û Cihê Tevlîbûnê: 2003/Sine**
**Dîrok û Cihê Şehadetê: 13-15’ê Sibata 2012’an li Botan-Besta**

**Heval Serhed Binasan**

Serhed sala 1985´an li Rojhilatê Kurdistanê, bajarê Sineyê tê dinyayê. Sine ango Sanandij (Senendec). Sanandij yanî Kelha Sanan. San di baweriya Yarsan de tê wateya pîr û zanayên mezin. Ji pîr û mezinên ku bi zanatiya xwe li ser bingeha exlaq û baweriya civakî civakê diparêzin û rêve dibin re dibêjin San. Dij jî tê wateya Kelh û Surên bilind. Sanandij ku niha di zimanê Farsî de bûye Senendec bi wateya Kelha Sanên mezin û zana ye. Sanandij di Kurdiya îroyîn de hatiye kurtkirin û bûye Sine.

Sine ji kevin de weke navendeke welatparêzî û raperîna Kurdan bûye û her dem bi serî rakirin û rabûna li hember dijmin û neyaran bala dijminan kişandiye ser xwe. Li hember hemû desthilatdar û şahên Îranê serî hildaye û ti carê radestî wan nebûye û serê xwe netewandiye. Tim weke wargeha berxwedan, raperîn û serhildanan rol lîstiye; ji raperînên Kurdî re malovanî kiriye û ji bo berxwedana li hember dagirkerî û qirkirinê barê pêşengtiytê rakiriye ser milên xwe. Raperîna Erdalan'an li wir çêbûye. Helbestvana mezin a Kurd Mesture Erdelan ku weke Mahşeref û Şerefxana Kurdistanî jî tê naskirin ji wir

derketiye. Di şoreşa azadîxwaziya gelan a li dijî rejîma Şah de erk girtiye û ji bo ku li şûna înkar û dagirkeriyê azadî, yekîtî, aştî, wekhevî û demokrasî li welat serwer bibe, mîna hemû deverên din ên Rojhilatê Kurdistanê, gelek bedelên giran daye.

Welatparêzî ji gelê vê herêmê re bûye çanda herî mezin û binirx. Ji ber vê yekê rejîma komara dagirker a Îranê her tim hewl daye bi tinekirin û xirakirina vê çandê, vê sermayeya giranbiha ji destê gel bistîne, yan marjînal û bêbandor bike, yan jî ji holê rake. Bi vê armancê, helandina çandî, jibîrbirina uslûb û dîroka civaka xwe û xirakirina şêwaza jiyanê bi taybet li Sineyê weke çeka qirkirin û jenosîdê li dijî gel bi kar aniye. Evê meyla ji bo ziman, çand û şêwejiyana biyaniyan taybet di ciwanên vê herêmê de pir pêş xistiye. Yên ku çanda welatperwerî û Kurdîniya xwe hê jî bi hemû hêza xwe diparêzin dayîk, pîr û kalin.

Serhed Hewramî (Horam) bû. Li gorî vesaziyên erdnîgariyê yên dewletê, beşeke Hewramanê dikeve ser Sineyê û di warê îdarî de bi wir ve girêdayiye. Hor=tav, xor, hur. Horam=Gelê ku ji tavê bawer dike. Horaman=Welatê ku şêniyên wê tavperestin. “Horam” bi demê re di zaraveyên din ên Kurdî de wek “Hewram” guherîbe jî, ew bixwe her dibêjin “Horam.” Li Kurdistanê yek ji zarave û çandên ku herî zêde xwe ji xirabûn, helandin û tinebûnê parastiye zarave û çanda Horamî ye. Tevî ku beşeke sînorên di navbera Rojhilat û Başurê Kurdistanê de li ser sînga Horamanê hatiye danîn û Horaman bixwe di navbera du dewletan de hatiye parvekirin jî, gelê Horam qet nehiştine ev bandor li şêwaza jiyan û parastina çand û zimanê wan bike. Jixwe Rêber Apo bal kişandiye ser vê ku Horamî dayîka ziman û zaraveyên Kurdî ne.

Serhed paşnavê xwe ji navê ku malbata wî li erd û zeviya xwe kirine digirt; li herêma Hewraman ji ber girêdana zede ya bi ax û nirxan ve nav li bax, baxçe û zeviyan tê kirin. Malbata Serhed jî navê Binasan li erd û bax û baxçeyên xwe kirine. Ev navlêkirin têkilî û peywendiyeke germ di navbera mirov û axê de çê dike. Bi gotina din, mirov û xweza weke du beşên girîng ên gerdûnê hevdû temam dikin. Şêniyên vê herêmê vê bizanin jî nezanin jî, rastî ewe ku ev felsefe û çanda jiyana kevneşopiya Xwedawendane ku ew, li pey wê dimeşin.

Ev reh, resenbûn, kevnar û asîbûna çandî mîna Horamên din, bandoreke pir mezin li şêwegirtina kesayeta Serhed jî dike. Serhed bi vê çandê mezin dibe û wê dadiwerivîne hundirê xwe. Malbata wî ji

kevin ve pir welatperwerin û bi nirxên xwe yên civakî ve girêdayîne. Ji vê malbatê hejmarek ciwan tevlî refên gerîla bûne. Herwiha di kêleka vê de, kesên ku ji aliyê dijmin ve hatine xistin û ji doza gel hatine dûrxistin jî hene. Bêguman dijminî Horaman jî rehet bernedaye; lîstok li ser lîstokan li ser wan pilan dike, cerdewantî û nokeriyê heya asteke mezin li wir jî pêşve dibe, lê Serhed ne li mal û civakê, ne li xwendingehê qet ji van fend û fêlên dijmin bandor nabe.

Berovajî, çanda Hewramî ku pakî û sadeyî di wî de çandibû, ew fêrî têkoşîna xweparastina ji hemû xirabî û qirêjiyekê kiribû. Ji ber vê, bi van taybetmendiyan di nav civakê de jî, di nav PKK de jî di nav hemû dost û rêhevalên xwe de her tim hat hezkirin û karî bi lez di dilê hemûyan de ji xwe re cih veke.

Di nava civakeke ku evqas pê hatiye lîstin û hatiye xirakirin de, taybet jî di zanîngehên ku bûne navenda şerê taybet û qirkirina derûnî-çandî de Serhed çawa karîbû evqas paqij bimîne û nehêle bê helandin û xirakirin! Çawa karîbû ewqas cewherê xwe ji qirêjî û xirabûnên kesayetî biparêze! Ewqas pak û sade mabû ku hevalên jin û xort tev wek “melek” lê dinêrîn. Gelek caran hevalan dema qala wî dikirin digotin: “Serhed weke melekan e.” Dibe ku ev gotin ti carê di rûyê wî de nehatibe gotin û wî qet nirxandineke wiha li ser xwe nebihîstibe û hêvî nekiribe, lêbelê jixwe ya girîng jî ew bû ku di çavê hevalên xwe de kesayeteke wisa giran û bipîvane.

Serhed di nav hevalên xwe yên malê û dibistanê de bi exlaq, çand û zekaya zêde bal dikşîne. Li mal, civak, dibistan û zanîngehê siyaseta bombardimanwar ya dijmin li ser gel, çand, dîrok, ziman, vîn, kesayet, hest, raman û hemû nirxên civaka xwe dibîne û pê dihese ku ev yek, Kurd û nasnameya wî ji holê radike. Mezin difikire, şîrove dike û fêm dike. Êş û janên gelê xwe hîs dike. Fêm dike ku bi navê jiyanê, jiyanekî dijî ku kêliyeke wê nemaye ku dijmin dest neavêtibe wê. Nakokiyên wî pir zêde dibin, lê bersiva nakokî û hezaran pirsên ku di serê wî de çêdibin di rêxistin û partiyên ku ser navê gelê Kurd ê Rojhilat siyaset dikirin de nabîne. Lewma ji pêdiviya şoreşgerbûnê bawer dike.

Hewl dide PKK'ê nas bike. Pilangeriya navdewletî ya li ser Rêber Apo, serhildanên girseyî yên gelê Rojhilat bi giştî û gelê Sine bi taybetî, taybet jî êrîşên rejîma Îranê yên li ser raperînên gel û şehadeta hejmarek ciwanên welatparêz di wan raperînan de, bi taybetî li Sine,

bandoreke mezin li wî dikin. Piştî van serhildanan gelek xizim, heval, dost û nasên wî tevlî refên gerîla dibin. Evana tev dibin sedem ku Serhed zêdetir meyl ji PKK´ê re bibîne û xwe nêzî wê hîs bike. Bawer dike ku tenê di nav PKK´ê de dikare şoreşgertiyeke rast ji gelê xwe re bike. Bi vê biryar û peymana mezin sala 2003'yan tevlî refên gerîla dibe.

Serhed jî mîna Zîlanê kesayeteke pir bêdeng, lê pir tijî bû. Kesayeta pijiyayî û bêdengiya wî ti carê nekarî wî rihê wî yê zarok veşêre yan jî kêmreng bike. Serhed zarokeke netebitî bû ku tenê bejin avêtibû û dil û mejiyê wî mezin û dewlemend bibû, lê giyan û rihê wî mîna zarokeke biçûk saf, sade, paqij û xweşik mabû. Bejna wî pir bilind bû; ji bejinbilindên din yek jî nedigihîşt bejna wî. Jixwe Zîlan jî di nav hevalên jin ên Kato û Bestayê de ya herî bejinbilind bû. Ji ber vê, carna hevalên din bi bejna wan dikeniyan û bi henekî bela xwe li wa dixistin.

Serhed di gelek mijaran de pir hunermend bû. Di satrancê de serwer bû. Kes zû zû nedihat beramberî wî. Yên ku her tim li beramberî wî ser satrencê rûdiniştin hevalên mîna wî serwer bûn. Eger ji deh caran carekê Serhed bin biketa, ew jî balkêş bû û beramber kêfxweş dikir. Satranc hîngî bi ziravî û lêhûrbûn dilîst ku dibê qey bi rastî di meydana şer de ye. Her kesê hez dikir di dema satranc lîstinê de li wî temaşe bike.

Di ´Birê´ ku lîstokeke gerîlaye de jî wisa bû. Mîna xezalan atîk û lezgîn bû di bez, êrîş û xweparastinê de. Dema Birê bihata lîstin, Serhedî di kîjan taximê de cih bigirta ew taxim biserdiket, ji ber ku Serhedî dizanî dijmin çawa bixapîne û êrîşî paygehê bike, eger bixwe di paygehê de bûya jî dizanî çawa paygehê biparêze. Birê jî weke satrancê lîstokeke leşkerî bû û cidiyeteke leşkerî dixwest, naxwe mirin li holê hebû.

Sala 2008´an ew jî di nav yekîneya Zîlanê wan de çû Zagrosê. Yekîneya Zagrosê her roj Birê dilîstin. Di nav ewqas Birêyan de tenê carekê Serhed şewitî. Ew û Rojbîn hatin beramberî hev. Serhed hîngî diliviya ku Rojbînê nedikarî lêxe. Di dawiyê de şeqamek lêda û got: “Ha ji te re, min tu şewitandî.” Ji ber vê hereketa Rojbînê ku ji nîşka ve derket heval têra xwe keniyan.

Serhed herwiha sabotajciyeke pir xurt bû û di karê xwe de serwer bû. Hesasiyet û dîsîplîna sabotajciyekê bi tevahî di xwe de rûnişkandibû. Bi vê erkê çûbû Zagrosê, wê bi vê erkê biçûya Botanê jî.



Sala 2009´an pêşniyara wî ji bo çûna Bakur hat pejirandin û bi erka sabotajcîtiyê ket nav Taxima Hereketî ya Botanê. Bi vê erkê tevlî hemû çalakiyan bû.

*****

Zivistana 2009-2010'an ku li Kato Jîrkayê bûn, monteke Serhed ê qetiyayî hebû. Cilê zivistanê yên ser hemû hevalan pir kevin û yên çend sal berê bûn. Lê yê Serhed pir qetiyayî û rizî bû. Hevalan çend caran jêre gotin montê xwe bidûrû. Piştî demeke dirêj ser israra hevalan dirût. Ji tiştên kevin û qetiyayî pir hez dikir. Bi kincên sade, kevin û pînekirî rihê xwe pir azad û şad hîs dikir. Tiştên nû û balkêş bêhna wî diçikandin.

Payîza 2009´an beriya bikevin kampê, bi tevî Zîlan, Evîn, Arêz Dilpak û Gizîng Rêbîn gelek gunî û tepik ji zozanan kom kiribûn ji bo ku di kampê de nanê xwe pê bipêjin. Serhed ji bo ku striyê guniyan nekevin laşê wî de û canê wî neşewitînin, ew montê reş ê qetiyayî ku her tim li xwe dikir, li xwe kiribû û wisa barên gunî dabû pişta xwe û kişandibû kampê. Lewre, wî montî her tim keda wî û hevalên wî û bîranînên wê demê dianîn bîra wî. Lewre çiqas kevin be jî hêja û xwedî nirx bû. Monteke din ê zêde û neqetiyayî hebû, lê Serhed ji yê kevin zêdetir hez dikir û dest jê ber nedida.

*****

Mamosteyên perwerdeya ziman peywira malê dabûn hevalan û ji wan xwestibûn ku bîranîn an jî nameyekê ji kesekî re binivîsin. Serhed pir fikirî ku çawa name binivîse û ji kê/î re binivîse. Di encamê de ji dilê wî hat ku ji dayîka xwe re nameyekê binivîse. Lê pêwîst bû baldar nêz bibe da ku mamoste aciz nebin, ji ber ku her du mamoste hevalên jin bûn.

***Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!***

Rojek beriya roja perwerdeyê dengê kenê ji mangeha hevalên xort bilind bû. Her kesê meraq kir ku li wir çi diqewime. Hevalên xort name û bîranînên ku bi mebesta peywirê nivîsandine ji hev re dixwendin û dikeniyan. Serhed jî nameya xwe ji wan re xwendibû. Di nameyê de ev gotin derbas dibûn: "...Dayîka min, eger rojekê ez hatim bîra te bila Ezrayîl bê xewna te!..." Naveroka nameyê pir xweşik nivîsandibû, lê di dawiyê de ev gotin xistibû nav de! Ken û pilqîniya hevalan ji ber vê bû.

Di waneyê de dema nameya Serhed hat xwendin tenê wê gotinê rexne girt. Hestên wî li hember dayîka wî pir xurt û mezin bûn û Serhedî pir hunermendane hestên xwe bilêv kiribû. Lê bi gotina dawî, uslûb weke henek lêhatibû. Ji ber ku hemû hevalan pir jê hez dikirin nekarîn xwe aciz bikin.

Rojên dawiya perwerdeya ziman ezmûn hatin girtin. Beriya ezmûn dest pê bike, mamoste hemû heval yeko yeko bi qasî metrekê ji hevdu dûr xistin û gotin: "Em li hember hevalan bêbawer nînin, lê ji bo ku rehet ezmûna xwe binivîsin bi navber birûnin çêtire" û cihê hin hevalan bi hevdu re guhertin. Şehîd Herekol keniya û got: "Ev bi serê xwe bêbaweriyeke". Bi vê henekê re her ji destpêkê ve hewaya ezmûnê guherî.

Hemû heval rûnîştibûn ser pelên xwe û bêdeng bersiva pirsan dinivîsandin. Şehîd Qehreman, Şehîd Herekol, Zîlan û Serhed sebra wan nedihat û her li ezmûna hevalên derdora xwe dinêrîn. Şehîd Qehreman eşkere du rêz pêş ve hat û ket navbera du hevalan de û ji herduyan kopya kişand. Şehîd Herekol hêdîka xwe nêzî Rubar Goyî û Bahoz Bandoz kir û hem kopya da wan, hem jî ji wan kopya girt. Zîlanê pişta xwe zîvirandibû civatê û ji ezmûna Evîn û Hebûnê ji xwe re kopya digirt. Serhed jî eşkere fenera destê xwe avêt ser ezmûna Arjînê û ji wê kopya kişand. Heta carekê pelê ezmûna xwe bi Botan Pepule re guherand. Mamoste li beramberî wan rûnîştibûn û hemû hewldan û keda wan a ji bo kopyakişandinê dişopandin û xwe ji kena kuştibûn. Geh kenê xwe vedişartin û bi dengek ku hemû heval bibihîsin hişyarî li wan dikirin, geh bêdeng li wan dinêrîn û bi wan tevgerên wan ên zarokane dikeniyan.

Dema ezmûn qediyan mamoste navê wan yek bi yek gotin: "...Vî hevalî, vê hevalê ji her kesî zêdetir kopya kişandin." Serhedî bersiv da: "Min bersiva hemûyan dizanî, lê min got ka binêrim hevalên derdora min jî bersivan rast nivîsandine yan na!"

Roja 8’ê Adara 2010'an ku hê di kampa zivistanê de bûn, şahiyeke pîrozbahiyê li dar xistin. Di şahîyê de Azad, Herekol û Serhedî skêçek pêşkeş kirin û bi vê skêçê rengeke pir taybet dan şahîyê. Azad rola axayeke feodal ê Kurd lîst. Serhed rojnamevan bû. Herekol jî kamêravantî dikir. Azad (axa) nav cilên xwe tijî kefî û cil kiribûn û zikê xwe werimandibû. Ji kulavê jî simbêleke mezin ji xwe re çêkiribû ku di nîvê skêçê de qetiya û jê ket. Bi çend kefiyan jî egaleke mezin çê kir û xist serê xwe.

Serhedî (rojnamevan) jî yelegeke sosyetik ê reş li xwe kiribû. Dema bi vî halî derketin ser dikê ji dîmena wan her kes li ser piştê ket û êdî ji dengê bilind ê ken û pilqîniya hevalan dengê axaftinên skêçvanan nehat bihîstin. Tenê kêliyekê dengê Herekol (kamêravan) hat guhê çend hevalên nêz ku kamêra (bîsfîng-B7) dabû zikê axa û digot: “uuuf uuuf, Çêla Nimêja ye!” Bi bihîstina vêya re careke din dengê kenê bilind bû. Hemû heval hîngî keniyan ku êdî ji çavên wan hêsir hatin xwarê û bi her du destan zikê xwe girtin.

Rojnamevanî li ser 8’ê Adarê bi axayê feodal ê Kurd re hevpeyvînek çêkir û jê pirs kir: “8’ê Adarê ji bo te tê çi wateyê?”

Axa bersiv da: Ev roj tê wateya ku her du jinên min baş xizmeta min bikin, eger nekin di vê rojê de dikarim du jinên din bînim ser wan.

Rojnamevan: 8’ê Adarê roja jinan e. Ma di vê rojê de jî tu zilmê li jinan dikî?

Axa: “Waa!? Min nezanîbû. Ê, naxwe ezê 9’ê Adarê jinên din bînim. Madem îro roja jinan e, naxwe were em bi hev re li vir cejna wan li wan pîroz bikin.” Û destên hev girtin, dîlaneke kurt kirin, piştre bi modêla Ewrûpiyan reqisîn. Di dawiya reqsê de axa bi vî zikê mezin di nav destên rojnamevan de çend car li dora xwe zîvirî. Vê carê jî dîsa kenê temaşevanan zîngînî ji tehtên Katoyê anî, erd bi xwe re hejand.

*****

Roja 13’ê Avrêla 2010´an endamên vê kampê cihê xwe berdan û ber bi Besta Navîn ve rê ketin. Tevî teqemenî û pêdiviyên şer, hin pêdiviyên jiyanî û nîv torbe ard jî bi xwe re rakirin birin. Şeva duyemîn çardeh demjimêran temamî meşiyan heya gihiştin Hêzil-Kanî Sêvê ya li Serkê Dêriyan. Ji ber ku 5 mehan di kampê de bêtevger mabûn bedena wan hinekê giran bibû, lewre ew meş li wan zor hat. Hemû pir westiyan, taybet jî hevalên xort zû ji taqetê ketin. Tenê Şehîd

Qehreman û Botan li gorî hevalên xort ên din hinekê serxwetir û ser pêyan man.

Hevalên jin ji yên xort serxwetir û baştir bûn û di rakirina çek û barên wan de alîkariya wan dikirin. Beriya ku ji kampê derkevin hin hevalên jin ji fîzîka xwe bifikar bûn ku di meşên dûr û dirêj ên şevên destpêkê de pir zorî bikşînin û neçarî alîkariya hevalên din bibin. Lê dema rewş berovajî qulibî û wan bixwe alîkariya hevalên xort kirin, êdî ew mijar di nav wan de heya demekê wek henekeke şîrîn lê hat.

Wê rojê bi armanca hem keşfa erazî, hem jî vehesîn û bêhinvedanê heya êvarê li Noqta Kanî Sêvê man. Êvarê jî, yanî êvara 15'ê heyvê rabûn daketin ser ava Çeqçeqo ku demjimêr û nîvekê li jêrtir e. Wê şevê li wê derê li Noqta Şehîd Şêx bicih bûn. Heya seherê ji ber sermaya dijwar ku xwêdana ser beden û cilên wan qerisandibû, recifîn û nekarîn razên. Ava Çeqçeqo her tim, taybet jî biharan ji ber helandina berfên çiyayan, pir geş û gur e. Xumxuma wê bilinde. Pêlên wê xurtin. Dema bayê biharê li vê avê bixe sermayeke dijwar belavî derdor dibe. Ew taxim jî wê şevê bi xwêdanê ve di vê sermayê de razan.

Di nav gerîla de gelek gotinên jiyanî bi peyvekê tên sembolîzekirin û ev peyv weke remz û şîfreyê lê tên. Remzên bi vî awayî bûne wêjeya gerîla; di vê dinyayê de tenê ew dixebitînin û tenê ew bixwe jê fêm dikin, ango fêm dikin ku mebesta axaftvan çiye. Nimûne; şorbe zelal û bêtam çêbibe jêre tê gotin "ava Zapê." Dema hat gotin "ava Zapê çêbûye" her kes fêm dike yanî çi. Ji bo recifîn û lerizîna ji ber sermaya dijwar jî peyva "reqis û dîsko" tê xebitandin.

Ew şev heval -ku her tim tîm tîm belav dibûn û dirazan- di tîman de pir nêzî hev razan da ku karibin hevdu germ bikin. Dîsa jî heya seherê heya diranên xwe ji sermayê recifîn. Seherê dema rabûn û êdî li ber tavê xwe germ kirin jî vê carê bi henekî bela xwe li hevdu dan û bûyerên şeva derbasbûyî ji xwe re kirin pêkenok. Piştre tîm tîm rewşa hev pirs kirin, henekê xwe bi rewşa şevê din kirin û keniyan:

-Ma qey we sare, hûn çûne ber tavê?

-Em qeşaya nav hestiyên xwe dihelînin. Hûn jî xwe bidin ber tavê, naxwe hûnê bibin heykel.

-Îşev heya seherê me reqsa Rusî kir.

-Xwedê tîma me dîsko dikir, hîn biherekettir e.

-We çima gazî Azad û Serhed nekir, bihatana hûn fêrî reqsa Ewrûpiyan bikirana!

-Azad û Serhed îşev modêla Emerîkî dilîstin, modêla Ewrûpa têrê nedikir.

-Dibêjin reqsa Çîniyan wekî ku mirov li elektrîkê bê xistin wisa hereketlî ye. Em wê jî fêr bibin ne xirabe. Ji bo sermayên hîn dijwartir wê pêwîst be.

-(bi keneke bilind) Reqsa Çînî ya çi? Ew dîlana Mêrdîniyan e. Ya rast "kabus" a Şirnexiyan jî ne kêmî Mêrdînê ye...

Hevalan wê seherê bi vî awayî bi hev re henek kirin heya germ bûn. A ku ew germ dikirin tav nebû, ji ber ku taveke dijwar tinebû. Di rastiyê de ya ku ew germ dikirin ew hestên hezkirina hevaltiyê, hîskirina hevdu û manewiyata hundirê wan bû ku di van henekan de derdiket derve. Ji ber vê wan henekan hêz dida wan; hevaltî, rêz û hezkirina jiyana şoreşgertî û têkoşîna wan bilind û xûrttir dikir. Ew hestên dewlemend guftûgo û henekên wan jî rengîntir û dewlemendtir dikir.

*****

Nîvro ji ber ku nanê wan kêm mabû bi nîv torbe arda ku bi xwe re anîbûn li wir nan çêkirin. Tenekeyeke zengargirtî û rizî li eraziyê dîtin û anîn kirin sêl. Vê carê jî berovajî êvarê, hem tav pir germ bibû, hem jî agirê bin sêlê ew aciz dikirin. Sermaya dijwar a şeva buhurî Sîbîrya û heykelên qeşayê anîbû bîra wan, germaya wê nîvroyê jî agirê dojehê bi bîra wan xist. Jixwe heval bi baweriya ku bi sala bû pê şer dikirin û li ber xwe didan fêr bibûn ku ti carê ji mirinê netirsin û mirinê weke parçeyeke jiyanê pir asayî bibînin. Lewre ji ber ku tirsa mirinê di wan de şkestiye tim henekê xwe pê dikin û pê dikenin.

Li ber sêla nan jî ev hest, bawerî û manewiyat bi tevî rewşa hewayê tev di nav henekekê de xwe dane der:

Şehîd Herekol: Li îşê vê xwezayê binêrin. Şeva dî em diqerisîn, ji serma hişk bibûn. Niha jî vê tavê em şewitandin... Heval Azad, ev agir çi tîne bîra te?

Şehîd Azad: (keniya) Dişibe dojehê. Hem dojeh, hem Newrozê tîne bîra min.

Herekol: (bi ken) Dema tu şehîd ketî em çi ji termê te bikin?

Azad: Xwedê ez ji axê jî pir hez dikim, ji agir jî. Ji bo vê jî hê min biryar nedaye termê min çi jê bê kirin. Êê... em çi ji termê te bikin?

Norşîn: (bi ken) Heval Herekol ji agir jî ditirse, ji mişkan jî. Em binax bikin wê mişk wî bixwin. Herî baş em wî bînin bavêjin nav vê ava Çeqçeqoyê.

Herekol: (bi ken) Spas hevala Norşîn! Wê demê jî wê masî min bixwin.

Serhed: Ez pêşniyar dikim hûn min ji pêyan veşêrin! (ev gotin bû henekeke pir taybet û her kes ji dil da kenandin)

Gizîng: Bejna te 3 metre ye. Em çawa bîreke sê metre kûr û teng ji te re bikolin?

Serhed: Hûn dikarin min serserkî jî veşêrin. Bila serê min li erdê, lîngên min li hewa bin! (dîsa kesê nekarî xwe bigire ji kenan)... Emê heval Norşîn Efrînkî veşêrin. (dîsa pilqîna kenê berdewam kir)

Norşîn: Tu xêreke wisa bikî xirap nîne ha, ji bo cihê min di gorê de fireh be û ez rehet hereket bikim.

Serhed: Dizanî li ser gora te wê çi şîn bibe?

Norşîn: Nêrgiz, rihan... Belkî jî zeytûn. Xêra xwe dareke zeytûnê ber serê min biçîne...

Serhed: Nawele, ser gora te wê dirî (strî) şîn bibe, yan jî gûnî...gûnî. Wê gunî şîn bibe ji ber ku te gûnî li Kato nehiştiye. Ser gora Gizîngê jî wê tirşok şîn bibe.

Azad: Gizîng ji catirê pir hez dike, pir vedixwe. Wê catir ser gora wê şîn bibe.

Norşîn: Wele ev çend roje ku em ji kampê derketine hema tirşok dixwe, wê tirşok şîn bibe.

Serhed: Başe, şer nekin. Hem catir, hem tirşok wê şîn bibe. Vêca xeyal bikin em biçin tirşok û catira ser wê kom bikin, ew di bin axê de qîrekê bike bibêje ‘giyayê min nebiiin. Ez li vir jî vedixwim.’ Hingê wê kezeba me biqete. Ez bawerim pêwîste em çaydana wê ya catirê jî pêre veşêrin... (Kê/î dikarîbû li hember henekên wî xwe bigire!)

Ew henekên xweşkalîte û tijî naverok û wate, westandin û germaya dijwar ji bîra wan bir. Şahî û hêzeke manewî ya pir xurt da wan.

*****

Dawiya meha Gulanê taxima wan ji bo nasîna erdnîgariya Bestayê derketin eraziyê. Çûn çiyayê Pîroyê. Ji wir daketin Girê Xanê. Serhed, Herekol, Dogan û Sîpan çûn nêzî bîst metrekê li biniya tepeyê Misto ku payîgeha Naviyana Şêxa diparêze, kemîn ji dijmin re danîn. Dema leşkeran xwestin bi rêzê dakevin paygehê, vê tîmê li wan xist û 6 leşker hatin kuştin. Di vê çalakiyê de Herekol û Serhedî pir xweş rola xwe lîstin. Vê çalakiya serkeftî pir şahî da taxim û hêzên din ên Bestayê.

Dema hevalên din ên taximê ser awayê lêdana wan û ziraviyên çalakiyê pirs dikirin, Serhed û Herekol ji şerma re sor dibûn û xwêdan didan. Hemû bersiv ji fermandarê xwe Dogan re hiştin. Her duyan jî hez nedikirin pesnê xebat û karên wan bê dayîn, ji ber ku her tişt li hember Rêber Apo û hevalên şehîd kêm didîtin. Bi vê hişmendiya mezin Serhed bi dilnizmî carekê ji hevalan re got: “Heval, nexweşe mirov di civatekê de birûne û di vê civatê de qala erêniya karên wê/î bê kirin.”

*****

Serhed weke sabotajcî tevlî çalakiya Aqêrê bû. Ji hevalên xwe pir hez dikir. Bi nirxên hevaltiya PKK´ê ve pir girêdayî bû. Piraniya Şehîdên Aqêrê ji nêz ve nas dikir. Lewre ji şehadeta wan pir bandor bibû. Piştî vê çalakiyê heval hemû paşve kişiyan. Di çalakiyê de tenê Heval Qehreman û Heval Silav şehîd ketibûn û haya her kesê ji şehadeta wan hebû. Lê heşt hevalên din xûya nebûn. Çend kom heval bi egera ku ew heşt heval birîndar bibin û di eraziyê de mabin, derketin eraziyê û hemû qada çalakiyê û derdora wir geriyan. Lê nedîtin.

Nûçeyên TRT jî jixwe ser hev digot ku termê deh şehîdan di destê leşkerên Tirk de ye. Lê ne Serhed, ne hevalên dî kesê nedixwest ji vê nûçeyê bawer bike, ji ber ku dijmin gelek caran agahiyên nerast û derew ji raya giştî re radigihandin. Piştî sê rojan diyar bû ku heşt hevalên nezîvirîne jî şehîd ketine û hejmara şehîdên vê çalakiyê bûne deh. Serhedî jî mîna hevalên xwe yên din heya wê demê hêviya zindîvegerîna wan di dilê xwe de netefandibû. Piştî sê rojan dema fêm bû ku ew heval şehîd ketine, çû dûrî hevalan di bin darekê de rûnişt û mîna zarokeke nav pêçekê ku bi zorî ji himêza dayîka xwe hatibe qutkirin giriya. Ji bo ku hevalên din, taybet hevalên nû û ciwan giriyê wî nebînin û jê bandor nebin xwe dabû pişt dareke dûrî hevalan, lê her

kesê fêm kir ku Serhed ji bo çi ji nav wan rabû çû. Nedikarî pêşiya rondikên xwe bigire. Mîna volqanê dikeliya û rondik berdidan xwarê.

Di vê çalakiyê de ji Taxima Hereketî ya ku ew bixwe têde bû Heval Havîn, Heval Azad û Heval Herekol şehîd ketibûn. Heval Qehreman jî demeke kurt beriya wê ji taxima wan qut bibû. Ji Taxima Hereketlî ya din ku Zîlan têde bû jî, Heval Silav û Heval Şahîn şehîd ketibûn. Ji ber viya hejmara her du taximan kêm bibû. Lewre fermandariya giştî ya Botanê biryar da her du taximan bikin yek, hejmara ku zêde bimîne jî ser taximên qadan belav bikin, heya piştre ji nû de Taximeke Hereketî ya din ava bikin. Bi vî awayî vesaziya Serhed jî ji bo herêma Besta, taxima Şehrîbanê hat destnîşankirin.

Piştî çalakiyê, fermandarê giştî yê qada Botanê Heval Sebrî Tendurek ji taxima wan re civînek çê kir. Encamên çalakiyê nirxand û yeko yeko ser kesayeta hevalên Şehîd, taybet jî şehîdên ku endamên vê taximê bûn axivî. Piştre pilana ji bo her du Taximên Hereketî ji wan re ragihand. Di nav vesaziyan de bal kişand ser pêdiviya alana Şehrîbanê ya bi sabotajciyekê û got: “... Heval Serhed jî ji ber hin xebatên sabotajê wê biçe Şehrîbanê...”

Serhed ti carê nefikirîbû ji Taxima Hereketî derkeve. Hele piştî van şehadetên Taximên Hereketî bi ti awayî nedifikirî. Bawer jî nedikir ku ji ber pêdiviya alanekê ji Taxima Hereketî bê derxistin. Heval Sebrî ji bêdengiya wî re fêm kir ku Serhed vesazî tam fêm nekiriye. Ji ber vê, wekî ku axaftina xwe berdewam bike got: “Heval Serhed, tu yê biçî Şehrîbanê. Pêwîstî heye.”

Serhed: Ez ji bo peywirê diçim û vedigerim, ne wisa?

Heval Sebrî pir ji Serhed hez dikir û nedixwest ew bi xemgînî biçe, lê pêdiviya alanên xwe jî dizanî. Fikirî ka çawa jêre bibêje û wî qaneh bike. Got: “Na heval Serhed. Tu yê li wir bimînî, tevlî taxima wir bibî.”

Serhed: Na. Ez naçim. Ji taxima xwe dernakevim.

Heval Sebrî: Keseke din nîne em rêkin. Niha tu biçe. Eger me hevaleke dî şûna te dît, tu vegere Taxima Hereketî.

Serhed: (kelegirî bibû) Heval, ez naxwazim ji taxima xwe derkevim. Ezê di taxima xwe de bimînim. Naçim derekê. Hûn pêşniyara min ji ber çav re derbas bikin wê baş bibe. Nikarim ji vê taximê derkevim.

Heval Sebrî: Dizanim tu bi vê taximê ve pir girêdayî yî. Bawer bike pêwîstî nebûya me tu rê nedikirî. Baweriya me bi te heye li wir jî xebatên xwe hîn xûrttir berdewam bikî.

Serhed, girî ketibû qirika wî, nedikarî peyvekê biaxive. Berê xwe da erdê û destên xwe danî ser eniya xwe û ji çavên xwe re sî çê kir da ku hevalên din rondikên wî nebînin. Heval Sebrî di dawiyê de got: “Ê, başe. Xwe amade bike. Îro êvarê Heval Serdem wê biçe Bestayê, bi hev re biçin.”

Dilê Serhed tijî kul bibû. Nedikarî taxima ku têde nêzî salekê bi van Şehîdan re hemû jiyan, hest, rih û rêhevaltiya xwe par kiribû bihêle biçe. Hevalên din ên taximê jî nedixwestin Serhed ji wir derkeve. Pêwîstiya taxima wan her tim wê bi kesayetên mîna wî hebûya. Hemûyan ew nas dikirin, pir pir jê hez dikirin. Ev “melek”ê ber dilê her kesê wê çawa ji wan qut bibûya! Taximê tev hez dikir Serhed li wir bimîne, lê nedikarîn pêdiviyên rêxistinê jî ji ber pêdiviyên taxima xwe paşçav bikin. Di encamê de pêwîst bû hemû taxim û alan hevdu xurt bikirana ji bo ku rêxistin xurt bibe. Çûna Serhed ji bo Bestayê wê weke alîkariyeke mezin a Taxima Hereketî bibûya ji bo vê herêmê.

Piştî civînê Serhedî çanteyê xwe amade kir. Çû pişt şkêrekê, careke din weke zarokekê ku ji dayîka xwe bê qutkirin têr û têr giriya heya dilê wî hênik û çavên wî sor bûn. Norşîn û Gizîng li şkefta kêlekê li benda wî bûn ku biçe gel wan, hevdu bibînin û ji hev xatir bixwazin. Demeke dirêj li benda wî man, lê Serhed neçû ba wan; dilê wî ranekir biçe ji endamên taxima ku nêzî saleke têde ye û çar şehîd daye xatir bixwaze. Dilê wî ranekir ku hevalên xwe bi rewşa xwe xemgîn bike û nexwest bi vî halê tijî kul û girî biçe gel wan. Ji bo ku hevalên wî, wî nebînin ji korîdora pişte ve zîvirî çû.

Serhedî çiqas ji wê taximê hez dikir, taximê hîn zêdetir ji wî hez dikir. Wî her ji destpêka hatina Bakur ve di vê taximê de cih girtibû. Zivistanê jî bi vê taximê re ketibû kampê û perwerde dîtibû. Fermandarê vê kampê Şehîd Qehreman Erdal bû. Hemû endamên taxim û kampê pir ji hevdû hez dikirin û pir bi hev ve hatibûn girêdan. Bi ked û feraseteke rêxistinî ya hevbeş rêhevaltiyeke pir xurt ava kiribûn. Rêz û hezkirina hevaltiyê di asta herî jor de parastibûn. Para herî zêde di vê kedê de ya Heval Qehreman, Azad, Herekol, Evîn Zana, Zîlan û Serhed bixwe bû.

***Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!***

Nêzî salekê bû ku ev taxim di van hemû xebatan û gelek xebatên din de her tim bi hev re tevgeriyabûn û bi hev re gelek kar meşandibûn. Gelek bîranînên xweş û hêja bi hev re par kiribûn. Niha ku ji bo biçe Şehrîbanê ji vê taximê qut dibû van bîranînan û gelek bîranînên hêja yên din ji nû de dihatin ber çavên wî û ewana di zîhin û dilê xwe de vedijand û dineqişand. Ev bîranîn yeko yeko dihatin ber çavên wî û careke din ew ji dil de birîndar dikirin. Lewre bêyî ku xatir bixwaze ber bi Şehrîbanê ve ket rê û çû.

*****





***Nasnav: Gezgör Suruç***
***Nav û Paşnav: Servet Doğan***
***Dîrok û Cihê Jidayikbûnê: 1977/Riha***
***Navê Dayikê: Üveyş***
***Navê Bav: Ömer***
***Dîrok û Cihê Tevlîbûnê: -.7.2002/Riha***
***Dîrok û Cihê Şehadetê: 13-15’ê Sibata 2012’an li Botan-Besta***

**Heval Gezgor Pirsus**

Gezgor li bajarê Ûrfayê, navçeya Pîrsusê ji dayîk dibe. Malbata wan malbateke welatparêz a eşîra Dîna ye. Ûrfa navê herî kevnar ê vê herêmê ye. Ûr=Bilind. Ûrfa=Ax û warên bilind. Ev nav ji serdema Neolîtîk heya niha tê xebitandin. Hin lêkolîn navê Ûrfa'yê vedigerînin dîrokên hê kevintir. Şêniyên Ûrfayê ji gelek qewm û gelan pêk tên; Kurd, Aşur, Ermen, Ereb, Tirkmen û Tirk gelên Ûrfayê ne. Kurd hejmara herî zêde, yanî nêzî 80% şêniyên Ûrfayê pêk tînin. Gelê Kurd bi gelên din re hezaran sale di nav hev de bi cîraniya hev dijîn.

Her yek ji van gelan li gorî zimanê xwe bi navekê qala wir kirine. Ereban ji ber ku Pêxember ji wir derketine jêre gotine Riha ango Ruha (ruh ji bo Pêxember xebitandine), Suryan (Aşur) dibêjin Urhoy, Meqdunî ango Makedoniyan (Yunan) piştî ku êrîş kirine wir û wir bi dest xistine navê wir kirine Edessa û kirine paytexta Qraltiya Osroenne.

Serdema Neolîtîk û şoreşa gundvanî li wir jiyan bûye. Çanda Xwedavendtiyê rehên xwe berdaye nav ax, kevir, dar û deştên wê. Xwedavend di Xeraw Reşkê (Göbekli Tepe) de pir hunermendane li şûn xwe şopên mayînde hiştine. Her der bêhna Xwedavendan û rengê

dîrokeke kevnar dide. Ûrfayê berhemên yekemîn ên aboriya ekolojîk ava kiriye û ji şêwaza jiyana civakî ya yekemîn a li ser vê aboriyê re derguştî kiriye. Kevnarbûna wê xwe digihîne dîrokeke ku dagirkerî, talan û serhildan çiye, ti kesê nedizanî. Wê demê Ûrfa biyaniyê wan peyvan bûye. Tenê hunera xwe ya afrîneriyê nîşan dida. Ji bilî vê, bi tiştek din re mijûl nedibû. Ax û ava Ûrfayê her kesê têr dikir û dida jiyandin, nedizanîn ku tenê çend hezar salek şûnde hemû berhemên ku bi wan hatine afirandin wê bikevin ber hêrs û temahên bêsînor û ser wê, kuştin û qirkirinên mezin dest pê bikin.

Ûrfaya warê Xwedavendan herwiha di pêvajoya koledariyê de weke warê raperîna Pêxemberan lê tê. Pêxember Îbrahîm ji wir derketiye û li hember zilm û koledariya Nemrûdan serî hildaye. Bi vî awayî raperîn û serî rakirin ji bo gelên Ûrfayê bûye bawerî û çand. Îlhama têkoşîna azadîxwaz bi pêvajoya Nemrûdan re, li hember wan çêbûye. Pergala koledarî çiqas li hember wekheviya pergala Dayîk-Xwedawend ava bûye, têkoşîn jî ewqas li hember pergala koledariyê derketiye holê. Rûyê destpêkê yê Ûrfayê çiqas “pîroz”e, rûyê ku li dijî vê pîroziyê derketiye holê jî ewqas “bi lanet”e. Rêber Apo di Parêznameya Ûrfayê de pênaseya “ÛRFA; SEMBOLA PÎROZÎ Û LANETÊ” di cih de dîtiye.

Di felsefeya gelek Pêxember û zanayan de ev dualîbûn heye. Felsefeya Zerdeşt pala xwe dide exlaq û Ronahiya Rojê ya Mîtra û dualîteya Ahura Mezda û Ehrîman. Tao reş û spî; di nav aliyê reş de xaleke spî û di nav aliyê spî de xaleke reş dide pêş. Di Buda de Nîrvana lûtkeya bilindahî, firîn û pîroziyê ye. Konfuçyus  ser şopa Zerdeşt “exlaq” dike bingeha jiyaneke birûmet. Felsefeyên Rojhilat bi giştî berê wan li “Ronahî”yê ye û xwe ji “Tarîtî”yê diparêzin. Di bingeha hemûyan de RONAHÎ, EXLAQ û AZADÎ hemwate û hemnirxin û pîrozin. Li beramberî vê, TARÎTÎ, KOLETÎ û SERÎTEWANDIN jî di yek astê de guneh, tewan û bilanetin. Ji pêvajoya koledarî û şûnve li Ûrfayê jî ev du xet tim li beramberî hev û di nav şerekê de meşiyane. Di sedsala bîstê de Ûrfa careke din şahîdiyê ji vê pevçûnê re dike û di himêza xwe de li hember Tarîtiyên sepandî RONAHIYA BÊDAWÎ diperwerîne.

Dema Komara Tirkiyê tê damezrandin, axa Ûrfayê jî mîna axa gelek deverên din a Kurdistanê dibe qurbaniya peymanên vajo (îmze)bûyî yên di navbera biyaniyên dagîrker de ku çavên xwe berdane dîrok û dewlemendiyên çandî û madî yên vê axê. Bi vî awayî

sînorên ji têlên bi strî li ser sînga Ûrfayê jî tên danîn û Ûrfa parçe dibe. Ûrfa dibe du beş; beşek dibe para dewleta Tirkiyê, beşa din dibe para dewleta Suriyê. Êdî wêjeyeke nû ji Kurdistaniyan re çê dibe; Bakurê Kurdistanê û Rojavayê Kurdistanê, ango Serxet û Binxet ew peyvin ku Kurdistaniyan û cîhanê heya wê demê nebihîstibûn û biyaniyên wan bûn. Navê serxetê dibe Pirsus, navê binxetê jî dibe Kobanê.

Ev ji bo gelên Ûrfayê mîna parçekirina bedena mirovekê ye. Mirov seherê çavên xwe ji xewê vedikin û dibînin ku odeya wan a kêlekê ji hatin, çûn û bikaranîna wan re qedexeye, aliyê din ê hewşa xwe nikarin bi kar bînin. Mala wan bûye milkê dewletê û ji ber ku bi saya dewleta fedakar(!) di wir de dijîn divê kode (vergî) bidin dewletê û hwd.

Ji bilî vê, cîranên ku salên dirêje bi hev re di nav dostanî û heta wekî ku ji malbatekê bin di nav hevde dijîn, tên neçarkirin ku bi çavên biyanî li hev binêrin. Hinek ji wan ji aliyê dewleteke ku bixwe biyaniye ve weke biyanî tên nîşandan, hinek di asta pîrozbûnê de tên pîrozkirin, hinek ji qirkirina etnîkî re tên derbaskirin, hinek bi înkara nasnameyî re rûbirû tên hiştin, hinek ji nedîtî ve tên hesibandin û hwd. Wekî ku evana têrê nekin û bes nebin, vê carê ji bo xatirê bendavan gund bi metirsiya di bin avê de manê re rûbirû tên hiştin, şîrket û kargehên biyaniyan û taybet jî yên Cihuyan li wir tên danîn û bi vî awayî destên dagirker li ber çavê şêniyên ku bi xizanî û birçîbûnê tên edebkirin Ûrfaya bibereket dikin navenda têrkirina biyaniyan.

Ev hemû tev janê dixin dilê Ûrfayê û êş didin gelên wê. Tevî hemû hewldanên dewletê, gelên wir fêrî dijmintiya hember hev nabin, berovajî, dostanî û hevaltiya xwe ya qayîm û qedîm diparêzin. Bi qasî vê, çanda xwe jî ji destavêtinên dagirkeran diparêzin û dest ji afirînerî û aboriya xwe ya komînal bernadin.

Ji ber ku pir gel li wir jiyan dikin û her yek ji wan jî xwedî ziman û baweriyeke olî ya cudane, şêniyên wir hemû zimanê hevdu fêm dikin û li hember ziman, ol û baweriya hevdu birêz in. A rast, baweriyên cuda ji bo wan pir girîng nînin û nakokiyan di nav wan de çê nake, ji ber ku baweriya wan a herî mezin û hevbeş “exlaqa dostanî û xatira cîrantiyê”ye. Vê girêdana bêsînor a bi ax û war, berhem, çand û cîrantiyê ve bi awayeke xwezayî feraseta welatparêziyeke kûr bi xwe re aniye.

Gezgor di nav pirçandîtiyeke wiha de mezin dibe. Welatparêziya xwezayî ya herêmê mîna hemû zarokên din terbiyet û edebeke welatparêziya xwezayî dide wî jî. Navê dayîka wî Uveyş, navê bav jî Omer e, mîna navê dayîk û bavê Rêber Apo. Dayîka wî jî Tirkmen û bavê wî Kurd e. Malbatên dayîk û bavê wî di nav raperînên eşîran ên li hember împeratoriya Osmaniyan de cih girtine. Vê rengeke din jî tevlî rengê welatparêziya wan kiriye. Bi derketina Rêber Apo û belavbûna tevgera azadiya gelên Kurdistanê re malbata wî bêdudilî deriyê xwe jêre vekiriye û tê de bedel daye. Şervanên wê derketine çiya û şehîd dane. Gezgor bi bandora hemû van rewşan mezin dibe û her diçe zêdetir tevgera azadiyê nas dike, jê hez û bawer dike û pêve tê girêdan.

Gezgor dîroka hezaran salî di salên kurt a temenê xwe de dibîne. Yên hemû zilm û gefên dijmin didin berçav û li ber xwe didin û yên ku bi dijminên gelê xwe re di rêzekê de tevdigerin! Careke din ‘pîrozî’ û ‘lanet’ hember hevdu rawestiyane û di pevçûnê de ne. Tevî ku Rêber Apo ku ji Ûrfayê ye û PKK´ê êdî sînorên welatê xwe û herêmê derbas kiriye û nav û dengeke cîhanî bi dest xistiye jî, Gezgor li derdora xwe hin kesên ku berjewendiya şexsî û malbatî di nokertiya ji bo dijmin de dibînin, xwe ji doz û tevgera gelê xwe re biyanî nîşan didin û dijmin ser wana xwe li wir xurt û bihêz dike, dibîne. Li ba wî qaîde diyar û şênbere û nayê guhertin; *li ser axa Pêxember û Rêberan divê neyar, noker û xayîn tunebin*.

Dema Rêber Apo bi pilangeriyeke navdewletî û bi alîkariya Kurdên nokerên biyaniyan tê dîlgirtin, Gezgor van rewşan hê rehettir tehlîl û şîrove dike. Di encama nakokî, tehlîl, lêhûrbûn û lêgerînên ku her diçe di fikrên wî de mezintir û geştir dibin de li pey şopa mirovên xwe yên şehîd û gerîla, di tîrmeha sala 2002'yan de tevlî refên şoreşgerên azadiyê dibe û digihîje xeyalên xwe yên bi salan.

Li çiya, li Herêmên Parastina Medyayê li qadên Xinêrê, Xakurkê, Metîna, Zap û Garê ma. Herî dawî bi pêşniyar û îsrara xwe derbasî Bakurê Kurdistanê, qada Botanê bû. Li wir weke fermandarê taximê erk girt. Ked û fedakariyê felsefeya jiyana wî dihunand. Gezgor di malbateke kedkar de bi kedê mezin bibû û wateya kedê pir baş nas dikir. Lewre di nav deh sal jiyana şoreşgerî de her tim xwe di nav keda xwe de anî ziman. Pir nediaxivî; keda wî ziman û dengê wî bû. Ev, felsefe û qenaeta wî bû û bibû taybetmendiya wî. Li Botanê jî bi



heman felsefeyê tevdigeriya; tevî ku ji milê xwe ve birîndar bû û xebatên pratîkî hinekê zehmetî jî didan wî, ti carê birîndariya xwe li pêşiya tevlêbûna xebatên jiyana xwe nekir asteng, di jiyanê de nimûneya rêhevaltiyeke xurt û fermandareke kedkar û fedakar nîşan da. Ji Gezgor ked dibariya. Gezgor yanî ked, fedakartî û wate.

Gezgor payîza 2010'ê li Herekolê bi hejmarek hevalên din re ket kampa zivistanê. Di vê pêvajoya zivistanê de demeke kurt ji ber ku baş nedikarî xwe bide fêmkirin di hin mijaran de zorî kişand. Lê bi lêhûrbûnên ku ser Parêznameyên Rêber Apo kir, zû ew tengasî derbas kirin. Wê zivistanê ser kesayet, pratîk, kêmasî û tengasiyên xwe hûr û kûr lêhûrbûn kir û ew tehlîl û şîrove kirin. Ji perwerdeya ku didît,

lêhûrbûna ku dikir û prespektîfên ku werdigirt hêza çareserkirin û derbaskirina wan kêmahî û tengasiyan dît û rexnedayîneke pir xurt da. Bihara 2011'an bi moral û hêza rexnedayîna ku daye, lêhûrbûna ku pêş xistiye û biryardariya mezin ku dijiya, bi tevî hemû endamên din ên kampê derket pratîkê û li herêma Bestayê tevlî xebatan bû.

Wê salê di taxima Bestayê de her hevalek bi rola xwe bû rengeke jiyanê. Taybet jî Reşo di xebatên rênasiyê de, Gezgor, Rojbîn û Cahîd jî di xebatên pêdiviyên lojîstîkî û kişandina erzaqên herêmê de sîmayên herî li pêş bûn. Hem pêdiviyên taximê, hem pêdiviyên komên hevalên ku ji bo çûna herêm û qadên xwe ji ser Bestayê re derbas dibûn û hem jî tevahî pêdiviyên sed û heftê şervanên nû pêk anîn. Ji bo ku dilê hemû komên rêwî razî be, li ser bingeha feraseta rêhevaltiyê ked û fedakariyeke mezin nîşan dan û çi ji wan re pêwîst be bêyî ku westandinê nas bikin pêk dianîn. Taybet jî, pêdiviyên şervanên nû ji pêdiviyên xwe û her kesê girîngtir û sertir dîtin û ji bo vê, gelek caran ji xwe kêm kirin. Bêyî ku ji westandina bêsînor û xwêdana ku didan aciz bibin, beziyan her derekê da ku tiştek ji hevalên wan kêm nebe. Dema hêstir hebe li pey hêstiran meşiyan û ji rêyên dûr ên yek şev û du şevan erzaq û pêdivî kişandin, eger hêstir nebe jî, bi mil û pişta xwe hemû pêdivî kişandin noqteyên pêwîst.

Hin caran barên wan hîngî giran bû ku pişta wan di bin de xwar dibû, lê ew ji bo wan girîng nebû, ji ber ku dizanîn ji bo çi dikin. Taybet Gezgor, ji ber ku zivistana derbasbûyî hinekî zorî kişandibûn, tevî ku rexnedayîneke pir xurt ji rêxistinê re dabû jî, dibê qey ev bes nedidît; her dixwest weke berdewamiya rexnedana xwe ji her kesê zêdetir kar bike, ji her kesê zêdetir biweste, ji her kesê zêdetir barên giran rake û ji her kesê zêdetir bêxew û birçî bimîne. Şerm dikir ji tengasiyên ku jiyan kiribû. Tevî ku rêxistinê rexnedayîna wî pejirandibû jî, wî bixwe rexnedayîna ku dabû bes nedidît û çiqas ked bide jî her xwe li hember rêxistinê deyndar didît.

Lewre ji bo rexnedayîna pratîkî û keda ku dida sînor nas nedikir. Ji bo xatira hevaltiyê xwe li av û agiran dida. Ew ked û fedakariyên wî di rastiyê de nîşandera asta girêdana wî ya bi Rêbertî, doz, gel, rêhevaltî, nirx, ked û jiyanê ve bûn. Lewre ked di kesayeta wî de gihîştibû lûtkeyê û Gezgor bibû sembola ked û fedakariyê.

*****



***Nasnav: Aysel Dijwar***
***Nav û Paşnav: Aysel Bartu***
***Dîrok û Cihê Jidayikbûnê: 1988/Wan***
***Navê Dayikê: Kıymet***
***Navê Bav: Yusuf***
***Dîrok û Cihê Tevlîbûnê: 2003/Wan***
***Dîrok û cihê Şehadetê: 13-15’ê Sibata 2012’an Botan-Besta***

**Heval Aysel Dijwar**

Aysel ji malbateke welatperwer a gundê Xumarê yê girêdayî navçeya Şaxê bû. Navçeya Şaxê bi bajêrê Wanê ve girêdayî ye. Aysel sala 1988'an li Xumarê ji dayîk dibe. Ew hê zaroke ku malbat ji ber zextên zêde yên dijmin ji wir koç dikin û diçin li navenda Wanê bicih dibin.

Di pêvajoya Plana Terbiyekirina Rojhilat (Şark Islahat Planı) de mîna hemû deverên din ên Kurdistanê, dijmin navê Şaxê jî diguherîne û dike Çatak. Erdnîgariya Şaxê di navbera Colemêrg, Botan, Sêrt, Garzan û Wanê de ye û ji bo her pênc cihan rola derî dilîze.

Ev navçe jî mîna navçeya Dihê (dewleta Tirk navê Eruh lê kiriye) ya Sêrtê, di pêngava efsaneyî ya 15’ê Tebaxa 1984'an de rol lîstiye. Şehîd Elî ku ji ber berçavka wî jê re “Gözlüklü Ali” hatiye gotin fermandarê qola ser Şaxê bûye. Di pêngava 15’ê Tebaxê de ev navçe jî dibe meydana çalakiya şoreşgerên Apoyî. Di warê siyasî, civakî û asta welatparêziyê de xwedî dîrok û bingeheke xurt e. Şax taybet ji 15’ê Tebaxê şûnde ji bo dewleta dagirker dibe hedefeke stratejîk. Welatparêziya vê herêmê hem bala raperîn û tevgerên şoreşger ên Kurdî, hem jî bala dijminan kişandiye.

*Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!*

Piştî 15'ê Tebaxê jî salên dirêj dewleta Tirk nekariye wir bi dest bixe û newêraye xurt li wir bicih bibe. Lewre dewlet neçar dimîne siyaseteke taybet li hember wê derê bide pêşiya xwe; di bin navê ewlekarî û parastina gundan de cehşkirina şêniyên herêmê û biçekirina wan, sîxurkirin, endamkirinên di MÎT û JÎTEM´ê de, vekirina navendên xistina exlaqî û ji bo vê mebestê erkdarkirina polîsan, vekirina dibistanên şevî û rojî û cur bi cur gelek polîtîkayên xistinê, mîna tevahî deverên din ên Kurdistanê li hember gelê vê herêmê jî tê bikaranîn.

Her wiha tîmên taybet ên polîsan, ango polîsên taybet li wir tên bicihkirin. Baskeke polîsan taybet tê erkdarkirin ku bi navê evîniyê jinên ciwan bixin. Ciwanên welatparêz ên ku dikevin nav vî teleyî piştî ku pê dihesin ew kes polîs û endamên JÎTEM'ê ne ji ber ku bixwe ji malbatên welatparêzin, piranî derûniya xwe winda dikin û yan neçar dimînin xwe bikujin yan jî eger malbat pê bihese di bin navê "lekegirtina namusê" de wisa li wan dikin ku çareseriyê di xwekuştinê de bibînin. Hin malbat jî bi sedema rûmeta welatparêziyê êdî wan napejirînin û diqewitînin. Heta hin malbat hene ku şûna tewanê di dewlet û zilamê beramber de bibînin, di keça xwe dibînin û şûna ku li pey kiryarî bikevin û hesab jê bipirsin ji bo "namûsa wan lekegirtî nebe" ser mijarê digirin û keça xwe ya nûciwan didin kalên şêst-heftê salî! Bi vî awayî hem nahêlin kes pê bihese, hem jî keça xwe ya ewqas ciwan êdî hêjayî kalên wisa bitemen dibînin.

Jixwe ew polîs û sîxurên erkdar piştî xistina jinan erka wan a duyemîn ewe ku wan jinên ciwan li holê bihêlin da ku malbat û civak bi wan bihese û deriyê malê ji wan re bê girtin û di encamê de yan kuştin-xwekuştin rû bide, yan jî ji neçariyê lingê wan bikeve fuhuşxaneyan.

Erka baskeke din ê polîsên taybet tirsandina çavên gel û meşandina xebatên îstîxbarat di dukan û navendên civakî yên mîna bazar, park û hwd. de ye; da ku bi vî awayî polîs rehet wan deveran weke navendeke xwe ya agahîgirtin, çavdêrîkirina ciwanan û kişandina wan bixebitînin.

Baskeke din bi belavkirina madeyên hişber û teşwîqkirina ciwanan ji bo xebitandina wan tê erkdarkirin.

Baskeke din erkdare ku bi rêbazên mîna gef û tirsandinê, êşkence, destavêtin, deyndarkirin, bê îtîbarkirin û cur bi cur gelek rêbazên din

ên dûrî exlaq gel bikin sîxur. Beşeke wan sîxuran di dibistan, zanîngeh, navendên aktîvîteyên civakî û siyasî de tên bicihkirin da ku sempatîzan û endamên rêxistinên demokratîk û legal ên Kurdî nas bikin û ji dijmin re eşkere bikin.

Erka baskeke din ê polîsan jî ewe ku ziyanê bigihînin malên gelê welatparêz û wan xizan û deyndar bikin. Ewê biçin ji dukanan hemû pêdiviyên xwe û malbata xwe pêk bînin, lê pere nedin. Dema xwediyên dukanan pere bixwazin jî bi gefan bên tirsandin da ku careke din newêrin pere bixwazin û tevî vê jî ji tirsan re her tim dukana xwe ji wan re vekirî bihêlin û hwd.

Ev rêbazên qirêj ji bo tirsandina gel û dûrketina wan ji doza azadiyê bi salane tên meşandin. Di vir de hedefa herî sereke ciwan û taybet jinên ciwan in; ji ber ku li hemû welatên dinyayê ciwan kelheyeke asî û bilindin û eger ji aliyê dewletê ve ev kelhe neyê fetihkirin dibe ku di pêşerojê de ji bo desthilatiya wan metirsiyan ava bike.

Ev siyaset heta li gundan jî tê birêvebirin. Gundên Şaxê her çiqas li gorî navenda navçeyê hinekê ji destavêtinên dijmin dûr jî mabin, dîsa gelek caran bûne qurban. Hin gundên Kato Xelîla bi tevahî tên çetekirin û taybet zilamên wan salên dirêj ji aliyê dijmin ve li hember gerîla tên bikaranîn. Artêşa Tirk di hemû operasyonan de van çeteyan dide pêşiya leşkeran, da ku çete eraziyê nîşanî wan bikin, ji ber ku çete şêniyên wirin û eraziyê xwe ji leşkeran ku ji cihên din hatine baştir nas dikin.

Tevlêbûna çeteyan ji bo operasyonên dijî gerîla çi bi zora dijmin be, çi bi daxwaza wan kesan be ji aliyê gel ve weke rûreşî, bêşerefî û îxanetê tê dîtin. Ên welatparêz têkiliya xwe bi kes û malbatên wisa re qut dikin, pereyê ku çete ji bo çekrakirin û çûna operasyonan ji dijmin digirin heram dibînin û mîna ku ew, xwîna zarokên xwe bixwin lê dinêrin û li her derê wana dihetikînin. Jixwe eger çeteyek bi vê rewşa bextreşiya ku tê de ye bihese, lîstokên dijmin nas bike, bixwaze xwe jê xelas bike û çeka dijmin berde û êdî nexwaze tevlî operasyonan bibe dawiya wî kuştina bi destê kiryarê nediyare.

Ev rewş heya sala 2000 jî pir li pêş bû. Lê jê şunde tevlêbûna çeteyan ya di operasyonan de lawaztir dibe, ji ber ku êdî gelek caran malbat bi hevjîn û zarok, dayîk, xwuşk û bira ve li hember zilamên çete

û çekdar radibin. Kêm nînin jinên ku ji bo zilam dest ji çekê dijmin berdin gefa berdanê li wan dixwin!

Gundên ku salên 1994-1995'an di pilana qirkirina Kurdistanê de tên valakirin û şewitandin ji bo ku çekên dijmin ranekin evqas koçberî, bêwarî û mirinê didin ber çav. Mîna hemû gundên vala û xirabûyî yên deverên din ên Kurdistanê, gundên Şaxê jî hê pêlavên zarokan û qetên cil û bergên jin û zarokan lê ne. Darikên derguşên zarokan hê bi rengê zer û şîn û kesk û sor li ser erdên xwe ne. Mirov lê nînin ku çîrok û serpêhatiyên xwe ji rêwiyan re vebêjin, lê ev tiştên bermayî û parçe parçe bêyî ku biaxivin her tiştî didin fêmkirin. Êş û azarê ku gelê Şaxê ji dijminê dagirker, neyar û xayînên Kurd kişandiye kêmî herêmên din ên Botanê nîne. Lê wan êş û azaran gel ji têkoşînê bêzar nekiriye û îdîaya gel a têkoşînê lawaz nekiriye.

Gelê herêmê ti carê ji çanda kevnar a berxwedan û welatperweriya xwe şerm nekiriye. Ji salên 1980'î şûnde bi saya Rêber Apo û hebûna PKK'yiyan di herêmê de gel bêhneke rehet kişandiye û çiqas êş dîtibe jî heya niha bi serbilindî qala têkoşîn û destkeftên xwe dike. Ji salên 1990'ê şûnve rakirina paygeh û tepeyên dijmin ji aliyê gerîla ve taybet li vê herêmê, bûye îlhama serhildan û çalakiyên aktif a gel û hêz daye berxwedana wan. Dema ku giştî alana Kato Xelîla, taybet jî du tepeyên Çêla Buka ji artêşa dagirker tên paqijkirin, êdî ew qad ji leşkerîbûnê rizgar dibe û zozanên Kato Xelîla ji bo çêrandina ajalan, danîna zom û debara jiyanê ji gel re vedibe.

Tevlêbûnên mirovên vê herêmê ji bo refên tevgera azadiyê dibe sedem ku gelek kesên bûne çeteyên dewletê û çek rakirine êdî xwe nêzî doza gelê xwe bikin û eger newêrin çek deynin jî, qet nebe neçin operasyonên dijî gerîla. Berxwedan û şehadeta hevalên bi navê Cemîlê Mezin, Dijwar, Êrîş û gelek şehîdên din ên ji vê herêmê hê mîna destanan dev bi dev tê vegotin. Bi taybetî kesên ku Şehîd Ronahî Alman (Andrea Wolf) dîtine û nas dikin bi şanazîya ku ew bixwe jî şahîdî parçeyeke vê dîroka berxwedanê ne mîna efsaneyan ji nifşên nû re qal dikin. Gelê wir tevî ku bi dehan sal ser re buhuriye jî di dil de hezim nekiriye ku Şehîd Ronahî di şereke sala 1998'an de bi birîndarî ketiye dest, leşker çûne ser û bi êşkenceyê ew înfaz kirine.

Hem ev, hem jî "gorên komî" ku dijmin termên gerîlayan tê de veşartiye yan jî termên welatparêzên ku bi destên kiryarên nediyar hatine înfazkirin avêtiye nav de, ji aliyê gelê vê herêmê ve weke

şermekê ji bo mirovahiyê tê dîtin û ji bo ku ew lekeyên reş ji ser rûyê mirovahiyê paqij bibin gelek caran vî gelî helwest nîşan daye. Bi taybetî ew gora komî ya ku leşkerên Tirk Şehîd Ronahî Alman û 27 rêhevalên din avêtine nav, di aliyê derûnî û hest de bandoreke pir giran li şêniyên vê herêmê kiriye û ev bandor heya niha jî mîna roja destpêkê girane û birîna wê di dilê gel de vekiriye.

Êş û birînên ku di beden de çêdibin demeke kurt mirov dêşînin û bandorê dike, lê piştî ku derbas bû ji bîra mirov diçe. Lewre şop li ser derûn û rihê mirov nahêle. Lê belê birînên ku di dil û kezeb de vedibin eger dehan sal, heta sedan sal jî ser re derbas bibe mîna roja destpêkê tim têşin û jan didin hinavên mirovên vê civakê. Mîna roja destpêkê mirovan ji dil dihejînin û dikevin nav xewn û xeyalan de. Şopa birînên bi vî awayî ti carê ji zîhnê mirovên vê civakê ranabe. Heta eger kesên şahida/ê buyerê jiyana xwe winda bikin jî, ew civak heya hebe dê wê şopa xedar bi xwe re rake. Ew “gorên komî” û “kuştinên kiryar nediyar” jî birînên wisa xedarin di dil û hinavê civaka Kurdistanê, Botan û taybet jî Şaxê de.

*****

Aysel zaroka çand û serpêhatiyeke wisa bû; li milekê êrîşên dijwar û xedar, li milê din berxwedan û serî netewandin! Li aliyekê bihîstina çîrokên lehengiyên gerîla, li aliyê din bihîstina dengê qîrîna kesên herî zêde ji wan hez dike di bin êşkenceyan de li girtîgehan!. Hê di temenê zaroktiyê de tim dibîne ku gelek mirovên wê yên nêz lingeke wan li malê, lingê din di hewşa paygeh û girtîgehan de ye. Bavê wê seherê di nav xebatên DEP’ê de, êvaran destên wî kelepçekirî di maşîna cendirmeyî de li ser rêya paygehêye.

Li aliyê din jî malbata wan di nav refên PKK´ê de ku weke yekane tevgera azadiya gelê Kurdistanê tê pejirandin bedel dane, tevlêbûn û şehîdên wan hene. Bi bandora tevahî van bûyeran Aysel ji zaroktiyê ve doza azadiya gelê xwe nas dike û bi çanda welatparêziyê tê mezinkirin û perwerdekirin. Lewre ji temenê zaroktiyê ve meyla wê ji bo şoreşgerbûnê pêş dikeve û li benda mezinbûnê dimîne.

Ji eşîra wan re eşîra Xelîlan tê gotin. Eşîra Xelîla yek ji eşîrên kevnar ên vê herêmê ye. Çiyayê Kato Xelîla ku ji milê başûr ve ser gundê Xumarê de serwere, bi navê eşîra wan e.

Dijmin mîna gelek malbat û eşîrên din dest davêje vê malbatê jî. Ji eşîra wan hejmareke zêde çete bi dest dixe û çekdar dike. Eşîra wan çiqas li ber xwe bide jî, di encamê de dibe du parçeyên beramberî hev. Parçeyek bi bihayê canê xwe her bedelekê dide ber çav û ji refên gelê xwe qut nabe, parçeyê din jî dikeve bin bandora neyarên xwe û bi malbat, dost, nas û gelê xwe re tê hember hev. Aysel ji fêmkirina van lîstokên qirêj ên dijmin dereng namîne. Pir zû pê dihese ku dijminî ev nakokî û dijbertî xistiye nav wan de. Lewre dilê wê yê zarok tijî kîn û nefret dibe. Rûmeta welatperwerî û netewiya wê ranake ku rewşa malbata wê bi vî awayî be. Lewre bi lez ev kîn û nefret di dilê wê de mezin dibe û vediguhere sonda qezenckirina çeteyên eşîra xwe û dawîanîna li wê rûreşiya mezin.

Bi  kîna mezin ku di dilê wê de li hember dijminan weke volqanekê amadeye ji bo teqînê û bi evîna azadiya gel û welatê xwe ku di dilê wê de weke lehiyê rabûye sala 2003'yan di temenê 15 salî de bi tevî hevala xwe Amara ku pir jê hez dikir, tevlî nav refên gerîla dibe.

Aysel di nav jiyana şoreşgerî de bi lez pêş dikeve û di qadên Xinêrê, Xakurkê û Zagrosan de tevlî xebatan dibe. Ji ber temenê wê yê ciwan, rêxistinê çend salan ew di nav xebatên ciwanan de hişt. Lê belê meyla Ayselê ji bo xebatên YJA-STAR´ê ti carê kêm nebû, berovajî, her ku çû mezintir û zêdetir bû. Di encamê de piştî sê sal xebatên ciwanan gihişt wê daxwaza xwe û derbasî qada leşkerî bû.

Taybetmendiya wê ya wêrek, zekî û bi xwestekbûn kesayeteke piralî di wê de ava kir; ji ber zekaya zêde û atîk zû fêrî tiştan dibû, zû tehlîl û şîrove dikir, zû fêm dikir, zû nêrîn di serê xwe de amade dikirin, zû pilan û bername datîna û zû wana dixist pratîkê.

Di warê hunerî de Aysel jî mîna Azad pir jêhatî bû. Girîngî dida nivîs, wêje, helbest, stran û folklorê û zû fêrî xebatên wisa dibû. Di mijarên leşkerî û çekan de jî wisa bû. Mejî û zekaya wê pir bi lez dixebitî û têrî her tiştî dikir.

Huner kesayeteke nerm û narîn dixwaze. Kesayeta Ayselê ya nerm bi narînbûna huner û wêjeyê re li hev dikir. Ji xwendina helbestan hez dike û bixwe jî helbestan dinivîse. Gelek caran raman, helwest, hest, xeyal û hêviyên xwe bi rêya helbestan dianî ziman. Pir girîngî dida rojnivîsê. Rojnivîs weke çandeke gerîla didît û giraniya pêwîst didayê. Hest û nêrînên xwe gelek caran diteyîsand ser rojnivîsa xwe. Îlhama ku ji Parêznamyên Rêber Apo digirt, nepejirandinên xwe yên li beramberî

dîlbûn û tecrîda ser Rêbertî, hestên xwe li hember Rêbertî, rêhevaltî û hwd. cur bi cur hestên xwe bi helbestan bilêv dikir. Di helbestên xwe de hemû rih û hestên xwe tevlê dikir û diberiqand.

Bi rastî jî rojnivîs di nav gerîla de bûye çandek. Helbest nivîsandin jî wisa tişteke hêjaye. Dibe ku hemû heval helbestan nenivîsin, lê ji sedî heştêyê hevalan gelek caran bi helbest û nivîsên wêjeyî hestên xwe bilêv dikin. Heta hevalên ku di warê nivîsandin, wêje û xwe anîna ziman de pir xurt nebin jî bi îfadeyên pir sade kêm jî be helbestan dinivîsin. Mirov dema helbesta hevaleke wisa dixwîne eger di warê wêjeyî de dewlemend nebe û kêmbûnên wê hebin jî, mirov hîs dike ku wê hevalê hestên xwe pir sade, pir xweşik, pir vekirî û bêyî perde û rûpoşan aniye ziman. Wê demê mirov heyran dimîne ji wê hunera wan re. Lewre gerîla ji bo nivîsandina helbestekê, yan nivîseke wêjeyî pir li peyvên balkêş, rengareng û edebî nagerin; hestên wan çi be bi zimanê herî sade bilêv dikin.

Aysel jî wisa bû. Di helbest û nivîsên xwe yên ji bo Rêber Apo de hemû lêhûrbûn û fêmkirinên xwe ji Rêbertî, girêdayîbûna xwe, îlham û hêza ku jê digire û hemû hest û hîsên xwe yên derbarî wî de pir sade aniye ziman. Gelek caran di dilê xwe de bi Rêbertî re diyalog kiriye û teyîsandiye ser rûpelên rojnivîsa xwe. Herwiha gelek caran di nav rojnivîsa xwe de name ji Rêber Apo, rêhevalên şehîd, hevalên ku pir bêriya wan dikir, dayîka xwe re nivîsandiye, ser xweza û gelek tiştên din jî dinivîsand û hestên xwe beramberî wan dianî ziman. Ayselê ji bo bilêv û bidengkirina kelecan û volqana nav dilê xwe pêdivî bi peyvên cuda nedidît û li tiştên wisa nedigeriya; ji ber ku hestên wê bihayê her tiştî bûn.




Aysel ji destpêka tevlêbûna nav refên

gerîla ve Şehîd Vejîn Soran nas dikir, pir jê hez dikir û pêve girêdayî bû. Di xebatên ciwanan de bi hev re mabûn, piştre di xebatên YJA- STAR´ê de û li Botanê bi hev re man. Şehîd Azad Bedlîs û Şehîd Rizgar jî nas dikirin. Dema ev heval di çalakiya Hêşatî de şehîd ketin, Aysel ji dil birîndar bû. Bi taybetî Şehîd Vejîn parçeyeke mezin ji dilê wê bi xwe re biribû. Di rastiyê de ti kes nebû ku ji şehadeta wan hevalan bandor nebibe, lê hevalên ku ew nas dikirin hê zêdetir bandor bûn. Aysel jî yek ji hevalên ku ew şehîd nas dikirin bû. Ji ber vê, bi şehadeta wan re di kûrahiya dilê xwe de jan girt. Êş û janên ku di dilê xwe de hîs dikir di rojnivîsa xwe de herikand nav helbestekê:

***LI TE DIGERIM (SENİ ARIYORUM)***

*Li te digerim di tarîtiya şevan de (Seni arıyorum gecelerin karanlığında)*
*di şemitîna stêrkan de (yıldızların kayışında)*
*û di derketina heyva çardeh şevî de heval. (ve dolunayın doğuşunda heval.)*
*Geh dibe perperikek (Bazen bir kelebek olur)*
*NÊRGIZ'an bêhin dike (NERGİZ'leri koklar)*
*li ezmanê şîn digere, (mavilikleri gezer,)*
*geh jî dibe teyreke baz (bazen de bir şahin olup)*
*difire ji warên bêkes re (uçar kimsesiz diyarlara)*
*ev dilê min. (bu yüreğim.)*
*Dibe ku li wir (Belki orada)*
*Belkî jî li Herekola Mîra (belki de Herekola Mîra'da)*
*Li rastî şopeke te were (bir izine rastlanır diye)*
*bi rojkirina şevan (geceleri gündüz yapıp)*
*bûm meşgerê hemû şêverêyên tu lê meşiyayîdi. (dolaşır oldum yürüdüğün bütün patikaları.)*
*ji ber ku cihên herî dawî tu jê qut bûyî bûn (Çünkü en son ayrıldığın mekanlardı)*
*Herekola ku niha li beramberî min rawestiya ye. (şu an karşımda durmuş olan Herekol.)*
*Piştî ku tu çûyî (sen gittikten sonra)*
*Besta li payîzan (Besta sonbaharlara)*
*Herekolê jî li zivistanan xwe pêçand (Herekol ise kışlara büründü)*

*cilê spî yê bûkîniya xwe li xwe gerand (beyaz gelinliğini giyip)*
*şîn girt. (yas tuttu.)*
*Ji bo sê şitil (Üç fidan)*
*sê dilan (üç yürek için)*
*Bestayê jî pelên zer yek bi yek (Besta ise sarı yaprakları birbir)*
*rijand ser axê (toprağa serpti)*
*bi tevî rondikên xwe (gözyaşlarıyla beraber)*
*da ku bi biharê re şitlên nû (ki baharla birlikte yeni fidanlar)*
*şîn bibin (yeşerip)*
*xunçe NÊRGIZ´ê bipişkivînin (tomurcuklar NERGİZ* açsın)*
*tav AZAD derkeve (güneş AZAD doğsun)*
*û ji bo ku hemû girtî bibin RIZGAR. (ve tüm tutsaklar RIZGAR olsun diye.)*

******

A rast hemû beşên hunerê hest û nermbûnê dixwazin; helbest, pexşan û nivîsên wêjeyî, folklor, şano, nîgarkişandin, heykel çêkirin, stran û hwd. Mirov ger hestên xwe tevlî berhemên xwe neke wê nekaribe naveroka wan bi wateyê tijî bike. Aysel jî mîna gelek rêhevalên xwe yên din di hemû van beşan de jêhatî derket. Ev pir alîbûna wê hem bi lez ew pêş xist, hem jî bi lez cihê wê di dilê hevalên wê de vekir. Perwerdeya ku li Akademiya Şehîd Bêrîtan dît, hê zêdetir zemîn jêre vekir ku di warê bîrdozî de jî kûrtir bibe. Şanoyên ku Ayselê senaryoya wan çêdikir û tê de rol dilîst, herwiha klîpa “Em Tîrêjên Rojê ne- Rêwiyên Azadiyê ne” ku bi hejmarek hevalên din re hevbeş di Akademiyê de çêkirin heya niha di nav giştî hêzên YJA-STAR û tevahî qadên rêxistinê de li ser zimanan digere û wer xûya dike ku wê her wisa bimîne. Welatparêz, sempatîzan, jin û ciwanên ku ji vê klîpê bandor bûne, ango bi bandora wê tevlî partiyê bûne ne kêm in.

Aysel sala 2009'an bi pêşniyar û daxwazeke zêde derbasî qada Botanê bû. Armanca wê ji çûna Botanê tenê şerkirina li hember dijminê dagirker û qewitandina wî ji axên Kurdistanê nebû, di heman demê de dixwest çeteyên eşîra xwe jî qezenc bike, dest ji çekê dijmin bi wan bide berdan û wan bikşîne nav refên gelê xwe. Bi van armanc û

---

* **Nêrgiz navê şehîd Vejîn e**.

îdîayan derbasî qadeke nû ya têkoşînê bû û li herêma Kato Xelîlayê dest bi têkoşînê kir.

Çûna Kato Xelîla ku warê dapîr û bapîrê wê bû û lê mezin bibû hesteke pir xweş dida wê. Aysel ku ewqas hestên netewî tê de li pêş bûn û tim ji her qadeke têkoşînê re xwe amade hîs dikir, li kêleka rihê netewîbûnê, ev jî dizanî ku mirov eger warê jidayîkbûn û mezinbûna xwe ji bîr bike wê ji reh û dîroka xwe qut bibe, ango bi gotineke kevnar a Kurdî “her giyayek li ser reha xwe şîn dibe.” Jixwe di nav gerîla de ev gotin bi navûdenge û jê tê bawerkirin. PKK bixwe tevgereke hem netewî, hem jî navnetewiye û ji gelek gelên cîhanê gerîlayên wê hene. Di vê ferasetê de herwiha civak û axa dayîkê ti carê nayê paşçavkirin û tu kes reha xwe jibîrnake. Ev rêgez bi qasî hevalên Kurd û Kurdistanî, ji bo hevalên ne Kurd û Kurdistanî jî pîvaneke serekeye û tê pejirandin.

Ji bo Ayselê jî wisa bû. Piştî şeş salan ji nû de dîtina herêm û warê ku lê mezin bûye, tê de tevgera azadiya gelê xwe nas kiriye û tê de êş û êşkenceyên ser gelê xwe dîtiye hemû bîranînên zaroktiya wê anîn bîra wê. Û ji ber ku heval her tim ji bo destwerdana vê rewşa dasepandî li wir hebûne dilxweş bû. Vê carê jî ew bixwe hatibû destwerdanê û wê nehişta ev gel ji vê zêdetir êşê bikşîne.

Carekê dema ji Katoyê ve li gundê xwe û gundên cîran dinêriya, ji hevalên ba xwe re got: “Berê ez Aysela keça van gundan bûm, lê niha Aysela van çiyayanim. Pir xweşe ku mirov li warê dayîk û bavê xwe şoreşgertiyê bike. Peyva şoreşger çiqas xweşe, Ya Star!...” Dema wisa got hevalan jî pêre henek kirin û bi ken jêre gotin: “zêde herêmgeriyê neke”, lê bersiva Ayselê mîna her tim amade bû. Wê jî bi henek bersiv da û got: “ma ez çi bikim, jixwe partiyê ez şandime vir ji bo ku herêmgeriyê bikim.”

Dema di erdnîgariya Kato Xelîlayê de digeriya ji hevalan re qala wan rojên zaroktiya xwe dikir ku bi tevî kesên derdora xwe ji Xumarê ve li van çiyayan meyzandiye û ji mezinên xwe pirs kiriye ku “gelo li wir jî gerîla hene yan na? Kîjan heval li wir in? Gerîlayên jin jî dikarin li wir bijîn?...” Niha jî bi gotinên xwe yên wan deman dikeniya û digot: “Zarok çiqas saf û paqijin! Her tişt ji wan re pir mezin, awarte û wek xeyalan tên. Niha kê dizane çend zarok heman tiştan ji bo me dibêjin!”

*****

Aysel demekê rastî hişmendiya desthilatdarî û ferdperestiya zilam hat û ji vê zorî kişand. Bi prespektîfên ku ji pirtûkên Rêber Apo

xwendibû û perwerde li ser dîtibû, hişmendiya zilam nas dikir. Fêm dikir ku Rêbertî her ji destpêkê ve li hember vê hişmendiyê rawestiyaye û şervanên jin jî fêrî têkoşîna li hember zilam kiriye, heta bixwe rasterast bi hezaran hevalên jin re ji nêz ve mijûl û elaqedar bûye û di vê mijarê de ew perwerde kirine. Aysel ji berê de gelek diyalog û giftûgoyên ku Rêber Apo bi şervanên jin re kiribû xwendibû yan jî bihîstibûn. Ev nêrînên Rêbertiyê tim hêz didan wê û ji wê re dibûn çavkaniya îlham û hêza têkoşînê. Bi vê re hê baştir fêm dikir ku Rêber Apo çima pirtûka “Kuştina Zilam” nivîsandiye, ango çima “Bîrdoziya Rizgariya Jinê”, “Teoriya Qutbûna Ji Zilam” û “Qutbûna Bêdawî” pêşkeşî tevgera azadiya jinê kiriye. Van di wê de bingeheke îdeolojîk a xurt û qayim ava dikirin.



Lewre zorî û zehmetiyên ku ji ber ferasetên çewt ên zilam dikişand ew ji têkoşînê bêhêvî û sar nedikir, berovajî, zêdetir hêz û vîn digirt ku hişmendiya pênc hezar salan a zilam tehlîl bike. Aysel mîna hemû mijarên din, di vê têkoşînê de jî pir ji xwe bibawer bû û taybetmendiya serî netewandin û asîbûna wê xwe dida der û kesayeta wê dixemiland.

Aysel di nav hevalên xwe de bi asîbûn û ji xwe bibawerbûnê dihat naskirin. Gelên çiyayî, taybet jî jinên ku li çiyayan mezin dibin tev wisa asîne. Erdnîgariya her welat û deverekê bandorê li şêniyên xwe dike. Erdnîgariya Kato Xelîla jî mîna hemû erdnîgariyên din kesayetên asî ku tim berê wan li bilindahiyan be afirandiye.

Kato Xelîla xwedî eraziyeke sertaser şkêr, zinar û latên bilinde. Xwezaya wê bi awayê korîdor bi korîdore. Kato Xelîla, Katoya Navîn û Kato Şamanos bi rêya korîdorekê ji hev qut dibin û dîsa di vê korîdorê

de digihîjin hev û bi hev ve tên girêdan. Lewre di giştî de ji hemûyan re Kato Xelîla tê gotin; Katoya Navîn û Kato Şamanos weke du baskên heman çûkê ne.

Di Kato de tenê darên qaça nerm ku çam jî jêre tê gotin hene. Ev dar bixwe pir hişkin lê pelên wan mîna striyên qaçên Kato Jîrkayê tûj nînin û li laşê mirov re naçin. Dema mirov ji navsera Kato dakeve gelek darên din, herî zêde jî berû, mazî û kezvanan dibîne. Li wan deran qaç zêde nînin. Qaç dareke asîye ku li her derê şîn nabe; dibê qey her derekê naecibîne. Qaç li Katoyê nav dilê zinar û şkêrên bilind diqelişîne, rehên xwe berdide nav sînga zinaran û têde hêlîna xwe çêdike. Qaçên latên bilind destûr nadin her kes destên xwe bigihîne wan û bivira xwe li wan bixe.

Aysel jî wisa bû û diviya ti kes rehet nêzî wê nebûya, ji ber ku ew keça asî ya tevgereke bilind û asî bû; tevgereke ku li hember hemû zordarî û zordarên vê cîhanê serî hildabû û li ber xwe dida. Ev tevger ji aliyê Rêbertiyê ve weke “Partiya Şehîdan” û “Partiya Jinê” hatibû binavkirin. Vê, enerjî û riheke hê xurttir û mezintir dida tevgera azadiya jinê. Aysel çend sal bû endama vê tevgerê bû û tê de perwerdeya Rêber Apo didît. Bi van perwerdeyan wêrekî û îradeya têkoşînê bi dest xistibû û li hember her zorahî û her sepandineke çewt pala xwe dida rêgeza têkoşînê.

*****

Li Kato Xelîlayê, Ayselê bi lez dest bi xebatên qezenckirina çeteyan; hem ên nav eşîra xwe, hem ên din kir. Bibiryar bû ku wana bi doza gel bide qezenckirin. Eger vê bi sernexista ewê li xwe nebuhurîba û xwe efû nekira. Li wir gelek bi hemû çete û çekdarên gundên wê derê, taybet ên eşîra Xelîla re mijûl bû. Gelê Kato Xelîla û koçerên ku ji Sêrt, Hezex, Cizîr û heta Êlihê ji bo koçeriyê dihatin wê herêmê pir jê hez dikirin, lê guhdar dikirin û jê bandor dibûn.

Carekê komek dayîk û keçên ciwan ji bo dîtina hevalên jin bi hev re hilkişiyan navsera Katoyê. Aysel û Berbang çûn pêşwaziya wan. Dema çûn hê ew jin negihîştibûn jorê. Heval demekê man, dayîkek hat. Deh xulek şûnde sê xwuşkên ciwan bi barên tijî ji jêr ve xûya kirin ku ber bi wan ve hildikişin. Dema gihîştin jorê Berbangê ji Ayselê re got: “Xeyal bike niha li vir kameravanek hebûya, wêneya van keçan bigirta, wêne di rojnameya Azadiya Welat de bihata weşandin. Gel wê çiqas ji vê wêneyê bandor bibûya ku êdî li Kurdistanê keçên ciwan

mîlîstiyê ji gerîla re dikin! Kê vê wêneyê bidîta dê bandor bibûya.” Keçên ciwan êdî nêz bibûn û deng çû guhê wan. Bi hev re keniyan û gotin: “Bi saya we em hene. Heval Aysel derket çiya û em hemû pey xwe de kişandin vir...”

Sala 2010´an hejmarek keçên ciwan li Kato Xelîla tevlî patiyê bûn. Du ji wan mirovên Ayselê bûn. Aysel nav û paşnavên wan bi navê hevalên şehîd kir û navê wan kir Silav û Avaşîn Êrîş. Ew di heman demê de heval û hevlîstokên zaroktiya Ayselê bûn û bi bandora wê tevlê bibûn.

*****

Rojekê du keçapên hev ji koçerên Şemsikî yên bi navên Eylem û Mizgîn tevlê bûn. Dema ji taximê re agahî hat dayîn ku du şervanên jin tevlê bûne, Aysel û Gizîngê xwe ji navserê berdan û ji bo pêşwaziya wan çûn alana Şehîd Dilsoz. Dema gihiştin wir hê şervanên nû nehatibûn, lê baveke bitemen bi tevî kurê xwe li wir, gel hevalan bû. Kurê wî 8 salî bû, navê wî Ehmo bû. Ya rast, navê wî Ehmed bû lê bi giştî Kurd nav û peyvên biyanî ditewînin û dişkînin, bi vî awayî navên biyanî xira dikin û rêça sedan sal a berxwedaneke çandî ya kevnar didomînin. Xirakirina navên biyanî weke helwest û adetekê lê hatiye; herçiqas êdî li hin cihan navên Kurdî jî tên tewandin û xirakirin.

Sala 2010´an li Botanê xwekuştina jinên ciwan zêde bibû. Gelek caran keçên dixwestin tevlî gerîla bibin ji aliyê JÎTEM’ê ve bi wan dihat leyîstin, wan keçan piştre ji bo malbat bi rewşê nehesin xwe dikuştin, an jî yên gundê wan nêzî Çemê Botanê bû xwe davêtin nav çem. Hin xwekuştin jî bi sedemên evînî, bêbawerî û tohmetên malbat û derdor, zewacên bi zorî û hwd. bûn. Vê rewşê, wê rojê jî mejiyê Aysel û Gizîngê pir mijûl kiribû, ji ber ku egera malbatên van şervanên nû pey wan bikevin û tiştekê bînin serê wan hebû. Ji bo ku vê stresê hinekê ji ser xwe belav bikin, heya ku îşê hevalên wir bi bavê Ehmo re biqede Ehmo anîn gel xwe, pêre hinekê leyîstin û henek kirin. Di nav axaftinan de Ehmo ji Gizîngê pirs kir: “Navê te çiye?”

Gizîng: Evdul Rezaq.

Ehmo: Na wele, navê te Eyşê ye. (berê xwe da Ayselê) Heval, navê te çiye?

Aysel: Navê min jî Evdul Xaliq e.

Ehmo: Naaa. Navê te jî Fatê ye.

Aysel: (wekî ku xeyîdîbe) Me navê xwe got. Tu çima navê me dikî Eyşê û Fatê îcar?

Ehmo: Ew navê zilaman in. Hûn hevalên jin in. Hem jî Eyşê û Fatê ji wan navan zêdetir li we tê. (Aysel û Gizîng pir bi van gotinên wî keniyan. Piştî bêdengiyeke kurt) Heval, bavê min dibêje “gerîla hemû tiştên xwe ji daran çêdikin.” Ev raste?

Aysel û Gizîng çavê wan ket ser satrenca ku heval dendikên wê ji darê çêkiribûn. Ji bilî vê jî, nexwestin gotina bavê wî vala derxin, lewre bersiv dan: “raste, em hemû tiştên xwe ji daran çêdikin.”

Ehmo: (li çekên ku heval danîbûn ser çokên xwe nêrî) Heval, ev çek çima nîvê wî ji hesin e, nîvê wî dar e?

Gizîng: (hem bi bandora gotina bavê wî, hem jî fikirî ku ew zaroke û eger rola hesin û texteyên çek jê re bibêje jî ew fêm nake, lewre) Ev çek bi darê ve dibin, em jî jê dikin, pê şer dikin.

Di vê wextê de bavê wî ku deng bihîstibû ji milê din ve keniya û got: “Heval, hûnê niha kurê min dîn bikin.” Aysel û Gizîng bi vê keniyan.

Ehmo: (wekî ku ji bersivê bawer kiribe) Himm!.. Heval, çima pêlavên gerîla (meqap) hemû weke hevin, yek şêwe û yek rengin?

Gizîng: Ji ber ku hemû bi darekê ve dibin û em jê dikin, li xwe dikin. Lewma.

Ehmo: (dîsa) Himm!.. Heval, çima cilê we jî hemû weke hevin, ji rengê qalikê darê ne?

Gizîng: Ji ber ku em qalikên daran jê dikin, li makîneyê dixin û dikin paç, piştre didûrin û li xwe dikin.

Ehmo: (dîsa) Hiimm!... Dizanî Evdul Erzaq, di hewşa me de jî darek heye “hêk” pêve dibin! (zimanê wî nediqulibî ku bibêje Evdul Rezaq, digot Evdul Erzaq.)

Bavê wî û hevalên ku deng bihîstin tev bi dengê bilind keniyan. Vê carê Aysel û Gizîng bi ken ji bavê Ehmo re gotin: “Mamo, were kurê xwe bibe, ewê niha me dîn bike!”

Heval ku pir kêfa wan ji wî zarokî re hat û pir jê hez kirin ji bavê wî re gotin “ev zarok pir zekî ye. Xwezî li şûna Ehmo we navê wî bikira Zekî.” Li Botanê ev weke çandekê lêhatiye ku eger malbat bixwazin gerîla nav li zarokan dikin, heta eger nasname ji wan zarokan re hatibe girtin jî. Êdî malbat bi navên nû ku piranî navên hevalên şehîdin gazî zarokên xwe dikin. Ehmo jî ji ber ku ji navê xwe pir aciz bû, ji vê gotina

hevalan pir kêfxweş bû û êdî dema bi Ehmo bihata bangkirin bersiva kesê nedida. Lewma bavê wî neçar ma di qeyda nasnameyê de navê wî bike Zekî.

Ev bîranîn di zîhna hemû hevalên wê derê de weke bîranîneke pir xweş ma û bû behaneyek ji bo ku dem dem Aysel bela xwe li Gizîng bixe û jêre bibêje: “Tuyê careke din cesaret bikî bi zarokan re henek bikî? Zarokên niha wek agirin. Tu wan saf û nezan bibînî ewê jî wek Ehmo bînin serê te. Binêre navê Ehmo bedava bû Zekî, navê te jî bû Evdul Erzaq!” û pilqînî pê diket.

Piştî ku bavê Zekî îşê xwe qedand û çûn, du şervanên nû gihîştin ba hevalan. Hê baş bêhna xwe nedabûn ku ji malbat û eşîra Şemsikî gelek kes li pey wan hatin ji bo ku wan ji tevlêbûnê poşman bikin û vegerînin malê. Aysel û hevalên din du rojan bi malbatê re mijûl bûn, guftûgo kirin û hewl dan armanc, şerafet û rûmeta tevlêbûna keçên wan bi wan bidin fêmkirin.

Eşîra Şemsikî ji kevin de welatparêzin û di nav refên têkoşîna azadîxwaziya Kurdistanê de gelek Şehîd û gerîlayên wan hene. Her ji destpêkê ve ku Heval Egîd diçe Botanê, ev eşîr bêyî dudiliyê bijî deriyê xwe ji PKK´ê re vedikin, keda xwe tevlî dikin û tê de pir bedelên giranbiha didin. Ti carê tevlêbûnên ji eşîr û malbata xwe lêpirsîn nekirine û destûra vê nedane ti keseke din jî.

Tevî vê jî xuya bû ku di hin mijaran de bi çavê kevneşopiyan meyzandina li jinê di wan de tam derbas nebibû. Taybet jî, ji ber ku Mizgîn hê li ser derguşê li kurapê xwe hatibû markirin û bûka apê xwe bû, li pey wê ketibûn û dixwestin eger Eylem venegere jî qet nebe Mizgînê vegerînin malê.

Aysel ji van nizîkatiyan hêrs bû û dît ku her du şervanên nû jî ji gotinên malbatên xwe şerm dikin, bandor dibin û xwêdan ji rûyê wan re davêje. Lewre Ayselê û hevalên din hewl didan vê şerma dasepandî û neayîdê wan ji ser wan rakin û kêfxweşî û hêzê bidin wan.

Dema malbatan dirêj kirin Ayselê ji wan re got: “Hûn bixwe jiyana xwe ya şexsî dikin, asta welatparêziya heyî bes dibînin û xwe nadin ber erkên girantir ên vê şoreşê. Di vê qonaxa şoreşê de ku Rêxistina me ‘Şerê Gel ê Şoreşgerî’ xistiye rojeva xwe, erkên pir giran dikevin ser milên her takekesa Kurd û Kurdistanî. Malbatên Şehîd û gerîlayan divê barê pêşengtiyê rakin û ji her kesê zêdetir şervanan bidin û kar bikin.

Hûn li şûna pêşengtiyê bikin, hatine keçên xwe bibin. Ma ev ne şerme, ne lekeye ji bo rûmeta welatparêziya we? Evqas Şehîd ji malbata we hene, van gotinên we bibihîstana wê çi bigotana? Hûn çima tên lîstoka dijmin û pêşî li tevlêbûna ciwanan digirin? Qet nebe bihêlin bila ev ciwan bi vîneke azad bijîn û ji bo gelê xwe xizmetê bikin. Namûsa we welat û têkoşîna we ye, ne ev keçin. Tevlêbûna jinên ciwan pirsgirêka namûsê nîne, berovajî, li pey ketina we pirsgirêkeke namûsê ye. Eger hûn xwe welatparêz dibînin, li şûna hewldana ji bo poşmankirina vana, rabin tevlêbûna wan, çek û nav û cilên wan ên nû li wan pîroz bikin û xatir bixwazin biçin malên xwe."

Malbatên şervanan li hember van axaftinên Ayselê matmayî man û bêdeng heya dawiyê guhdar kirin. Ji van gotinan pir bandor bûn û rabûn biçin. Dema xwestin biçin, heval hemû ji bo xatirxwestin û rêkirina wan rabûn ser piyan. Malbat ku rabibûn xatir bixwazin keçên xwe derbas kirin û çûn rûyê Ayselê, lê Ayselê nehişt wê maç bikin. Ji wan re got: "Heta hûn keçên xwe maç nekin û xatir ji wan nexwazin, em nahêlin ji me xatir bixwazin."

Malbatan nexwest ji ya xwe dakevin û her israr kirin. Bi vê re Ayselê û hevalên din jî di ya xwe de israr kirin. Ayselê dîsa got: "Eger ji keçên xwe xatir naxwazin ji me jî nexwazin, biçin." Vê carê malbatan dema israra hevalan dîtin neçar ji ya xwe daketin; çek, cil û navên nû li keçên xwe pîroz kirin û ew maç kirin. Piştre bi dorê ji hevalan jî xatir xwestin û çûn. Aysel û hevalên dî bi vê asîbûn û israra xwe, vê dilsoziya partiyê nîşan dan ku pêşî li xirabûna navbera du malbatan (ku mirovên hev ên nêzin jî) û xeyîdandina wan ji zarokên xwe, bigirin. Herwiha ew fêr kirin ku li hember vîna azad a ciwanên xwe rêz nîşan bidin.

*****

Ayselê heya payîza 2010´an li herêma Kato Xelîlayê xebatên xwe meşand. Zivistanê bi tevî endamên din ên tîma xwe derbasî Kato Jîrkayê bû û bi Ronahî, Zîlan, Havîn, Rojbîn û hejmarek gerîlayên din ên jin re xweser man û perwerdeyeke têr û tijî derbas kirin. Bi giştî hevalên jin ji zemînên wisa xweser ku ew bixwe tenê bin, yanî hemû hevalên jin bin pir hez dikin, ji ber ku ew di zemînên xweser de xwe azadtir û rehettir hîs dikin.

A rast zemînên giştî ku hevalên xort tê de bin jî, ayîdê xwe dibînin û di wir de jî xwe li hember perwerde, jiyana rêxistinî, avakirin û meşandina rêhevaltiyeke rast berpirsyar dibînin, lê dîsa jî bi gotina



wan bixwe “tama zemîna xweser cuda ye.” Wan, wê zivistanê hûr û kûr ser taktîkên Şerê Gel ê Şoreşgerî xwe perwerde kirin û guftûgoyên berfereh û kûr meşandin. Heya biharê xwe baş amade kirin, biharê bi vê amadekariyê ji kampa zivistanê derketin û derbasî qadên nû yên xebatên xwe bûn.

Ayselê dixwest hemû Botanê bigere û bibîne, lewre zivistanê ji rêveberiya xwe re pêşniyar kir ku vesaziya wê ji bo alaneke din ango alaneke derveyî Kato Xelîlayê çêbibe. Ev pêşniyara wê hat pejirandin. Ser vê bingehê wê derbasî Bestayê, taxima herêma Hêzilê bibûya û li wir li ser tîmê bihata erkdarkirin. Bi vî awayî bihara 2011'an bi helandina berfê re bi tevî Zîlan, Ronahî, Havîn, Dîdar û Arjînê ji kampa zivistanê derket û ber bi alana xwe ya nû ve bi rê ket. Tîma wan a nû destpêkê bi tevî Ayselê, ji Şerda Gever, Hêvarîn Efrîn û Sema Koçer pêk dihat. Destpêka havînê Hêvarîn û Sema ji bo Başûr hatin şandin. Ji ber valatiya ku ji çûna wan di tîmê de çêbû, Evîndar Gever ku heya hingê di taxima Şehrîbanê de bû ji wir hat kişandin û derbasî tîma Ayselê hat kirin.

Taxima Hêzilê ji milê başûr ve heya Kêla Memê, ji milê bakur ve heya Kor Qendîl û eraziya Berwariyê, ji aliyê rojhilat heya Kato, ji rojava ve jî heya Sêgirkê wan deran xwedî înîsiyatîf bû. Aysel jî bi tevî tîm û taxima xwe di tevahî vê alana fireh de heya payîzê bihust bi bihust geriya û erazî, gel û koçerên alanê û hedefên dijmin keşf û nas kirin.

Destpêka payîzê Heval Sosin ku fermandara herêma Katoyê bû, bi rêya cîhazê Aysel agahdar kir ku birayê wê yê biçûk tevlî refên gerîla bûye û niha li Kato li ba wan e. Ji bo vê jî ew dixwazin Aysel biçe gel wan, birayê xwe bibîne. Aysel bi vê mizgîniyê gelek kêfxweş û şa bû. Hemû hevalên taxima wan yek yek çûn tevlêbûna birayê wê lê pîroz kirin. Lê di nav vê kêfxweşiyê de nedizanî ku di remz (şifre)a cîhazê de dîroka ku ji bo hevdîtina wê û birayê wê hatiye destnîşankirin şaş fêm

bûye. Roja ku Ayselê xwest ber bi Katoyê ve bi rê keve, di cîhazê de jêre agahî hat ku birayê wê roja berê ji bo Başûr re hatiye şandin û Aysel dereng maye. Sosinê heta çûna birayê Ayselê ji bo Başûr çend rojan dereng jî xist da ku Aysel karibe xwe bigihîne birayê xwe û wî bibîne.

Haya Sosinê jî nebû ku taxima Ayselê dîroka diyarkirî di cîhazê de şaş fêm kirine. Sosin bi salan bû Aysel nas dikir û dizanî ku yeke hişyare û xemsar nîne. Lewre mat ma ku Aysel çima xemsar nêz dibe û naçe gel birayê xwe! Di encamê de dema dîtibû ku tevî du caran bangkirina ser cîhazê jî Aysel her naçe, neçar mabû bi derengî jî be birayê wê bişîne Başûr.

Ayselê pir dixwest ji malbata wê hinek tevlê bibin. Sala berê du keçên mirovên wê Silav û Avaşîn tevlê bibûn, lê ji malbata teng, ango ji xwuşk û birayan ti kes tevlê nebibû. Vê carê birayê wê yê biçûk tevlê bibû, lê ji ber şaş fêmkirinên ser cîhazê hevdu nedîtin. Ev di dilê wê de ma û dema hevalan ji ber neçûna Kato û nedîtina birayê xwe ew rexne kirin, ji wan re got: “Min bizaniya not wê şaş fêm bibe, ezê bixwe biçûma ser cîhazê, ezê bixwe bi Heval Sosin re axivîbama. (Bi ken) Ev nêzî neh sale min ew nedîtiye, niha kê dizane çiqas mezin bûye! Nizanim eger min ew bidîta minê ew nas bikira yan na, ji ber dema ez tevlê bûm ew hê zarok bû. Eger min ew bidîta wê ji bo moral û tevlêbûna wî jî baş bûya. Çi bikim, êdî çû. Ev dijmin wê destûr bide di pêşerojê de em hevdu bibînin an na, ev jî nediyare...”

Dema ev gotin digot li dûr, li cihên bilind dinêriya. Hevalên derdor aciz bûn û gotin: “Ev çi axaftine, her hal hûnê hevdu bibînin! Sal neketine torbê de!” Ayselê bêdeng her du birî û milên xwe bi hev re rakirin hewayê û bêyî ku biaxive bi awirên xwe got: “tiştek diyar nîne!” Ev daxwaza dîtinê di dilê wê de ma. Dibê qey Ayselê hîs dikir ku di demeke nêz de wê bûyerek biqewime û tiştek an bê serê wê, yan jî bê serê birayê wê û ewê hevdu nebînin. Dîsa jî ji bo ku hevalên wê ji ber hev nedîtina wan xemgîn nebin, bi lez rojev guhert û axaftin bir ser mijarên din.

Aysel û tîma wê heya payîzê di alana Hêzilê de kar û xebatên xwe meşandin. Keşfa erazî û hedefên dijmin, naskirina gel, tevlêkirina şervanan û çalakiyan dan pêşiya xwe. Payîzê, heyva Cotmehê jî li gorî biryara fermandariya giştî ya Qada Botanê ji bo ku zivistana pêşiya xwe di kampeke xweser de bi hêzên din ên li herêma Bestayê re hevbeş derbas bikin ber bi Besta Navîn ve rê ketin.

*****



***Nasnav: Mahsum Bagok***
***Nav û Paşnav: Ahmet Aktaş***
***Dîrok û Cihê Jidayikbûnê: 1’ê Çileya 1979’an Mêrdîn***
***Navê Dayikê: Menci***
***Navê Bav: Musa***
***Dîrok û Cihê Tevlîbûnê: 1.12.2003/Mêrdîn***
***Dîrok û Cihê Şehadetê: 13-15’ê Sibata 2012’an li Botan-Besta***

**Heval Mehsum Bagok**

Mahsum ji Mêrdînê, ji navçeya Mîdyadê bû. Ew jî mîna Ronahiyê Torî'ne. Malbateke pirhejmarin; sêzdeh kesin, yanî yanzdeh xwuşk û bira ne. Gelên ku di dîroka nêz û dûr de pir zêde rastî komkujî û qirkirinên fîzîkî hatine her tim bi derûniya parastinê dijîn û zêde anîna zarokan li dinyayê weke rêbazeke xweparastina ji tinebûnê dibînin. Lewre zarokên zêde ji bo gelên wisa adeta xweparastin, kevneşopiyeke civakî û şêwazeke jiyanê ye.

Ji bo Kurdan jî wisa ye. Tevî ku xizanî û hejarî di civaka Kurd de di asteke pir jor de ye, zarokanîna zêde mijareke lêpirsînê nîne û ziyana wê qet nayê lêpirsîn û guftûgokirin. Heta gelek caran eger ji kesekê bipirsî ku çima evqas zêde zarok anîne dinyayê, tuyê heman sê bersivên ku her tim dibihîsî careke din jî bibihîsî: “xwedê dide”, “ji bo ku kar bikin zarok çiqas hebin başe” û “eger em zêde zarokan neynin dinyayê ma Kurd çawa bimînin, çawa zêde bibin?” Heya nifşa beriya niha jî malbateke Kurd ku ji hejmara zede ya zarokan aciz û nerazî be yan tinebû, yan jî pir pir kêm bû ku nedihat zanîn.

Kurd zarokên zêde weke bereketa zêde dibînin. Di rastiyê de ev, ji derûniya bindestî û xweparastina ji tinebûnê tê. Yanî gotina “Kurd ji zarokên zêde hez dikin” pir kême ji bo ravekirina vê rewşê. Çiqas nêrînên cuda hebin jî, rastiya herî li ber çav, tirsa tinebûnê ye. Lê mixabin gelê Kurd bixwe vê bi vî awayî rave nake. Ev rewş bêguman, tenê bi gelê Kurd ve sînordar nîne. Hemû gelên ku gelek caran rûbirûyê qirkirinê hatine, taybet li Rojhilata Navîn, Hîndistan û Efrîqayê, bi vî awayî ne.

Malbata Mahsum jî yek ji wan malbatên sade ya Kurd bû ku ji serpêhatî û îşê xwedê bawer dike û zarokên zêde weke xenîmeta jiyanê dibîne. Dayîka Mahsum mîna hemû dayîkên din ên Kurd bi anîna her zarokekê re spasiya xwedayê xwe dike ji bo ku ji bo kêfxweşî û debara jiyanê bereketeke evqas mezin daye wan. Ji ber ku zarok bereketa xweda ne, nedibû spas nekira...

Malbata wan herwiha ji kedê bawer û hez dikin û ji bo bi destxistina bereketê, kedê mîna îbadeta rojane dibînin. Ked di civakên êşkişandî û talanbûyî de çande û pîroze. Yên kedkar xwedî rêzin û tên hezkirin. Kesên bêked nayên hezkirin, nayên pejirandin, kes wan ji xwe nabîne û li wan guhdar nake. Ked ser her tiştî re ye. Hemû bereketa jiyanê weke encama keda mirov tê hesibandin. Civakên wisa kedkar pir paqij û sade mane û dûrî her awayê xirabî û fêlbaziyekê jiyan dikin. Qet haya wan ji vê nîne ku çerxa sermayedarî û debara jiyana zordest û desthilatdaran ser talankirina ked û xwêdana eniya wan digere. Fêlbaziyê nizanin û qet lêpirsîn nakin ku çima tevî evqas kedeke mezin ku didin dîsa jî her tim birçî, xizan û li pey nan in, lê di beramber de, yên bêked her diçe dewlemendtir dibin û kedkaran muhtacî xwe dikin.

Malbata Mahsum welatparêzin û bi nirxên gel û civaka xwe ve girêdayîne. Her dem di refên gelê xwe de helwest nîşan dane. Mîna gelek malbatên din ên Kurd, êşên bindestiyê bi kûrahî hîs kirine û zilmên dijmin bi çavên xwe dîtine û jiyan kirine. Bi taybetî piştî derketina PKK'ê ti zilm û zordestî, êşkence û êşek namîne ku ev malbat tê re derbas nebe. Di rêya azadiyê de bedelên giranbiha dane ber çav.

Mahsum hê zaroke dema ku bi êşên bindestiya gelê xwe dihese; sala 1991'ê ku ew hê zarokeke 11 saliye, kurê xaltîka wî ku li çiyayên Mêrdînê gerîlaye bi tevî çend rêhevalên xwe ji aliyê xayînekê ve tên jehrîkirin û şehîdxistin. Sala 1995'an ku êş û kula vî bêbextiyê hê tam derbas nebûye û germahiya xwe diparêze xwuşka wî jî di refên gerîla



de şehîd dikeve. Evana hestên şanaziyê û hêrsa tolhildanê di nav hev de bi malbatê didin jiyankirin.

Welatparêzên Kurd wisa fêr bûne. Di nav êş û janên ku dijîn de fêr bûne ku di kêliyekê de du hestên cuda bijîn: li aliyekê bawerî, serfirazî û evîna têkoşînê, li aliyê din kîn û nefret û sonda berdewamkirina xeta şehîdên xwe. Du hestan di yek demê de dijî Kurd. Ev du hest bêyî hev nabin, her tim bi hev re ne, bi hev re mezin dibin û bi hev re pêş dikevin. Ev her du hest di dilê Kurdan de di xalekê de digihîjin hev. Ev xal, daxwaza bi dawîbûna şer û misogerbûna aştiyeke mayînde ye. Lewre êşên ku wan kişandine ew fêrî vê kirine ku nexwazin ti keseke din heman êşan bijî. Ti malbat, taybet jî ti dayîkeke Kurd ku zarokeke wê şehîd ketibe naxwaze kezeba ti dayîkeke din bişewite, heta kezeba dayîkên leşkerên dijmin jî. Lewre tevî hemû birîn û janên dilê xwe her dem aştî û bi dawîbûna şer dixwaze.

Ji bo eşîr, malbat û bi taybetî dayîka Mahsum jî wisa ye. Her ku şehîd û tevlêbûnên gerîla di malbata wan de zêde dibin, ew jî zêdetir bi dijmin re tên beramberî hev û zêdetir bi têkoşîna azadî û aştîxwaziya gelê xwe ve tên girêdan; bi awayekî ku temamen bi têkoşînê re dibin yek û di navbera xwe û doza xwe de valatiyekî nahêlin.

Mahsum ji zaroktiyê ve bi qasî çîrokên Behlulê Kurdî û Xoce Nesredîn, çîroka berxwedana şehîdan û lehengiyên gerîla dibihîse. Herî zêde çîroka xwuşk û kurê xaltîka wî û herwiha berxwedana koma Şehîd Kamuran û duwazdeh rêhevalên wî li Nisêbînê, bala wî dikşînin û bandorê lê dikin.

Li Kurdistanê bi derketina PKK´ê re êdî çîrokên ku dayîk ji zarokên xwe re dibêjin jî reng guhertine. Jiyannameya Rêber Apo û berxwedaniyên gerîla tevlî çîrokên dayîk û pîran bûne. Lewre zarokên

Kurd hema bêje dîroka tevgera azadiyê tev di nav laylayî û çîrokên dayîk û dapîrên xwe de dibihîsin. Mahsum jî wisa, bi van çîrokan mezin dibe. Lê belê ew hê zaroke û nizane bûyer û vegotinên ku dibihîse çîrokên xeyalî nînin, rastîne û ew bixwe jî dema mezin bibe wê bibe parçeyek ji wan.

Ev çîrok û vegotin tenê wî kêfxweş û aram nakin û sebra wî naynin, di heman demê de şêweyeke didin hest û hizir û xeyalên wî. Lewre her mezintir dibe dizane ku tiştên bihîstiye rastîne. Dema xwuşka wî şehîd dikeve û malbat dikevin ber zext û êşkenceyên dijmin, hê zêdetir bi rastîbûna wan dihese. Nefreta ji dijmin ku di dilê wî de mezin dibe, wî ber bi têkoşînê ve dehf dide. Êdî zaroktiya wî bi lez derbas dibe, bi lez mezin û ciwan dibe, bi lez qonaxa têkoşîna wî di HADEP'ê de dest pê dike û bi lez têde aktîf û xurt dibe.

Li ba wî baweriyek heye; her xebateke ku gel ronî bike ziyanê dide dijmin. Lewre di navbera xebatan de cudabûnê danayne. Çi bê pêşiya wî dike; xebatên ciwanan, belavkirin û firotina rojname û kovaran, kişandina ciwanan ber bi xeta têkoşînê ve û hwd. Heta carekê dema ku rojnameyê difiroşe tê binçavkirin. Di binçavan de hişyar tevdigere û nahêle ti bangeşeyek li ser wî zelal bibe. Lewre zû tê berdan.

Herwiha ji ber xizaniya malbatê hê di temeneke pir biçûk de dest bi kar dike û di debara jiyana sêzdeh kesî ya malê de alîkarî dide malbata xwe. Ji bo vê mebestê piştî qedandina dibistana seretayî dest ji xwendinê berdide. Mîna xebata dirûnkariyê gelek xebatên din dimeşîne. Parçeyeke jiyana wî bi keda jiyana civakî û parçeyek jî bi pêkanîna erkên welatparêziyê derbas dibe. Evqas kar di nav hev de û di bin çavdêriyên dijmin de jêre zor bên jî, xwe jê paşve nade, heya dema ku dibîne êdî nikare ji vê zêdetir di bin zext û zoriyên dijmin de bijî.

Xebatên ku di rojname, DEHAP û baskê ciwanan de dimeşîne wî têr nake û nabe derman ji bo birîna ku ji şehadeta xwuşk, kurxaltîk û çend hevalên wî di dil û hinavê wî de vebûye. Lewre di dawiya sala 2003'yan de derdikeve çiya û xwe digihîne cihê ku dema serê xwe datîna ser koşa dayîka xwe weke çîrok jêre dihat qalkirin. Ew êdî li navenda xeyalên xwe bû û zindî çîrokên zaroktiya xwe dijiya.

Hezkirin û nefret du ferheng û fêrgehên pir mezin in. Mîna êş û kêfxweşî. Mîna baş û xirab. Mîna gelek tiştên ku jiyanê li gelekê bikin dojeh û kêfxweşiyên nav jiyanê bikin jehr... Êş û kêfxweşiyên mezin,

hezkirin û nefretên mezin mirovan mezin perwerde dikin, mezin fêr dikin û bilind difirînin. Bêguman, di vir de şert heye; şert ewe ku mirov bi van êş û kêfxweşî, eşq û nefretên xwe ve girêdayî bimîne. Şoreşger ev kesin. Wateya şoreşgerbûn û jiyana şoreşgerî ev e.

Berxwedana koma Şehîd Kamuran, xwuşk û kurxaltîkê Mahsum hem êş, hem jî kêfxweşiya serfiraziyê dabûn gelê Mêrdînê. Lê xayînê ku koma kurxaltîkê wî jehrî kiribû û bibû sedema şehadeta wan birîneke pir kûr di dilê wan de vekiribû û nefret di dilê wan de gihandibû lûtkeyê. Dema êş û birîneke kûr di dilê mirovekê de vebibe, ew kes li pey dermankirinê nagere ku êşa xwe ji bîr bike, na, qaîde ne ev e; qaîde ew e ku ew kes ji bo ku her tim karibe têkoşîn bike û tol hilde pêwîste êşên xwe biparêze û ji bîr neke. Kurd wisa ne. Kurd nikare êşên ku dîtiye ji bîr bike. Eger derman bike û êşa xwe ji bîr bike dibe xayîn. Jibîrkirina êşê ji bo Kurdan tê wateya bêrûmetiyê. Eger êşên dil bên jibîrkirin, wê demê têkoşîn çênabe, tol nayê hildan, hêrsa serkeftinê bilind nabe, agirê dil geş nabe û pêt navêje. Eger agir nebe germahî û ronahî jî nabe... Lewma ji bo Kurdan berxwedan hemwateya jiyanê ye û germahî û ronahiye.



Ev nefreta ji îxanetê re, evîna têkoşînê, êşên giran û xeyala kêfxweşî û bexteweriyê ye ku şoreşgeran derdixe çiya. Lewre gerîla ji zorahî û zehmetiyên jiyana xwe jî hez dikin û çavên wan li rehetiyan nagere, ji ber ku êşên wan hene û ev êş, armanc daniye pêşiya wan; armanca wan dawîanîna li wan êşan e. Eger êşên xwe ji bîr bikin wê nekaribin vê armancê pêk bînin. Ji ber vê, girêdayîbûna bi êşên xwe ve girêdayîbûna bi armancê ve jî bi xwe re tîne.

Armanca Mahsum têkbirina dijminên hundir û derve bû. Bi qasî têkoşîn li hember dijminên dagirker, ewqas jî, heta jê zêdetir jî têkoşîn

li hember xayîn û dijminên navxwe kiribû armanca xwe û dizanî ku serkeftina dijminên derve ji ber xayîntiya dijminên hundire, lewre pêwîste destpêkê xayîn û dijminên hundirîn ji holê bên rakirin. Dema Mahsum ev hest dijiyan nedizanî ku bixwe jî mîna kurê xaltîka xwe wê bi destên xayîneke Kurd şehîd bikeve.

Mahsum di nav partiyê de bi hêsirên ku dayîka wî ji bo xwuşk, xaltîka wî ji bo kurê xwe û gelê Mêrdînê ji bo koma Şehîd Kamuran rijandibûn û tilîliyên ku li ser termên wan dabûn ve her tim girêdayî ma û ew ji bo xwe kirin nirx. Bi van nirxan ve girêdayî di nav jiyana gerîlayî de pêşketinên xurt nîşan da. Li qadên Kelareş, Qendîl, Asos û Zagrosan ma û di xebatên dirûnkarî, gumruk, asayîş û xebatên din ên leşkerî de cih girt. Çend salan, heya dema şehadetê jî di nav hin xebatên taybet ên rêxistinê de cih girt.

Di beşa sabotajê de serwerî bi dest xist û di vî warî de çi li Zagros û Şemzînanê, çi li Botanê roleke girîng leyîst. Sala 2008'an bi tevî Şehîd Leşker Ciwanro li Zagros, li herêma Herkî û Şemzînanê weke sabotajcî erk rakir. Dema derbasî Botanê bû jî, dîsa bi vê erkê derbas bû. Sala 2011'an li herêma Besta, alana Şehrîbanê tevlî xebatan bû. Dema pêwîstî bi sabotajê hebûya ango pilansaziya çalakiyekê bihata kirin, di mijara sabotajê de bi tevî Serhed rol dilîst. Di demên din de jî weke her hevaleke din bi awayeke aktîf tevlî xebatên taximê dibû û bi erkên xwe yên jiyanî radibû.

*****



**Nasnav: Şerda Gever**
**Nav û Paşnav: Ferdane Kina**
**Dîrok û Cihê Jidayîkbûnê: 1990/Colemêrg**
**Navê Dayikê: Nesîbe**
**Navê Bav: Kamil**
**Dîrok û Cihê Tevlîbûnê: 2010/Colemêrg**
**Dîrok û Cihê Şehadetê: 13-15’ê Sibata 2012’an li Botan-Besta**

**Heval Şerda Gever**

Şerda ji gundê Bilinbasanê yê girêdayî navçeya Geverê bû. Gever ku navçeya herî mezin a Bakurê Kurdistanê ye û bi bajarê Colemêrgê ve girêdayiye, weke sêkuça sê beşên Kurdistanê ye; parçeyên Bakur, Rojhilat û Başûr li Geverê digihîjin hev. Piştî ku sînor hatine danîn jî, di navbera şêniyên her sê aliyên sînor de danûstandinên madî û manewî weke beşeke sereke ya çanda jiyanê her tim dewam kirine. Ji şêniyên Geverê gelek kesan mirovên wan li Rojhilat û Başûr hene, ango keç dane hev û ji hev girtine. Ji ber vê, gelek kes hene ku ji dayîk û bavê wan aliyek ji Geverê ye, aliyê din ji Rojhilat an jî Başûr e. Ev, bûye sedema çûn û hatina zêde û vê bi xwe re pirçandîtî jî aniye.

Ya herî girîng û berçav jî ewe ku, Kurd ji sînor û qedexeyan acizin û antîpatiya wan li hember van peyvan heye. Lewre fêrî pêkanîna sînor û qedexeyan nînin; berovajî, bi eşqeke mezin pê li sînoran dikin û qedexeyan paşçav dikin. Ew, ji dîroka kevnar ve fêrî pêlêkirina sînoran û pêkanîna tiştên qedexene. Zilm, êş û azarên ku di dîroka hezaran salî de dîtine, ew fêrî îsyana li hember sînor û qedexeyan kirine. Yanî qedexe û sînor ango “heram”ên dijminan “helal û rewa”yên Kurdan e. Kurd ji bo xwe wisa dihesibînin ku eger “sînor” û “qedexe” ji bo tiştekê

li ser wan bê danîn, weke wê ye ku kesek her du destên xwe bixe qirika wan û bixwaze wan bifetisîne. Lewre ev peyv bêhn û henaseyê ji Kurdan diçikînin.

Li hember vê yekê, mirovên Kurd jî ji bo rehet bêhn bigrin û bidin pê li wan peyv û ferasetan dikin. Ma qey dibe tu li welat û axa rewa ya xwe qedexe bî û bi destûra fermî ya (pasaport) dewletên nerewa, biyanî û dagirker di welatê xwe de bigerî!? Ev ji bo her gelekê bi wateya ruxandin, teror û cînayeteke derûnî û giyanî ye, lewre Kurd vê nas nakin û berovajî wê dikin. Eşqa binpêkirina sînoran di dilê her Kurd û Kurdistaniyekê de heye.

Li Geverê jî mîna xetên din ên sînor ev mijar bi tevî rewşa xizaniya gel, bûye sedem ku şêniyên herêmê debara jiyana xwe herî zêde li ser sînoran bikin û bi qaçaxçîtiya ser sînorê ve mijûl bibin. Lewre roj nîne ku di van sînoran de mirovên Kurd û Kurdistanî dilê xwe daneynin nav destên xwe û bi qaçaxî li ser wan sînorên tijî dehfik û paygeh nemeşin!

Giştî herêma Colemêrgê li ser xeta Zagrosan e. Navçeya Geverê jî li ser wê xetê ji milê başûr ve ji aliyê rêzeçiyayên Cîlo, Oremar û Çarçêlayê ve hatiye himêzkirin. Ji lûtkeya Cîlo û Çarçêlayê ve mirov tam di rûbirû û asta xwe de li beramberî xwe deşta Geverê dibîne. Gever deşteke bilind û firehe di navbera çiyayên bilind û tijî lat û zinar de bicih bûye. Li rojavayê wê Botan, li bakurê wê jî Wan heye. Li aliyê rojhilatê wê parçeyê Rojhilatê Kurdistanê heye û ji başûr ve jî bi Behdînanê ve tê girêdan.

Gever ji ber ku li ser xeta sînorê navbera sê dewletane, ji kevin de ji aliyê dewleta Tirk ve hem stratejîk û hem metirsîdar hatiye dîtin. Ev, ji bo giştî Kurdistanê derbasdare. Di vê navberê de Gever ku weke yek ji paytextên serhildanan tê naskirin jî, ji çavên dijmin û neyaran dûr nemaye. Ji ber radîkalbûna berxwedan û welatparêziya gelê Geverê, heta cehş, çete û sîxûrên wir jî gelek caran newêrin serbest bilivin û xwe eşkere bikin.

Dewleta Tirk ku her ji salên destpêka damezrandina komarê ve ji bilî zimanê Tirkî hemû zimanên din ên gelên Tirkiyê qedexe dike, herî zêde li Kurdistanê vê înkar û helandina xwe disepîne. Tirs û wehşeta ku dewleta dagirker taybet li ser gelê Kurd pêk tîne, dibe sedem ku zimanê Kurdî li gelek deveran bi veşartî bê axaftin. Heta zimanê zikmakî niha hêdî hêdî di nifşên nû de tê jibîrkirin. Lê belê li Geverê wisa nîne. Li Geverê heta cerdevan û sîxûrên dewletê jî ji tirsa gel bi

Kurdî diaxivin. Çawa ku di giştî Botanê de xwendin di dibistanên Tirk de bêîtîbar tê dîtin, li Geverê jî ji her derê zêdetir îtîbara xwendingehên Tirk di çavê gel de şkestiye. Hewlên dijmin ji bo fetha kelha Geverê çiqas zêde û bi siyaseteke taybet be jî, ji ber ku gelê wir bixwe rasterast û aktîf di nav siyaseta civaka xwe de ne, ew bernameyên dijmin li hember wan vala derketine û pûç bûne.

Nasnameya şêniyên herêmê ser navê eşîrên wane. Pergala eşîrtiyê hê ji dema hikumeta Medyayê ve li Kurdistanê weke şêwazeke jiyan û nasnameyeke civakî lê hatiye. Nasnameya jorîn “Kurdbûn” û nasnameya jêrîn jî “navê eşîr û bavikan”e. Eşîran qet ji dewlet, desthilat û hikumetên navendî bawer nekirine, li hember wan artêş û



siyaseta rêvebirina xwe di nav xwe de avakirine û meşandine. Bi rêveberî û hêza xwe ya cewherî xwe li hember hemû êrîşên siyasî û leşkeri yên dewlet û împeratoriyan parastine.

Konfederasyona eşîran tenê bi serdema Medan ve sînordar nemaye û di pêvajoyên şûndetir de jî di bin navên cuda de her hatiye meşandin. Li gorî pêdiviyên siyasî, civakî û leşkerî eşîrên herêmekê an jî eşîrên çend herêman bi hev re peyman kirine û siyaseteke hevbeş diyar kirine. Bi vî awayî xebatên navxweyî yên eşîran û danûstandina

wan bi hev re hatiye rehet û hêsankirin. Vê peymanê di tevlêbûna nav raperînên Kurdî de pir rol lîstiye. Serokeşîr eger qaneh bibe û tevlî raperînê bibe, eşîr jî tev de aktîf dikevin nav raperînê û erk radikin. Eger serokeşîr tevlê nebe jî, jixwe ji ber ku mezinê eşîrê ew bi xwe ye her kes lê guhdar dike û tevlê nabe. Yanî helwesta serokeşîr ji aliyê tevahî eşîrê ve tê şopandin û dibe helwesta wan a hevbeş.

Di kêleka van aliyên erênî de hin aliyên neyînî jî rû dane ku salên dirêj bûye sedema dijmintiya navbera çend eşîran. Di vir de nasnameya netewî hatiye jibîrkirin û nasnameya eşîrtî û bavikaniyê derketiye pêş. Paşverûtiyên eşîrtiyê gelek caran lehiyên xwînê rakirine û hejmareke zêde mirovên hêja li bablîsokên dijminahiyên navxweyî gevizandine. Li beramberî kuştinekê tol hatiye hildan û ji nû de kuştinan rû daye. Her ku dijmintî zêde bûye hejmara kuştiyên navbera du eşîrên beramberî hev zêdetir bûye. Carna vê xwînê bi dehan salan ajotiye. Carna eger xwîn bi tolhildanekê hatibe bi dawîkirin jî, dijmintî û ji hev xeyîdandin salên dirêj ajotiye.

Dibê qey wan kesan ji bîr kirine ku tev welatiyên welateke bênasname ku di cîhanê de kes lê mikûr nayê û nas nake ne! Dibê qey nizanin welateke wan ê bindest û parçe parçebûyî heye! Dibê qey haya wan nîne ku her roj gelê wan bi kuştin, qirkirin, êşkence û destavêtinên dijminan re rûbirûye! Dibê qey nizanin gelê wan li çar aliyê welat û dinyayê çi êşekê ji destê dijminên xwe dikşîne û çawa dinale! Kes napirse û nabêje dijminên me yên ewqas hov, har û xedar hene ku hebûna me weke gelekê nas nakin, em çima hevdû dijmin dibînin û hember hev çek bi kar tînin, çima van çekan li hember dijminên welatê xwe nateqînin?

Di vir de careke din jin hem bûne kevokên aştiya navbera eşîrên dijminê hev, hem jî bûne qurbanî; ji bo ku xwînê bi dawî bikin jinan pê li dil, hest û kezeba xwe kirine û keç dane eşîra beramber. Keçên ciwan ku bi salan fêrî neyartiya hember eşîra beramber hatine kirin, bi bihayê jiyana xwe ji bo ku xwînê rawestînin bêyî ku hez bikin û bixwazin bi xortên eşîra beramber re dizewicînin. Kes nabêje ev çi teror û cînayete li ser van keçan dimeşe? Heya kengê wê jin bibin qurban ji bo şerê şerefa zilaman ku di rastiyê de bêşerefiye? Ji bo şerê şerefê(!) yê navbera zilaman bi dawî bibe, pêwîste hê çend jinên din bên fedakirin?

Colemêrg û Gever jî, ji bo xwe pareke zêde ji van ferasetên erênî û neyînî girtine.

Bi derketina PKK'ê re feraseta netewîbûnê li herêma Colemêrg û Geverê jî mîna deverên din ên Kurdistanê derdikeve jorî nasnameya eşîrtiyê. Eşîrên ji hev xeyîdî, bi merasimekê ku gelek kesên xwedî îtîbar tevlî dibin aştî dikin û li hev tên. Nakokiyên bênirx û biçûk li aliyekê tên hiştin û têkoşîna yekpare ya gel li hember dewletên dagirker û hikumetên desthilatdar weke giyaneke hevbeş di nav dilê gelê herêmê de şîn û geş dibe. Eger nakokiyên navbera eşîran bi tevahî ji holê ranebibin û pirsgirêkên wan ji binî de çareser nebibin jî, li hember hev çekrakirin û neyartî di asteke jor de radibe û kêm jî be danûstandin di navbera wan de pêş dikeve. Pêhesandina têkoşîn û berjewendiyên netewî bandor li giyanê welatperweriya gel dike û hevgirtinê pêk tîne.

Li Geverê bi naskirina tevgera azadî û feraseta têkoşîna PKK'ê re gel xwedî li vê têkoşînê derdikeve û xwe dide ber erkên şoreşê. Colemêrg bi giştî û Gever bi taybetî bêyî dudilî himêzê jêre vedikin û bedelên giran û hêja pêşkêş dikin. Bi bandora tevlêbûnên refên gerîla û şehîdên ku tên dayîn, gelê wir weke nîvgerîla di qad, meydan û kolanên bajêr de çalakî û serhildanan dikin şêwazeke jiyana xwe ya rojane.

Bi bilindbûna hestên netewî, xwedî derketina li şoreşa azadiyê û çalakiyên ku tên kirin re ev navçe li ber çavê hemû Kurdistanê her diçe zêdetir mîna stêrkeke geş dibiriqe, ji ber ku weke navendeke berxwedan û serhildanan lê tê. Êdî li ser zimanê Kurdistaniyan navê çar paytextên berxwedanê ango Licê, Nisêbîn, Cizîr û Gever bi hev re mîna destanan tê qalkirin. Gelek navçeyên ku bi berxwedanê tên naskirin hene, lê di nav wan de ev çar nav weke sembolê lê tên.

Jixwe herêma Zagrosê bi tevahî û di nav de Gever jî herêmeke bilind, çiyayî û asê ye. Şêniyên wê jî li erdnîgariya xwe hatine. Çawa ku Cîlo û Çarçêla ji Îskender heya Osmaniyan rê nedane ti kes tê re derbas bibe û serê xwe li hember êrîşên wan netewandine, gelê wir jî bi heman serfirazî û asîbûnê li hember dagirker û neyaran tim li ser pêyan rawestiyaye. Dengê tilîliyên dayîkan û diruşma serhildanan bûye melodî û strana herî xweş li ber guhê şêniyên vê herêmê.

Şerda zaroka vê Geverê bû. Hê ji zaroktiyê ve li pey dengê laylaya dayîka xwe dengê qêrîn û diruşmên serhildanan dibihîse. Bi çanda

welatperwerî û hestên azadîxwaziyê tê mezinkirin. Her seher dema ji xewê radibe, ji şûşeya pencereya malê ve li heybeta Cîlo û Çarçêla dinêre. Berê wê tim li bilindahiyane. Bi bilindahiyan re diaxive û di dilê xwe de pesnê heybeta wan dide. Dixwaze bi hevalên xwe yên zarokatiyê re biçe li çiya û zozanan bilîze. Lîstokên nav kolan û gund dilê wê rehet nakin û wê têr nakin.

Dema dikeve temenê ciwaniyê zêdetir bi wateya bilindahiyê dihese. Şerda naxwaze mîna keçên ciwan ên derdora xwe lêgerînên xwe di xortekê de zîndanî bike. Hest û erkên berpirsyartiya li hember doza jinan û gel wê zêdetir dikşîne xwe. Tevî ku destpêkê ji kurapê xwe hez dike jî her ku zêdetir PKK'ê nas dike hest, hîs, hizir û xeyalên wê diguherin. Lewre dema jê re pêşniyar tê kirin ku bi kurapê xwe re bizewice, vê pêşniyarê red dike. Evîna welat û azadiyê ji evîna kesekê zêdetir wê dikşîne xwe. Lewre wijdana wê ranake ku evîna gel, welat û azadiya zayenda xwe ji bo evîna kesekê qurban bike.

Hemû hest û xeyalên xwe bi keçapa xwe Amarayê re par dike. Li benda kêliyekê dimîne ku derfeta reva ji malê bibîne. Wê kêliyê bi dest dixe û di bêhnekê de xwe li çiyayên azad ên Botanê dibîne.

Puşpera sala 2010'an bû. Hejmareke zêde heval li Kato Jîrkayê kom bibûn. Hevalan ji bo silavkirina çalakiya Şehîd Zîlan (Zeyneb Kinaci) ku di nav wan de weke Xwedawend tê pejirandin, çalakiyek li ser paygeh û girê Aqêrê pilan dikirin.

Di dema amadekariyên vê çalakiyê de Şerda û Amara gihiştin wan. Hê kincên malê li wan bû. Heval her tim beriya hemû çalakiyan şahiyan çêdikin û bi vê şahiyê hê beriya çalakiyê, serkeftina xwe pîroz dikin. Bi vê mebestê wê rojê jî, beriya ku ber bi hedefa xwe ve bi rê kevin şahiyek çêkirin. Piştî şahiya giştî, hevalên jin di nav xwe de jî şahiyeke din li dar xistin. Şerda û Amara di vê demê de gihiştin wir.

Piştî ku hevalan yeko yeko silav dan wan û xêrhatin li wan kirin, ew birin gel xwe û tevlî şahiyê kirin. Şerda û Amara ku çend şev ser hev, her şevekê jî herî kêm şeş demjimêran meşiyabûn, wekî ku qet nemeşiyabin û pêdiviya wan bi vehesînê nebe geş û serxwe bûn.

Hevalan ji wan re gotin: “Werin em cih ji we re amade bikin, bêhna xwe bistînin.” Lê wan bersiv dan: “Na heval. Em newestiyane, em dixwazin tevlî şahiya we bibin.” Vê zindîbûna wan her ji serî de bala hemû hevalan kişand û ew kêfxweş kirin. Hîngî zindî û bi livûtevger bûn ku qet xwe nû û biyanî nedidîtin, berovajî, dibê qey

kadroyên salan bûn. Rûniştin di nav hevalan de û bi wan re tevlî stran, çepik û lîstokan bûn.

Hevalan ji wan xwest ku stranekê bibêjin û bi dengê xwe yên nû û zindî rengeke nû tevlî wê şahiyê bikin. Ew du hevalên nû ku her ji destpêkê ve hîsên xerîbiyê jiyan nekirin bêîtîraz bi hev re dest bi strangotinê kirin. Bi strana “Meyrema Ecem” dest pê kirin û çend stran gotin. Hevalan jî di ber stranên wan de ji wan re çepik lêdidan. Germahiya dilê du gerîlayên nû û ciwan riheke nû tevlî rihê çalakiyê kir. Ew her du jî dema pê hesiyan ku kêfa hemû hevalan ji wan re hatiye û ji wan hez kirine, zêdetir vebûn û xwe rehettir hîs kirin.

Heval beriya ku ber bi cihê çalakiyê ve rêkevin, ew ji bo ku perwerdeya şervanên nû bibînin şandin Bestayê, gel Rojbînê ku wê demê li ser vê xebatê radiwestiya. Piştî perwerdeya Şervanên Nû, Amara ji bo Herêmên Parastina Medyayê hat şandin, Şerda jî li Bestayê tevlî xebatên taximê bû.

Şerda di nav pratîka Botanê de bi lez di hemû aliyan de pijiya û pêş ket. Meraqa wê ya fêmkirina Parêznameyên Rêbertiyê, zekaya zêde, daxwaz û keda zêde ji bo fêrbûn û zanîna tiştan û hezkirina wê ya zêde li hember jiyana şoreşgerî bû sedem ku bi lez di gelek xebatan de serwer bibe. Bi jêhatî û atîkbûn, coş û kelecan, dilgermî, sadebûn, dilê mezin, dîsîplîn û hişyarbûna li hember pîvanên rêhevaltiyê pir zû xwe xist nav dilê hemû rêhevalên xwe.

Kesayeta wê aram, giran, têr û tijî bû. Mîna Havînê keneke wê yê pir xweşik û ji dil hebû. Dema dikeniya dibê qey ew daristanên Besta û zinarên Hêzilê tev pêre dikeniyan. Hîngî xwezayî bû ku di rûyê gul û giya, dar û teht, stêrk û tav û heyv, mar û muriyan de dikeniya û bi wan re diaxivî û hestên xwe parve dikir. Ji ber van taybetmendiyan kesayeta wê her diçû mezintir û xweşiktir dibû û zêdetir pêş diket. Lewre di nav çend mehan de pir aktîf bû û piştî dîtina perwerdeke têr û tijî ya kampa zivistanê, bihara sala 2011'an ku hê saleke wê di nav gerîla de tijî nebibû di taxima Hêzilê de weke alîkara



Ayselê hat erkdarkirin. Şerda di nav hemû hevalan de pir dihat hezkirin. Hevalan, ew li ser destan digirtin û tam weke keçeke asî ya Kurd û jineke Zagrosî lê dinêrîn.

Pora Şerdayê heya ser çokên wê dihat, dibê qey mîna pêlên avê ser bejna wê de diherike. Pora dirêj di nav jinên Kurd de pir tê hezkirin û parastin. Di nav gerîla de jî wisaye. Hemû heval ji pora dirêj hez dikin û di ber parastina pora hevdû de xwe berpirsyar dibînin. Eger hevalekî ku

pora wê dirêj û geş be lê zêde pora xwe neparêze hevalên din aciz dibin. Şehkirin û hunandina pora hevdû tişteke pir hêjaye ku gerîla bi zevq û hezkirin dikin. Gerîlayên jin ji Rêber Apo fêr bûne ku fîzîka xwe binirx bibînin û jê hez bikin. Ev ji bo wan beşek ji felsefeya hezkirina zayenda xweye. Pora Şerda xeml û çanda jinên Zagrosî dianî bîra mirov. Lewre hin car hevalên ku pora wan kurt bû bi mebesta henek, bi pora Şerda ve wêne digirtin. Şerda li pişt wan xwe vedişart û pora xwe ser milên wan de berdida heya wênegir wêneyê bikşîne. Pora Şerda ji du milan ve ser bejna hevalan de diherikî û di vê rewşê de ku hemû bi kêfxweşî dikeniyan wênegir wêne digirt. Bi vî awayî di wêneyan de dibê qey pora hevalên ku di nav wêneyê de xûyane ewqas dirêje. Ev geh dibû sedem ku heval bi hev re henekan bikin û bibêjin: “hûn bi pora Heval Şerda ve çiqas xweşikin!”

Şerda dengê wê jî pir xweş û çiyayî bû û herwiha govenda wê jî pir narîn û balkêş bû û heval pir jê hez dikirin. Dengê wê yê çiyayî resentiya çanda Kurdistanê dianî ber çavên mirov. Jixwe dengên çiyayî di nav gerîla de pir tê hezkirin û guhdarkirin. Heta Aysel ku bi deng û folklora xwe dihat naskirin jî ji deng û dîlana Şerda pir hez dikir û jêre digot “hunermenda tîma me!” Şerda hemû dîrok, çand û hunera Gever û Colemêrgê di stran û dîlanên xwe de dianî ziman û dida naskirin. Tevî stranên gelerî, welatparêzî, dengbêjî û sirudên şoreşgerî, ti govendeke herêmên Colemêrg, Botan û Wanê nebû ku Şerda nezane. Van huner, jêhatîbûn û serweriya wê ya di çanda civakî de kesayeta wê ya şoreşger hê zêdetir dixemiland, ew di nav hevalên xwe de zêdetir dibiriqand û dida hezkirin. Tecrubeyên leşkerî û gerîlatiya ku di demeke kurt de girt jî, kesayeta wê temam, têr û tijî kirin.

Şerda payîza sala 2011'an bi tevî hevalên tîma xwe ji bo derbaskirina pêvajoya zivistanê derbasî Besta Navîn bû.



*Nasnav: Demhat Şervan*
*Nav û Paşnav: Mehmet Türken*
*Dîrok û Cihê Jidayikbûnê: 1991/Wan*
*Navê Dayikê: Sabihe*
*Navê Bav: Alattin*
*Dîrok û Cihê Tevlîbûnê: 2010/Wan*
*Dîrok û Cihê Şehadetê: 13-15’ê Sibata 2012’an Botan-Besta*

**Heval Demhat Şervan**

Demhat li gundê Lonluce ya girêdayî Wanê ji dayîk bibû. Malbata Demhat welatparêz û oldarin û zarokên xwe bi çand û exlaqê welatparêzî û olî mezin dikin. Bi vê taybetmendiyê dibe nimûneyek ji malbatên sade ya Kurd. Li vê herêmê bi pêşketina xebatên legal ên Kurdan re ev malbat jî di nav de cih digirin û tevlî xebatan dibin.

Malbata Demhat piştre diçin navçeya Mîksê rûdinin. Lê belê Demhat bixwe ji ber şert û mercên jiyana bêbext a ciwanên Kurd berê xwe dide warên xerîbiyê û metropolên Tirkan. Di warê madî de rewşa malbata wî xirab nîne, lê belê jiyana madî wî têr nake û li pey zanîn û têgihiştinê dikeve. Li mirovên derdora xwe dinêre û jiyana wan dişopîne. Ji şêwazê jiyana wan hêrs dibe û naxwaze weke wan bijî. Ji jiyaneke seranser, rojane, bêarmanc, bênaverok û bêkalîte bêzar dibe, wê napejirîne û layiqî xwe nabîne. Dixwaze jiyanê nas bike û heqê wê bidê. Lêgerînên wî zêde dibin. Naskirin û dîtina deverên din bala wî dikşîne. Lewre berê xwe dide Îstanbolê.

Paşnavê malbata Demhat “Türken”e. Ew hê ji zaroktiyê ve paşnavê xwe weke zilm, neheqî û înkarê dibîne. Dizane ku ew, zarokeke Kurde lê paşnavê wî mîna sed hezaran Kurdên din peyva “Tirk” pêveye. Ev nakokî mîna bruskê li mêjî û dilê wî dixe û ser wî de

tê. Gelek nav û paşnavên mîna Türken, Türkan, Türkkan, Türkoğlu, Türk, Türkdoğan, Türkelî, Öztürk, Cantürk û hwd. dibihîse, lê dibîne ku ew kes bixwe Tirk nînin. Demhat hê negihîştiye temeneke ku karibe vê faşîzm û nîjadperestiya dewletê fêm bike, lê mejî û dilê wî rehet jî nîne; ji ber ku navê Kurd, Ermen, Ereb, Aşur, Laz, Çerkez û navê gelên din di nav û paşnavê ti kesî de nabîne û nabihîse, berovajî, her tişt bi navê Tirkîtiyê ye. Bala wî dikşîne ku heta di navê stranan de jî ev gotin heye û ji stranan re "Türkü" tê gotin!

Demhat di zaroktiyê de mîna hemû zarokên din ên li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê dijîn gava lingê xwe davêje dibistanê, destpêkê bi gotina "çi bextewerim ku Tirkim" re rûbirû tê. Tirkbûn û Tirknebûna ti kesî girîng nîne, ya girîng ewe ku her kes xwe Tirk bibîne û ji ber înkara nasnameya xwe, xwe şa û bextewer hîs bike! Di zaroktiyê de dema bi vê hişmendiyê re rûbirû tê, di gotina wê hevokê û fêrbûna zimanê Tirkî de zoriyê dikşîne, jê fêm nake ku çi êrîşeke mezin li ser kesayeta wî dest pêkiriye. Lê vê carê mezin bûye û ber bi ciwaniyê ve gav davêje. Di destpêka ciwantiyê de dema bi sosretbûna paşnavê xwe dihese tevlîheviya serê wî dike mejiyê wî biteqîne. Ev nakokî wî dihejîne.

Di sala 2006'an de dema ku li Îstanbolê di karên dirûtin û şofêrtiyê de dixebite PKK'ê ji nêz de nas dike. Jiyana xerîbî û dûrbûna ji axa dayîka xwe dibê qey mîna gulekê ku neyê avdan roj bi roj zêdetir wî diçilmisîne û dilop bi dilop bedena wî dihelîne. Naskirina ciwanên Apoyî di wexteke wiha de jêre mîna dermanî tê û giyanê wî ji nû de zindî û geş dike. Vê derfetê winda nake û li wir tevlî hin xebat û çalakiyên ciwanên Apoyî dibe heya ku hêdî hêdî dibe yek ji pêşengên sereke yê çalakiyên ciwanên şoreşger.

Hem li Kurdistanê, hem li Îstanbolê êş û azarên gelê xwe bi çavên xwe dibîne û ji gelek êş û trajediyên ku ji ber Kurdbûnê tên serê wan re şahîdiyê dike. Pir hevalên wî di temenên jêrî hejdeh saliyê de bi gelek behaneyên cur bi cur dikevin bin êşkenceyan û lingê wan dikeve girtîgehan. Her roj li ber çavên wî ciwanên Kurd di nav çalakiyan de dibin hedefa bombeyên gazê, fîşek û gefên polîsan, dayîk û zarok ji aliyê panzêran ve tên pelçiqandin, hemû rojên şemiyê Dayîkên Şemiyê li ser cadeya ziwa û hişk a Îstanbolê bi saetan rûdinin û daxwaz dikin ku termên zarokên wan ên winda û nasnameya kesên kujer bên eşkerekirin. Lê belê rastî bêrêziya desthilatdar û polîsên Tirk tên, li Kurdistan û deverên din ku Kurd lê dijîn her tim hemû meydan qadên



şer û pevçûna navbera gelê wî û dewleta Tirke û gelek trajediyên mîna vana ku bûne rastiya Kurd li ber çavên wî diqewimin.

Li aliyê din her roj nûçeyên şer û pevçûnên ku di çiyayên welatê wî de di navbera gerîlayan û leşkerên Tirk de rû didin dibihîse û li dîmenên pêşwaziya gel ya li termên Şehîdên xwe temaşe dike. Di hin merasimên veşartina termên gerîlayên şehîd û sersaxiya wan de bixwe jî rasterast tevlê dibe. Li aliyê din jî her carê agahiya hin heval û nasên xwe dibihîse ku derketine çiya û tevlî refên şoreşê bûne. Evana tev bandor li hest, xeyal û fikrên Demhatê ciwan dikin û mîna mixnatisê wî ber bi xwe ve dikşînin. Hinava wî mîna volqanê dikele û her bûyerek mîna erdhejê wî dihejîne.

Lêgerîna wî zûde ber bi lûtkeya çiyayan ve firiyabû û rihê wî zûde li bilindahiyan bask vekiribû. Tenê beden li bajêr mabû. Ji bo wî êdî dem dema vêye ku bedena xwe jî bispêre himêza germahiya çiyayên azad. Ji bo pêkanîna wê evîna ku hinava wî dagir kiribû, vedigere warê xwe Wanê. Ji bo cara dawiyê ji Wan û Miksê xatir dixwaze û di bêhnekê de xwe li Botanê, li çiyayên Masîroyê dibîne.

Bi vî awayî Demhat heyva tîrmeha sala 2010'an tevlî refên gerîla bû û dest bi jiyaneke nû û pêkanîna xeyalên xwe yên salan kir. Heval Evîn, Azad, Cesur Wan, Aysel, Kemal Ûrmiye, Harun Sêrt û hejmareke din heval ew li ber çemê Masîroyê pêşwazî kirin. Hevalan çend rojan li wê derê ew li gel xwe hiştin, piştre ji bo ku perwerdeya seretayî ya şervanên nû bibîne, ew şandin gel Rojbîn û Şoreş Ûrfa ku fermandarên şervanên nû bûn. Demhat piştî ku perwerdeya seretayî li şervanên nû

bi serkeftî qedand, vesaziya wî li taxima Bestayê hat destnîşankirin. Bi vî awayî derbasî cihê xwe yê nû bû û tevlî xebatên hevalên kevin bû.

Demhat tevî ku di malbateke pirhejmar û qelebalix a yanzdeh kesî de mezin bibû jî, xwedî kesayeteke bêdeng, metîn, aram û giran bû. Tevî dayîk û bav, şeş xwuşk û du birayên wî hebûn. Di malê de xwuşkên wî ji birayan zêdetir bandor lê kiribûn. Lewre di nav refên partiyê de jî zêdetir di bin bandora perwerdeya hevalên jin de ma, pir li wan guhdar kir û jiyan û xebatên wan meraq kir. Bi taybetmendiya kesayetê ve girêdayî bi giştî li hember hemû hevalên xwe şermok bû, lê taybet li beramber hevalên jin hê zêdetir şermok bû û pir jî birêz nêz dibû. Lêgerîna wî di mijara nizîkatiyên Rêber Apo yên ji bo doza azadiya jinê û şervanên jin zêde bû. Carna heta ji meyzandin û axaftina bi hevalên jin re jî şerm dikir. Hevalên jin dema bi vê şerma wî dihesiyan hewl didan axaftin û danûstandinê bi wî re zêde bikin da ku hinekê vebe û xwe rehet hîs bike. Jixwe dema perwerdeya şervanên nû didît jî, Rojbîn di vê mijarê de pir hesas û hişyar nêzî wî û şervanên din ên mîna wî dibû.

Di vî temenê ciwan de evqas giranbûna wî bala hevalan dikişand. Hem giran, hem jî pir sade, saf û paqij! Demhat ji axaftinê zêdetir, hez dikir guhdar bike û fêr bibe. Dizanî di jiyana şoreşgerî de gelek zêde tişt hene ku pêwîste fêr bibe, ji ber ku êdî gerîla bû û barê gelekî, heta ji vê jî zêdetir, barê mirovahiyê rakiribû ser milên xwe. Rêbaza wî ya xweanîna ziman bêdengî û awirên wî yên zelal û tijî bawerî bû. Ji zimanê wî zêdetir awirên wî diaxivîn. Awirên wî hemû nêrîn, meraq û daxwazên wî pir xweşik, sade û zelal bilêv dikin.

Demhat çiqas bêdeng be jî, di jiyanê de bêreng û bêrol nebû; pir vekirî bû ji bo hînbûn û pêşketinê. Zekî, kedkar, jêhatî û bidîsîplîn bû. Her tişt pir zû fêr dibû û zû serwer dibû. Her tişt dipirsî û li bersivan digeriya. Ji hemû hevalan pir hez dikir, rêz nîşan dida û guhdar dikir, lê taybet li Serhed û Nevres Kobanê pir guhdarî dikir û guftûgoyên xwe piranî bi wan herduyan re pêş dixistin. Ji ber ku ziman û uslûba wan zêdetir fêm dikir. Belkî jî ji ber vê be ku Serhed û Nevres jî mîna wî bêdeng û giran bûn û zêdetir bi awirên xwe diaxivîn û di xebatên xwe yên sabotajê de pir serkeftî bûn. Dema ew bi karên dehfik û sabotajê re mijûl dibûn, Demhat bi heyranî, meraq û baldariyeke zêde li destê wan mêze dikir, bi van meyzandinan hezkirina xwe ya fêrbûna

sabotajê bilêv dikir û heya ji destê wî bê hewl dida di karên hûrik ên ber destan de alîkariya wan bike.

Demhatî pir ji Bestayê hez dikir û zû pêre bû yek. Di fêrbûna jiyana gerîlayî û serweriya erdnîgariyê de zorî nekişand. Hem havîna germ û hem zivistana Bestayê jêre pir xweş dihat. Zivistanê di kampa binerd de bi tevî hevalên din perwerdeyeke xurt dît. Li pey meraqên xwe ket û di Parêznameyên Rêbertiyê de li bersivên xwe geriya. Li tecrube, guftûgo, rexne û rexnedanên hevalan guhdar kir û ji bo xwe kirin ezmûn. Ser tecrubeyên ku digirt re xwe ji bo pratîka sala 2011'an amade kir. Biharê dema ji kampa zivistanê derketin, vesaziya wî dîsa li Bestayê, li alana Şehrîbanê çêbû. Bi vê amadekariyê derbasî pratîka nû bû.

*****





**Nasnav: Havîn Cudî**
**Nav û Paşnav: Ayşe İşcen**
**Dîrok û Cihê Jidayikbûnê: 08.12.1988/Şirnex**
**Navê Dayikê: Xezal**
**Navê Bav: Mehmet**
**Dîrok û Cihê Tevlîbûnê: 20.07.2010/Botan**
**Dîrok û Cihê Şehadetê: 13-15'ê Sibata 2012'an li Botan-Besta**

## Heval Havîn Cudî

Havîn li Şirnexê, gundê Gundikê Melê di malbateke welatparêz de ji dayîk bibû. Gundikê Melê navê xwe ji navê eşîra Mala Melê digire. Eşîra Mala Melê pir kevin de salên dirêj li vê derê jiyan dikin. Lewre ew gund ku êdî mezintir dibe û weke beldeyekê lê tê ji kevin de bi navê mezinê vê eşîrê bûye û di nav Kurdan de her bi vî navî dimîne. Gelê wir jî mîna hemû deverên din ên Kurdistanê, navên ku dijmin li warê wan kirine qet naxebitînin.

Gundikê Melê li jora Şirnexê û tam beramberî Cudiyê Mirada ye. Ji Gundikê Melê ve Sefîne (Keştiya Nûh), Lawikê Xerîb, Helena Pîr, Qesabxane, Girê Hirmo, lûtkeya Bilûrvan, Çêla Sor, Zêrînkê, Afroka, Navenêr, Kursê Keça û gelek çiya û gundên ku di qirkirinên salên 1994-1995'an de hatine valakirin û şewitandin tev xûya dikin.

Li bakurê Gundikê Melê jî Besta heye. Çiyayê Fileh ku Gundikê Melê û çend gundên din lêne, ser giştî erdnîgariya Cudî û Bestayê serwere. Dijmin di vî rêzeçiyayî de li gundê Gwîze Korkê paygehek, li Gundikê Melê paygehek û li ser Çêla Nimêja jî paygeheke din ku

tumen û tugayekê diparêze daniye. Paygehên din jî her yekê çend tepeyên xwe ji bo parastinê hene.

Dijminî bi giştî erdnîgariya Bakurê Kurdistanê, taybet Botan û hê taybettir jî herêma Şirnexê di bin navê ewlekariyê de tev kiriye leşkerî. Heta navenda Şirnexê bixwe aliyê wê yê leşkerî ji aliyê wê yê medenî mezintire. Yanî navenda bajêr nîvî zêdetir leşkeriye.

Şirnex sînorê navbera sê beşên Kurdistanê ye; Bakur, Başûr û Rojava li Şirnexê digihîjin hev. Tabura Tankê, tumen, çendîn alay û tugay û tabur, navenda JÎTEM û sîxûrkirinê (taybet li Kun Mişkê ya li biniya Şirnexê), hejmareke zêde navendên veşartî û paygehên polîs, MÎT, JÎTEM´ê û hwd. jiyan li gelê herêmê herimandine. Evqas tedbîrên ewlekariya şidyayî ne ji ber xweparastina ji êrîşên îhtîmalî yên dewletên derva ye, berovajî, ji tirsa PKK’ê ye. Ji ber ku dewleta Tirk baş dizane ku PKK her ji destpêka damezrandinê ve, bi baweriya ku Kurdistan yek parçeye sînorên fermî yên dagirkeran nas nake, pê lêdike û ji vî milê sînor heya wî milê din bêyî destûrên dewletan û berçavgirtina formalîteyên burokratîk tê û diçe, ji ber ku van sînoran weke zilmê û nerewa dibîne û ji bo rakirina wan bi dehan sale têkoşîna siyasî û leşkerî dimeşîne. Yanî şerê PKK´ê li hember dagirkeran bi parçeyeke Kurdistanê ve sînordar nîne.

Havîn ji herêmeke wisa, ji malbateke wisa û mezinbûyîna çandeke wisa bû. Ji eşîra wan re Mala Melê dihat gotin. Eşîra Mala Melê biyaniyê hestên welatparêziyê nebû. Beriya ku Havîn ji dayîk bibe, ji vê eşîrê hejmareke berçav tevlêbûn û şehîd di nav tevgera azadiya gelê Kurdistanê de hebûn. Eşîra wan bi giştî ji berê de tim di rêzên gelê xwe de cih girtibûn û xwedî li nasname û çanda xwe derketibûn. Bedel dabûn berçav û li hember dagirkeran rawestiyabûn. Di raperînên Botanê de rol lîstibûn û erka xwe ya netewî bi cîh anîbûn.

Bi derketina PKK'ê re jî ev malbat xwe berpirsiyar dibîne û jêre himêz vedike. Bêyî dudilî gelek ciwanên wê derdikevin çiya û bedelên giran didin; ji vana xalê Havînê yê bi navê Xalîd sala 1996'ê li Şkefta Birîndaran şehîd dikeve. Piştî wî, miroveke wê ya din bi navê Dersîm şehîd dibe. Herî dawî xaleke wê yê din bi navê Haşim ku sala 1992´yan tevlî refên gerîla bibû di heman zivistana ku Havîn şehîd ket de, nêzî sê heyvan beriya şehadeta Havînê, li Cudî şehîd ket.

Lê belê ji ber şert û mercên zivistanê û nebûna têkiliyên di navbera herêman de, Havîn hê bi şehadeta wî nehesiyabû. Baş bû pê



nehesiyabû; ji ber ku Heval Haşim Havîn tevlê kiribû, li çiya hevdu dîtibûn û pir bi hevdu ve girêdayî bûn. Havînê pir ji Heval Haşim hez dikir û eger bi şehadeta wî hesiyaba kê dizane wê çiqas pê bandor bibûya. Dema Heval Haşim şehîd ket, nedizanî ku piştî demeke pir kurt Havîn jî wê şehîd bikeve û wê du şehîd li ser hejmara şehîdên malbatê zêde bibin...

Ne tenê ji nav malbatê, ji cîran, nas û dostan jî gelek tevlêbûn û şehîd di nav gerîla de hebûn, ji ber ku tevlêbûn ji bo nav refên gerîla weke çandekê lê hatiye û malbatên ku tevlêbûyînên wan nebin hema bêje tine ne. Heta ji malbatên ku bi dilxwaz bûne çete û li hember PKK'ê çekên dijmin rakirine jî gerîla derketine. Ev, bandora vê ye ku welatparêzî û zanista netewî ji berê de bûye çanda hevbeş a vê herêmê û bi derketina PKK'ê re jî hê xurttir bûye.

Di dîroka raperîn û berxwedanên mezin ên Botanê de, herwiha gelek jinên leheng û wêrek ên mîna "Eyşê Dînê" ku fermandartiya artêşên mezin ên bi çend hezar leşkeran û şerên giran kirine jî hene. Jixwe Fermandar Eyşê ji ber heybet, xurtbûn û wêrekiya zede ya di şer de, ji aliyê leşkerên wê ve leqeba "dîn" lê tê kirin. Heya niha jî navê deriyeke rêzeçiyayê Çêla Nimêja bi navê Eyşê Dînê ye. Eyşê nehiştiye artêşa Osmaniyan ji deriyên Cudî, Çêla Nimêja, Herekol û Katoyan ve hilkêşin û gelê herêmê dorpêç bikin; ji Cudî heya Çêla Nimêja, ji Hecî Musa û Pîro heya Herekolê, ji wir heya Katoyan tev parastiye. Heta niha jî li wan deran çeperên ku Fermandar Eyşê ji bo şer çêkirine û şikeftên ku tê de maye (taybet li Hecî Musa) weke xwe mane.

Jina Elkî jî, mîna Eyşê Dînê fermandareke xurt a şer bûye. Gelek jinên mîna Eyşê Dînê û Jina Elkî li vê herêmê derketine ku yan bixwe serfermandartiya artêşan kirine yan jî di nav artêşên gelê xwe de rolên girîng lîstine û fermandartî kirine. Ev di dîroka Botanê de rawestîneke biheybet û rola pêşengtiya jinên herêmê nîşan dide û hê jî li ser vê civakê bibandore.

Jixwe piştî derketina PKK'ê jî bi serkêşiya Şehîd Fehîme Îke kom bi kom jinên Botanê tevlî têkoşînê bûne. Xebat, berxwedan û şehadeta

*Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!*
Heval Seadet (Rehîme Qehreman) û Heval Bêrîvan Êzîdî (Binevş Egal) li Şirnex û Cizîrê, hemû gelê herêmê radike serhildanê û kom bi kom ciwanan, taybet jî keçên ciwan dikşîne serê çiya. Jixwe gora van hevalên jin ên şehîd heya niha jî weke ´Qibleh´ tê ziyaretkirin û gel ji bo derbaskirina nexweşî û parastina tendirustiya xwe, pêkhatina miraz û daxwazên dilê xwe û hwd. diçin ziyareta gora wan Şehîdan.

Ev berxwedanên mezin, tehlîlên Rêber Apo yên li ser gel û taybet jinên Botanê û dîrok û çanda wan, hişmendiya desthilatdariya zilam heya astekê lewaz kiriye û bûye sedem ku tevlêbûna jinan ji bo refên gerîla û xebatên siyasî û civakî asayî û weke rûmetê lê bê meyzandin. Lewre li Botanê jinek piştî ku tevlî gerîla bibe, êdî weke efsaneyê pîroz dibe û bi xirabî nayê qalkirin, kes mafê xwe nabîne nebaş ser kesayet û jiyana wê ya bihurî biaxive. Ji ber ku ev exlaq li tevahî Bakurê Kurdistanê û taybet Botanê rûnîştiye, ti kes ji tevlêbûna keçên xwe ya ji bo refên PKK'ê aciz nabe û rêz li vê vîna mezin tê girtin. Eger destpêkê malbat nexwazin keçên wan tevlî gerîla bibin jî, piştî ku tevlêbûn çêbû êdî malbat nêrînê diguherînin û rêz nîşan didin.

Lê belê dema jin di nav mal û civakê de be bi vî awayî nîne; yanî jin eger di nav gerîla de be mezin, xwedî vîn û pîroze. Lê eger di malê de be ev feraset û meyzandin diguhere û zayendperestiyeke hişk û şikênandina vînê dikeve dewrê. Bi vî awayî êrîşeke giran li ser vîn, giyan, hest û hizrên jinan pêş dikeve. Çanda PKK'ê di asteke berçav de hatibe runişkandin û di feraset û hişmendiya li hember jinê de werçerxan û şoreşeke mezin pêk anîbe jî, aliyê temamnebûyî hê hene û feodalîzma hezaran salan ji mejiyan paqij nebûye. Lewre zayendperestiya zilam hê di civakê de rewa tê dîtin. Feraseta zilamsalar bi kûrahî tê jiyankirin. Zewicandinên bi zorî û di temenên biçûk de, lêxistina li jinan, zewacê zilamê hemdem bi çend jinan re û hwd. ji mînakên vê ne. Sedema ewqas xwekuştinên jinan jî jixwe evin.

Ev yek di malbat û derdora ku Havînê tê de jiyan dikir de jî hebû. Havîn hê di temeneke pir biçûk de êş û azarên jinbûn û Kurdbûnê nas dike. Zordestî û desthilatdariya hişk a zilam ya li ser jinên derdora wê dibe sedem ku pir zû fêm bike ku êşên hemû jinan yekin. Cudahiya ku di navbera wê û birayên wê de tê danîn pir zelal û berçav dibîne. Dibîne ku di temenê ciwaniyê de ji ber axaftina ku ser wê digere baweriya malbatê, taybet jî birayên wê li hember wê dişkê. Pir hewl dide birayên xwe qaneh bike û şaşbûna wan axaftinan bi wan bide

fêmkirin, lê belê hemû hewldanên wê bêsûdin; ji ber ku zilam ji hemû derew, xapandin û fêlbaziyên hemzayendên xwe bawer dikin, lê ti carê ji rastiya jinekê bawer nakin, ji ber ku bawerkirina ji jinê ji bo xwe weke şermezariyekê dibînin. Ev, ji bo Havînê weke êşkencê tê. Ji ber ku dibîne zilamê ku her roj li hember dijmin serî ditewîne çawa li ser jinê zordeste û eger nekaribe dilê jinekê bi dest bixe bi derew, hetikandin û paşde axaftinan şeref û rûmeta wê jinê leke dixe dike û têk dibe.

Li milekê ev rewşên civakî, li milê din jî helandinên ku di dibistanên dijmin de pêre rûbirû tê, mejî û dilê Havînê tijî pirs dikin. Jiyan lê dibe jan. Dibistan lê dibe dojeh. Mamoste lê dibin zebanî. Bav û bira lê dibin gardiyan. Êşên ku ji ber jinbûnê dikşîne roj bi roj evîna Rêber Apo di dilê wê de mezintir dike. Yekane rêya rizgarbûna ji vê jiyana bijan di şopandina rêya xalên xwe de dibîne. Ser hemû westandin û zehmetî, xweşî û zorahiyên jiyana şoreşgeriyê hûr û kûr difikire. Di encamê de biryara xwe dide: “jiyana ku ez tê de nînbim û hebûna min tê de bêwate be, ew jiyan ne ayîdê mine. Ez pêwîste biçim jiyanekê bijîm ku ez ya wê, ew jî ya min be!”

Xwarziyê wê Rêzan û keçapa wê Hebûn di kêleka êşên xwe de, êşên wê jî dibînin. Bi zextên derûniya li ser Havînê û êşkenceya ku dikşîne dihesin û wê hîs dikin. Lewre ji bo dawîanîna li wan êşan, herî zêde jî ji bo xatirê Havînê û ji bo ku wê ji vê rewşê rizgar bikin heman biryarê didin. Tîrmeha sala 2010'an her sê bi hev re bi rêya Heval Haşim li Bestayê tevlî refên gerîla dibin. Wê demê temenê Havîn û Hebûnê 18 sal, ê Rêzan jî 17 sal bû.



Havînê ji Botanê pir hez dikir. Jixwe keça Botanê bû. Navê Botanê îlham dida wê, hestên wê bilind dikir û rûyê wê mîna gulan geş dikir. Di jiyana gerîlatiya Botanê de pir zû bi hevalan re bû yek, pir zû ji jiyana gerîlayî û hevalên xwe hez kir. Bi armanca mezin û temenê ciwan ve girêdayî, pir enerjîk û bicoş bû.

Perwerdeya seretayî li Botanê, li ba Rojbînê dît. Rojbînê dema ewqas enerjîk, jêhatîbûn û pêşketinên wê di warê rêxistinî û leşkerî de dît, ew li Botanê hişt. Ji ber van taybetmendiyên wê piştî ku dewreya şervantiya nû qedand, yekser ji bo Taxima Hereketî hat şandin. Piştî şehadetên Aqêrê ev taxim ji nû de hat vesazîkirin. Vê carê di taximê de tîma YJA-STAR´ê ji Ronahî, Zîlan, Dîdar û Havînê pêk hat.

Havîn di nav çend heyvan de bi tevî taxima xwe hemû alanên Besta, Herekol û Garisayê geriya û hê zêdetir evîndara Botan û jiyana ku hilbijartîbû bû. Dema li erdnîgariya welatê xwe digeriya kêlî bi kêlî dilê wê tijî dibû û bi şanazî ji Dîdar re digot: “Ez ne Eyşê ya nav malê me. Ez Havîna lûtkeyên çiya me.” Havîn helbestvan nebû. Dibe ku di jiyana xwe de ti carê helbestek nenivîsîbe. Lê dema ev hest û gelek hestên xwe yên din ji hevalan re digotin dibê qey helbestvanekê diaxivî. Lewre êdî bi hestên xwe yên xweşik jî bala hevalan dikişand.

*****

Payîza sala 2010'an tîma YJA-STAR´ê ya Taxima Hereketî derbasî Kato Jîrkayê bûn ku, bi hevalên jin ên wê derê û yên Kato Xelîlayê re zivistanê bi hev re bimînin. Bi vî awayî Havîn jî derbasî wir bû û hesreta dîtina Kato di dilê wê de nema.

Havînê ji rehetiyê hez nedikir. Jixwe di jiyana gund de ji zarokatiyê ve fêrî kedê bibû û biyaniya wê nebû. Di dilê xwe de hesteke wiha jiyan dikir ku ‘hemû keda ku min di temenê xwe de da vala çû, qet nebe di nav partiyê de bila keda min bikeve xizmeta jiyaneke rast û azad.’

Ji ber nûbûna wê, hevalan zêde ew nedixistin nav kar û ji bo peywirên dûr û giran nedişandin. Havîn ji vê aciz dibû û nedipejirand. Ji bo hemû peywiran derdiket pêş û xwe pêşniyar dikir. Dema hevalan pêşniyara wê nedipejirandin û ew rê nedikirin zora wê diçû. Lê dema pêşniyar bihata pejirandin, mîna gulekê ku bi derketina rojê re vebibe û di rûyê xwezayê de bikene dipişkivî, geş dibû û bi eşq û evîn ser karê xwe de diçû.

Wê payîzê beriya ku berf bibare çend rojan baraneke dijwar barî û hewa pir sar bû. Di Kato Jîrkayê de dar nînin, jixwe ax jî zêde nayê dîtin. Tenê li ser serê zinar û latên bilind pir hindik darên qaçê hene. Ew jî metirsîdare ji bo ku mirov biçe wan jêke û bîne. Li ser şkêrên nizim jî dar nemane. Lewre heval ji bo pêdiviyên agir, nan, çay û

xwarina xwe diçûn li zozanan gunî jê dikirin û demekê li cih de dihiştin ji bo ku li ber tavê ziwa bibin, pê bikevin û dû dernexin.

Rojekê ku baran pir giran dibarî û brusk eman nedida erdê, piştî ku hinek baran kêm bû çar hevalan xwe amade kirin biçin ji zozanan guniyan bînin. Havînê jî xwe pêşniyar kir. Heval ji bo ku ew neweste, nedixwestin wê bi xwe re bibin lê Havînê pir îsrar kir biçe. Heval neçar man wê jî bibin. Her çar heval çûn guniyên xwe di demjimêrekê de kom kirin anîn. Heya ew vegeriyan, hevalên din xebatên nav noqteyê kirin. Ew kom heya ji guniyan vegeriyan ji pora serî heya pêlavên lingê wan şil û pil bûn. Dema çûn baran hindik dibarî, lê dema vedigeriyan êdî baran veguherîbû berf û barana têkilhev, ango şilopê. Pir cemidîbûn. Hevalên din ji wan re cih vekirin ku nêzî agir birûnin, xwe ziwa û germ bikin. Havînê nexwest biçe ber agir. Hevalekê jê pirs kir: “Çima naçî ber agir? Pir westiyayî?” Keneke pir xweşik ket ser lêvên Havînê û got: “Heval, bawer bike min nû gerîlabûna xwe hîs kir. Ji ber ku hevalan heya niha qet nedihiştin ez biwestim û biçim karên zor, hem jî di baranê de. Ev cara yekê bû çûm kareke zor. Lewre min nû gerîlatiya xwe jiyan kir û bawer kir ku gerîla me.” Havîn careke din bi van hestên xweş û tijî wate wêjeya şoreşgertiyê dinivîsand û helbesteke gerîlayî dixwend ji hevalên xwe re. Lewre hevalên wê ji van hestên wê yên sade pir hez kirin.

Havîn mîna fîlozofekê li pey hînbûna her tiştî bû. Her tişt dipirsî û dixwest bizane. Dixwest razên vê jiyanê fêm bike û dîroka xwe weke jin û Kurd fêr bibe. Jiyana Rêber Apo jêre weke muemma dihat û dixwest bizane zarokeke wisa biçûk çawa Rêbereke wisa mezin jê derket. Her tişt meraq dikir. Havîn dibê qey pê hesiyabû ku temenê wê dê kurt be û jiyan bi lez diherike, lewre pêwîste lez bike. Dibê qey dizanîbû wext li benda wê namîne û divê bi lez her tiştî fêr bibe. Dibê qey dixwest eger jiyana wê demkurt jî be, vê jiyanê tijî tijî bijî. Nedixwest kêliyekê vala derbas bike. Li wateya jiyanê digeriya. Ji bo rewşa jinê, taybet keçên ciwan, xwuşk û hevalên xwe yên gund û dibistanê heyf dixwar.

Pirsên Havînê çiqas zêde bin jî, hevalên wê weke mamosteyekê lê dinêrîn, ji ber ku gelek tiştan ji wê fêr dibûn.

Wê zivistanê bi tevî Ronahî, Zîlan, Dîdar, Rojbîn, Aysel, Rûken Cudî û panzdeh hevalên din di kampekê de man. Ji ber ku jiyana gerîlatî jêre

nû bû, her tişteke vê jiyanê bala wê dikişand û zû xwe dixist nav de. Şert û mercên zor ên wê zivistanê; berf, qeşa, serma û seqema dijwar qet ew xemgîn nedikir û ji tevlêbûna partiyê poşman nedikir. Berovajî, Havîn bi kenê xwe yê şîrîn ku hêjayî dîtinê bû hemû zehmetiyan pêşwazî kir. Lewre hemû bîranînên ku di wê kampê de jiya di dil û mejiyê xwe de kola û neqişand. Hevalên wê jî meraq, hest, henek, stran û kenê wê di dilê xwe de kolan û neqişandin.

Kenê wê ewqas ji dil bû ku dema dikeniya ji çavên wê rondik dihatin û rondik mîna stêrkekê di nav reşkahiya çavên wê de dibiriqîn. Hemû hevalan ji wî deng û awayê kenê wê yê taybet pir hez dikirin. Dema dikeniya dibê qey hemû tehtên Kato bi kenê wê şa dibûn û pêre dikeniyan. Jixwe di wê kampê de dema dengê kenê Havîn û Rûkenê nehatibûya, dibê qey di kampê de kesek tineye û kesê di wir de jiyan nedikir. Bi vî awayî bi kenê xwe jî zindîbûn û kelecan didan jiyana kampê. Ji ber ku Havîn û Rûken pir ciwan û enerjîk bûn û zêde nedizanîn li cihê xwe birûnin, tim di livîn û tevgerê de bûn, her dem dikeniyan û ti carê ken ji lêvên wan kêm nedibû, mirov li kû dera şkeftê bûya dengê kenê wan dibihîst û dizanî ew bi çi re mijûlin.

Bihara sala 2011'an dema berfê dest bi helandinê kir û hêdî hêdî erazî vedibû Havîn bi tevî Zîlan, Ronahî, Dîdar, Aysel û Arjînê ji kampê derketin û ber bi Bestayê ve ketin rê. Havîn û Zîlan ji Taxima Hereketî qut bûn û bi hev re derbasî taxima Şehrîbanê bûn.

*****



**Nasnav: Cîlo Sîpan**
**Nav û Paşnav: Selami Kaya**
**Dîrok û Cihê Jidayikbûnê: 01.05.1995/Wan**
**Navê Dayikê: Kadriye**
**Navê Bav: Zekeriya**
**Dîrok û Cihê Tevlîbûnê: 17.06.2011/Wan**
**Dîrok û Cihê Şehadetê: 13-15’ê Sibata 2012’an li Botan-Besta**

**Heval Rojvan Sîpan**

Rojvan ji navçeya Erdîşê ya girêdayî Wanê bû. Zarokê malbateke welatparêz, sade, xizan û kedkar a eşîra Xidirî bû. Malbateke pirhejmarin; dayîk, bav û duwanzdeh xwuşk û birane. Ji bo debara jiyana çardeh kesan, bavê wî di xebatên avasaziya xaniyan ango înşaatê de dixebite. Nedihat bîra Rojvan ku rojekê bavê wî bi destên sax û nerm bi wan re li ser sifreya xwarinê rûniştibe. Jixwe bavê xwe zêde bêkar di malê de nabîne. Bavê wî tim bi sedema xebatên ku dimeşîne, destên wî zivir û qelişîne û tim an xwîn ji qelişên nav kefa destên wî tê, yan jî herî dikeve nav wan qelişan de û bi şûştinê jî jê dernakeve û jê naçe. Cilên ser bavê wî tim qetiyayî û pînekirîne. Tenê çend cilên wî hene ku bi hev ve diguherîne.

Rojvan ji zaroktiyê ve tim van dîmenan dibîne, bi van dîmenan mezin dibe û ev dîmen li ber çavên wî tim dubare dibin; serpêhatî diyare, li ser eniyê hatiye nivîsandin û ewê neguhere, nifira xwedayane; Kurd wê xizan ji dayîk bibin, xizan bijîn û xizan bimirin!

Rojvan di nav kevneşopiya civakekê de dijî ku bûye du parçe; beşeke wê li hember serpêhatiya nivîskî ya ser eniyê çok daniye û beşa

din li hember vê îsyan dike. Li aliyekê Kurdeke welatparêz heye ku ji qedera ser eniya xwe bawer dike û li hember wê xwe pir bêhêz, reben û belengaz dibîne û xwe ji daxwazên xwedayan re berdaye. Li aliyê din Kurdeke welatparêz ê din heye ku li hember sepandinên di bin navê serpêhatî û kerema xwedê de li wan tê kirin serî hildide û dixwaze wê biguherîne da ku mîna "mirov" karibe biîtîbar bijî, ne tim di nav kedeke bêencam û di beza li pey nanekê de!

Malbata Rojvan pir welatparêzin û bi çanda Kurdînî û exlaqê kedê ve girêdayîne. Ti carê xwe ji refên gelê xwe dûr negirtine. Berovajî, di nav refên têkoşîna azadîxwaziyê de tim tevlêbûneke berçav nîşan dane û roleke erênî lîstine. Dayîk û bavê wî yên kedkar tevî ku xwe li hember serpêhatiya dasepiyayî ku Kurd jêre "qedera reş" dibêjin bêçare hîs dikin jî, zarokên xwe bi evîna têkoşîna ji bo welatek azad mezin û perwerde dikin. Li ba wan rûmeta herî mezin welatparêzî, girêdayîbûna bi exlaq û nirxên civakî ve û pêkanîna erkên wê ne. Lewre naxwazin zarokên wan jî bi êşa ku ew bixwe pê mezin bûne mezin bibin.

Rojvan hê ji zaroktiyê ve di pêsîra dayîka xwe de Rêber Apo û tevgera azadiya gelê Kurd nas dike û pê dihese ku serpêhatiyeke reş mîna malbata wî, gel û welatê wî jî dorpêç kiriye. Bindestiya xwe û zordestiya beramberî xwe dibîne û hîs dike. Vê nizimbûnê ji bo xwe napejirîne. Rojvan divê mezin bibe û destwerdana vê rewşê bike!

Zaroktiya wî bi keviravêtina ji polîs û panzêran derbas dibe. Lîstokên zaroktiya wî jî mîna hemû zarokên din ên Kurdistanê şerê keviran ê bi dijmin re ye, ji ber ku di vê Kurdistana tijî şer û xwîn de lîstok ji bo zarokan qedexeye; zarok şûna bilîzin û şahî bikin, çekên li gorî temenê xwe radikin. Çeka zarokên Kurd kevirên nav destên wan ên hûrike. Geh ew kevirên biçûk li gorî hêza wan giran tên û destên biçûk û narîn ê Rojvan diwestînin. Geh ji ber ku hêza milên wî têrê nake kevir nagihîjin hedefa xwe û lê nakevin. Geh panzer asîd û têzavê davêje rûyê wî, ji ber vê çavên wî dişewitin û nikare kevirê xwe bavêje, lewre bi girî paşde direve û xwe davêje himêza dayîka xwe da ku di derfeteke din de kevirê xwe bavêje dijmin.

Peyva "dijmin" bi qasî navê dayîk û bav li guhên zarokên Kurd nas tê. Zarokên Kurd biyaniyên vê peyvê nînin û êdî rojane pêre rûbirûne. Lewre li hember vê peyvê tirsê jiyan nakin. Rojvan jî wisa. Ev bêtirsî

wêrekiya şerkirinê dide wan. Ji ber vê ye ku di Kurdistanê de ji zarokên nav meydanên şer re “generalên biçûk” tê gotin.

Her ku Rojvan mezin dibe çeka wî jî diguhere û mezintir û bibandortir dibe; vê carê molotof kokteyl çeka wî ye. Yekane tişta ku di bajêr de jê hez dike ew kêlîne ku bi tevî ciwanên din bi ser û çavên pêçandî molotofan davêjin polîs û panzêran û êrîş dikin ser wan. Rojvanê ciwan di xebatên ciwanên Apoyî de bi lez aktîf dibe û di demeke kurt de ji ber aktîfbûna zêde û serkeftinên wî yên di çalakiyan de weke endamê rêveberiya xebatên ciwanên Wanê tê erkdarkirin. Di vê xebatê de kar û erkên ku digire ser milên xwe bi giştî serkeftî derbas dibin. Ji ber van pêşketinan di nav hevalên xwe de pir tê hezkirin û jê tê bawerkirin.



Carekê dema di Roja Zimanê Kurdî de ciwan diçin ji bo daxwaza zimanê zikmakî çalakî bikin tev bi hev re strana Hozan Aram Tîgran a “Şîrîn û xweşe zimanê Kurdî” dibêjin. Ev stran êdî di hemû çalakiyên ji bo mafê zimanê zikmakî tên kirin de weke siruda çalakiyan lê tê. Rojvan ku li Wanê di piraniya wan çalakiyan de cih digire, êdî ev stran dikeve ser zimanê wî û hema di her kêlî û merasimekê de dibêje. Mijar û sedema merasiman çi dibe bila bibe strana ku Rojvan dibêje her ev e. Hin caran hevalên wî pêre henek dikin û dibêjin “ma tu jî strana xwe ya meşhûr nabêjî?”

Rojvan di malê de bi dayîk û xwuşkên xwe re zêdetir têkiliyê datîne, danûstandinên wî zêdetir bi wan re ne û zêdetir bi wan re dirûne û dirabe. Lewre kesayeta wî di bin bandora dayîk û xwuşkan de şêwe digire. Ev, diteyîse ser şêwazê axaftin, liv û tevgerên wê yên bedenî jî. Bi awayeke ku di uslûb, liv û tevgerê de zêdetir bişibe jinan. Dema strana xwe ya Zimanê Kurdî jî dibêje xwe pir narîn dilivîne û

heya stran diqede ji xwe re çepikan lêdide. Herwiha di dîlanên Wanî û Serhedî de mîna bedena marê xwe pir zirav û narîn diherikîne. Ev, ji bal û çavên derdora wî winda nabe.

Dema mezin dibe tu tişt bi qasî dîwarên bilind ên nav kolanên bajêr wî tengav nake. Li beramber wê, ti tişt bi qasî bilindahî, bi qasî Çiyayê Sîpanê û berfa ser serê wî bêhna wî venake. Hema ji dûr ve jî be dîtina lûtkeya bi berf a Sîpanê kelecanê dixe dilê wî. Bejna bilind a Sîpanê ya xwe, xeyalên bilindbûna xwe jî ya Sîpan dibîne. Di xeyalên xwe de xwe û Sîpanê digihîne hev û bi hev ve girê dide. Lewre di nav gerîla de paşnavê xwe dike Sîpan.

Di nav xebatên aktîf ên ciwanên Apoyî de asta xebatên Rojvan dikeve ber bala polîsan. Polîs dixwazin wî bigirin û bavêjin girtîgehê. Heya demekê lê digerin. Lê belê wî di nav xebatên xwe de tecrubeya xwe xelaskirinê jî girtiye û fêrî taktîkên wê bûye. Lewre her carê bi awayekê xwe ji ber bala polîsan û metirsiya ketina dest difilitîne. Di encamê de pê dihese ku di bajêr de êdî cihê wî nîne û nikare ji vê zêdetir li wir bijî. Xeyal, hest û hizrên xwe bi hin hevalên xwe yên xebatên ciwanan ku ji wan pir bibawere re parve dike. Ew hevalên wî jî di heman hest, nêrîn û biryarê de ne, jixwe ew jî tev ji aliyê polîsên Tirk ve tên lêgerandin. Di encama vê biryara hevbeş de rojeke pûşpera 2011'an bi tevî Berçem, Devrîm, Bahoz, Şevger û Şoreşvan ji Wanê dikevin rê û bêhna xwe li çiyayên bilind ên Kurdistanê, li Masîroyê distînin.

Dema gihiştin Masîroyê, çend rojan li ba hevalên wir man. Şehîd Azad, Cesur û Şiyar Çewlik pêşwaziyeke germ li şeş şervanên nû kirin. Navê Azad Felluce pir bala wan kişand. Kurd jixwe esmerin, lê rengê rûyê Heval Azad esmer nebû; hê tarîtir bû. Lewre wisa fêm kirin ku Heval Azad Erebe û ji bajarê Felluceya Îraqê ye. Bi kêfxweşî û matmayî ji hevalên din pirs kirin: “Me nedizanî Erebên Felluce jî di nav gerîla de hene!”

Cesur ku ji hevalên din ciwantir bû û pir henekçî bû pir xweşiya wî çû, dîsa derfetek dît ji bo bela xwe li Azad bixe. Bi tevî Şiyar ku ew jî di kemîna heman fersendê de bû bi dengê bilind keniyan û ji kenînê êş ket zikê wan. Piştre ji wan re gotin: “Heval Azad ji Bedlîsê ye. Kurd e. Ji ber ku reşe em jêre dibêjin Azad Felluce.” Heval Azad bixwe jî têra xwe keniya û bi henek ji wan re got: “Hevalno, xûyaye we qet ên mîna min reş nedîtine. Ez birayê biçûk ê Mandêla me, ji Efrîqayê hatime tevlî

şoreşa welatê we bûme. Binêrin Efrîqî çiqas sosyalîstin!” Hevalên nû bi van henekan hêdî hêdî vebûn û êdî bi kêfxweşî û rehetî dest bi henek, giftûgo û pirsan kirin.

Roja din berdestê seherê komeke din a hevalan; Egîd Civyan, Qehreman Colemêrg, Zinar Ewrex û Berbang ku ji Kato Xelîlayê dihatin û dixwestin derbasî Kato Jîrkayê bibin, li Sîxur Paşa gihiştin gel wan. Nîvro Apê Feysel bi du destên tijî hat ba wan.

Sîxur Paşa navê xwe ji Sîxur digire. Çiyayeke bilind, lat û biheybete û ser Masîroyê de serwere. Gelek hêlînên sîxuran li ser serê wî ne. Êvaran sîxur dadikevin nav zeviyên gundiyan û li wir dibin nêçîra wan. Sîxur parastina xwe bi sîxên ku davêjin dijminên xwe dikin, yanî çeka wan sîxên wan e. Sîxên wan dirêj, tûj û hinekî hişkin û rehet di laşê beramber re diçin. Sîxur dema mirovan, an ajalekê bibînin ku dixwaze wan nêçîr bike yekser sîxên xwe yên tûj davêjinê. Bi vî awayî beriya dijminên xwe dikevin tevgerê.

Apê Feysel ji devera Sîxur Paşayê bû. Malên wan beriya koçberiyê hema di biniya kelha Sîxur Paşa de bûne. Di salên 1994-1995'an de ku dewleta Tirk fermana valakirin û şewitandina gundên Kurdistanê û bêwarkirina Kurdan derdixe, ew jî bi tevî malbata xwe koçberî Edene û Mersînê dibin. Apê Feysel piştî çardeh, panzdeh salan bi tevî du birayên xwe careke din vedigere ser axa xwe. Havînan li Sîxur Paşa û Masîroyê kon vedidin û weke koçeran dijîn, zivistanan jî vedigerin metropolên Tirkan.

Sala 2011'an biryar didin ku ji nû de malên xwe ava bikin. Kureke Dayîka Sêvê û Apê Feysel bi navê Xebat Azad sala 2010'an tevlî refên gerîla bibû. Lê ew hê ji salên 1980’yan ku şerê gerîlayî li Botanê dest pêkiribû welatparêz bûn û bi PKK´ re bûn. Wê demê ew her sê bira û hevjînên wan ku keçapên wanin nûciwan bûne û mîlîstî ji hevalan re kirine.

Dayîk û bavê wan di bin erda mala xwe de stargehên veşartî çê kirine û gerîlayên birîndar tê de veşartine. Fermannameyên Rêber Apo ku gihiştine destên hevalan û perwerde li ser dîtine, rapor û gelek belge û tiştên rêxistinî yên salên 1989-1992'yan di nav qutuyên fîşekan de, di nav prîkêtên dîwarên malê de veşartine. Sala 1993'yê kureke Dayîka Delîla ku dibe biraziyê Apê Feysel bi navê Maas tevlî refên gerîla dibe û sala 1999'ê di pêvajoya pilangeriya navdewletî de li

herêma Gabarê di encama berxwedaneke mezin de û bi lehengî şehîd dikeve. Vê malbatê di nav şoreşa azadiya Kurdistanê de kedeke pir hêja tevlî keda heyî kiribûn, lê qet ev bes nedîtibûn; ser, giyan, can û malê xwe ji xizmeta şoreşê re razandibûn.

Êvara roja derbasbûyî dema Şiyar şervanên nû ji Masîroyê anîbûn Sîxur Paşayê, Dayîka Delîla, Dayîka Sêvê, Dayîka Eyşê û Hemîde ku her çar jintiyên hev bûn agahdar kiribûn ku di nav şervanan de du hevalên jin jî hene. Dayîk ji ber ku li wan zozanan dinya pir sar bû û dizanîn ku derfetên germkirinê li ba hevalan nîne, ji Şiyar xwestibûn ku eger hemû şervanan nebe ba wan jî qet nebe wan du şervanên jin bibe.

Şiyar ev daxwaza dayîkan pêk anîbû. Dayîk û zarokên wan ji dîtina Berçem û Devrîmê û biryara tevlêbûna wan kêfxweş bibûn û hemû pêdiviyên wan pêk anîbûn. Vê rehetiyê dabûn wan ku wê derê weke mala xwe bibînin û şerm nekin. Heya derengê şevê bi wan re elaqedar bibûn û germahiya dilê xwe ya dayîktiyê ku mîna volqanê dikeliya bi wan dabûn hîskirin.

Dayîka Delîla ku kurê wê Meas şehîd bû û Dayîka Sêvê ku kurê wê Xebat gerîla bû bi çaveke hê taybettir û germtir li wan dinêrîn û kêfxweş bûn ku heya ciwanên Apoyî hebin wê rêya zarokên wan ku şopa Şehîdane berdewam bibe. Dema li wan dinêrîn geh bi kêfxweşî û hezkirin serê wan dixistin himêza xwe û destên xwe li nav pora wan digerandin, geh şîretên dayîktiyê li wan dikirin, geh li wan guhdar dikirin û geh ji tirsa ku careke din wan nebînin çavên wan tijî hêsir dibûn. Destên xwe yên bibereket û pîroz li ser serî û rûyê wan re dianîn dibirin û duaya xêrê ji wan re dikirin. Gotina “yadê ez qurban, xwe biparêzin, hûn ji me re pêwîstin. Hûn divê Rêberê me ji nav lepên dijmin bidin berdan, divê tola Şehîdên me rakin. Yadê ez gorî, dilê me neşewitînin, xwe biparêzin yadê!...” ji ser zimanê wan dayîkan kêm nedibû.

Seherê zû dayîk rabibûn hin pêwîstiyên şervanan amade kiribûn û dabûn destên Apê Feysel, da ku ji hevalan re bibe. Dema Berçem û Devrîm jî bi rê kiribûn, bi germahiya dilê dayîktiya xwe ew himêz kiribûn û şandibûn. Heya şervan ji ber çavên wan winda dibin, her du destên wan li hewa li ser pêyan li wan meyzandibûn.

Apê Feysel çû cihê Şiyar wana. Şervanan dema Apê Feysel dîtin û dilsozî û germahiya wî li hember xwe hîs kirin, pir bandor bûn û çîroka wî ji hevalan pirs kirin. Hevalan bi kurtî qala serpêhatiya malbata wî ji

wan re kirin. Şervan hê zêdetir bandor bûn û bi awayekî ku Apê Feysel bibihîse gotin: “Em jî hatine tola wan hildin û van çiyayên ku hatine wêran û talankirin careke din ji wan re şîn û ava bikin...!”

Apê Feysel heya êvarê li ba wan ma û carna ji wan re qala bi hev ve girêdayîbûna jiyana gel û gerîla kir, carna bêdeng li wan guhdar kir. Geh xwe di temenê wan de hîs kir, geh ji nîşka ve hemû zilmên ku ji dijmin dîtine di kêliyekê de ji ber çavên wî re derbas bûn û bi hebûn û biryara şoreşgeriya wan ciwanan şa bû û hestên serfiraziyê jiyan kirin. Apê Feysel bi hezkirin û hestên bavekê nêzî wan dibû û mîna Xebatê xwe li wan dinêrî. Wekî ku Xebatê xwe dîtibe ewqas bi wan şa bû û ji wan hez kir. Şervanan jî ew mîna sembola baveke Kurd ê êşkişandî dîtin, lê guhdar kirin û jê hez kirin.

Êvarê piştî ku Apê Feysel ji wan xatir xwest û çû, şervanên ciwan jî bi koma hevalên ku wê derbasî Kato Jîrkayê bibûna re rabûn ketin rê. Egîd û Berbang bi şervanan re pêşde dimeşiyan, Qehreman û Zinar jî ku kelûpelên hemû hevalan û hin tiştên din li hêstirê kiribûn bi hêstirê re dimeşiyan. Koma hevalan gihiştin ser navrêya (boğaz) Sîxur Paşayê. Şervanên nû çawa hilkişiyan navrêyê, destê hev girtin û dest bi dîlanê kirin. Ber stranên “Özgürlük Gençleri” (Ciwanên Azadiyê) ku Ciwanên Apoyî yên Wanê derxistibûn, “Dil Dixwaze Here Cengê” û “Mevziden Mevziye” ya Şehîd Delîla dîlana xwe geş kirin. Rojvan li wir jî dîsa strana “Bi Xeml û Rewşe Zimanê Kurdî” got, ber de dîlan kir û çepik lêdan.

Nîv demjimêrekê li wir di ber stranên xwe de govend gerandin. Qet westandin hîs nedikirin. Ji vê navrêya bilind ve li pişt xwe nêrîn û tevahî Masîro; Tirba Esed, Gêrgavê, Mamê Mus, Piling Axa, Kelehê, Kepir Tirşo û Çêla Buka di bin lingê xwe de didîtin. Çavê wan heya lûtkeya çiyayê Artos dibirî. Li pêşiya wan jî çiyayê Kato Jîrka bi hemû heybeta xwe rawestiyabû, wek dayîk himêz ji wan re vekiribû û li benda wan bû.

Piştî hinekî dîlan, henek û hest parvekirinan dîsa dest bi meşê kirin. Egîd ji bo careke din eraziyê kontrol bike û bibîne ku Qehreman û Zinar li kuderê mane, hinekê xwe li paş hişt. Ewên din li pey Berbangê xwe ji navrêyê berdan. Qederekê meşiyan ku Heval Egîd ji pişt ve gazî Berbang kir. Berbang kom li ber kaniyekê rawestand û çû gel wî. Egîd ji Berbangê re got ku ‘Zinar xwe gihandiye wî û jêre gotiye ku bi

Qehreman re ji hevdu qut bûne, Qehreman xuya nake û Zinar çiqas gazî wî kiriye jî, ji Qehreman bersivek negirtiye. Hêstir û kelûpelên hemûyan jî gel Qehreman mane.'

Ji bo ku rewş zelal û fêm bibe, Egîd ji Berbangê xwest ku bi tevî Zinar paş ve bizivirin û li Qehreman bigerin, eger nebînin û şopeke cuda bibînin jî, yekser biçin Şiyar wana agahdar bikin da ku ji aliyê xwe ve tedbîrên pêwîst bigirin. Egîd jî wê bixwe bi şervanan re çûba da ku şervan bi rewşê nehesin. Şervanên nû ku ji dûr ve Zinar bi tenê dîtibûn, eger meraqa Qehreman bikirana Egîd wê ji wan re bigota ku Şiyar gazî Qehreman kiriye, lewre Berbang û Zinar diçin ji bo eger karek hebe alîkarî bidin wan. Bi vê pilanê her yek rabûn ber bi cihê destnîşankirî ve rê ketin.

Berbang û li pey wê jî Zinar bi hemû hêza xwe ber bi paş ve beziyan. Carcar di bin guniyan de rûdinîştin û derdora xwe dişopandin. Dema Qehreman nedidîtin dîsa radibûn dest bi bazdanê dikirin. Gihîştin navrêyeke biçûk ku demek beriya wê jê derbas bibûn. Ji wir ve careke din li derdor nêrîn. Dîsa kes nedîtin. Rabûn ku xwe ji navrêyê berdin.

Di vê wextê de ji şiverêya milê rastê ve Qehreman bi haleke têra xwe westiyayî, hefsarê hêstirê di dest de ber bi navrêyê ve hildikişiya. Zinar hê saleke wî di nav gerîla de tijî nebibû, pir ciwan bû, hê di pir waran de tecrubeyeke zêde negirtibû û ji xuyanebûna Qehreman pir bandor bibû. Ji nişka ve dema Qehreman li pêşiya xwe dît bi acizî jê pirs kir ku li kuderê maye, çima bersiva bangkirinên wî nedaye.

Bi vê pirsê, bêyî daxwaza xwe bi Qehreman da hîskirin ku wan guman kirine reviyabe. Berbang ji bo ku vê hewayê biguherîne û gotina Zinar sererast bike, ket navberê û bi ken ji Qehreman re got: "Qawet be. Were hinekê li vir bêhna xwe bide, em piştre bimeşin. Tu niha pir westiyayî."

Bi vê re Zinar fêm kir ku şaştî kiriye, diviya wisa bi vê uslûbê neaxivîba. Lewre ket hewldana telafîkirina axaftinên xwe û xwest dilê Qehreman bistîne. Qehreman ku ji westandina zêde di nav xwêdanê de şil û pil bibû û qet halê wî yê bersivdanê nebû ji axaftinên Zinar hinekî li ber ketibû. Lewre, nerûnişt ku bêhna xwe vede, meşa xwe berdewam kir. Zinar bi zorî serê hêstirê jê girt da ku ew hinekê vehese.

Hinekê meşiyan heya gihiştin ser kaniyekê. Li wir Qehreman li ber kaniyê dest û rûyê xwe şûştin, avek vexwar û çend xulekekê bêhna

xwe da. Piştre bi xemgînî û fikar got: “Dema em gihiştin ser wî çemê jêrê, lingê hêstirê li kevirekê qelibî û barê wê ket. Çantê te jî Hevala Berbang, ket nav avê, şil bûye. Hûn xuya nebûn. Heval Zinar jî ji min dûr ketibû, êdî dengê min nedigihîştê. Neçar mam bi tena xwe barê hêstirê ji nû de girê bidim. Pir westiyabûm, ji bo vê jî dema gihîştim kevirê mezin hinekî rûniştim. Lewma dereng mam. Dengê bangkirina ti kesê nehatiye guhê min ku bersiv bidim.” Bi vî awayî rewş fêm bû.

Qehreman li benda berteka Berbang bû, ji ber ku çanteyê wê şil bibû, lê ew ji ber xemgîniya ku Qehreman tê de bû bi “canê te sax be, ezê ziwa kim” ev mijar bi dawî kir. Qehreman henaseke rehet kişand û dilê wî hinekê aram bû.

Ji ber ku Qehreman pir westiyabû, Berbangê Zinar bi hêstirê re şand ba Egîd da ku jêre bibêje li cihê ku lêne li benda wan birûnin û zêdetir pêşve neçin heya tev bigihîjin hev. Bixwe jî bi Qehreman re ma. Piştî hinekê vehesîn rabûn meşa xwe domandin. Di rê de Qehreman ku pir ser axaftina Zinar difikirî, bi xemgînî ji Berbang re got: “We guman kir ku ez reviyabim, ne wisa?” Berbang bersiv da: “Ev çi gotine? Ma me hevalên xwe li erdê dîtine ku derheqê wan de wisa erzan bifikirin?” Heval Qehreman dema ev bersiv bihîst zerdekeneke şîrîn ket ser lêvên wî. Îcar dilê wî tam rehet bû. Bi lez meşiyan û xwe gihandin hevalên xwe. Berbang li kêlekekê rewş ji Egîd re got. Ser van ragihandinên wê re Egîd jî qet rojeva derengmana Qehreman venekir da ku derûniya wî zêdetir bandor nebe. Bi xweşî û rehetî meşa xwe domandin heya gihiştin Kato Jîrkayê.

Şervanên nû ku nêzî heft demjimêran meşiyabûn, berovajî gumanên hevalan zêde westandinek li ser xwe hîs nekirin. Kêfxweşî û coşa ku di rê de dijiyan westandina rê ji bîra wan bir. Heya wê demê navê Rojvan, Sefkan bû.

Roja yekê Avrêla heman salê li Amanosê heft heval ketibûn kemîna dijmin û di encama pevçûneke dijwar de şehîd ketibûn. Yek ji wan hevalan Hevalê Rojvan Tolhildan (Zekî Durdu- ji Meletî) bû. Berbang ew nas dikir, pir jê hez dikir û ji şehîdbûna wan pir bandor bibû. Lewre ji bo bîranîna Şehîd Rojvan, ji Sefqan re pêşniyar kir ku navê xwe biguherîne û bike Rojvan. Piştre hinekê qala kesayeta wî jêre kir. Sefqan navê Rojvan ku tê wateya “parêzvanê rojê” pir eciband û ev pêşniyar pejirand; Sefqan êdî bû Rojvan.

*Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!*

Li Kato Jîrkayê du rojan bêhna xwe vekirin. Di vê navberê de rêveberiya herêma Katoyê vesaziya şervanên nû destnîşan kir. Li gorî vesaziyê Berçem, Devrîm û Şevger wê li wir mabana û perwerdeya seretayî bidîtana; Rojvan, Bahoz û Şoreşvan jî ji bo dîtina perwerdeya seretayî wê derbasî Bestayê bibûna. Piştre rênasek diyar kirin ji bo ku heya Hêzilê wan bibe. Bi vê armancê êvarê ji hevalên Katoyê û sê hevalên xwe yên ku bi hev re tevlê bibûn xatir xwestin û bi tevî Berbang û rênas ber bi Bestayê ve ketin rê.

Ji bo ku biçin Bestaya Navîn diviya ser alana Hêzilê re derbas bibin. Ji Katoyê ve ber bi Hêzilê xwe berdan. Roja din sehera zû demjimêr 4:00´an beriya ku dinya vebibe gihiştin ba taxima Hêzilê ku Aysel û Şerda jî tê de bûn. Taxim tev şiyar bûn û ji bo xêrhatina wan nîvdemjimêrê beriya rojbaşa rojane, rojbaş kişandin. Piştre ji wan re cihê vehesînê amade kirin. Şervan çûn heya nîvro ku tav baş germ bû razan. Dema rabûn hevalên taximê pir bi meraq û elaqedariyeke mezin li gel wan rûniştin. Aysel û tîma wê jî çûn pêşwaziyeke pir germ li wan kirin û bi wan re dest bi gufûgoyan kirin. Piştî nîvro rênasê ku ew anîbûn vegeriya Katoyê. Berbang û her sê şervanên nû jî ber bi Bestaya Navîn ve bi rê ketin. Ji vê taximê Heqî Efrîn û Fîkret Wan ku mirovê Ayselê bû, weke rênas hatin diyarkirin ji bo komê bigihînin Bestaya Navîn.

Ji Masîroyê ve heya wê derê şervanên nû ji rêyên ewle ve hatin derbaskirin û li Katoyê jî hejmareke zêde heval dîtin. Serbest tevgeriyan û qelebalix kirin. Kesî ji wan re hişyariyek neda. Lê vê carê wê ji rêyên ne ewle ku her kêlî egera rûbirûbûna bi dijmin re hebû, derbas bibûna. Ji ber vê pêwîst bû zêde neaxivin, dema axivîn bi dengê nizim ku tenê beramberî wan bibihîse biaxivin û bêdestûr neçin derekê. Hem jî heya bigihîjin cihê xwe wê her şeş kes bûna.

Ew çend roj bû dimeşiyan. Bi xwe nedihesiyabin jî hê westandin li ser bedena wan hebû. Di meşê de ji ber ku xwêdan didan tava hênik a êvarê jî li wan pir dijwar dihat û ew dişewitandin û êş dida ser û çavên wan. Ji ber ku hê fêrî meşê nebibûn, her tiştê bandor li bedena wan dikir.

Rênas rê zêde ewle nebe jî, ji ber nûbûna wan zû zû navber didan û çend demjimêran carekê xwarinê didan wan. Şervan nû nû bi westandina xwe dihesiyan. Di westandina zêde de nedikarîn pir xwarinê bixwin. Jixwe fêr jî nebibûn li ser erda tazî û hişk razên. Ji ber

vê hinekê bêxew jî diman. A rast ne tav û germaya dijwar, ne jî xwarin û xewa kêm bandoreke zêde li wan nedikir. Ya bandor dikir bêdengî bû. Di qelebalixê de westandin zû ji ser mirov diçe. Lê di bêdengiyê de westandin her di bîra mirov de dimîne û bandor li taqeta beden dike. Di encamê de roja din beriya nîvro gihiştin Xirbikê Bestê.

Xirbikê Bestê navê gundeke li Bestaya Navîne ku li derdora çemê Xirbikê hatiye avakirin. Di dema xwe de gundeke pir xweş û şîn bûye. Eraziya wê tevî ku çend caran ji aliyê leşkerên Tirk ve hatiye şewitandin jî, bi daristanên tijî û geş xemiliye. Bi gotina Şehîd Qehreman Erdal “*Daristanên Bestayê bi înad li hember dijmin tim ji nû de, ji nû de şîn dibin.*” Berû, mazî û kizwan xwezayî şîn dibin. Şêniyên gund bixwe jî darên fêkî çandine.

Dema xebatên gerîla di qada Botanê de pêş dikeve û bandor li gelê welatparêz yê wir dike, dewleta Tirk li gelek gundên Botanê paygehên xwe çêdike da ku hem tevgera gerîlayan asteng bike, alanê li wan teng bike û alanên derdora xwe bixe bin çavdêriyê, hem jî gelê wir ji gerîla qut bike. Gelê gundê Xirbikê pir welatparêz bûne û di vê têkoşîna azadiyê de pir rol lîstine. Dijmin pir hewl daye sîxûran ji nav wan derxe da ku çûnhatinên gerîla û alîkariya gel bi wan re îxbar bikin. Lê ev gelê birûmet îxanet nepejirandiye. Dijmin dema fêm dike ku nikare heta bi zor û êşkenceyan jî ji devê ciwan û mezinan agahî bi dest bixe, zarokan kom dike û dixwaze bi şekirokan wan bixapîne da ku qet nebe ji devê wan gotinekê bikşîne. Lê zarokên Xirbikê jî ku ji mezinên xwe çanda welatparêziyê fêr bûne heman bersivên mezinên xwe didin leşkeran. Leşker îcar hewl didin bi êşkenceyan zarokan bidin axaftin.



***Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!***

Bi vê armancê bi keviran pêşiya herikîna ava çemê Xirbikê digirin û weke hewzekê lê dikin ji bo av bilind bibe. Serê zarokan dixin nav hewzê û heya bêhna wan biçike serê wan di nav avê de dihêlin. Piştre derdixin û dibêjin “eger ji me re nebêjin gerîla kengê tên vir û ji gund kê/î alîkarî dide wan, emê we di avê de bifetisînin.” Çiqas hewl didin hemû ev hewlên wan ji aliyê zarokên biçûk ên Xirbikê ve bi berxwedan û “ez nizanim, min qet gerîla nedîtine” vala tê derxistin.

Ji salên 1990'î şûnde ARGK dikeve pêvajoya stratejîk a ji holêrakirina  paygeh û navendên dijmin ên li ser axa Kurdistanê. Di çarçoveya vê heyama stratejîk de li tevahî Bakurê Kurdistanê, gerîla davêjin ser tabur û paygehên dijmin û wana ji binî de radikin. Li Botanê jî bi vî awayî. Li gorî vê yekê paygeha Xirbikê jî dibe hedefa hevalan û ji holê tê rakirin. Dewleta ku li beramber çalakiyên bibandor ên ARGK bêçare dimîne, salên 1994-1995'an fermana qirkirina gundên Kurdistanê û cerdewankirina şêniyên wan derdixe. Li gorî wê fermanê, eger gundiyên li ber xwe bidin hebin wê bên kuştin, ewên ji kuştinê bifilitin jî bên koçberkirin.

Gundê Xirbikê û Tuşîmya ku hema li jêrî Xirbikê Bestê ye jî, mîna hezaran gundê din ne tenê ji mirovan, ji hemû cure zindiyan tên valakirin, şewitandin û rûxandin. Mirovên wir ji ber ku nabin çete hinek tên kuştin, hinek tên koçberkirin. Ajal tev tên kuştin. Dilê dijmin bi vana rehet nabe; agir berdide gund û hemû daristan, bax, baxçe û zeviyan jî dişewitîne. Bi vî awayî şopa zindiyan li ser rûyê erda Xirbikê û Tuşîmyayê nahêle.

Dewleta faşist ya Tirk navê vê pêkanîna xwe ya qirêj, hovane û faşîzane dike “paqijî.” Yanî kuştina mirov, ajal û darên Kurd dibe paqijî û weke peyva “operasyona paqijkirina başûrê rojhilat” (güneydoğu temizliği operasyonu) derbasî nav rûpelên dîroka reş a vê *komara modern* dibe!

Dîwarên wan malan hê bi bilindahiya nêzî metrekê li ser erde ne. Dîwar ruxiyane û kevirên wan li derdor rijiyane. Mirov dema li wan deran digere û van şopan dibîne dibê qey her kevir û dareke şewitî dixwaze tiştekê bibêje.

Koma hevalan derdora demjimêr 9:00’ê seherê gihiştin dibistana xirabûyî ya vî gundî. Hemû malên xirabe li ber çavên wan kul û derdên xwe ji wan re vedigotin. Şervanên nû ku ji Masîroyê ve heya wir dem dem ji gundên wisa re derbas bibûn, bi dîtina dîmenê vî gundî yekser

serpêhatiya wê fêm kirin. Li Gêrgavê, Tirba Esed, Sîxur Paşa û Gundê Tahirê Kero dîmenên ku dîtibûn bi dîmena Xirbikê re xelekên heman çîrokê bûn ji bo wan. Mîna fîlmekê ku her carê xelekeke wê temaşe bikin.

Gerîlayên nû vê carê westandina xwe zêdetir hîs kirin. Rojvan di warê fîzîkî de ji Bahoz û Şoreşvan naziktir bû û ji wan zêdetir westiya. Jixwe ew hemû hê nû bûn û bedena wan venebibû, ji ber ku cara yekê bû dimeşiyan. Rojvan di dilê xwe de wisa guman kir ku êdî wê her tim bi vê hejmara kêm bimînin û tim di vê germa havînê de bimeşin. Hê xweşikbûn û rengîniya jiyana gerîlatî nedîtibû, lewre digot qey ji vê pêve, wê weke van çend rojan her tim di nav ger û meşê de bin. A girîng jî digot qey êdî wê qet nekaribin qelebalixê bikin û serbest dengê xwe rakin.

Piştî xwarinê, Berbang û rênasan bi dorê zêrevanî kirin, ên nû jî di hênikahiya siya dîwarên dibistanê de xwe dirêj kirin û yekser ji xew re çûn. Lê Rojvan ji ber ku fikrên wî mijul bûn, kir nekir zêde bi xew ve neçû, zêde nekarî birazê. Dema ji xewê şiyar bûn û rabûn ser xwe Rojvan li kêlekekê, bi awayeke ku kesek nebihîse ji Bahoz re got: “Ez bawerim jiyana gerîlatî wê li min zor bê. Ezê li bajêr karibim hê rehettir û serkeftîtir xebatên partiyê bimeşînim.” Piştî vê gotinê bêyî ku ji kesî re bibêje, ji dibistanê derket û çû xwe di nav darên derdora dibistanê de veşart da ku eger derfet bibîne û heval pê nehesin karibe bireve.

Bîst xulekek derbas bibû ku pêjna wî nedihat. Berbangî pirsa wî kir. Bahoz nû bêbiryariya Rojvan û gotina ku jêre gotibû ji Berbang re got. Ji ber ku nîvroyên Bestayê pir germ û dijwar bûn, mar li Bestayê pir bûn û jehra wan di germê de pir har dibû, Heqî û Berbang ku gerîlayên kevin bûn û xwedî ezmûn bûn tirsiyan ku mar pêve bide û tiştek bê serê wî. Li derdor çend caran bangî wî kirin, lê bersivek negirtin. Neçar man Fîkret li wir li ba şervanan bihêlin û biçin li Rojvan bigerin. Hingî li derdor beziyan û gazî kirin ku xwêdan ji ser û çavên wan re avêt. Ji cihên hinekê bilind ve li derdor temaşe kirin. Dîsa jî Rojvan nedîtin.

Rojvan hema dused metrekê jora dibistanê, di nav daristanê de rûniştibû, xwe veşartibû û dema evqas qîrkirin û westandina hevalan dît wijdana wî ranekir, bandor bû û bixwe rabû ji nav daran derket û vegeriya dibistanê, gel hevalên xwe. Heqî û Berbang derbarî

nexweşiyên ku tav di mirov de çêdike, marên har ên Bestayê û hirç û berazên wê derê de şervan hişyar kirin û gotin ku eger bixwazin biçin derekê pêwîste ji wan re bibêjin, ji bo ku ji hevdu haydar bin. Piştre hinekê hêz û wêrekî dan wan û ji wan re gotin ku jiyana gerîla hemû di meşê de nîne, tenê çend demjimêrên wan mane ji bo ku bigihîjin gel hevalên wir. Lê belê pêwîst bû heya êvarê li wir bimana, heya rênasên taxima Bestaya Navîn bên wan bibin.

Demek şunde Gezgor û Rodî ku endamên alana Bestaya Navîn bûn, bi barên giran ên teqemeniyê ji Hêzilê vedigeriyan cihê xwe gihiştin Xirbikê. Wan, cihê taxima xwe dizanîn. Êdî hewce nebû ew kom li benda hatina rênasan bimîne. Bi hev re hinekê rûniştin heya wan jî bêhna xwe stendin. Piştre rabûn bi hev re çûn ba taximê. Li wir piştî pêşwazî û xêrhatina germ a hevalan, kincên gerîla ku li ba taximê zêde hebûn li gerîlayên nû kirin. Roja din êvarê ji wê taximê û du rênasên ku wan ji Hêzilê ve anîbûn wir, xatir xwestin û ber bi noqteya şervanên nû ve bi rê ketin.

Li wir şanzdeh şervanan perwerdeya seretayî didîtin. Piraniya wan ji Wanê bûn û hevalên van sê şervanên nû bûn. Jixwe kurapê Bahoz, Çekdar jî li wir bû. Hemû şervan ji dîtina hevdu pir pir kêfxweş bûn. Herî zêde jî Rojvan. Tevî ku bixwe xwedî kesayeteke aram û bêdeng bû jî, ji qelebalix û pirhejmariyê pir hez dikir. Careke din dîtina ciheke qelebalix, taybet jî dîtina hevalên xwe yên malê pir ew kêfxweş dikir. Ew hevalên wan ên malê û yên nav xebatên ciwanan ku demek bû xûya nedikirin, hinek ji wan li Kato Jîrkayê dîtibûn, ewên din jî niha li Bestayê didîtin. Bi vî awayî pê hesiyan ku ew hemû tevlî partiyê bûne.

Rojvan ku di rê de ji ber westandina zêde çilmisîbû û zehmetiyên rê heta bandor li coş û biryara wî jî kiribû, li wir mîna gulekê ku piştî demekê hatibe avdan geş bû û ji nû de bişkivî. Pir kêfxweş bû ku li Xirbikê dema xwestibû bireve, hevalên wî zû pê hesiyabûn û ew dîtibûn. Pir poşman bibû û şerm dikir ji vê bûyerê. Dema dît hevalên ku bûyerê dizanin li gorî vê nêzî wî nabin, ev derûnî bi lez derbas kir.

Di perwerdeya şervanên nû de Rojvanî pêşketinên cîdî û lezgîn nîşan da. Wekî ku destpêkê jiyana gerîlatî li ber çavên xwe pir zor nîşan dabû nebû, berovajî, di fêrbûna şêwazê jiyana şoreşgerî de zêde zorî û zehmetî jiyan nekir, heta pir zû bi vê jiyanê re bû yek. Bi awayeke ku eger rêxistinê bixwesta ji bo xebatan wî bişîne bajêr jî, îcar Rojvan

nedixwest biçe. Pêşketinên wî yên zêde û lezgîn bala hevalan û fermandarên wî kişand û ew pir kêfxweş kirin.

Roja 30’ê puşperê ku salvegera çalakiya fedayî ya Heval Zîlane, şervanên nû jî mîna qadên din ên gerîla ji bo bîranîna wê rojê merasimek li dar xistin. Di merasim û şahiyê de stranek ji Rojvan jî hat xwestin. Rojvan rabû dîsa strana xwe ya “şîrîn û xweşe zimanê Kurdî” got. Jixwe wî her roj ev stran ji hevalan re digot. Lewre hevalên din ku ji berê de dizanîn Rojvan wê çi stranekê bibêje, beriya ku wî rakin ser pêyan xwe amade kirin ku bi çepikan pêre bibêjin.

Rojvan di şahiya ku ji bo pîrozbahiya qedandina dewreya wan hat çêkirin de jî, careke din heman strana xwe got. Piştre bi tevî Şoreşvan, Çekdar û Bahoz dest bi folklora Wanê û Serhedê kirin. Folklora wan bîst xulekekê kişand. Her çar hevalan li gorî rîtma folklorê xwe pir narîn dilivandin, lê belê xwelivandina Rojvan ji ya hemûyan balkêştir û narîntir bû û bala hemû hevalan kişande ser xwe. Çavên hemûyan li hember folklora wî vebibû û mat mabûn ku xortek tevî ku bedena wî hişke jî çawa di folklorê de xwe ewqas nerm û nazik dilivîne. Arjîn ku fermandara dewreya wan bû, matmayî ji hevalên jin re got: “Hevalno mêze kin, ew sedî sed ber destên dayîk û xwuşkên xwe mezin bûye!”

Piştî ku dewreya wan bi serkeftî qediya Rojvan ji ber ku pir ji Bestayê hez dikir û bi xwezaya wir re hatibû girêdan, ji rêveberiya xwe re pêşniyar kir ku li Bestayê bê hiştin. Pêşniyara wî hat pejirandin. Bi vî awayî derbasî taxima wir, nav hevalên kevin hat kirin.

Di nav xebatên taximê de Rojvan hê zêdetir vebû, tecrube girt, li hember pratîkên zor xurt bû û pêş ket. Îcar bi halê xwe yê destpêkê ku pratîk di çavên xwe de wek tişteke ji derveyî taqet û hêza xwe lêkiribû dikeniya.

Piştî dewreya wan, dewreyên din jî li pey hev ji bo perwerdeya şervanên nû vebûn. Rojvan bi tevî Rojbîn, Gezgor, Havîn, Reşo, Hemze, Silav û hevalên xwe yên din serdana wan dikir, ji wan re erzaq û pêdiviyên wan dibir, bi wan re guftûgo dimeşand û tevlî şahiyên wan dibû. Dema şervanên ji xwe nûtir didît, hîsê kevinbûnê jiyan dikir, şa dibû û ji dilê wî dihat ku bi wan re bibe alîkar. Xuya bû ku sebra wî pir bi wan dihat...

*****




**Nasnav: Simko Amara**
**Nav û Paşnav: Dervîş Çakmak**
**Dîrok û Cihê Jidayîkbûnê: 1997/Edene**
**Navê Dayikê: Rahîle**
**Navê Bav: Çetîn**
**Dîrok û Cihê Tevlîbûnê: 2011/Botan**
**Dîrok û Cihê Şehadetê: 13-15’ê Sibata 2012’an li Botan-Besta**

**Heval Simko Amara**

Simko bi esil ji Semsurê bû, lê salên dirêj beriya ku bê dinyayê malbat diçin Dersîmê. Wê demê li Dersîmê jî berdewamiya fermana tevkujî û koçberkirinê ya sala 1938'an (katliam ve tehcir planı) bi hemû dijwariya xwe berdewam bû. Bi vî awayî malbata wan dîsa dikevin ber êrîşan. Êrîş û zextên ku li Semsurê ew neçarî koçberiyê kiribûn vê carê jî li Dersîmê wan bi heman rewşê re rûbirû dihêle. Ji ber vê, ji neçarî wir jî terk dikin, koçberî metropolên Tirkan dibin û li Edenê bicîh dibin. Simko jî li Edenê, navçeya Seyhanê ji dayîk dibe. Sedema koçberiya malbatê Kurdbûn û girêdayîbûna wan ya bi ax û warê xwe ve, yanî welatparêziya wan e. Ew di dema Osmaniyan de jî, di dema Komarê de jî li dijî dagirkerî, talan û qirkirinên sultan û desthilatdaran xwedî helwestên radîkal bûne û di eniya gelê xwe de cih girtine. Ev helwesta wan di dema Komarê de li hember zordarî û dagîrkeriyan hê xurttir dibe.

Ev serhildêriya malbatê ji bo Simko jî dibe mîrateyeke xurt û ji biçûkahiyê ve waneya têkoşînê fêrî wî dike. Simko di temenê heft heşt salî de fêrî keviravêtina polîsan dibe û di kolanên Seyhanê de bi hevalên xwe yên zarok re dikeve pey panzer û polîsan û kevir davêje

wan. Lîstokên wî yên zaroktî bi kevir dest pê nekiriye, lê pir zû wateya keviravêtinê hîn dibe, pêre aşîna dibe û jêre dibe dost û heval. Kevir li destên wî mezintir be jî, hêza milên wî têrî rakirina pir keviran neke jî, ew bi biryardariyeke xurt radihêje wan û davêje hedefa xwe. Ev kar û çalakî jêre weke lîstokê tê û zevq dide wî. Ji ber aktîf û enerjîkbûn, pilan û taktîkên lêxistina dijmin û li hedefketina kevirên wî, ew hêdî hêdî di nav zarokan de derdikeve pêş û dibiriqe. Di yanzdeh saliyê de çeka xwe mezintir dike û di kêleka keviran de molotof kokteylan jî radike davêje.

Di nav koma wan a zarokên çalakvan de yê herî biçûk Simko ye. Di çêkirin û bikaranîna molotofan de jî bi lez serwer dibe. Êdî weke fermandarê zarokan lê tê. Zarok ji wî dipirsin li kuderê bicih bibin, ji kuderê ve kevir bavêjin, çawa êrîş bikin û çawa birevin. Gerîlatiya Simko di van temenan de dest pê dike. Li gorî vegotineke wî ku piştî tevlî gerîla dibe ji rêhevalên xwe re qal dike, koma wan jî mîna polîsên sîvîl li goşe û kenarên kolanan bicih dibin û dema polîsên sîvîl û fermî derbas dibin keviran davêjin wan û direvin.

Ku hinekî mezintir dibe jî, dema ciwanên din molotofên xwe tenê davêjin panzeran Simko molotofên xwe davêje nav koma polîsan jî. Ji ber ku Simko di hemû taxên Kurdan de li her derê di hemû çalakiyan de heye, êdî rû û sîmayê wî ji polîsan re eşkere dibe û tê naskirin. Polîs dema ewqas çalakbûna wî û hebûna wî ya di hemû çalakiyan de dibînin, êdî li zarokbûna wî nanêrin û dikevin pey wî lê ew her carê bi taktîkeke cuda xwe ji destê wan difilitîne.

Hin caran jî dikeve ber têzava panzêran. Ji gazê bandor dibe, çavên wî tijî hêsir dibin û dişewitin. Îcar bi hêsir, îsk û bi çavên şewitî û sorbûyî xwe davêje himêza dayîka xwe. Her ku Simko mezintir dibe, giriyên wî jî kêmtir dibin, ji ber ku qayimbûna wî cihê rondik û îskên wî dadigire.

Simko ji ber ku di çalakiyan de jêhatî û pêşenge û di jiyan û xebatên xwe de bicoş, enerjîk û hîperaktîfe, di temenê duwanzdeh salî de dikeve nav xebatên ciwanên Apoyî yên Seyhanê û di sêzdeh saliyê de li ser komeke ciwanan erkdar dibe. Simko bixwe biçûkê koma xwe ye. Lê belê ti kes li temenê wî nanêre; her kes li karên ku dike mêze dike û li pey wî dimeşe, ji ber ku kar û çalakiyên Simko dike û dide kirin ji temen û bejna wî mezintirin. Lewre bala her kesê, hemû ciwan û



rêveberan diçe ser wî. Weke fermandareke çalakiyan lê tê meyzandin û her kes dixwaze wî biparêze.

Simko tenê di warê pratîkî de na, di zîhin û zekayê de jî pir li pêş û vekiriye. Ev taybetmendiyên wî pir dikevin çavan. Lewre dema ku zarokên hemtemenê wî fêrî bikaranîna kevir û molotofan dibin, Simko ku van qonaxan zûde derbas kiriye êdî perwerdeyên îdeolojîk dibîne.

Ji şeş heft saliyê ve fêrî jiyannameya Rêber Apo û dîroka PKK´ê dibe, ji duwanzdeh saliyê ve hêdî hêdî çîroka şoreşên Viyetnam, Hîndistan, Kuba, Başûrê Efrîqa û Sovyetê heya astekê hîn dibe. Di van şoreşan de çi bûyerên girîng û bibandor rû dane, kengê ser ketine, serketin û binketinên wan tevan hîn dibe. Ew, van tiştan bi zimanê zarokan, mîna çîrokan guhdar bike û bibihîse jî, dizane ku ji çîrokan wêdetir, rastiyên wisa ne ku çarenûsa hemû gelên cîhanê guhertine, hemû dinyayê xistine bin bandora xwe û rêgeheke nû dane seyra dîrokê. Dibê qey Simko dizanîbû ku ji bo zarokên Kurd ev çarenûseke ku çîrokên wan jî mîna jiyana wan divê siyasî be. Simko bi eşq û evîn li wan çîrokan guhdar dike û di mejiyê xwe de dikole, wekî ku hîs kiribe, pêwîste bi lez her tiştî fêr bibe û dereng nemîne! Dibê qey dizanîbû ku çerxa demê ji panzdeh sal zêdetir derfeta jiyanê nade wî.

Bi taybetî şoreşa Sovyetê bi ziraviyên wê ve jiberdike. Rastî û şaştiyên di teoriya Marks û Engels de, sedemên veqetîna Bolşevîk û Menşevîkan ji hevdû, rastî û şaştiyên di qenaet û pêkanînên Lenîn û Stalîn de, serkeftin û xetayên girîng ên di temenê şoreşê de, sedemên hilweşîna Reel Sosyalîzmê û mijarên sereke yên ku Rêber Apo Reel Sosyalîzmê tê de dipejirîne yan jî rexne dike tev wekî ku li ser mejiyê wî hatibe nivîsandin fêr dibe. Ev zekaya wî ya bêsînor çawa ku li wê derê ji bala rêveberên wî winda nabe, di nav gerîla de jî bala her kesê û rêveberên wî dikşîne û dibe sedem ku her kes heyran û matmayî li wî binêre.

Jiyana zaroktiya Simko bi vî awayî di nav şer û pevçûn, siyaset û îdeolojiyê de derbas dibe. Destpêkê bi pratîk û pêkanînê gav davêje

nav jiyana siyasî de, piştî demeke kurt dest bi teoriya wê jî dike û şûna zarokeke asayî yê di pêsîra dayîka xwe de, dibe zarokeke siyasî di meydana şer û pevçûnên nav kolanan de.

Ya rast zarokên Kurd ên welatparêz tev di zaroktiyê de fêrî siyaset û şer dibin, zaroktiya xwe di dinyaya zaroktiyê de jiyan nakin, li şûna amûrên lîstokê kevir û molotofan radikin û ev çek dibin lîstoka zaroktiya wan. Lê belê tişteke ku Simko ji tevahî zarokên din ên Kurd cuda dike heye û ev li ber bala her kesî ye; ew jî zekaya wî ya bêsînor e di fêrbûn û pêkanînê de.

Ev lêgerînên wî yên xurt û biheybet di temenê panzdeh salî de wî dikşînin lûtkeya çiyayan. Dibê qey bajêr ji çalakiyên Simko westiyane û nikarin ji vê zêdetir wî dil û rihê wî yê mezin rakin. Generalê biçûk yê kolanên Edenê polîsên wir har kiriye; polîs dixwazin hejmarek ciwanên aktîf bigirin û bavêjin girtîgehê. Yek ji wan stêrkên tim biriqiya nav ciwanên ku navê wan di pêş de tê, Simko ye. Simko ku ji berê de eşkere bûye û çend caran kariye xwe ji destê polîsan bifilitîne, vê carê dibîne ku dijmin zarokan ji berê cidîtir digire û bêyî ku li temenê wan binêre gelek zarokan davêje girtîgehan û êşkence dike. Lewre ji bo nekeve dest havîna 2011'an bi tevî hejmarek hevalên wî ku bi temen çend salan jê mezintir bûn tevlî refên gerîla dibe.

Pêvajoya ku ew tevlê bû li Qendîlê nêzî mehekê bû ku şerê giran û dijwar ê di navbera Tevgera Azadiyê û artêşa dagirker ya Îranê de qediyabû û di dawiya wî şerî de Heval Simko Serhildan ku fermandarê hêzên gerîla bû şehîd ketibû. Şehîdbûna Heval Simko di nav tevahî tevgera Apoyî de deng vedabû û bandor kiribû. Wê demê navê Heval Simko ket ser zimanê hemû hevalên ku wî nas dikirin û bû rojeveke taybet di nav wan de. Li Botanê jî, rêveberiya şervanên nû ku Şehîd Simko nas dikirin, an jî ser kesayeta wî gelek tişt bihîstibûn pir qala kesayet û bîranînên wî ji şervanan re dikirin. Simko di wan vegotinan de ji kesayeta Şehîd Simko pir bandor bû û navê xwe yê nav gerîla kir Simko.

Di nav perwerdeya şervanên nû de metîn û arambûn, dîsîplîn û zekaya teorîk û pratîkî ya wî bala rêveberên wî dikişand. Bi lez di warê jiyanî û perwerdeyên bîrdozî, siyasî û xweparastinê de pêş ket. Ji ber ku nîvê temenê xwe ya biçûk bi avêtina kevir û molotofan derbas kiribû, di perwerdeya xweparastinê de jî di nav endamên dewreyê de li pêş hemûyan bû. Fîşekên wî heta libek jî xesar nediçû, tev li hedefê

diketin. Kûderê nîşan bigirta fîşeka wî rasterast li wir diket. Ser hemû amûr û rêbazên xweparastinê perwerde dît û pir bi lez serwer bû. Ji ber van serkeftinên wî rêveberiya şervanên nû dûrbîneke biçûk weke xelat diyarî wî kirin.

Di perwerdeyên teorîk û bîrdozî de pir baldar li perwerdeyan guhdar dikir û çi ji devê komîsyonan derbiketa yekser digirt. Dema komîsyonan agahiyeke şaş dabana, ji nav hemû şervanan tenê Simko pir ji xwe bibawer radibû ew şaştî sererast dikir û dema komîsyon di mijarekê de agahiyên wê/î kêm bûna ew radibû agahiyên zêdetir dida.

Carekê Gizîng di waneyekê de mînakek ji nizîkatiyên Reel Sosyalîzmê ji bo hêz û aboriyê da. Simko destûr xwest û rabû, çend gotinên Marks û Lenîn li ser zêde kirin û kêmbûnên Gizîng temam kir. Herwiha derbarê şaştiyên di mentiq û felsefeya hêz û aboriyê ya di Sovyetan de hin agahiyên ku Gizîngî qet nedizanîn da. Gizîng û Yilmaz Viyan ku komîsyon bûn li hember wî mat man û heya dawiyê lê guhdar kirin. Piştre Gizîng qala rexneya Rêber Apo li ser hin pratîkên Reel Sosyalîzmê kir. Simko dîsa destûr xwest û rabû ser sedema wan rexneyên Rêber Apo agahiyên kûrtir da û şîrove pêş xistin.

Yilmaz bi heyraniyeke mezin jê pirsî: “Tu van tiştan ji kû dizanî?” Simko bi dilnizmî bersiv da: “Min ser wan pir lêkolîn kiriye û perwerde dîtiye.” Wê demê devê Yilmaz û Gizîng vekirî ma û bi heyraniyeke hê mezintir lê nêrîn, heyrana wî man ku di vî temenê biçûk de çawa ewqas lêkolîn kiriye, ewqas xwe perwerde kiriye û di perwerdeyên ku dîtiye de ewqas baldar bûye û tişt fêr bûne. Êdî di perwerdeyan de gelek caran komîsyonan dema agehiyek didan ango şîroveyek dikirin nêrînên wî meraq dikirin.

Di dewreya şervanên nû de rêveber û şervan tevan pir jê hez dikirin, çavên wan her bi ser wî ve bûn û weke xezîneyeke ku divê her dem bê parastin lê meyze dikirin. Simko ku ji aliyê her kesî ve pir dihat hezkirin û li ser destan dihat girtin di nav dewreyê de yê herî ciwan bû û di vî temenê biçûk de jî xwedî kesayeteke ji temenê xwe mezintir û pijiyayîtir bû. Ji bo pêşketinan pir vekirî bû û dibê qey ji bo pêşketinê bi dem û zeman re ketibû pêşbaziyê. Dibê qey dizanî dema wî zêde nîne û divê bi lez bijî, bi lez fêr bibe û bi lez pêk bîne...

Ev coş û kelecana mezinbûna Simko ya di warê hest û fikir de û pêşbirka wî ya bi zeman re dişibiya jiyana perperikan. Cureyeke

perperikan heye ku şev û tarîtiyê nas nake, ji ber ku temenê wê têrî gihiştina şevê nake. Seherê ji hêkê derdikeve û êvarê dema roj diçe ava temenê wan diqede. Lewre ew perperik di nav temenê xwe yê yek rojî de kêliyekê li cihê xwe rûnane û venahese. Bi demê re di pêşbirkê de ye. Pêwîste bi lez fêrî firîn û rûnîştina ser kulîlkan bibe, bi lez tecrube bigire, bi lez tama jiyanê hîs bike, bi lez bijî û bi lez bimire. Temen û jiyana Simko ev cureyê perperikan dianî bîra mirov.

Rêveberiya wan hîngî bi wî hêvîdar bûn û pêşketinên mezin tê de didîtin ku jêre digotin: “Heval Elî Çîçek jî di van temenan de dest bi şoreşgertiyê kir û bû sembol û Stêrka Sor a hemû ciwanên Kurdistanê. Tu jî dikarî bibî Elî Çîçekek nû.” Simko hê ji wê demê ve di çavê rêhevalên xwe de Elî Çîçekek nû bû ku di qonaxa pêşketin û stêrkbûnê de bû ji bo ciwanên Kurdistanê.

Ji şehadeta Uğur Kaymaz û çalakiya fedayî ya Lawikê Bêzar (Muslîm Dogan) pir bandor bibû û dixwest şopa wan di kesayeta xwe de bike kevneşopiyek ji bo hemû ciwanên Kurd û di rêya Rêheval Simko Serhildan de xwe bigihîne lûtkeyê. Pêvajoya ku perwerdeya şervantiya nû didît, li navçeya Kopê ya Muşê Evîn Munzûr (Evrîm Demîr) jî çalakiyeke fedayî kir û şehîd ket. Simko hê zêdetir bandor bû û bi rê û rêça wan ve zêdetir hat girêdan. Pir hêsan û rehet di navbera wan û Rêber Apo de têkiliyeke ku negengaze ji hevdu bê qutkirin danî. Simko ev hemû lêhûrbûnên xwe rojane di jiyanê de bi derdora xwe re parve dikirin. Bi van lêhûrbûnan tevlî jiyanê dibû.

Di dewreya wan de ji bilî werzîşa seheran, şahiyên mîna lîstok, dîlan û strangotinê jî zû zû dihatin lidarxistin. Simko kêm caran stran digot û dîlan dikir, lê di lîstokan de ji her kesê atîktir, hereketîtir û bi coştir bû. Hevalên din ew dişibandin sîvoriyan. Sivorî ajaleke pir biçûk û ewqas jî bi liv û tevgere. Geh li ser çiqla herî jêr a darê ye, geh bi berû yan jî hejîra nav destên xwe ve li ser çiqla herî jore. Mirov nizane ji kûderê ve xwe ji wî serî ve digihîne wî serê din. Simko jî wisa bû. Taybet di lîstokên Birê ku lîstokeke gerîlayî ye, kevir û hedef, mendîl û xweveşartinê de mîna sîvoriyan bû. Çiqas giran, aram û bêdeng bû, ewqas jî bi coş û xuroş û bi lev û tevger bû.

Ji ber ku temenê wî jêrî hejdeh saliyê bû, fermandariya Botanê dixwest wî bişînin Herêmên Parastina Medyayê ji bo xebatên ciwanan. Lê belê payîza dereng bû, berf ketibû, li ser sînoran rê bi tevahî hatibûn girtin û hemû keşfên rê û hewldanên wan ên ji bo şandina

Simko vala derketin. Lewre wê salê nekarîn wî derbasî Başûr bikin. Ji neçarî li wir hiştin da ku biharê bi helandina berfê û vebûna rê re wî bişînin. Lewre Hemze ku di nava dewreyê de çend caran serdana şervanan kiribû ew girt ba xwe ji bo ku biparêze. Di herêma Bestayê de diçû ku derê Simko jî bi xwe re dibir û ji xwe qut nedikir. Heya dema ketin nav kampa zivistanê jî, Simko her li ba Heval Hemze ma û pêre tevgeriya.

*****

**Kombûna Taxima Şehrîbanê**

Bihara sala 2011'an endamên taxima Şehrîbanê li alana xwe kom bûn. Felat ji Kato Xelîla derbasî wir bû û li ser taximê hat erkdarkirin. Taxim bi giştî ji sê tîman pêk dihat. Rewşen Sêrt, Zîlan, Evîndar û Hêvî tîma YJA-STAR´ê pêk dianîn. Piştî demekê ji ber ku di tîma Ayselê de ku li Hêzilê bû valatî çêbû, Evîndar derbasî wir bû. Şûna wê Havîn ji Besta Navîn hat Şehrîbanê. Rewşen ser tîmê bû. Serhed, Demhat, Azad, Mehsum, Rênas Ûrmiye, Cudî Sêrt, Dilsoz Wan û Çekdar du tîmên din pêk dianîn. Serhed û Rênas ser tîmên hevalên xort bûn. Bi giştî rêveberiya vê taximê ji Felat, Rewşen, Serhed û Rênas pêk dihat.

Taximê ji biharê heya derengiya payîzê ku dawî li pratîka salê hat di hemû alana Şehrîbanê de bi hev re tevgeriyan û hemû xebatên xwe hevbeş meşandin. Hemû bîranîn, kêfxweşî û xemgînî bi hev re jiyan, her tiştên xwe bi hev re par kirin û bi hev re ji hemû pratîk û bûyeran re himêz vekirin. Şer û çalakiyên xwe bi hev re kirin, bi hev re pilansazî danîn û bi hev re pilan û bernameyên xwe pêk anîn. Bi hev re keşf kirin û bi hev re ser keşfên xwe de çûn. Bi hev re xwêdan rijandin, bi hev re westiyan û bi hev re vehesiyan. Bi hev re meşiyan, bi hev re beziyan û bi hev re bêhna wan çikiya. Bi hev re birçî û tî man, bi hev re çûn ser kaniyên metirsîdar ku tim li ser wan dijmin kemîn datîna, bi hev re ji bo ewlekarî û parastina hevdû li ser kaniyên avê kemîn danîn û bi hev re bi barên tijî şaşalên avê heya noqteya xwe beziyan ji bo ku hevalên ku li noqtê li benda wanin avê vexwin. Bi hev re pêdiviyên xwe bi dest xistin û bi hev re hemû tiştên nav çenteyên xwe par kirin. Eger lezoyek di berîka yekê de hebe bi hev re vexwarin û eger qetek nan di çanteyê yekê de hebe bi hev re rûniştin parve kirin û xwarin.

Bi hev re keniyan, bi hev re êşiyan. Bi hev re hez kirin, bi hev re hêrs bûn û bi hev re ji kîn û nefretê tijî bûn. Bi hev re nûçeyên radyoyê şopandin, bi hev re ji çalakî û şehadetên hevalên xwe yên li qadên din agahdar bûn û bi hev re sonda tolhildanê xwarin. Bi hev re ji çalakiyan kêfxweş bûn, bi hev re ji şehadeta hevalên xwe birîndar bûn û bi hev re qala bîranîna rêhevalên xwe yên Şehîd kirin. Bi hev re ji cîhaza mezin ferman û prespektîfên rêxistinê guhdar kirin û bi hev re ser wan guftûgo kirin û nêrîn parve kirin.

Bi hev re bi meşên dûr û dirêj şev gihandin rojê û bi hev re roj qulibandin êvarî. Bi hev re di germaya dijwar a rojê de xwêdan dan û

bi hev re bi cil û bergên şil li ber bayên şevê cemidîn û recifîn. Bi hev re hebûn û nebûna xwe parve kirin.

Hebûna xwe di hevdû de hîs kirin, hêviyên xwe di awirên hevdû de dîtin û pêşeroja xwe di kenê hevdû de anîn ber çavên xwe. Ji hev hez kirin û rêhevaltiyeke xurt û nehej bi hev re ava kirin. Rihê rêhevaltiya Apoyî di kesayeta xwe de misoger kirin. Ji bo parastina hevdû çend caran xwe dan ber hevdû, xwe ji dijmin re kirin hedef da ku tiştek bi hevalên wan neyê. Di operasyonan de bala leşker û kobrayan kişandin ser xwe da ku hevalên dîtir xwe ji wir derxin û ziyanê nebînin.

Ev rih bû yê ku di şerê 12 û 13'ê sibatê de jî şer dikir û êrîşî neyar û xayînan dikir. Ev rih bû yê ku nehişt xayîn ji kampa wan derkeve û dilê dijmin bi vê şa bibe. Ev rih bû yê ku ew kirin yek cewher di ewqas bedenan de.

*****

**Jêhatîbûn**

Bihar bû. Hê nebibû heyvek ku taxim komî ser hev bibû û dest bi pratîkê kiribû. Piştî nîvro zêrevan pê hesiyan ku di pala kêlekê de liv û tevgerek heye. Her zêrevanekê bi vî awayî tekmîl ji zêrevanên pey xwe re da ji bo ku bişopînin û zelal bikin. Jixwe ji bilî wê tu tiştek di eraziyê de xuya nedikir. Heya êvarê tekmîl bi vî awayî dewam kir û neguherî. Lewre êvarê biryar dan ku biçin lê binêrin. Ji nîvro ve zêrevanan bi dûrbînê bi taybetî ew aliyê eraziyê şopandibûn û xistibûn bin kontrola xwe, lê ji bilî vê tevgerê tiştek nedîtibûn. Tenê seherê zû dîtibûn ku şivanek bi pezê xwe ve ji dola jêrê ve çûye û venegeriyaye vî milî.

Nîvro bi agahdarkirina zêrevanan re Felat, Serhed, Rewşen, Rênas û Evîndar her yek bi dûrbînekê ji cihekê ve cihê ku zêrevanan gotibûn şopandin. Tiştek nedîtin, tenê carna heliz û darên behîvan pîçekê dihejiyan. Ji bilî vê her tişt di rewşeke asayî de bû. Meraqa hevalan her diçû zêde dibû. Fêm kirin ku rewşeke awarte nîne, ji ber ku liv û tevger pir serbest bû û qet pêwîstiya xweveşartinê nedihat dîtin. Lê heya zelal jî nebûya dilê wan wê rehet nebûya. Heval li bendê man tarî dakeve erdê ji bo ku biçin mêze bikin ew çiye. Dema tarî daket, çend hevalan xwe nêzî wir kirin, çend hevalan jî ew parastin heya biçin û vegerin.

Ên ku pêşde diçûn her ku nêz dibûn zêdetir dengê pel û pûşên erdê bihîstin. Li hember her egerekê carna dengê çûk û ajalan derxistin, lê bersiv tinebû. Vê carê tam çûn nêz û dîtin ku pezek di nav çiqlên daran de maye û nikare ji nav derkeve. Fêm kirin ku şeva derbasbûyî ku şivan pezên xwe anîbûn vî milî, ev pez ji keriyê xwe qut bûye û di eraziyê de maye. Pez rakirin birin gel xwe. Pez eger deng derbixista wê noqteya wan eşkere bibûya, ji ber vê li ciheke hinek dûrî noqteya xwe girêdan.

Roja din li hêviyê man ku xwediyê pez lê bigere da ku bidinê. Lê kes ji wan deran re derbas nebû. Wê rojê dîsa pez ma. Êvarê cihê pez piçekê wirdetir birin û girêdan. Çeqelan dora pez dan û qîjevîj bi eraziyê xistin. Heval pê hesiyan. Beriya ku çeqel êrîşî pez bikin çûn anîn. Ew, şeva dûyemîn bû ku kesek xwedî lê derneketibû. Evîndar got: “Li gorî qanûnên Îslamê jî biçî ev pez êdî helalê me ye, li gorî qanûnê gerîla biçî dîsa helalê me ye. Bînin em serjêkin.” Hin heval alîgir bûn, hinek dijber bûn. Azad got: “Xwedê ji vê zêdetir em nikarin vê pezê

xwedî bikin. Yek jî, emê ji bo wê bikevin rîskê.” Heval bi giştî tevlî wî bûn.

Rabûn serjêkirin. Piştî serjêkirina pez çend heval ji bo pêkanîna peywirekê ku ji berê de hatibû pilankirin bi rê ketin çûn û ewê heya şeveke din venegeriyabana. Ewên din jî bi gurandin û paqijkirina pez ve mijûl bûn. Nefikirîn kêra ku pez pê serjêkirine bihêlin gel xwe. Kêr dan xwediyê wê. Piştî ku ew bi rê ketin hevalên li noqteyê man li kêrekê geriyan. Kêr li ba ti kesê tinebû. Kêrên taximê tev li ba yên ku çûn peywirê mabûn. Qasaturaya Serhed a sabotajê xwestin. Hevalan ew jî ji bo peywirê bi xwe re biribûn. Li makêtekê geriyan. Ew jî tinebû. Evîndarê jîletek ji hevalên xort xwest. Jîlet jê re anîn.

Evîndarê milên xwe hildan û bi wê şevê, li ber tava heyvê bi jîlêtê pez gurand, hem jî bi tena serê xwe û di nav demeke kurt de. Heya hevalên din çend poşêt amade kirin ji bo ku qetên pez têxin nav de û bi vî awayî têxin çanteyên xwe de, Evîndarê pez tev gurand, qet kir û ji bo rakirinê li ser hevalan parve kir.

Heval matmayî mabûn li hember vê lez û jêhatîbûna wê. Her kes heyrana Evîndarê mabû, taybet hevalên ciwan; ji ber ku wan qet hêvî nedikirin hevaleke jin ewqas bi lez û jêhatî kareke wisa bike, ya girîng jî jinek ewqas wêrek be. Evîndar di perwerdeyên xwe yên leşkerî de pir jêhatî, atîk û serwer bû, lê di warê hest de jî pir nerm û nazik bû. Dil nedida pê li muriyekê bike. Ji bo ku heval di wexta meşê de pê li gula nekin, tim hişyarî dida û digot: “Dema dimeşin baldar bin pê li gula nekin. Ew jî mîna me zindîne û canê wan têşe.” Niha ji bo her kesê cihê meraqê bû ku ev hevala dilnazik û dilnizim çawa bû ku pezek gurand, hem jî bi tena xwe û bi jîletê û ewqas jî lezgîn!

Wê şevê ji bo ku deng dernekeve tiştek negotin û bêdeng man. Lê seherê nekarîn heyraniya xwe veşêrin. Hem bi kêfxweşî bi karê wê dikeniyan, hem jî meraqa xwe pê re parve kirin. Evîndarê di bersiv de got: “Dijmin sax be; em wisa fêr kirine ku karên herî zor jî weke vexwarina avê bi rehetî pêk bînin. Hûn nizanin dema min jîlet lêdida min çi hestek jiyan dikir. Naxwe qey we got Evîndarê di mala xwe de karê wisa kiriye!”

*****

**Pirsgirêkên Silopyayî Û Goyîyan**

Havîna 2011'an li Bestayê pir germ derbas bû. Jixwe havînên Bestayê her tim wisa derbas dibin. Ew havîn jî mîna her havîneke din. Gêrikên bi daran ve aman nedidan. Hem bêhna wan pir nexweş bû, hem jî gez dikirin. Lewre mirov nedikarî destê xwe bide wan an jî ji bo vehesînê pişta xwe bide daran. Pêşû tenê bi pêvedanê ve sînordar nediman; vizeviza wan li ber guhê mirov weke êşkencê dihat. Wan jî îşê xwe dizanîn; navbera nîvro ku pir pir germ bû xwe di nav kunên daran de vedişartin, seher û êvaran ku hênike û gerîla piçekê dikarîbûn vehesin û bêhna xwe bidin jî, ji nav daran derdiketin û dest bi vizeviz û pêvedanê dikirin. Bi vî awayî aman ji hevalan dibirîn. Hevalên ku diçûn Bestayê, ango rêwî bûn û ji ser wir re derbas dibûn destpêkê pir zorî dikişandin heya ku fêrî germa, gêrik û pêşûyên wir dibûn. Piştre hêdî hêdî laşê wan fêr dibû û êdî tiştek ji wan re xem nebû, ji ber ku bedena wan bi xwezaya wir re aheng çêdikir. Li her sê alanên Bestayê rewşa hewa û xwezayê bi vî awayî bû.

Taxima Şehrîbanê li gorî prespektîfên ku zivistana bihurî ji perwerdeyê girtibûn û fermanên rêxistinê ku ji cîhaza mezin guhdar kiribûn pilansaziyek ji bo xebatên xwe yên salê danîn. Çalakiyên leşkerî û tevlêkirina şervanan di serê pilan û bernameyan de dihat. Li ser bingeha van prespektîf û pilansaziyan xebatên salê dest pê kirin.

Felat, Rewşen, Havîn, Zîlan, Çekdar û Dilsoz nû hatibûn alanê û erdnîgariya wir nas nedikirin. Lewre ger û nasandina erazî ji bo hevalên ku nû derbasî wir bûne jî, di çarçoveya pilansaziyê de bû û beriya her tiştî diviya ev pêk bihata. Lewre her roj taximê berê xwe dida aliyekê û erazî û hedefên aliyekê keşf dikirin. Bi vî awayî hem endamên nû erazî û hedefan nas dikirin, hem jî endamên kevin careke din erazî kontrol dikirin û eger di liv û tevgerên dijmin de guhertinek hebe dişopandin û li gorî vê pilansazî datînan.

Havînê keçeke ciwan bi navê Sarya ji Silopiyê, herêma Bilikayê tevlî refên gerîla bû. Xebatkarî ew anîn li Şehrîbanê radestî taxima wir kirin û çûn. Sarya du rojan li wir, li ba taximê ma heya ku rênas bên wê bibin cihê perwerdeya seretayî. Di nava wan du rojan de hevalan pêşwaziyeke germ li Saryayê kirin. Herî zêde Havîn, Demhat û Dilsoz ku ciwanên taximê û şervanên salekê bûn bi tevlêbûna ciwanan kêfxweş dibûn û wekî ku bifirin wisa şa dibûn.

Bi taybetî dema ew şervan jin bûna, Havînê ji kêfxweşiyan nedizanî çi bike. Havîn û Hêvî ku hemtemen bûn, bi cihanîna hemû pêwîstiyên Sarya girtin ser milên xwe û ji bo ku ew rehetiya xwe bistîne çi alîkariyek jê re pêwîst be pêk anîn. Hevalan ji bo ku Sarya şerma xwe derbas bike û xwe rehet hîs bike henek û giftûgoyên cur bi cur pê re meşandin û lê guhdar kirin. Di nav wan pêşwazî û guftûgoyan de Sarya vebû, xwe rehet hîs kir û di gelek mijaran de hem serpêhatî, welatparêzî û asta xebatên malbata xwe, hem jî kelecana tevlêbûna xwe û nêrîn û dîtinên xwe yên cuda cuda bi hevalan re parve kirin.

Bi vî awayî di nav axaftin û vegotinên Saryayê de hevalan fêm kirin ku di navbera eşîra Sarya û eşîra Goyiyan de nakokiyên mezin hene, lewre Sarya ji Goyîyan 'acize.´ Sarya axaftinên ku ji zaroktiya wê ve tim hatine guhê wê bi berfirehî ji hevalan re vegotin û sedema vê nakokiyê wiha anî ziman: "...Dayîka min digot, Goyî hatine gundê me. Kalkê min bi xwe re birine derveyî gund. Dareke mezin hebûye ku hundirê wê vala bûye. Goyiyan, kalkê min xistine hundirê wê darê û agir berdane darê. Bi vî awayî kalkê min di nav darê de şewitandine. Ji ber vê jî ez ji Goyîyan hez nakim..."

Hevalan piştî ku li hemû gotinên wê guhdar kirin, ketin fikra çawa jê re bibêjin ku di nav PKK´ê de nakokiyên navbera malbat û eşîran nînin, yên ku ev nakokî xistine navbera Kurdan û ew berdane hev dijmine. Bi vê fikrê, Zîlanê bi kenê xwe yê nizim ji Sarya re got: "Di nav me de jî gelek hevalên Goyî hene. Ev îş wê çawa be? Tu yê ji wan jî hez nekî?"

Sarya: "Xwedê ez ji Goyiyan acizim heval. Dayîka min digot ku em divê bi wan re qet neaxivin. Naxwazim ti keseke Goyî bibînim. Hema hevalên Goyî jî nîşanî min nekin. Ma ezê kalkê xwe ji bîr bikim...!"

Felat û Rewşen rojek piştî tevlêbûna Sarya ser cîhaza mezin ji taxima Besta Navîn rênas xwestin ji bo ku bên Sarya bibin cihê şervanên nû. Reşo komeke heval biribûn Katoyê û li taxima xwe amade nebû, lewre Egîd Goyî di cîhazê de bersiv da ku ewê bixwe bê wir. Bi vî awayî hevalên Şehrîbanê dizanîbûn ku wê Egîd Goyî bê Saryayê bibe cihê perwerdeyê. Ji ber vê her ku Sarya aciziya xwe ya li hember Goyiyan dianî ziman, heval tev dikeniyan û bi dengê nizim ji hev re digotin: "Egîd xwariye ji destên vê!"

Hevalan dixwestin ziyana ku nakokiyên navxweyî ya Kurdan dide wan bi Saryayê bidin fêmkirin, lê ji ber ku ew hê nû tevlê bibû û

perwerde nedîtibû, ser vê mijarê zêde dirêj nekirin. Di nav van hewldanan de carna pê re henek jî dikirin. Evîn Gever û Xelat Şemsê ku fermandarên Bestayê bûn jêre gotin: “Heval Sarya, tu baş dikî. Welehî em jî ji Goyiyan acizin. Hele heval Egîdeke me yê Goyî heye, tu bizanî çi belayeke!” û bi axaftina xwe re têr têr jî dikeniyan.

Roja din seherê zû, di destpêka ronahiya rojê de Egîd gihişt gel taxima Şehrîbanê. Zêrevan agahî da ku rênas hatiye. Heval hemû kom bûn ji bo silav bidinê. Sarya pirs kir: “Ev heval kî ye?” Xelat keniya û jê re got: “Welehî ev heval Goyî ye. Navê wî jî Egîd Goyî ye.”

Endamên taximê di rêzê de rawestiyabûn ji bo ku silav bidin Egîd. Sarya jî di nav hevalên jin de rawestiyabû. Egîd yek yek silav da hevalan. Dema gihişt Sarya, destê xwe dirêj kir ku silav bidetê. Sarya wekî ku hinek kes destên wê jê bistînin wiha her du destên xwe bir pişt xwe û veşart. Çavên hemû hevalan li Sarya bû da ku bibînin wê çawa silav bide Egîd. Dema Sarya dest neda Egîd û destên xwe veşart, tev ji kenan re mirin û bi dengê bilind dest bi kenê kirin.

Egîd ji ber germaya dijwar û westandina zêde di rê de di nav xwêdanê de mabû û sipsor bibû. Ti halê wî yê ku meselê fêm bike nebû. Lewre tam mesele fêm nekiribe jî, zêde israr nekir, Sarya derbas kir û silavdana xwe bi hevalên din re domand.

Piştî silavdanê bi hevalan re rûnişt, avek vexwar û hinekê ser xwe ve hat. Piştre Felat û Evîn çîroka kalkê Sarya jê re qal kirin û gotin ku ji ber vê bûyerê ew ji Goyiyan hez nake û silav nade wan. Egîd matmayî got: “Na ya! Min got qey yeke pir oldare û silav nade hevalên xort!” Hevalan jê re gotin: “Em pêwîste wê qaneh bikin ji bo bi te re bê. Dibêje bi Goyiyan re gavekê navêjim.”

Egîd ku hê tam westandin ji ser wî neçûbû keniya û got: “Hîngî çîrok bi Goyî û Torîyan ve kirine, em nizanin çawa sererast bikin. Goyî pir şerkerin lê şûrê xwe şûna ku li hember dijmin hildin hember gelê xwe hildane. Di vir de çi gunehê min heye, ma min kalkê wê şewitandiye? Ma ne ez jî ji bo rakirina van nakokiyan li virim?”

Hemû heval bi hev re hinekê rûniştin. Piştre Sarya jî hat gel wan rûnişt. Egîd bi wê re hinekê axivî û bi navê eşîra xwe rexnedayîn jê re da. Îcar Sarya rabû silav dayê. Êvarê bêpirsgirêk bi hev re rabûn bi rê ketin û bi axaftin û henekan ji Şehrîbanê çûn Besta Navîn; cihê ku Sarya perwerdeya seretayî ya şervantiya nû lê bidîta.

## Yekemîn Serdana Hemze

Havîn bû. Sehereke zû, beriya hewa vebibe Reşo û Gezgor piştî meşeke şeş demjimêrî gihiştin ba taxima Şehrîbanê û agahî dan ku komek heval ji Başûr hatine ku di nav wan de Heval Hemze Şirnex jî heye û Heval Hemze weke fermandarê giştî yê Bestayê hatiye şûna Heval Xelat, Heval Xelat jî derbasî xebateke din dibe.

Di taxima Şehrîbanê de Felat, Azad, Mehsum û Rewşenê Hemze nas dikirin. Zîlan û Serhedî jî sala 2009'an li Heftenînê ew di konferansa Botanê de dîtibûn, ji bilî vê jî Hemze wê demê serdana hemû komên ku wê derbasî Botanê bibûna kiribû. Jixwe wê demê ew, endamê fermandariya Heftenînê bû.

Roja din Hemze û Xelat bi hev re çûn serdana taxima Şehrîbanê. Hemze li wir jî mîna Besta Navîn û Hêzilê civîn ji taximê re çêykir. Rewşa Rêber Apo û sepandinên dijmin ên girtîgehê de, rewşa siyasî ya cîhan, herêm û çar beşên Kurdistanê, êrîşên Îranê yên li ser Qendîlê û berxwedana PJAK'ê, rewşa siyasî ya di navbera dewleta Suriyê û PYD´ê de, xebatên PÇDK´ê û êrîşên siyasî, civakî yên PDK û YNK´ê li ser wê, bi giştî mijarên ku di rojeva rêxistinê de ne, bi taybetî jî Pêngava Şerê Gel ê Şoreşgerî ku rêxistinê pir cidî hildaye rojeva xwe û li ser radiweste ji taximê re ragihand. Herwiha li nêrîn, rexne, daxwaz û pêşniyarên wan guhdarî kir.

Piştre yeko yeko bi wan re guftûgoyên takekesî meşandin. Bi taybetî bi Demhat, Dilsoz û Çekdar re pir elaqedar bû û demdirêj li wan guhdar kir, ji ber ku Demhat nû saleke wî di nav gerîla de qediyabû û Dilsoz û Çekdar jî hê nûtir bûn û nû perwerdeya şervantiya nû qedandibûn. Hemze her bi giştî pir ji şervanên nû û ciwan hez dikir, pir bi wan re elaqedar dibû û di nav perwerdeya seretayî de pir diçû serdana wan. Dema diçû serdana taximên Bestayê jî, herî zêde bi hevalên nû û ciwan re dipeyivî.

Piştî van xebatan û naskirina endamên taximê Felat û endamên din, Hemze li alanê gerandin da ku piştî ewqas salan careke din wargeha xwe bibîne û ji rewşa nû ya erdnîgarî û hedefên dijmin agahdar be. Ya rast Hemze ti tiştek girêdayî erdnîgariyê ji bîr nekiribû. Dibê qey nû çend saleke ji wir çûye, wiha her tişt di bîra wî de mabûn. Pir kêm tişt ji bîra wî çûbûn. Navê hin deveran jî hatibû guhertin, Hemze diviya vana fêr bibe. Lewre Hemze bi lez dest bi gera erazî û naskirina hedefên kevin û nû kir.

Dema di herêma Bestayê de digeriya bîranînên wî yên kevin dihatin bîra wî. Ev bîranîn bi hevalên pê re digeriyan re parve dikir, taybet jî qala hevalên ku wan salan şehîd ketibûn dikir û yek yek ew bi bîr dianîn. Bi vî awayî şehîdên kevin jî bi hevalan dida naskirin.

Dema di eraziyê de digeriyan carekê hevalekê jê pirs kir ku gelo erazî ji bîra wî çûye yan na. Hemze bersiv da: “Bawer bike heval, her der weke kefa destên min tê bîra min. Berf û baran û lêdanên dijmin hin guhertin di eraziyê de çêkirine, lê bi meyzandineke giştî, hema her der weke xwe ye. Dibê qey par ji vir çûme û îsal zivirîme. Tenê navê hin noqteyan hatine guhertin. Ezê di demeke kurt de fêrî van navan jî bibim. Weke din her tişt ji min re weke vexwarina avê rehete...”

Felat û Rênas ji her kesê zêdetir dikarîn hestên Hemze fêm bikin, ji ber ku ew jî mîna Hemze berê salên dirêj li Botanê mabûn, demeke kurt çûbûn Herêmên Parastina Medyayê û dîsa vegeriyabûn Botanê. Ya rast Hemze li gorî Felat û Rênas demdirêjtir ji Botanê qut bibû, lê pir jê re xem nebû, ji ber ku êdî karîbû daxwaza xwe bi rêxistinê bide pejirandin û li Botana xwe vegere. Ev jê re bes bû.

*****

**Bedela Îxanetê**

Êvarekê rêveberiya taximê kom bûn û encamên keşfa ku ew demek bû dikirin nirxandin û ber bi pilansaziyekê ve çûn. Di keşfê de navnîşana mala çawişeke pispor ku pir faşîst bû û destên wî bi xwîna ciwanên Kurd sor bibû, hatibû naskirin. Vê carê ji bo dîlgirtina wî, çalakiya pêwîst pilan kirin. Li gorî pilana ku danîn pêşiya xwe Felat, Rewşen û Serhed wê biketana navenda bajarê Şirnexê, çawişê pispor dîl bigirtana û bi saxî bianiyana çiya.

Bejna Serhed pir bilind bû. Bejna Felat û Rewşenê navîn bûn. Her sê bi fîzîkî xurt bûn. Çûna her sêyan bi hev re ji bo çalakiyeke wisa guncav hat dîtin. Ser vê bingehê êvarekê bi cil û bergên medenî ketin navenda Şirnexê. Çend ciwanên welatparêz ên Şirnexê di nav bajêr de pêşiya wan keşf û çavdêrî dikirin û rê nîşanî wan didan. Dema gihiştin kolana ku mala çawişê pispor lêye, ciwanan ser û binê hemû kolanên wê derdorê girtin. Li gorî keşfa ku kiribûn seherê demjimêr 7:00 çawiş ji mala xwe derdiket û diçû paygehê. Hevalan li gorî vê xwe pilan kirin û demeke kurt beriya wexta pêwîst bi maşîneyekê ve ketin nav wê

kolanê. Di serê kolanê de maşîne rawestandin û li bendê man ku çawiş ji mala xwe derkeve.

Maşîna çawiş li kolanê, li ber deriyê mala wî bû. Kêliya ku heval li bendê bûn hat; deriyê hewşa malê vebû û çawiş di derî de xûya kir. Bi tenê ji malê derket û ber bi maşîna xwe ve meşiya. Rewşen û Felat di nav maşînê de man, Serhed jî bi kulmeke tijî îsota hûr a sor ji maşînê daket û ji pişt ve bi lez ber bi çawiş ve meşiya.

Dema Serhed nêzî wî bû, wî xwe tewandibû û maşîna xwe kontrol dikir. Serhed ji pişt ve gazî wî kir û bi Tirkî jê re got: “Efendî, bakar mısın?” (Birêz, dikarî li min binêrî?) Çawiş rabû li pişt xwe nêrî. Çawa çawiş berê xwe li Serhed zivirand, Serhed bi lez îsota nav kulma xwe avête nav çavên wî, piştre desteke xwe da ber devê wî ji bo ku qîr neke, bi destê din jî her du destên wî hişk girt û şidand. Heya hingê Felat û Rewşenê jî xwe gihandinê. Bi lez bi şûtika ku bi xwe re anîbûn destên wî girêdan û xistin nav maşîneya xwe û bi lez ji wê alanê dûr ketin. Çawiş pir qelew bû û bejna wî kurt bû. Bejna Serhed û Felat bi ser wî diket. Lewre girêdana wî ji wan re pir zor nebû.

Çawiş di maşîneyê de pê hesiya ku yên ew dîl girtine gerîlane. Wî bi salan bû dijbertiya gelê Kurd û tevgera azadiyê dikir, gelek welatparêz girtibûn û êşkenceyê dabû, herwiha hatibû şerê dijî gerîla. Niha jî di destê gerîla de bû. Ji ber vê digiriya û ji wan tika dikir ji bo ku wî berdin. Devê wî ranediwestiya û her digot: “Hûn çiqas pere bixwazin ezê bidim we, min berdin. Jin û zarokên min hene. Min qet ziyan negihandiye Kurdan û hwd.” Pir ditirsiya heval wî bikujin.

Di rastiyê de ew ji pratîka xwe ditirsiya. Bi salan perwerdeya vê dîtibû ku çawa Kurdan bikuje û ji holê rake. Qet nefikirîbû ku wê rojekê hesabê van pêkanînên xwe bide gelê Kurd. Heta qet xeyal nekiribû rojek wisa di maşîneyekê de, ewqas nêzî gerîlayan be. Di şeran de ji dûr de gerîla dîtibûn û fîşek avêtibû wan lê ewqas nêz, hem jî di nav destên wan de rewşeke cuda bû. Heta xeyalkirina wê jî jê re gengaz nebû. Lewre hemû bedena wî direcifî, zimanê wî giran bibû û hew mabû dilê wî raweste. Ji ber vê jî hema digiriya.

Heval bi halê wî dikeniyan û ji hevdû re gotin: “Tirsa PKK'ê heta faşîstan jî dide giriyandin!” Serhed ku ji Rojhilat bû û Tirkî baş nedizanî bi Tirkiyeke çeloxwarî jê re got: “Hê me tiştek bi te nekiriye wisa digirî. Tuyê hê pir bigirî!” Felat got: “Dayîk û zarokên Kurd ji ber faşîstên weke te her roj digirîn. Bila dayîk, hevjîn û zarokên te jî hinekê bigirîn,

ma wê çi bibe? Tu jî hinekî bigirî bi halê xwe. Ma qey girî tenê çarenûsa Kurdan e?!" Rewşenê jî got: "Qurbana PKK'ê bim, zilam aniye çi halî! Horr horr digirî. Qet şerm jî nake. Xwe ser serê gelê me zilam dibînin ha? Emê zilamtî nîşanî we bikin. Zilamtiya we bikeve binê erdê erê wele."

Dema zilam digiriya û diket tikayan, Serhedî bi Tirkiya xwe ya şkestî jê re got: "Em bixwe her tim dimeşin, lê me tu bi maşînê anî. Hê çi dixwazî?" Serhed ku kesayeteke pir bêdeng û aram bû, dema henekek jî dikir her kes ji dil dida kenandin. Felat û Rewşenê nedikarîn xwe bigirin, hîngî bi vê heneka xweşkalîteya Serhed keniyan û jê re gotin: "Helal be ji te re. Di demên evqas tengav de çawa tê bîra te tiştên wisa bibêjî?"

Van axaftin û guftûgoyan tirsa kuştinê ji ser çawişê pispor ranedikir. Gelo ev tirsa mirinê wî ji kiryarên qirêj ên salan poşman kiribû, yan ji ber ku evqas sal weke piyonekê ji aliyê dijmin ve hatibû xebitandin xemgîn bû, yan şerm dikir ji pratîka xwe, yan jî hema tenê tirsek bû ku qet lê nefikirîbû! Diyar nebû.

Heval bi kêfxweşiya serkeftina çalakiyê ji Şirnexê derketin û çawiş bi xwe re anîn Şehrîbanê, gel taxima xwe. Hevalên taximê ku li benda hevalên xwe yên çûne çalakiyê bûn, bi kêfxweşiya ku serkeftî vegeriyane pêşwaziyeke germ li wan kirin. Ji bo vexwarin û şûştina dest û rû avê ji wan û çawiş re anîn, piştre xwarin ji wan re danîn. Çawiş mat mabû; xuya bû li bendê nebûye ku ewqas mirovane nizîkatî jê re bê kirin. Vê carê hinekê aram bû.

Wê rojê heya êvarê li wir ma. Hevalan ji bo lêpisînkirinê dê ew bişandana Herêmên Parastina Medyayê. Êvarê rênasên ku wî bibin hatin. Çawişî cihê xwe xweş dîtibû û nedixwest ji wir biçe. Ji hevalan re got: "Hema li vir lêpirsîna min biqedînin. Çi sizayekê didin min jî bidin. Ezê li vir gel we bimînim û hemû karekê bi we re bikim. Naçim malê..."

Dibê qey welatparêzeke ku bi salane bi hevalan re xebat dike û ti guneh û tewaneke wî nîne! Dema ev axaftin kirin, Demhat û Havîn bi zorî xwe girtin ji bo şemaqê lê nexin û tifekê li rûyê wî nekin.

Êvarê rêveberiya taximê ew bi rênasan re bi rê kirin. Dema rabûn biçin çawişî berê xwe li hevalan zivirand û got: "Min nedizanî hûn evqas mirovin û bi exlaqin. Dewletê derheqê we de em xapandine."

Çawiş bihara sala 2013'an piştî ku HPG'ê agirbest ragihand hat berdan.

*****

**Zimanê Biyanî**

Sibeyekê Zîlanê di keşfê de hin liv û tevgerên biçûk li girê beramberî xwe dît û agahî da taximê. Roja berê Evîn jî hatibû serdana wan. Dema Zîlanê agahî da, Evînê û rêveberiya taximê tev dûrbînên xwe girtin û ji cihên cuda cuda ve dest bi keşf û şopandinê kirin. Her sê tîm belav bûn û her yek ji cihekê ve erazî xistin bin çavdêriya xwe. Heya demjimêr 9:00´an çavdêrî û şopandinên xwe berdewam kirin, lê ti kesek, ti liv û tevgerek nedîtin. Tenê yek du şivan di eraziyê de hebûn, ew jî jixwe her tim dihatin li wan deran pezên xwe diçêrandin û di nav zeviyên xwe de digeriyan. Ji bilî wan, ti kesek xuya nedikir. Heya saet 9:00´ê hêdî hêdî tav tam ket beramberî wan û li çavên wan da. Lewre nedikarîbûn baş beramberî xwe bibînin. Taxim careke din komî ser hev bû, lê zêrevan li wir hat hiştin û hat hişyarkirin ku taybet tepeya ku Zîlanê tevger lê dîtiye bişopîne.

Heya ber bi êvarê ku sî û hênikahî daket erdê tiştekê xuya nekir. Her zêrevanekê dema tekmîl dida zêrevana piştî xwe jê re digot: “Min pir şopand lê min tiştek nedît.” Hevalan ji Zîlanê re gotin: “Tu baş dizanî ku ew, şivan an jî beraz û ajalên din nebûne?” Zîlan ji xwe bibawer bû. Ji çav û dîtinên xwe jî, ji hişyarî û hesasbûna xwe jî bawer dikir. Hemû taxim jî di wan mijaran de hember wê pişta wan qayîm bû, lê balkêş bû ku çima piştî Zîlanê ti kesê dijmin nedît.

Êvarê beriya ku zêrevaniya roj bi dawî bibe, Zîlan û Evîn bi hev re careke din çûn keşfê. Evîn hilkişiya ser darekê, Zîlan jî di bin dareke din de rûnişt. Dûrbîna xwe hûr û kûr li hemû eraziyê gerandin. Heya nêzî demjimêrekê kesek nedîtin. Carekê bihîstin ku hema ji jê ra wan dengê pispisê tê. Evîn ku li ser darê keşif dikir dema li jê ra xwe nêrî dît ku pênc kes bi kincên medenî di nav çend daran de rûniştine, dûrbîn di destê wan de ye û yek ji wan bi tilî Tepeya Dumanê ku li beramberî wane ji yên din re tarîf dike. Bi dengeke pir nizim bi hev re diaxivîn. Ji tiraşê rû û pora wan re xuya bû ku subayên Tirk in. Pişta wan li noqta hevalan bû û tenê li beramberî xwe dinêriyan. Jixwe tav qulibîbû û ji pişt hevalan ve li Tepê Dumanê ku li beramber bû dida.

Evîn û Zîlan ji cihê ku lêbûn ve nedikarîn tam axaftinên subayan fêm bikin. Ji bo ku axaftinên wan baş fêm bikin û bizanin hedefa wan çiye, Evîn hêdîka ji darê daket û çû çend metrekê pêşdetir di bin siya darekê de rûnişt û li wan guhdar kir. Zîlan jî bi lez çû taximê agahdar kir û vegeriya cihê xwe.

Subayekê Tepê Duman ku dijmin tê de xwe veşartibû û cihê ku guman dikirin heval lêbin ji subayên din re qal dikir. Cihê ku wan guman dikirin û dixwestin operasyon ser bikin ti hevalek lê nebû. Leşkerên dijmin şeva derbasbûyî hatibûn li Tepeyê Dumanê bicîh bibûn û pilan dikirin ku şevek şûndetir, yanî wê şevê bi dorpêçkirin û serdegirtinekê hêza Şehrîbanê ji holê rakin.

Piştî ku hevalan ev agehiyên pêwîst ji subayan girtin, Evîn rabû ji pêyan û bi dengeke bilind got: “Radest bin!” Subay ku li benda rewşeke wisa nebûn û qet guman nedikirin gerîla çend metrekî li pişt wan bin şoq bûn û bi vê şoqê re dest û lîngên wan li hev ketin. Beriya ku dest bavêjin çekên xwe, hevalan du narincok avêtin nav wan û çend fîşek li wan dan. Piştre bi lez pilansazî û vesaziya xwe çêkirin; Felat, Serhed, Rewşen û Rênas li ser sê qolan hatin erkdarkirin û ber bi Tepeya Dumanê ve bi rê ketin. Tenê hevaleke ciwan ku hê tecrubeya şer baş negirtibû li wir li ba Evînê hat hiştin.

Her sê qol heya cihekê di nav dol û daran de bi hev re beziyan. Ji wê şûnve ji hev belav bûn ji bo ku hêzên operasyonê dorpêç bikin û ji sê aliyan ve li wan bixin. Evînê bi cîhaza biçûk koordîne dikir. Çend caran prespektîf da wan, lê carekê dît ku Felat û Serhed û Rênas ser cîhazê bi Farsî ketine nav de, bi hev re diaxivin û pilan û cihê ku lêxin ji hev re dibêjin. Evînê jixwe Farsî nedizanî û tiştek ji wan fêm nedikir lê dilê wê rehet bû ku ew îşê xwe dizanin. Lewre êdî îşê xwe ji wan neanî û neket navbera wan de. Her sê fermandarên qol bi zimanekê diaxivîn ku li Bakur û Tirkiyê qet nayê axaftin û leşkerên Tirk jê fêm nakin, piştre nêrînên xwe di cîhazê de kurt ji Rewşenê re jî radigihandin.

Dijminî jî cîhaza hevalan şopandibû. Dema heval derbasî zimaneke din dibin, dijmin dibêje qey pilansaziyeke pir berfireh li hember wan heye û hejmareke pir zêde heval bi çekên giran diçin ser wan. Lewre di cîhaza xwe de bi lez bi fermandarê Şirnexê re axivîn û ji wan skorsky xwestin. Hê hewa tam tarî nebibû, beriya heval bigihîjin Tepeya Dumanê skorsky hatin leşker rakirin birin. Bi vî awayî operasyona dijmin bêencam bi dawî bû, termê pênc subayên xwe di biniya noqta hevalan de hiştin û çûn. Qolên hevalan jî vegeriyan cihên xwe. Wê êvarê noqteya xwe guhertin.

Heya wê demê kes nefikirîbû û nehatibû hişê ti kesî ku sê rêveberên vê taximê ji Rojhilatê Kurdistanê ne û avantaja wan a

zimaneke din ji bo xapandina dijmin heye. Pir kêfa Evîn û Rewşenê ji vê rewşê hatibû û têra xwe pê keniyan. Piştre ji wan re gotin: “Bi rastî heya niha em qet nefikirîbûn ku hûn her sê ji Rojhilat in.” Felat, Serhed û Rênas her sêyan bi hev re bersiv dan: “Xwedê heya niha nehatibû bîra me jî. Li ser cîhazê ji nişka ve hat bîra me û em derbasî kanalê Farsî bûn.” Îcar dest pê kirin, henekê xwe bi reva dijmin kirin:

“Azad: Ewna (dijmin) gotin qey em sedan kesin ser wan de diçin.

Mehsum: Ji ber ku Farsî fêm nekirine, niha gotine ka hûn ser kîjan çekên giran diaxivin.

Havîn: We dît çawa di nav toz û dumanê de xwe avêtin nav skorsky?!

Demhat: Hîngî min êşkenceya wan polîsan xwariye, bila bicehimin biçin. Xwezî zêdetir bihatana kuştin.”

Ya herî kêfxweş ku ji kêfxweşiyan nedikarî li ser cihê xwe birûne Zîlan bû, ji ber ku keşfa wê rast derketibû û bi kuştina pênc subayan re weke çalakiyekê bi dawî bibû. Çalakiyeke bêkeşf, bêbername û bêhedef lê serkeftî! Zîlanê di nav vê kêfxweşiyê de got: “Niha dijmin dibêje leşkerên ku min şandibûn operasyonê hemû zîvirîn hatin. Ma ew pênc subayên min kanê ne, li kîderê man!”

Bi axaftina her hevalekê re heval tev ji dil dikeniyan. Ew şev ji bo wan weke şahiya pîrozbahiya çalakiyekê derbas bû.

*****

**Gora Erzaqan**

Di nav pratîka salê de taximan weke beşek ji xebatên xwe, hin caran erzaq jî ji bo salên pêşiyê berhev dikirin û li deverên cuda cuda binax dikirin û vedişartin. Payîzê hin erzaqê din berhev kirin. Ji ber ku baran û şiliyê dest pêkiribû, pelên daran diweşiyan û erazî tazî dibû her der guncav nebû ji bo veşartina erzaq. Di encamê de cihek li nêzî rêya hatinçûna gel dîtin.

Wê derê jî dest nedida ku cihê erzaq pir teng û kûr çêbikin, ji ber ku di bin de kevir derdiket. Lewre erd bi awayeke zirav û dirêj kolan û erzaqê xwe xistinê. Piştî ser girtin hinek zêde ax ji ber ma. Ax axeke sor bû û li kûderê bireşandana ji dûr ve xuya dikir. Hem jî li vê fikirîn ku dema baran bibare axa ser erzaq wê dakeve û nizim bibe, bi vî awayî jî cih eşkere bibe. Ji ber vê, dema axa ser zêde be bi baranê re wê bi erda din re rast û di astekê de be. Lewre axa ser erzaq hinekî bilind kirin û bi pûş û çilo veşartin. Mîna hemû cihên din ên erzaqan, ji bo ku cihê vê erzaqî jî nîşankirî be, nîşanek li wir hiştin. Nîşan diviya bal nekişandiba. Di eraziya wir de kevirên biçûk û belave pir bûn. Wan jî ji bo nîşanê kevirek danîn ser erzaqê.

Piştî ku îşê xwe qedandin û xwestin ji wir biçin gundiyek dîtin. Baş nedizanîn wî gundî ew li ser cihê erzaqê di wexta karkirinê de dîtine yan na. Di vê wexta şevê de ji bilî wan ti kes di eraziyê de xuya nedikir. Heval dema li kesê gundî nêz bûn, dîtin ku keseke nase û miroveke xirab nîne. Jixwe hevalan jê re digotin “Kalo.” Çûn gel wî, hinekê pêre rûniştin û rewşa wî pirs kirin.

Çend rojek beriya wê, kobra hatibû ew der hemû kiribû hedef. Kalo piştî vê bûyerê nû heval didîtin û pir kêfxweş bibû. Lê belê wê kolandina erdê ew tirsandibû. Lewre ji hevalan pirs kir: “Xwedê xêr bike heval, çi bûye, çima we erdê dikola. Aman nebêjin hevaleke me şehîd ketiye, me cihê wê çêdikir!”

Heya wê kêliyê tiştek wisa hîç nehatibû fikra hevalan. Bi axaftina Kalo re hat bîra hevalan ku bi rastî jî cihê erzaq weke gorekê çêbûye. Lewre, di bersiva Kalo de gotin: “Kalo, ev heval nû şehîd neketiye. Me termê wî ji ciheke dûr anî li vir veşart. Me got ser rêya gele, gel dema ji vir derbas bibe bila ser duaya xêrê bike. Ji ber vê me li vir veşart. Tu jî xêra xwe kengê ji van deran re derbas bûyî duayekê ji Şehîdên me û hemû miriyên xwe re bike.” Dema ev tişt ji Kalo re digotin bixwe ji her

kesî baştir dizanîbûn ku cihê erzaq bi taybetî li wir nehatiye hilbijartin, berovajî, ji ber ku cih nedîtine anîne wir û kêfxweş bûn ku Kalo bi axaftin û fikarên xwe di rastî de aqil dabû wan.

Di encamê de dilê Kalo rehet bibû ku bi kobrayên wê rojê ti hevalek şehîd neketiye. Bi vê kêfxweşiyê Kalo di rojên pêşiyê de li ser rêya xwe rastî kê/î hatibû ji wan re gotibû: “Termê hevaleke şehîd li felan derê ye. Biçin ser fatîha bixwînin.” Bixwe jî qet paşçav nedikir; hemû rojê diçû li wir fatîhe dixwend û duaya xêrê ji bo gerîla dikir. Axaftina Kalo wisa bi lez belav bû ku di demeke kurt de hemû şêniyên wê deverê, şivan û xwediyên zevî û bax û baxçeyan tev diçûn li wir nimêj û dua dikirin.

Piştî heyv û nîvekê ku taxima Felat ji bo derbaskirina pêvajoya zivistanê Şehrîbanê berdan û çûn, agahiyeke wiha girtin: “ser axaftinên Kalo re her kesê ji nasên xwe re gotiye ku biçin li ser gora şehîd fatîhe û dua bixwînin û nimêjê bikin. Ev axaftin gihiştiye guhê dijmin jî û dijmin guman kiriye ku li wir çek û cebilxane hatibe veşartin. Lewre piştî ku heval ji alanê derketine, dijmin ji gel bi awayeke veşartî, çûye axa wir vedaye û erzaq şewitandiye.

*****

**Kêfxweşiya Mirina Baveke Xayîn**

Payîzê ji navenda Şirnexê ciwanek bi navê Serdar tevlî gerîla bû. Serdar nû leşkeriya xwe qedandibû. Ji bavê xwe nefret dikir. Dayîka wî dema ew zarok bûye ji ber zilm û zordariyê, hevjînê xwe berdabû û jê qut bibû. Bavê Serdar piştî berdana hevjîna xwe bi jineke din re zewicîbû û li ser wê jinê jî pir zilm û zordarî meşandibû. Wê jinê jî hemû ‘aciziyên xwe yên ji zilam ji serê Serdar re derxistibû. Herwiha bavê Serdar demekê endamtiya MÎT'ê kiribû, piştre weke polîs û subay rol girtibû. Destên wî ketibû xwîna gelê wî de.

Serdar ti carê bi bav û jinbava xwe re li hev nake, bi rêya telefon û serdankirinan têkiliya xwe bi dayîka xwe re didomîne. Ji zaroktiyê ve li hember ajan û polîsbûna bavê xwe radiweste û pê re şer dike, lê bavê wî lê guhdar nake. Dema mezin dibe jî bavê wî bi zorî wî dişîne leşkeriyê. Serdar leşkeriya xwe li metropolên Tirkiyê diqedîne û vedigere Şirnexê.

Tenê du rojan ji bo pêşwaziya mêvanan li malê dimîne. Di van du rojan de dîsa bi bavê xwe re diaxive ji bo ku dest ji subaytî û nokeriya ji bo dijmin berde. Lê bavê wî pir tûnd li hember wî radibe û wî ji malê diqewitîne. Ew jî diçe xatir ji dayîka xwe dixwaze û jê re dibêje ku wê tevlî PKK´ê bibe. Bi vî awayî tevlê dibe.

Dema Serdar tevlê bû, hevalan nasname û karta wî ya qedandina leşkertiyê girtin ji bo ku têxin arşîvê. Şevekê piştî tevlêbûna wî dijmin li Şehrîbanê operasyon dest pê kir. Xwestin hemû deriyên navbera Şirnex û Şehrîbanê ku ser her du aliyan de serwerin bigirin. Destpêkê Deriyê Sêvê girtin ji bo ku ji wir ve operasyonê koordîne bikin. Serhed û Nevresê ji berê de li hemû deriyan dehfik çandibûn û tedbîra operasyonan girtibûn. Serhed dema dît leşker derketine ser Deriyê Sêvê dehfika xwe teqand.

Roja din seherê hevalan nûçeyên TRT´ê ji radyoyê guhdar kirin. Di nûçeyan de qala dehfika ku şeva derbasbûyî li Deriyê Sêvê hatiye teqandin kirin û nasnameya du subayên ku di bûyerê de hatine kuştin eşkere kirin. Yek ji wan navê bavê Serdar bû. Hevalekê nav li gel xwe nivîsand û ji Felat re bir da ku bi nasnameya Serdar re bidin ber hev. Dîtin ku nav û paşnav, navê gund û bajêr û dereceya leşkertiyê ya bavê wî bi awayê ku di nasnameya wî de heye û awayê ku TRT dibêje weke hevin. Heval çûn gel wî û careke din xebatên ku bavê wî dimeşîne û

dereceya wî ya nav artêşê jê pirs kirin. Serdar bi heman awayê ku TRT´ê gotibû bersiv da, lê belê nedizanî heval çima ewqas pirs dikin.

Heval bi bûyerê pir êşiyan û ji ber Serdar xemgîn bûn. Nedizanîn çawa jê re bibêjin. Gelek fikar di serê wan de hebûn; di encamê de çiqas keseke xirab be û Serdar jê nefret jî bike, dîsa bavê wî bû û dibe ku pir pê êşiyaba, dibe ku ji hevalan ‘aciz bibûya û ji biryara xwe ya tevlêbûnê poşman bûya, dibe ku ser şopa bavê xwe jiyana xwe bidomanda û bibûya dijminê gerîla, dibe ku pir xurt jî nêz bibûya û hwd. Tiştek diyar nebû. Ji ber vê gelek fikar ketibûn serê hevalan de.

Rêveberiyê di nav xwe de guftûgo kirin ku ka çawa bikin. Di encamê de biryar girtin ku hemû hevalên rêveberiyê amade bin û bi hev re jê re bibêjin. Bi vî awayî gazî Serdar kirin ku bê gel wan. Bi hev re rûniştin û ser rewşa malbata wan axivîn. Piştre mijar anîn ser operasyona şeva bihurî. Gotina “bavê te bi teqîna dehfikê miriye” rehet û hêsan nebû. Çi dibe bila bibe, ew bavê wî bû û diviya li gorî vê nizîkatî bihata kirin. Lewre di ragihandina mirina bavê wî de pir zorî kişandin.

Di dawiyê de piştî hewleke zêde Felat got: “Heval Serdar, TRT´ê ji bo bûyera şevê din nasnameya bavê te da. Serê te û malbata te sax be. Tu çi bikî, biryara te çi be tu dizanî, em rêz ji vîna te re nîşan didin. Em jî pir pê êşiyan. Tu bi vê bûyerê re di kesayeta bavê xwe de rastiya Kurd jî baştir nas bike û bibîne dijmin çawa gelê me, malbatên me dike dijminê hev. Bavê te di nav refên dijmin de bû, tu jî tevlî refên me bûyî. Em dixwazin nêrîna te jî bizanin...”

Heya Felat karî vê bibêje dibê qey li ser agiran bû. Hîngî jê re zor hatibû ku heya got di xwêdanê de şil bû. Serdarî di rûyê hevalan de xemgînî dît û fêm kir ku ji ber xatirê wî bi bûyerê pir êşiyane. Dest bi axaftinê kir û got: “Heval, hûn çima evqas xemgînin? We erka xwe pêk aniye. We ew nekuştiban dê wan hûn bikuştana. Ma ne ji bo kuştina we hatibûn ser deriyê, naxwe çi îşê bavê min li wir hebû.” Piştre keniya, destên xwe danî ser milên Serhed û got: “Te qenc kir. Jixwe bavê min bênamûsek bû. Pêwîst bû we zûtir wî bikuşta. Min li malê du carê xwest wî bikujim lê ji tirsa ku bê zanîn min kuştiye û bikevim girtîgehê min nekuşt.”

Heval li hember axaftinên Serdar mat man. Li benda bersiveke wisa nebûn. Digotin qey wê pir bi mirina bavê xwe bandor bibe û biryara wî ya tevlêbûnê biguhere. Di ragihandina bûyerê de pir zorî kişandibûn, nedizanîn ku Serdar dema bibihîse wê ji kêfa bifire û spasiyê li hevalan bike.

*****

**Malbata Havînê**

Heyva Cotmehê Hemze û Evîn çûn Hêzil û Şehrîbanê. Serdana wan kirin, bi rêveberiya her du taximan re axivîn û biryara ku ji bo zivistanê hatiye girtin ji wan re ragihandin. Ji taxima Hêzilê re gotin ku tenê tîma Ayselê bê Besta Navîn, tîmên din li cihê xwe bimînin. Ji taxima Şehrîbanê re jî gotin: “Taxima we wê bên li Besta Navîn zivistanê derbas bikin. Tev bi hev re neyên. Destpêkê tîmekê bişînin û hêza Şehrîbanê sivik bikin. Hevalên mayî bila van deran komî ser hev bikin. Pêwîstiyên xwe bînin, tiştên zêde jî veşêrin û werin. Tîma Heval Aysel jî wê ji Hêzilê bên Besta Navîn. Hevalên jin wê bi hev re xweser di kampê de bin.”

Li Şehrîbanê çend roj piştî vê agahdarkirinê, Serhed bi tevî tîma xwe ku ji Demhat, Mehsum û Azad pêk dihat çûn Besta Navîn. Hevalên din jî bi komkirina wir ve mijûl bûn. Piştî demeke din tîma Rewşenê jî ji bo çûnê xwe amade kirin.

Di vê wextê de ku destpêka heyva Mijdarê bû dayîk, bav û birayeke Havînê ji bo dîtina wê hatin Şehrîbanê. Haşimê xalê Havîn, Pelşîn Koçgirî û çend hevalên din ew pêşwazî kirin. Malbatê li hember Havînê êşa wîjdanî dikişand, ji ber ku ji ber axaftinên ku di nav gund de ser wê geriyabûn Havîn pir êşandibûn. Herî zêde jî birayê wê êş dikişand û li hember Havînê xwe tewanbar didît, ji ber ku herî zêde wî Havîn êşandibû, dijûn jê re kiribûn û wekî ku êşkencê lê bike wisa lêxistibû. Di encamê de Havîn dilşkestî ji malê derketibû. Ya rast ji malê derneketibû; ji hemû civakê reviyabû. Rêzanê xwarziyê wê ji derdê civakê ew revandibû çiya ji bo ku xaltîka wî kêliyek jî be azad û rehet bijî.

Piştî ku Havîn bi tevî Hebûn û Rêzan tevlê dibe rastiya bûyerê derdikeve holê û malbat fêm dikin ku keça wan ji zilameke zewicî û xwedî zarok hez nekiriye. Lê êdî dereng bibû; êdî keça wan derketibû çiya û ew poşman bibin an nebin ji bo keça wan xem nebû, ji ber ku keça wan êdî rêya xwe dîtibû û xwe ji êşkence û tohmetên civakê rizgar kiribû. Ji bo malbatê ku destpêkê ji tohmetên ser keça xwe bawer kiribûn û li gorî wê nêzî keça xwe bibûn rexnedayîn hinekê dereng ketibû, lê dîsa jî dikarîbû bê telafîkirin, yanî wan dikarîn dilê Havînê bistînin. Şansê herî mezin jî ji bo vê rexnedayînê ew bû ku keça wan li Şehrîbanê bû û dikarîbûn bibînin.

***Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!***

Dema agahiya hatina malbata Havînê ji rêveberiya taximê re hat, Rewşen ser cîhazê bi Evînê re axivî û ji bo hevdîtina Havîn û malbata wê destûr jê girt. Ji ber ku amadekariya çûna Besta Navîn dikirin, Rewşen bi Zîlanê re axivî û jê re got: “Ez û Havîn ji bo dîtina malbatê diçin. Rêya me hinekî dûr dikeve. Ji ber vê em nikarin tiştên xwe bibin. Tu û Hêvî hema ji vir ve rêkevin biçin Besta Navîn. Eger we karî tiştên me bînin, eger nekaribin jî li vir veşêrin bihêlin.”

Wê şevê Rewşen û Havîn bi hev re çûn cihê ku ji bo hevdîtinê hatibû destnîşankirin. Beriya ku biçin gel malbatê, Rewşen û Pelşînê ji Havînê re gotin: “Em dizanin te di malê de pir êş kişandiye. Jixwe malbata te ji ber ku tu êşandine li hember te hê jî êşa wijdanî dikşînin. Em te fêm dikin lê tu êdî şoreşgerî. Pêwîste li gorî êşên ku te kişandine nêzî malbata xwe nebî û sar nêz nebî. Berovajî, pir germ nêz bibe.” Piştre bi hev re henekek pilan kirin.

Havînê li pişt darekê xwe veşart. Rewşen û Pelşîn jî bi hev re çûn gel malbata Havînê. Pelşînê ji malbatê re got: “Heval Havîn bixwe amade nebûye. Ji ber vê nehatiye. Ev heval fermandara wê ye. Şûna wê hatiye we bibîne. Her karek, her gotineke we ji bo Heval Havîn hebe, hûn dikarin ji vê re bêjin, ewê ji Havînê re ragihîne.”

Malbatê deng nekirin, hinekê xemgîn bûn lê bi rûyê xwe neanîn. Çavê wan her li derdor digeriya, dibê qey hîs dikirin Havîn hatiye û li wir e. Dayîk û bavî ji Rewşenê re gotin: “Ferqa we nîne keça min. Tu jî ji bo me her Havîn î.” Rewşen keniya û got: “Welehî ez dizanim niha hûn di dilê xwe de dibêjin çima Havîn nehatiye, ev şûna wê hatiye.” Dayîkê, Rewşen himêz kir û got: “Na keça min. Ferqa we û Havînê nîne.”

Hinekê bi hev re rûniştin, axivîn. Meraq û hesreta dayîk û bavê Havînê ji awirên çavên wan dixuya. Her çavên xwe li derdor digerandin. Piştre Pelşîn çû gazî Havînê kir. Havîn ji pişt darê derket û xuya kir. Dayîk çawa ji dûr ve Havîn dît rondik ketin çavên wê de. Bav jî bi dîtina wê re ji nişka ve wekî ku henase di sînga wî de tengav bibe bêhna wî çikiya, destên xwe danî ser dilê xwe û henaseyeke kûr kişand. Heval tirsiyan ku qeyrana dil wî bigire û tiştek bê serê wî, lê zû ser xwe ve hat. Bira jî bi çavên tijî hêsir li Havînê mêze dikir. Dema Havîn dîtin tev rabûn ser pêyan. Çavên wan bi hêsir jî be devê wan dikeniya. Havîn jî dema ew dîtin ber bi wan ve beziya. Demeke dirêj hevdû himêz kirin. Taybet dayîka Havînê demeke dirêj ew xist himêza

xwe, destên xwe di nav pora wê de gerand û bêhna wê kişand hinava xwe.

Çend demjimêran bi hev re rûniştin. Dayîk û bav pê re diaxivîn, dikeniyan û lê guhdar dikirin. Lê bira, demeke kurt şunde êşa wijdanî ya ku li hember xwuşka xwe dikişand nehişt ji wê zêdetir li beramberî wê birûne. Rabû ji wir dûr ket, çû li ser tehteke biçûk rûnişt û têr têr giriya. Ji şerma xwe nedikarî li rûyê Havînê binêre. Demekê pêwîstî dît ku bi tenê birûne. Hesreta careke din dîtina Havînê mîna agir dilê wî dikizirand, lê şermê jî ew bernedida, ji ber ku hindik êş bi Havînê nedabû kişandin. Niha jî wî bi êşa ku dikişand bedela pratîka xwe dida.

Heval çend caran çûn gel birayê wê, lê nekarîn dilê wî aram bikin û bînin nav civatê. Lewre Rewşenê ji dayîk û bav destûr xwest û ji Havînê re got: “Birayê te şerm dike bê vir. Were em bi hev re biçin gel wî. Li wir pê re biaxive.” Bi hev re rabûn çûn gel birayê wê. Havîn hinekî bi birayê xwe re axivî. Qirika wê jî tijî bû, ji ber ku bi her axaftinekê re êşa ku ji rûyê civakê kişandiye dihat bîra wê.

Rewşen ket navberê û ji bira re got: “Heval Havîn dixwaze bizane ku we bi rastî ji ew axaftinên ku ser wê belav bûne bawer kiriye yan na. Rastiya rewşê ji we re zelal bûye yan na. Yekane tişta ku Heval Havîn dixwaze bizane eve.” Bi pirsa Rewşenê re birayê Havînê serê xwe rakir, destê xwe danî ser milê Havînê, ew bi xwe ve şidand û got: “Ez dizanim Havînê wisa nekiriye. Ji exlaq û çanda Havînê bawer dikim. Hêvîdarim Havîn li min bibore û bizane ku pir pir jê hez dikim.”

Havînê bi van axaftinan re bêhneke kûr kişand û zerdekeneke şîrîn ket ser lêvên wê. Dilê wê rehet bibû. Tişta ku dixwest bihîstibû, êdî mîna çûkekê sivik bibû û dixwest bifire. Ji birayê xwe re got: “Temam, vê carê rabe em biçin gel dayîk û bavê xwe.” Destê hev girtin û bi tevî Rewşenê vegeriyan gel dayîk û bavê xwe. Bi vî awayî dilê hemûyan rehet bibû û dilê hevdû standibûn. A herî girîng jî ew bû ku malbatê lêborîna Havînê girtin. Bi vî awayî hevdû helal kirin.

Hemûyan ji ber tevlêbûna Havîn, Hebûn û Rêzan kêfxweşî û şanazbûna xwe anîn ziman. Ji bo destûra hevdîtinê spasî hevalan kirin, xatir ji wan xwestin û bi dileke rehet rabûn biçin. Di xatirxwestinê de dayîkê ji Rewşenê re got: “Rewşen keça min, ez Havînê emanetî we dikim. Wê biparêz in. Ez bi we hemûyan serbilind im. Haya we ji xwe û Havîna min hebe” û bi kêfxweşî vegeriyan mala xwe.

***Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!***

Havîn û Rewşen jî bi kêfxweşî û dileke rehet ber bi Besta Navîn ve bi rê ketin.

*****

**Li Taxima Hêzil**

**Gelê Mehrê**

Di tîmê de Şerda alîkara Ayselê bû. Aysel fermandara tîma YJA-Starê bû di Taxima Hêzilê de û alîkara Sîpan Urmiye bû. Piştî lêhûrbûna kampê zivistanakê li Kato Jîrkayê, bihara 2011´an li Taxima Hêzilê bi vî awayî hat erkdarkirin. Sema Koçer û Hêvarîn Efrîn endamên din ên vê tîmê bûn. Serê havînê vesaziya Hêvarîn û Sema ji bo Herêmên Parastinê Yên Medyayê çêbû. Her duyan jî xatir xwestin û bi merasîmekê hatin birêkirin. Ji ber valatiya ku di vê tîmê de çêbû Evîndar ji Şehrîbanê derbasî tîma Ayselê bû.

Taxima Hêzilê geh tev bi hev re, geh tîm bi tîm diçûn Kêla Memê; keşfa hedefên dijmin, naskirina erazî, têkiliya bi gel re û xebatên din heya payîzê bi berdewamî meşandin. Hemze dema serdana vê taximê kir ragihand ku, ger gelê koçberbûyîne Bestayê bixwazin vegerin ser axa xwe divê alîkarî ji wan re were dayîn û zêdetir bên vexwendin û teşwîqkirin.

Di demjimêr 8:00´an de Evîndar û Şerda ji keşfa siharê vegeriyan noqtê û encamên keşfa xwe ji fermandariya xwe re ragihandin. Di keşfê de tiştek nînbû. Piştî keşfê îcar zêrevan derketin û parastina ewlekariyê girtin ser xwe.

Wext nîvro bû. Evîn bi tîma Ayselê re runiştibû û diaxivîn. Fikret bilez ji cihê zêrevaniyê daket û ji Evînê re got; “du jin bang dikin û fîtik lê didin, xuyaye li me digerin!” Evîn û Aysel beziyan cihê zêrevaniyê. Sîpanî jî xwe gihande wan.

Dayîk û keç di vê kelegerma havînê de hingî li hevalan geriyabûn, ji xwêhdanê şil bibûn û rûyê wan bi tava bisoj sor bibû. Dema li beramberê xwe heval dîtin ji kêfxweşiyan hev mabû dilê wan raweste. Dayîkê desteke xwe danî sînga xwe, bi destê din darê girt. Du rondikên hûr ji çavên wê hatin xwarê û got; “Wey delalên min! Werin ba min, ev çend rojin em li her derê li we digerin...”

Heval ji dayîkê pir bandor bûn, destê wê maç kirin û bi germî ew û keça wê hembêz kirin. Şaşalên wan tijî av bûn. Av dane wan ji bo ku li rûyê xwe bikin û vexwin da ku hênik bibin. Piştre çay û xwarin jî ji wan re anîn.

Malbat ji Aşuriyên Bestayê bûn. Salên dirêj bûn ji ber zilma zordariyên dijmin mîna hemû gundiyên gundên din, wan jî gundê xwe terikandibûn û koçberî bajarên Tirkan û Ewropayê bibûn. Niha jî dixwestin careke din li axa xwe ya bibereket û pîroz vegerin û Mêhrê ji nû de ava bikin. Ji bo ewlekariya xwe pêwistiya wan bi hevalan hebû. Hatibûn agahî bidin gerîla da ku wan biparêzin. Dayîkê ji hevalan re got; “me wek Aşûr, Kurd û Ermen dîrokek bi hev re jiyan kir, di navbera me de qet pirsgirêkek derneket, lê dijminî ol weke şûrekê girt destê xwe û em pê qet qetî kirin. Hin Koçer(Kurd) bi xweşbînî nêzî vegera me ya gund nebûn. Heval, hûn bi wan re baxivin, bila ji niha ve di navbera me de pirsgirêk dernekevin. Em, Kurd û Ermen tev xwîşk û bira ne...” Dayîkê hingî jidil diaxivî, ne gengaz bû ku heval jê bandor nebin û xwe weke zarokên wê, wê jî weke dayîka xwe nebînin. Herî zede jî Şerda yê. Piştî heval pê hesiyan ku ev malbat çend rojin bi awayê 2-3 komên cuda li erazî, hem jî li vê eraziya fireh belavbûne û li wan digerin hê zêdetir bandor bûn.

Dawiyê, dayîkê ew vexwendin gundê xwe û xatir xwestin çûn. Heval jî vegeriyan noqtê û tekmîl dan hevalên din.

Çend roj şûnde Evîn, Şerda, Heqî Efrîn û Fîkret Kawişta serdana gundê Mêhrê kirin. Di serdanê de bi pêşwaziyeke pir germ ya gelê wir re rûbibû hatin. Yên ku vegeriyabûn gund tenê malbatek bû, yanî hemû zarok û neviyên yek malbatê bûn.

Dayîk û keça ku li Hêzilê dîtibûn ji dûr ve hemêz ji hevalan re vekirin û ber bi wan ve beziyan. Hevalan heman tişt kirin. Evîn û Heqî gerîlayên kevin bûn û gellek caran tiştên wiha dîtibûn. Lê belê Şerda û Fîkret gerîlayên ciwan ên salekê bûn û her çiqas bixwe jî li mala xwe gellek caran pêşwaziya gerîlayan kiribin jî, lê vê carê ew bixwe gerîla bûn û diçûn serdana gelê xwe. Ji vê pêşwaziyê gellek bandor bûn. Çavên wan dibiriqîn.

Malbatê heval birin hundirê odeya ku nû çêkiribûn. Xuyabû nû dest bi ji nû de avakirina xirabeyên gundê xwe kirine. Heya derengiya şevê çîrok û serpêhatiyên koçberî, komkujî û êşên ku li dûr welatî jiyankirine ji hevalan re gotin, qalê kirin. Geh bi çavên tijî hêsir û xemgîn, geh bi kenên dengê bilind vegotin û vegotin. Carna jî kêfxweşiya vegera gundê xwe û diayên xêrê gotinên wan xemilandin. Navê PKK´ê û Rêber Apo ji ser zimanê wan kêm nebû. Dayîk û malbatê

bi gotina “bi saya Rêber Apo nebûya emê niha ne li vir bûna. Bê PKK ev welat hîç e.” lûtkeya girêdan û welatparêziya xwe nişan didan.

Welatparêziya Aşûriyên Kurdistanê, bi taybet yên herêma Botanê di nav gerîla de dihat zanîn. Li beramber van vegotinên welatperwerane yên vê malbatê Evînê jî qala bûyereke wiha ji wan re kir: “Payîza 2009´an Ferzende Heleb, Arjîn Dersîm, Bahoz Bandoz û Gizîng li Kato Jîrkayê serdana gundê Geznaxê kiribûn çûbûn maleke Aşûrî. Malbata Aşûrî wêneyeke Hz. Îsa û Rêber Apo li kêleka hev bi dîwar ve kiribûn. Li kêleka Hz. Îsa wêneyeke Hz. Meryem, li kêleka Rêber Apo jî wêneyeke Dayîka Ûweyşê bicih kiribûn. Li malê tenê dayîkeke pîr, kur û bûka wê hebûn. Zarok tev li Ewropa bûn. Ciwan di encama koçberiyê de bi zehmetî be jî hinek fêrî jiyana nû bibûn, lê pîr û kalan bê hewayê gundê xwe nekarîbûn jiyan bikin. Wê dayîk û bavî berê xwe dan wêneyên ser dîwar û ji hevalan re gotin; “di dîrokê de ji bona rizgariya gelan ji bilî Hz. Îsa û Serokatî kes derneketiye û wê dernekeve jî.” Piştre, dayîk di navbera Arjîn û Gizîng de rûniştibû, destên wan girtibû nav destên xwe û ji wan re gotibû; “bê Serok Apo di Kurdistanê de ji bo tu kesê jiyan nîne, hele ji bo jinê qet nîne.”

Vê bûyerê di Botanê de deng vedabû û hemû gerîla jê pir bandor bibûn. Dema Evînê ev mînak ji malbata Mêhrê re vegot, ne tenê hevalên ciwan yên pê re bûn, ew malbat bixwe jî gellek bandor bû. Bi vê bandorê her wiha serfiraziya welatparêziya gelê xwe yê Aşûrî careke din jiyan kirin.

Derengiya şevê guftogoyên pêwist qediyan, heval rabûn da ku biçin. Lê beriya ku ji gund veqetin xwestin serdanekê Dêra Xirabe ya gund bikin. Dêr ji derva de hinek xera bibû, lê di hundir de xisareke zede nedîtibû, ji ber ku di ciheke asê û veşartî de mîna kelheyekê hatibû avakirin. Hezaran Aşûriyan tê de îbadet kiribûn. Li gor baweriya wê malbatê giyanê Hz. Îsa û wan îbadetan Dêr ji xirabûnê parastine. Malbatê piştî ku bi hevalan re serdana dêrê kirin bi heman germahiyê ew birêkirin û vegeriyan nav mala xwe. Hevlan jî berê xwe dan cihê xwe.

Wê şevê tevî ew qas westandina wê rêya dûr jî xew neket çavên Şerdayê. Her li vegotin, diayên xêrê û girêdayîna Aşûriyan a bi Rêber Apo re fikirî û di dilê xwe de sonda tolhildana ji dijminên dagirker dubare kir.

**Tevlêbûna Şervaneke Nû**

Yek ji erkên Taxima Hêzilê jî, mîna hemû hêzên din tevlêkirina şervanên nû bû. Payîzê ji koçerên Sorî keçeke ciwan a bi navê Axîn tevlê bibû. Hevalên Taxima Hêzilê ew anîbûn gel xwe. Heta ji bo ku perwerdeya şervanên nû bibîne derbasî Bestaya Navîn bibe wê li gel tîma Ayselê bimaya.

Taximê pêşwaziyeke germ li Axînê kir. Şerda ji herkesê bicoştir û bitevgertir bû. Ji kêfa tevlêbûna şervana nû nedizanî çi bike. Fîkret hat ku dîsa bela xwe li Şerdayê bide, got; “roj roja te ye hevala Şerda. Eger ev şervan hevaleke xort bûya ezê pê re mijûl bibûma, lê hevaleke jin e, ji lewra fîtefîta te ye.” Şerdayê qehqeheyek avêt û got; “Xwezî piştî dîtina dewreya şervanên nû vesaziya wê ji bo tîma me çêbibûya.”

Fîkret; “Bila nece, li vir em perwerdeyê bidinê. Ezê bi tena serê xwe hemû perwerdeyên şervanên nû bidimê, qet ji te alîkarî jî naxwazim.” û çavên xwe ji Şerdayê vedizîn, hewl da kena xwe veşêre.

Şerdayê jî kena xwe veşart bi dengeke ciddî: “Heval Fîkret, ezê dersa yekemin li ser hişmendiya zilam bidime heval Axîn. Dema hêza min ya teorîk têrê nekir û pêwistiya min bi şênberkirinê hebe jî ezê mînaka te bidim. Dibe?”

Çavên Fîkret vebûn. Li bendê nebû ku Şerda bersîveke wiha bidetê. Heqî nekarî kenê xwe bitepisîne, berê xwe da Fîkret û bi dengê ku ji ber kenê dilerizî jê re got: “Şah û mat!”

Îcar Şerda jî tevlê kena wî bû. Ev şahkêşandin û yekser matkirina Şerdayê hinek li zora Fîkret çûbe jî qet tiştan bi dil nedigirt, zû aram dibû û bi reqîb re dikeniya. Di encamê de îcar ew jî tevlê kena Şerda û Heqî bû.

Rojek piştî tevlêbûna Axînê malbata wê li pey ketin. Malbat ji welatparêzên kevin ên PKK´î bû û şerm dikirin qala, ango daxwaza vegera wê ji bo malê bikin. Hinek bi keça xwe Axînê û hevalan re rûniştin. Piştre tevlêbûna wê û navê li xwe kiriye pîroz kirin, hinek diyariyan jê re hiştin, xatir xwestin û çûn.

Roja piştî wê du rênasan ji Hêzilê Axîn birin Bestaya Navîn û radestî rêvebiriya şervanên nû kirin. Êdî Axîn li Hêzilê nebû. Lê xizmeke wê (zavayê wan bû) aram nedibû û ji bo dîtina wê her dihat gel hêza Hêzilê. Hevalên li wir pir hewldan ku pê bidin fêmkirin, Axîn êdî di perwerdeyê de ye û heya perwerde neqede nikarin wê bibînin. Lê belê wî bawer nedikir. Digot; “çawa dibe ev qas zû çûbe perwerdeyê. Teqez

li van dera ye, heval nahêlin ez bibînim.” Dibê qey cara yekê ye ji nav koçeran û Soriyan keçek tevlê dibe! Ji bo dîtina Axînê pir israr dikir. Di dawiyê de heval ji niyeta wî ketin gumanê û jê re gotin: “Malbata heval Axîn deng nekirin, tu çima evqasî li pey dikevî?”

Ji Fîkret re firsend çêbibû. Çû ba Şerdayê, got: “Mînaka şênber li ser hişmendiya zavayê Axînê bide, ne li ser min. Biçe şah û matê li wî bike.”

Ayselê dengê Fîkret bihîst. Çû gel wan. Keniya û ji Şerdayê re got: “Bi xwedê tu ketî ser zimanê heval Fîkret, êdî zehmete belaya xwe ji te veke.”

Şerda ji helwesta zavayê Axîn pir hêrs bibû. Jê re got: “Di ciwantiya xwe de tu tevlê nebûyî, te karek ji bo welat nekiriye, tu çûyî zewiciyî û bi jiyana xwe ve mijûl bûyî. Niha jî ciwanên we tevlê dibin, lê tu dixwazî pêşiya wan jî bigirî. Eger te şoreş bikira û Kurdistan rizgar kiriba heval Axîn niha tevlê nedibû.”

Herkes ji van axaftinên Şerdayê matmayî bibû, ji ber ku Şerda her tim pir aram, rûbiken û kêfxweşe, hêza axaftineke wiha jê nedihat payîn. Fîkretî bi dengeke nizim ji Heqî re got: “Heval Şerda li ser satrancê pir serwer bûye. Van rojan hema şah dikişîne û mat dike.” û keniya.

Zava piştî van gotinan fêmkir ku di şaşitiyekê de ye. Rabû ser xwe, xatir xwest û çû. Fîkret ji Şerdayê re got: “Îcar ji zavayê heval Axîn re şah û mat!” Herkes bi helwesta Şerdayê pir kêfxweş bibû.

**Xizmantiya Bi Darê Zorê**

Dema Fîkret diaxivî pîçekê serê zimanê wî digirt. Dema bi aramî axaftibûya zimangirtina wî pir diyar nedibû. Lê belê dema bi kelecan, bi lez û bi ken axivîbûya hinek xuya dikir.

Gundê wî ´Xawişta´, gundê Ayselê ´Xumarê´ li binarê Kato Xelîla cîran û pir nêzî hev bûn. Ji Ayselê pir hez dikir û rêz didayê. Ji ber ku gundên wan jî nêzî hev bûn hîn zêdetir xwe nêzî Ayselê didît. A rast, wî Aysel nêzî xwe didît û jê re “xwarzî” digot. Dema Aysel tevlê partiye bûye Fîkret hê zarokeke 9-10 salî bûye. Lê dibê qey ew ji Ayselê mezintir e xwe weke xalê wê, wê jî wek xwarziya xwe dibîne.

Taxim li dora koma ku ji Dersimê hatibû û rêwiyên Başûr bûn rûniştibûn. Ev çend roj bûn ew kom li gel vê taximê vedihesiyan û

westanbûna rê ji ser xwe davêtin. Wê êvarê êdî xwe ji bo rêyeke dirêj amade dikirin. Heval ji keşfa erazî ya êvarê vegeriyabana ew kom wê rabûya û derketibûya rê, eger encamên keşfê erênîbûna!

Fîkretî çay anî, bardaxan dagirt û danî pêşiya hevalan. Ayselê bi dengeke nizim di guhê Evîndarê de got: “Înşalah heval Fîkret niha dîsa ji min re nebêje ´xwarzî´ û di nav hevalan de min nehetikîne.” Çawa gotina Ayselê qediya, Fîkret bardaxek di dest de berê xwe da wê û bi dengeke asayî got: “Ev çay jî ji bo xwarziya min!”

Ji koma Dersimê Yilmaz got: “Ya heval Fîkret, xwarziya te kîjan hevale tu evqas qal dikî?”

Fîkret bi qehqaheyeke bilind: “Vaye ev e. Heval Aysel e.“

Yilmaz: “Xwarziya te ji te mezintir e, ji te kevintir e jî. Barî xwe bike xwarziya wê.” Hinek rawestiya, piştre pirs kir: “Birastî hûn çiyê hev in?”

Aysel: “Em tişteke hev nînin. Em ji du eşîrên cuda ne.”

Şerda: “Heval Fîkret bi zorê xizman ji xwe re çêdike. Mirovên wî di nav me de nîn in. Pir jî hez dike ku xwîşka wî tevlê bibe, lê tevlê nabe. Ew jî hestên xwe wisa tîne ziman.”

Ronya (ji koma Dersîmê): “Yanê bi darê zorê Aysel kiriye xwarziya xwe?” û keniya.

Evîndar (bi keneke bilind): “Li her derê yên mezin dibin xalanê yên biçûk û barê xizmantiyê digirin ser xwe, lê ev kevneşopî li gel heval Fîkret berovajiye. Ji dilnizmiya zêde barê giran yê xizmantiyê ragirtiye ser milên xwe, tevî ku bi xwe ji Ayselê biçûktir e jî.”

Fikret ji vê gotina “barê giran yê xizmantiyê” hêz girt, ket kelecanê. Bi vê kelecanê dîsa zimanê wî girt. Berê xwe da Ayselê û got: “Te dît ez bareke çiqas giran radikim, hê jî qayil nînî. Weleh tuyê xaleke wek min dilnizim ku evqas li te bifikire nebînî.”

Bi vê gotina Fikret dengê kena hemû hevalan, gerîlayên wê derê bilind bû.

Yilmaz ji Ayselê re got: “Wele bi darê zorê be jî tu kiriyî xwarziya xwe, êdî dest ji te bernade. Lê xizmantiyeke wisa xizmantiyeke xweşik û sade ye. Xwezî di vê Kurdistanê de xizmantya herkesê wek ya heval Fikret bûya. Bêguman piştî van axaftinan heval Fikret êdî wê qet bela xwe ji te veneke.”

Keşifçî vegeriyan, tekmîla keşfê dan: “Erazî paqije, tişteke awarte nîne.”

Taxim ketin rêzê û bi merasîmekê koma Dersimê ber bi Başûr ve birêkirin.

**Kombûna Taxima Besta Navîn**

Taxima Besta Navîn bi xebatên keşf û parastina erazî ji ketina dijmin, nûkirina stargehên berê yên xweparastinê, pêşwazîkirina li komên rêwî ku ji Bakur derbasî Herêmên Parastina Medyayê dibûn ango ji wir dihatin Bakur û pêkanîna pêwîstiyên wan ên rê, ewlekariya rêwiyan, rênastî û anînbirina komên rêwî di navbera alanên Şehrîbanê heya Hêzil û Kato Jîrkayê de, amadekirina erzaq û pêwîstiyên din ên jiyanî û hwd. re mijûl bû.

Tîma YJA-STAR´ê ji Rojbîn, Silav, Sorxwîn, Havîn û Şîlan Amed pêk dihat. Havîn demekê şûnde derbasî taxima Şehrîbanê bû. Şîlan jî havînê ji Herêmên Parastina Medyayê hat ket vê taximê. Rojbîn biharê ji Kato Jîrkayê derbasî wir bibû û li ser vê tîmê hatibû erkdarkirin.

Tîmên hevalên xort jî ji Gezgor, Reşo, Cahîd, Beşîr Mêrdîn, Amed Amed, Welat Efrîn, Rojvan û çend şervanên nû ku dem dem diguherîn pêk dihat. Rojvan heyva tîrmehê û Simko payîzê piştî ku perwerdeya şervantiya nû qedandin derbasî vê taximê bûn. Egîd Goyî ser vê taximê radiwestiya. Welat ser xebatên dirunkariyê radiwestiya û cil û bergên hevalan didûrî. Lewre nedikarî tevlî jiyan û xebatên taximê bibe. Reşo ji ber xebatên rênastiyê kêm caran di nav taximê de dima.

Ji bilî vê taximê ku girêdayî herêma Bestayê bû, di alana Besta Navîn de cihê perwerdeya seretayî ya şervanên nû jî hebû. Taximê di warê ewlekarî û lojîstîkî de pêdiviyên wan jî pêk dianîn û tevlî şahî û merasimên qedandina dewreyên wan dibûn.

*****

**Hirç Û Berazên Bestayê**

Carekê agahî hat ku erzaq hatiye û ji bo rakirina wan hejmareke zêde heval pêwîstin. Çend şervanên ku nû perwerdeya seretayî qedandibûn li taximê bûn. Hevalên din ev heval li ba koma rêwî ku du şev bû li ba wan bûn hiştin û çûn erzaqê hatiye bikşînin alanê. Êvarê bi tarîbûna hewayê re rêketin. Çend şev ser hev bi hêstir û pişta xwe erzaq kişandin. Bi roj vedihesiyan, bi şev dîsa dest bi kişandina erzaqê dikirin.

Besta bi roj dibê qey erd û ezmanê wê dikele. Bi şev hêniktire, lê ne zêde, ji ber ku tav ji seherê heya êvarê lê dixe û hemû ax û kevirên wê disîncirîne, lewre êvarê jî hinekî germe. Dîsa jî şev ji roj hêniktire, lê

mixabin pêşû di nav xebatên xwe de ne û aman nadin mirov. Hevalên alanê bi vê rewşê re aheng çêkiribûn, fêrî hewa û xwezaya wir bibûn û jê ‘aciz nedibûn. Bi roj di bin siya daran de hewl didan bêhna xwe bistînin. Tav dizîvirî û siya daran cihê xwe diguhert. Bi vê re heval jî radibûn li gorî tav û siya erdê xwe eyar dikirin.

Piştî westandin, ked û fedakariyeke zêde erzaq tev hatin kişandin û li çend deverên cuda di bin erdê de hatin veşartin. Li hember her eger û îhtîmalekê hevalan ti carê tevahî erzaq li yek cihî venedişartin. Tecrûbe di vê mijarê de pir bûn. Eger cihek ji dijmin re eşkere bibûya û biketa destê dijmin, qet nebe bila hemû erzaq neketa dest. Lewre çi tedbîr pêwîst bûya digirtin.

Lê yê ku li erzaq û tiştên hevalan digeriya tenê dijmin nebû; hirç û berazan qet aman nedidan erzaqê hevalan. Lewre heval bi qasî dijmin diviya li hember hirç û berazan jî tedbîrên xwe bigirin. Beraz diçûn cihê erzaq û tiştan vedidan. Eger erzaq derketa ya ku dixwarin jixwe dixwarin, ya nexwaribana jî hemû tevlî hev dikirin û diçûn. Eger cil, firax û pêwîstiyên din ên jiyanî jî jê derketibana hemû li eraziyê belav dikirin û diçûn.

Hirç ji beraza baştir nebûn. Ew jî diketin ser erzaqan û hemû dixwarin. Jixwe hirç pir zêde xwarinê dixwin, bi yek carî dikarin maşîneyek erzaqê biqedînin. Eger hirçek tenê be belkî piçekê di bin de bihêle û nekaribe hemûyê biqedîne, lê eger hejmar ji yekê zêdetir be ew jî namîne. Hirçan erzaqê hevalan torbe torbe dibirin derdor, li wir dixwarin û torbeyên valakirî jî dihiştin diçûn. Bi vî awayî rengên derveyî xwezayê di erazî de zêde çêdibûn û ev, ji bo ewlekariya alanê baş nebû. Jixwe ji ber xesarên ku hirç û beraz didin hevalan, ji kevin de dijminî kuştina wan ji bo gundiyan qedexe kiriye.

Wê salê hevalan ji ber hirç û berazan cihên veşartina erzaqên xwe hemû bi betonê çêkirin, wisa erzaq xistin nav de. Erzaqê ku wan çend rojên dawî kişandin jî xistin nav wan cihên bi beton. Dilê wan rehet bû ku vê carê ji derdê beraz û hirçan xelas dibin. Erzaqên xwe xistin nav de, qamuflaja pêwîst kirin û hiştin.

Çend roj şûnde Gezgor û Cahîd hin erzaqên din anîn û xwestin bibine yek ji wan cihên ku berê erzaq xistinê. Dema çûn wir dîtin ku çend qalib beton li derdora cihê erzaqê ne. Hirçê qalib qalib ew beton şkênandibû û xwe gihandibû erzaqan. Bi dîtina wê dîmenê re fêm kirin ku îşê hirçan e. Gezgor bi dîtina vê dîmenê re mat ma û di cihê xwe de

hişk bû. Cahîd tepek li eniya xwe da û got: “Ya Star! Ev beton çawa rakirine? Emê hê çi bikin ji bo ji wan xelas bibin!”

Jixwe ji ber germaya dijwar di xwêdanê de şil bibûn û bi bar ve têra xwe westiyabûn, dema ev dîmen dîtin tam ji hal ketin. Gezgor ser her du çokên xwe de rûnişt. Her du pir ‘aciz bibûn û ji qehra re nedizanîn çi bikin. Ewqas ked, westandin û metirsiyên ewlekariyê didan ber çav heya hinekê erzaq dianîn, lê hirç û berazan xwe pê têr dikirin.

Torbeyên vala ku li derdor belav bibûn kom kirin û ser erzaqê ku li erdê hatibûn rijandin û belav kirin ax reşandin ji bo ku xuya nekin. Barê ku anîbûn careke din rakirin birin û çûn noqtê. Li wir rewş ji hevalên dî re ragihandin û li çareseriyekê geriyan. Fikreke hevbeş derket. Ew jî dê çiqas encam bigirta diyar nebû bêguman.

Roja dî Cahîd û Amed çûn teybek birin nav cihê erzaqê. Çend pîlên mezin pêve girêdan ji bo ku têra çend rojan bike. Teyb di hundir de bi dengeke nizim pêxistin û derketin. Deng tenê bi qasî ku ji ber derî ve pir nizim bê bihîstin hatibû bilindkirin. Lewre dema hirç û beraz bihatana wê ji ber derî ve dengê teybê bibihîstana, fêm bikirana ku mirov di hundir de hene û neketana hundir û ji wir biçûna. Gezgor û Cahîd bi vî awayî karê xwe qedandin û bi xeyaleke rehet vegeriyan noqta xwe. Lê wê her çend rojan carekê bihatana pîlên teybê biguhertana û pîlên nû pêve girê dabana.

Rojbîn û Silavê jî cileke gerîla yê kevin û qetiyayî ku êdî bi kêrî lixwekirinê nedihat bi xwe re birin û çûn ciheke din. Li wir bi awayeke ku ji dûrve weke mirovekê xûya bike cil bi dareke ber deriyê cihê erzaqê ve kirin û bi dileke rehet çûn.

Her çend rojan carekê heval çûn pîlên teybê guhertin û dîtin rewş erêniye. Lê belê şopên hirçê li wir dîtin. Xuya bû ku hirç hatiye ber cihê erzaqê, li wir dengê teybê bihîstiye û gotiye qey hin kes tê de hene, lewre ziviriye. Çend caran bi vî awayî heval bi kêfxweşiya ku ev taktîk ji bo xapandina hirç û berazan encam digire ji wir vegeriyan noqtê.

Demek şûnde dîsa Gezgor û Cahîd çûn pîlan biguherînin. Ji dûr ve torbeyên spî û zer û karton û naylonên rengareng ên li eraziyê belavbûyî dîtin. Dema nêz bûn û ketin hundir tenê teyba şkestî li erdê dîtin. Ji erzaqê heyî qet tiştek nemabû. Bi qehr û ‘acizî tiştên li eraziyê belavbûyî kom kirin û vegeriyan noqtê. Agahî dan hevalên din.

Gezgor got: “Erzaqê ku em dikşînin tevahî Botanê têr dike, lê hirç tiştekê di destên me de nahêlin. Em evqas diwestin ji bo ku hirç û berazan têr bikin. Em çaryekê wan ji erzaqa xwe naxwin.”

Cahîd jî got: “Xuyaye hirç pir hatine û çûne. Her cara ku hatine deng bihîstine û zivirîne. Vê carê pê hesiyane ku deng her tim heman denge û naguhere. Fêmkirine xapandinek li holê heye. Ji ber vê ‘aciz bûne û yên nexwarine jî tev rijandine û tevlîhev kirine, ax jî xistine nav de ji bo ku em nekaribin bi kar bînin.”

Rojvan ku keda hevalan didît û didît ku ew, roj û şev ranawestin û wek muriyan her di nav kar û xebatên pratîkî de ne bi vê bûyerê pir êşiya û got: “Heval, eger hûn destûr bidin ez dikarim biçim erzaqê mayî kom bikim. Ezê tev bineqînim, ji hev cuda kim û paqij bikim.” Gezgor destên xwe danî ser milê wî û jê re got: “Ne îşê neqandin û paqijkirinêye, naxwe me yê bixwe ji hev cuda bikirana.”

Roja din Gezgor û Cahîd dema ji peywireke din dizîvirîn li cihekê cilek bi darekê ve daleqandî dîtin. Wate nedanê ku ew cil çima li wir wisa xweşik hatiye daleqandin, ji ber ku dizanîbûn tu kesê li van deran cil nedaniye.

Rasterast berê xwe dan cihê erzaqê ku hevalan li ber wê cil bi darekê ve kiribûn. Li wir jî heman serpêhatiya erzaqê roja berê dîtin. Hirçan piçek erzaq nehiştibûn. Li wir jî ji şopên derdor xuya bû ku hirç çend caran heya nêzî wir hatine, lê dema dîtine ku mirovek li wir rawestiyaye paşde çûne. Çend caran her ev rewş dubare bûye; hatine û mirovek li wir dîtine. Piştre fêmkirine ku ew xapandineke. Ji qehra re çûne hemû erzaq xwarine, torbe li eraziyê belav kirine û cil jî birine li tepeya beramber bi ser darekê ve daleqandine û çûne.

Li aliyekê heval pir ‘aciz bibûn û ji qehra re dikir biteqin, li aliyê din jî bi halê xwe dikeniyan ku bi destên ajalan ketine çi rewşê! Gezgor got: “Min pir bihîstiye ku heval li ber deriyê cihê erzaqan dehfik ji bo hirçan çandine, lê hirç çûye dehfik rakiriye û biriye li ser rêya hevalan danîye. Lê bi rastî heya min ev rewş bi çavên xwe nedît, min ewqas ji zeka û hişê hirçan bawer nedikir.”

Cahîd jî got: “Li Zagros û Heftenînê jî hirçan tim wisa li me dikirin.” Piştre Gezgor got: “Eger rojekê hirçan ez jî birim û xwarin qet mat nemîne!”

Ji ber ku qehr û aciziyê fayde nedikir bi henekan hewl didan dilê xwe hinekê aram bikin.

**Dewreyên Şervanên Nû Yên Sala 2011´an**

**Ked Azadiye**

Gezgor dîsa erzaq ji şervanên nû re anî. Evîn û Xelat jî ji sibehê ve hatibûn wir. Gezgor erzaq danî, hêstir bir li ciheke dûrî noqtê girê da û vegeriya. Hinekî bi şervanan re rûnişt, rewşa wan pirs kir û bi wan re guftûgo kir.

Gezgor pir nediaxivî, zêdetir guhdar dikir. Ev bêdengiya zêde taybetmendiya wî bû, yan hin êş di dilê wî de hebûn, şervanên nû vê yekê nedizanîn. Lê ev diyar bû ku awirên wî pir kûrin û pir li dûr dinêrin. Awirên Gezgor tijî girêdayîbûna bi armancê ve, hezkirina jiyanê, hezkirina hevaltiyê û hevalên xwe bû. Ji eniya wî ked dibarî. Şervan wî nas nekin jî ev awir û enî li ber çavên wan tablo bû.

Gezgor piştî hinek rûniştina bi hevalan re ji Xelat re got ku dixwaze hinekê bi hev re biaxivin. Xelat got “başe”, bi hev re ji bo guftûgokirinê xwe dan aliyekê û di bin siya darekê de rûniştin. Gezgor êşên wijdanî yên ji ber kêmasiyên pratîka zivistana derbasbûyî dikşîne û hewlên xwe yên ji bo layîqbûna ji Rêber û partiya xwe re anî ziman û got ku hê di bin bandora zivistanê de ye, lewre êşên wijdanî wî bernadin, bi kedê ve girêdayiye û kedê weke rêbaza xwe gihandina rûmet û telafîkirinê dibîne.

Xelat ji axaftinên Gezgor pir bandor bû, li bendê nebû ku Gezgor hê evqas di bin bandora zivistanê de be tevî ku kêmasiyeke cîdî jî rû nedaye. Lewre xwest zêdetir prespektîf bidetê ji bo ku vê êşa wijdanî derbas bike û jê re got: “Em hemû, her yek bi awayekê ketine nav kêmasiyan li hember rêxistinê. Lê piştî rexnedayînê me derbas kir. Te jî rexnedayîneke pir ji dil daye partiyê. Êdî ne hewceye evqas xwe di bin de biperçiqînî û di bin de bimînî. Keda ku tu didî kê ji me dide? Nepêwîste ji bo rehetkirina wijdana xwe evqas zordariyê li bedena xwe bikî û xwe ji asta pêwîst zêdetir biwestînî. Tu di mijara kedê de nû xwe ji partiyê re îsbat nakî! Jixwe tu bi ked û fedakariya xwe tê naskirin.”

Xuya bû ku Gezgor hinekê rehet bibû bi van axaftinan. Piştî vê guftûgoyê hineke din rûnişt û rabû biçe. Dema xatirxwestinê Berbang ku qet haya wê ji naveroka guftûgoya navbera Gezgor û Xelat tinebû jê re got: “Erzaqê me hemû maye ser taxima we, taybet jî maye ser te. Em lêborînê dixwazin, hûn pir bi me ve diwestin. Hevalên rêveberiya

we bihiştana me yê bixwe bikêşanda, lê nahêlin.” Gezgor wiha bersiv da: “Ma qey ji kedê birûmettir tiştek heye? Ma ne Rêber Apo di Parêznameyan de dibêje ‘*ked azadiye.*’ Ev gotin ji bo min pîroz û rêgeze! Ked rûmeta mirovahiyê ye! Ez bi kedê nawestim heval.”

Piştre çû hêstir vekir, hefsarê wê xist destê xwe û li pêşiya hêstirê meşiya. Ev çend demjimêr bû ku hêstirê li wir bêhna xwe dabû, lê dîsa jî Gezgor lê siwar nebû. Berbang pirs kir: “Tu siwarê hêstirê nabî?” Gezgor bersiv da: “Ew jî cane. Hêstirên me pir diwestin. Em pir erzaqan bi wan dikşînin. Ji bo ku vehesin dema bar nebe jî em lê siwar nabin.”

**Yekemîn Serdana Heval Hemze**

Hemze ku nû hatibû Bestayê, hemû alanên herêma xwe digeriya û serdana hevalan dikir. Di serdanên xwe de bi tevî Gezgor çû ba şervanên nû jî. Yilmaz, Berbang û Gîvara ku rêveberiya şervanên nû bûn, pêşwaziya wan kirin. Yilmaz hevaleke kevin bû, sala 1996-97´an li Şamê li Qada Rêber Apo mabû. Temenê wî hinekê zêde bû û derdora pêncî salî hebû. Lê wekî ciwaneke bîst salî bi coş û kelecan bû. Ev coş û kelecana xwe di xêrhatin û pêşwaziya hevalên ku ji derve dihatin de her tim nîşan dida. Dema Hemze jî çû serdana wan heman germahî û coş nîşan da û pêşwaziyeke germ lê kir.

Hemze li wir jî bi pêşwaziyeke germ a hevalan re rûbirû hat. Bi rêveberiya wir re rûniştin, qala bîranînên xwe û rewşa Botanê kirin. Hemze xebatên wir û asta perwerdeya şervanan pirs dikir, hevalên wir jî jê re radigihandin. Di navberekê de Berbang ji Hemze pirs kir: “Heval Hemze, ez hatim bîra te?”

Hevalê Hemze keniya û bersiv da: “Çawa nayê bîra min. Ez te nas nekim, kê nas bikim?”

Berbang: “Sala 2001'ê li Xinêrê, li Dibistana Kadro em bi hev re bûn. Tu ser taximeke me bûyî. Hingê ez nû û ciwan bûm. Piştre me hevdû nedît heya konferansa Botanê ya 2009'ê, li Heftenînê. Li wir jî min got belkî tu min nas nekî, lewre pir neaxivîm.”

Heval Hemze: “Li wir jî çawa min tu dîtî yekser min tu nas kirî. Wê demê pir qelebalix bû û em pir mijûl bûn. Ji ber vê min jî derfet nedît hinekê bi te re biaxivim. Naxwe min tu nas kirî.” Hinekê bêdeng ma, piştre berdewam kir û got: “Ma nayê bîra te dema hûn li Xanturê, di koma Cudî de bûn jî ez hatim ba we? Wê demê we amadekariyên xwe dikirin ji bo hatina Bakur.”

Berbang: “Raste. Hîngê jî ez hatim ba te, lê dîsa min got belkî nayêm bîra te. Ji ber vê min deng nekir.”

Hevalê Hemze: “Tu qet neguheriyî. Mezin bûyî lê rûyê te weke xwe ye. Ji ber vê, yên wê demê tu dîtine eger niha te bibînin wê yekser te nas bikin. Min her tim tu şopandî. Min hemû hevalên wê demê dişopandin.” Piştre berê xwe da Yilmaz û şervanan û got: “Berbang 2001'ê nû tevlê bibû, bejna wê bihustek bû.”

Ev axaftina Hemze pir xweşiya şervanan çû û ew têr têr bi Berbangê dan kenandin.

Yilmaz û Berbangê jê pirs kirin ku gelo piştî ewqas salan dûrbûna ji Botanê, eraziya wir di bîra wî de maye? Heval Hemze got: “Bawer bikin her der di bîra min de ye. Bi baran û berfê hinek erazî guheriye, lê bandor nake, dîsa ji hev derdixim. Bi salan min bi hesreta van deran erdnîgariya Botanê tev di bîra xwe de hişt. Hin noqteyên nû hatine çêkirin û navê hin noqteyên berê jî hatine guhertin, ezê fêrî vana jî bibim. Lê hin noqte jî navê wan her navê dema me ye.”

Yilmaz: “Na ya! Kîjan noqteyên kevin hene ku navê berê li ser wan be?”

Hemze: “Nimûne, “Noqta Xezalê.” Ev noqte sala 1993'yan jî her Noqta Xezalê bû. Berê me li gorî bîranînekê nav li noqteyan dikir. Nimûne li cihekê me savar xwariba, me navê wir dikir Noqta Savarê, li cihekê me sêla nan bihişta, me navê wir dikir Noqta Sêlê, me doktorek bianiya noqteyekê, me navê wir dikir Noqta Doktor û hwd. Lê niha navê Şehîdan li noqteyan tê kirin. Bêguman ev baştire...”

Berbang: “Hûn dema hatin ji vê palê ve hatin. Çima we xwe li eraziyê da, li vê kêlekê rê hebû û nêztir jî bû ji noqta we ve.”

Hemze: “Ez rê dizanim. Lê min dixwest hinekê eraziyê bigerim û di serê xwe de nû bikim. Ji bo ku van joran jî bibînim ji wir ve hatim. Baş bû. Her der weke xwe ye. Ez li van deran fêrî gerîlatiyê bûm. Wê demê em ji Gabarê rê diketin heya Kato Marînosê dimeşiyan ji bo çalakiyekê, erzaq derxistinekê, karekê... Ji Mêrdînê heya Gabarê em dihatin. Ev, rêya me ya herî nêz bû. Hîngî li van deran geriyame her derê wê di bîra min de ye. Cihê ku bîranînên mirov lê hebin zû bi zû ji bîra mirov naçin...”

Hemze piştre li wir jî rewşa Herêmên Parastina Medyayê û rojevên rêxistinê ku di cîhazê de nikarin bişopînin ji rêveberiya wir re ragihand û ew di mijarên siyasî yên dawiyê de agahdar kirin.

Hemze û Gezgor hineke dî bi hevalên wir re rûniştin. Piştre Hemze got: “Ez vê carê tenê ji bo dîtina we hatim. Ezê hê pir bêm û emê demdirêj guftûgoyan bikin. Niha em rabin biçin.” Û rabûn xatir xwestin çûn.

*****

**Sivorî**

Dewreyeke şervanên nû bi dawî bibû, wê merasîm û şahiya dawiya dewreyê bihata lidarxistin. Sibehê Berbangê di bin darekê de sîvoriyeke biçûk ku nû ji dayîk bibû dît. Sivorî hê baş ling negirtibû û nedikarî bimeşe. Lewre ji ser darê ketibû. Berbangê ew dît, rakir xist nav destên xwe û destên xwe hêdîka ser re gerand. Şervanên jin ku Sarya Silopî û Viyan Hêşatî jî di nav wan de bûn, hatin li dora Berbangê kom bûn û bi ken û hezkirin li sivoriyê dinêrîn. Destên xwe ser re dianîn û dibirin, pê re diaxivîn, ji ber ku ketiye û canê wê êşiyaye dilê xwe jê re dişewitandin û hwd.

Hinekê sivorî delalî kirin ku dîtin Heval Hemze û çend hevalên dî tên gel wan. Berbangê nezanî sivoriyê deyne kîderê. Tirsiya ku eger deyne ser darê careke din bikeve, eger jî li erdê bihêle hevalek bi şaştî pê lê bike, yan jî mar pêve bidin. Nezanî çawa bike, hema bi lez xist nav gomleka xwe û zincîra gomlekê kişande jor. Bi vî awayî çû pêşiya mêvanan û silav da Hemze û hevalên dî.

Yên bi Hemze re hatibûn derbasî gel şervanan bûn. Hemze jî li wir hema ser pêyan hinekê bi Berbangê re ser vesaziya şervanan û pilansaziya wan axivîn û pirsan kir.

Di nav vê guftûgoyê de sivoriyê serê xwe ji ser zincîrê ve ji nav gomlekê Berbangê derxist. Hevalê Hemze sivorî dît û kenê wî hat, lê ji bo ku Berbang şerm neke bi zorî xwest kenê xwe veşêre û wekî ku nedîtiye nîşan bide. Dema sivorî diliviya Berbang diqidqidand û Berbangê jî bi zorî kenê xwe bêdeng dikir. Sivoriyê çend carên dî serê xwe ji wir derxist. Di dawiyê de Hemze êdî hew karî pêşiya kenê xwe bigire û ji Berbangê re got: “Te çima ev feqîr xistiye wir de!”

Berbang: “Ji darê ketibû. Xuyaye nû ji dayîk bûye û hê ling jî negirtiye. Tirsiyam ku mar pêve bidin an jî bê perçiqandin.” Hemze ji bo ku Berbang şerm neke got: “Te baş kiriye. Tişt nabe. Ma ne em pêwîste xwezaya xwe jî biparêzin.” Lê xuya bû ku di dilê xwe de têra xwe dikeniya.

Merasîma leşkerî çêkirin û karta mezunbûnê diyarî şervanan kirin. Li pêşiya merasimê Hemze axaftineke biheybet kir û careke din bi navê hemû tevgera gerîla, HPG û YJA-STAR´ê tevlêbûna wan li wan pîroz kir. Dema Hemze diaxivî -gerçî ne tenê di vê merasimê de, her bi giştî wisa bû- mirov hîs dikir ku partî diaxive. Ji her gotineke wî, ji awir û xetên

rûyê wî baweriyeke bêsînor û nehej dibariya. Lewre hevalên kevin û nû, rêveber û şervan, jin û xort hema her kesê hez dikir lê guhdar bike û jê hîn bibe. Dema diaxivî dibê qey dar û teht jî tev lê guhdar dikirin. Wiha bi heybet û edeb dagirtî bû. Di vê merasimê de jî dema diaxivî şervan heyrana wî dibûn û dixwestin rojekê weke wî bibin.

Piştî merasima leşkerî şahiya ku şervan amade kiribûn hat pêşkêşkirin. Di nav şahiyê de ji çend hevalan stran hat xwestin. Hemze dengê hemû hevalan li ba xwe bi cîhaza tomara deng, tomar kir. Stran ji Yilmaz û Berbangê jî hat xwestin. Yilmaz strana “Dayê ez xatir ji te dixwazim” got. Dora Berbangê hat. Berbangê nezanî çi stranekê bêje. Hevalê Hemze jê re got: “Stranên Merziye Ferîqî xweşin. Eger ‘Şeş Pepule’yê dizanî vê beje.” û ev stran jî tomar kir.

*****

**Îtîraf Û Îftîra**

Dewreyeke şervanên nû kom bibûn û dest bi perwerdeya xwe kiribûn. Di perwerdeyê de rêveberiya wan taybet ser girîngiya dirustbûn, sadebûn, exlaq û çanda PKK'ê radiwestiya. Yilmaz waneyeke taybet ser uslûb û xîtabet, çanda şoreşgerî, dîsîplîna gerîlayî û parastina nirxan da wan û di nav gotinên xwe de bal kişand ser vêya ku şoreşgerek divê ti carê axaftinan neavêje ser hevalên xwe.

Hemze hat serdana şervanan û demekê bi wan re rûnişt. Her carê dema dihat çend demjimêran bi wan re dirunişt û guftûgo dikir. Şervan hemû lê diciviyan û lê guhdar dikirin.

Hemze nedikarî peyva "îtîraf" (mikurhatin) rehet bîne ziman. Şûna "îtîraf"ê digot "îftîra". Hevalên kevin ew fêm dikirin û pirsgirêk dernediket.

Vê carê dema bi şervanên nû re diaxivî, rojev anî ser çanda rêxistinê û di nav axaftinên xwe de got: "Ji kêmasiyan netirsin. Asayiye ku mirov bikeve kêmasiyan. Lê ya girîng ewe ku mirov dema kêmasî kir wêrek be û *îftîra* bike. *Îftîra* tişteke pir girînge û mirov mezin dike. Mirovek ku *îftîra*yan bike, pir zû pêş dikeve û ti carê li hember rêxistinê nakeve kêmasiyên cidî..."

Şervan destpêkê şaş man ji van gotinan, ji ber ku Yilmaz ji wan re gotibû ku îftîra di exlaqê PKK'ê de nîne û şoreşgerek nabe bi îftîrayekê axaftinan bavêje ser hevalên xwe. Niha jî Hemze ji wan re digot îftîra tişteke başe, bikin. Destpêkê fêm nekirin şaştî di kûderê de ye. Lê Simko her ji destpêkê ve fêm kiribû ku pirsgirêk di kûderê de ye, lewre di ber xwe de hêdîka dikeniya lê belê giranbûna xwe parast û nehişt kes pê bihese.

Şervanekê bi çavên tijî pirs li Berbangê nêrî. Berbang ku rewş fêm kiribû keniya û îşaret dayê ku niha guhdar bikin, ewê piştre ji wan re bibêje. Gîvara jî bi rewşê hesiya, lê Yilmaz bi herikîna axaftinên Hemze re çûbû û vê gotinê qet bala wî nekşand.

Hemze çend carên din peyva *îftîra* bi kar anî û bal kişand ser girîngiya wê. Di vê kêliyê de êdî şervanekê ku Kurdî baş dizanî û mesele fêm kiribû nekarî ji vê zêdetir kenê xwe veşêre û pilqînî pêket. Hemze bi çavên tijî hezkirin lê nêrî, pêre keniya û jê pirs kir: "Heval, bi çi dikenî?" Şervan şerm kir û got: "Tiştek nîne." Hemze got: "Nawele tiştek heye. Ev alî zûde dikenin, bala min kişand. Bêje bêje şerm neke."

Şervan hem dikeniya, hem şerm dikir û nekarî bersivê bide. Gîvara got: “Hevalê Hemze, tu li şûna îtîraf dibêjî îftîra. Bi vê dikenin. Dibêjin heval Yilmaz ji me re gotibû ku îftîra nebaşe, nekin lê hevalê Hemze dibêje îftîra tişteke başe, bikin. Ji ber vê dikenin.” Şervanên ku destpêkê ji ber fêmnekirina rewşê matmayî bibûn jî vê carê fêm kirin û nekarîn pêşiya kenê xwe bigirin. Hemze û şervanên nû tev bi hev re keniyan.

Piştre Hemze got: “Ez vê gotinê (îtîraf) nikarim bêjim. Min şaş got lê hûn rast fêm bikin. Îftîra (yanî îtîraf)ya ku ez dibêjim, bikin lê yên heval Yilmaz gotine qet nekin. Ew nebaşe.” Û kêfxweşiya xwe ji vê baldarî û hişyarbûna şervanan anî ziman.

*****

**Fêrgeha Herî Mezin**

Keçeke ciwan bi navê Bişeng ji bajarê Kirşehîra Tirkiyê tevlê bû. Xwendevana zanîngeha Ispartayê bû. Derdora çarsed, pêncsed sal berê malbata wan ji Kurdistanê koçî Anatolyaya navîn kirine û Kurdbûna xwe bi temamî ji bîr kirine. Bi vî awayî Bişeng jî ji Kurdbûna xwe bêhay mezin dibe, heta ji Kurdan aciz û bi nefret dibe û weke terorîst li wan dinêre. Derbarê Rêber Apo û PKK'ê de jî weke dijmin difikire. A rast Doktor Mahîr ku sala 2007'an li Bakur şehîd ketibû û Adem Uzun ku kadro û nûnerê KNK'ê yê li Ewrupayê ye mirovên wanin, lê Bişeng wan nas nake.

Di nav xizmên wan de ji bilî van du PKK'yiyan, ên din bi giranî ketine bin bandor û xizmeta pergalê. Hejmareke zêde walî, qaymeqam, efser û sîxurên MÎT’ê ji vê malbatê derketine. Heta mirovên wan ên di nav NATO’yê de cih digirin jî hene. Yanî malbatekin ku ji aliyê dijmin ve hatine fetihkirin. Balkêşe ku ev du heval çawa ji vê malbatê derketine.

Jixwe Bişeng heya sala 2009'ê ku dibe welatparêz, qet haya wê ji van du mirovên wê nîne. Tenê yên ku bûne kadroyên pergalê nas dike û bi wan şanaze. Jixwe li cihê ku lê mezin bûye û cihê ku lê xwendiye, yanî li Kirşehir û Ispartayê faşîstên AKP’yî û MHP’yî bi bandorin û ti şopa meyleke din xûya nake.

Dergistiyê Bişeng ciwaneke Kurd ê welatparêz bûye, lê malbata wî jî mîna malbata Bişeng ji Kurdbûnê pir dûr bûne û bi nêrînên dijmin li gelê Kurd û tevgera azadiyê mêze kirine. Ew bixwe jî li zanîngehê bi Kurdbûna xwe hesiyaye û PKK nas kiriye. Lewre xebatên xwe yên nav Ciwanên Apoyî di zanîngehê de veşartî rêve biriye û nehiştiye malbat û kesên wî pê bihesin. Wî zaniye ku Bişeng jî PKK ji zimanê dijmin bihîstiye û nas kiriye. Lewre hewl dide bêyî ku navê Rêber Apo bîne ziman fikir, raman û şîroveyên wî, taybet di mijara jinê de bi Bişeng re guftûgo bike.

Bişeng dibêje qey ew nêrîn, nêrînên dergistiyê wê bixwe ne. Ji wan nêrînan pir hez dike û bandor dibe. Dergistiyê wê sala 2010'an bêyî ku wê agahdar bike tevlî refên gerîla dibe û li pey xwe gelek postêr, Parêzname û pirtûkên Rêbertiyê, rojname û kovarên nêzî PKK´ê, rozêt, alên PKK´ê û hwd. dihêle.

***Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!***

Dema malbata wî Bişengê agahdar dikin ku kurê wan xuya nake û lê digerin, Bişeng diçe tiştên wî mêze dike. Tiştên ku li pey xwe hiştine dibîne û meraq dike ku evqas tiştên mirovekê ku ji bo Tirkiyê weke xeteriyên herî mezin tên dîtin, çima li ba dergistiyê wê bûne. Diçe pirtûkan dixwîne û nû fêm dike ku ew raman û nêrîn ên Rêber Apo ne, ne yên dergistiyê wê ne. Pir pê bandor dibe û diçe tevlî xebatên komîteya ciwanên Apoyî dibe. Piştî salekê, yanî sala 2011'an ew jî tê tevlî gerîla dibe.

Jiyana Bişeng a bîst û sê salan tev burokratîk û bi teqlîda burjuvayan derbas bibû. Di navbera dîwarên bilind û cemidî yên bajêr de mezin bibû. Ji ber bilindbûna dîwaran rast û dirûst ezmanê nedîtibû. Heyv, stêrk û ewran nedîtibû û xeyalên wê di şînahiya ezmanan de negeriyabû. Ji bilî demên ku çûbû parkan, bi çavê xwe rengê axê nedîtibû. Tu carê destên wê bi ax û herî nebibûn. Di zaroktiyê de bi ax û heriyê nelîstibû û cilên xwe bi toz û qirêj nekiribûn. Mîna bûkên plastîk di bin çavdêriyeke hişk de mezin bibû. Gul bêhin nekiribûn û bêhna wan nekişandibû hinava xwe. Strî neketibûn tiliyên wê de. Şînkahî nedîtibû. Ser pêyan gizîng û hilatina tavê pêşwazî nekiribû û nedîtibû tav çawa diçe ava û asoyê li pey xwe tîne. Qîjînî û qelebalixa zarokan a di dema lîstokan de nedîtibû. Ji ser kursiyên nerm û germ ên pembo daneketibû û li ser erdê rûneniştibû. Destên wê neqelişîbûn. Ji sermayê neqerisîbû û ji germayê xwêdan nedabû. Tavê li serê wê nedabû û çavên wê ne êşiyabûn. Bi yek peyvê, mîna robotan bi temamî jiyaneke bêjiyan jiyabû.

Bişengê di jiyana xwe de qet girîngî nedabû van tiştan û heta qet nehatibû bîra wê ku lê bifikire jî. Gelo mirovek, bi taybet jineke ciwan dibe ku çi tamekê ji vê jiyana qerisî bigire? Ev bîst û sê sal bû ku Bişeng miriyeke ser pêyan bû û jiyanê hîs nedikir, ji ber ku heya roja 4'ê Avrêla 2011'an ku tevlî meşa Amarayê bibû dilopek herî bi delingên şalê xwe ve nedîtibû. Tevî vê jî, ji xwe re gotibû “ez jiyan dikim” an jî wisa hatibû xapandin ku jiyan dike.

Dema heriyê bi pêlav û cilên xwe ve dibîne, dengê qîrîna bi yekdeng a deh hezaran dibihîse, kevirên nav destên biçûk ên zarok davêjin polîs û panzêran dibîne û dîmena ku dijmin bi fîşekan li gel dixe bi çavên xwe dibîne, wê demê nû nû bi xwe û bi jiyanê dihese û hîs dike ku nû dixwaze ji dayîk bibe. Bişeng piştî bîst û sê salan di meşa Amarayê de ji dayîk dibe. Evna tevahî jiyana wê ser û bin dikin,

vediguherînin û berê wê didin çiyayên ku tê de jiyanê hîs bike. Jiyana nû ya Bişengê di nav refên gerîla de bi vî awayî dest pêkir.

Ji ber şêwaza jiyana ku jiyabû dema tevlê bû heval ditirsiyan ku nekaribe zû bi jiyana wan ku jiyaneke sade û çiyayiye re ahengê çêbike. Lê wisa derneket. Berovajî, Bişeng bi lez fêrî jiyana xwe ya nû bû û xwe pê re kir yek. Ji jiyana ku jiyan kiribû şerm dikir û bi eşq û evîneke mezin ev jiyan himêz kir. Ji hemû zehmetiyên wê jî hez kir. Heta ji pêşû û gêrikên ku heval ji ber wan dibeicîn jî hez kir û ew weke parçeyeke jiyana xwe dît. Tevî ku her tişt jê re nû dihat û mîna zarokeke ku nû fêrî jiyanê dibe jî bû, pir bi lez di nav de pijiya û pêş ket.

Di dewreya wan de Hemze çend caran çû serdana wan. Serweriya Bişengê di telefuza Tirkî de û qet Kurdînezanîna wê bala wî kişandibû, ji ber ku Bişengê ne tenê nedikarî biaxive, herwiha qet peyveke Kurdî jî fêm nedikir. Hemze di nav jiyana xwe ya bîst û çar salan a gerîlatiyê de gelek Kurdên ji xwe biyanîbûyî dîtibû, lê ew kes çiqas heliyabin jî, kêm jî be axaftinên Kurdî fêm dikirin û bi qasî Bişengê ser Tirkî de serwer nebûn. Lewre dixwest hinekê jiyana Bişengê ya malê fêm bike. Bi vî awayî vê carê bi Bişengê re kûr û dûr ketin nav guftûgoyan.

Hemze destpêkê hinekê rewşa wê û perwerde pirs kir da fêm bike ku gelo di fêrbûna jiyana me û fêmkirina perwerdeyê de zoriyê dikşîne yan na. Ji ber ku pirsgirêka Bişengê ya ziman hebû. Bişeng bi kêfxweşî, coş û kelecaneke pir mezin bersiv da: “Heval Hamza inanıyor musun, ben artık yere oturuyorum! (Heval Hemze, ez êdî li ser erdê dirûnim, bawer dikî!)”

Hemze li bendê bû Bişeng ji bo ziman zoriyê bikşîne, lê li bendê nebû ku ew nû fêrî rûnîştina ser axê bibe. Lewre li hêviya bersiveke wisa nebû. Li beramber bersiva ku girt mat ma. Berbangê got: “Bişeng li malê bi çavên xwe axê nedîtiye û li erdê nerûniştiye. Ji ber vê, rûnîştina ser axê jê re weke şoreşeke mezine. Niha wekî ku şoreşek kiribe wisa jê re tê. Kelecana wê ji ber vê ye.”

Hemze careke din nefret kir ji pergala ku mirovan weke robot lê dike û tevî vê jî bi jiyankirinê dixapîne. Li Bişengê vegeriya û got: “Wê demê tu ji her kesê zêdetir dikarî wate bidî vê jiyanê û bi hêza wate û hêza jiyanê bihesî. Dikarî rûyê rast ê dijminê ku xwe weke dost nîşanî te daye çêtir bibînî û nas bikî. Binêre çawa hatiyî ziwakirin! Nefreta te

pêwîste bi qasî erd û ezman be li hember dijmin. Herwiha hezkirina te ya jiyana rast û xwezayî jî divê bi qasî nefreta te mezin be.”

Bişeng pir bi baldarî li Hemze guhdar dikir û hewl dida bi kûrahiya wateya van gotinên zêrîn bihese. Hemze axaftinên xwe dewam kirin û got: “Binêre li vir kursiyên me nînin. Mal û apartmanên me, pere û computerên me nînin. Telefon û tiştên me yên madî nînin. Çend dest cilên me û çend cot pêlavên me nînin. Lê em vê jiyana xwe nadin hezar qesr û koşk û şato û vîlayan. Binêre dijmin nehiştiye tu pê bihesî ku Kurd î. Wekî ku ji kîvroşkekê re bibêjin ‘tu pêwîste bi dengê kûçikan bihewtî, yan bi dengê kerê bizirî’. Tu eger baş xwe perwerde bikî, bi kîn û nefreta ku di dilê te de mezin bûye û bi eşqa jiyana ku ji Rêber Apo fêr dibî wê kesayeteke pir mezin ji te derkeve.” Piştre qala Şehîd Heqî Karer, Şehîd Kemal Pîr û çend şehîdên din ên ku Kurd nînin û li dijî înkar û qirkirinên ser Kurdan tevlî PKK´ê bûne kir. Herwiha mînaka hin hevalan da ku mîna Bişengê dûrî nasname, çand û zimanê xwe mezin bûne, lê di nav partiyê de pir pêş ketine.

Bişeng pir bi baldarî li gotinên wî guhdar kir. Di dawiya guftûgoyan de ji Hemze re got: “Ben on altı yıl okudum. Son dört yılını üniversitede okudum. Kaç okul değiştirdim. Bir çok öğretmen, doçent ve profesör gördüm, tanıştım. Ama sizin bana söylediklerinizi hiç bir yerde bana öğretmediler. Önderlik ne büyük bir cihanmış böyle! Bu PKK nasıl bir okulmuş tanrım! (Min şazdeh salan xwend. Çar salên dawî min li zanîngehê xwend. Min çend xwendingeh guhertin. Min gelek mamoste, doçent û profesor dîtin û nas kirin. Lê belê li tu derekê ev tiştên ku we ji min re gotin fêrî min nekirin. Rêbertî çi cîhaneke mezine wisa! Ev PKK dibistaneke çawaye Xweda!)” û ji ber vê guftûgoyê spasiya xwe ji Heval Hemze re anî ziman.

*****

**Giranbûn Û Dilnizmiya Bêwext**

Payîz bû. Pelên daran diweşiyan û dar rût û tazî dibûn. Hewa hêdî hêdî sar dibû û dem dem baran dibariya. Dewreya dawî ya perwerdeya şervanên nû bû. Şervanên ciwan dema baran bibariya li dora agir kom dibûn dirûniştin. Dema dinya vekirî bûya jî, ji bo ku bilîzin li derdora Gîvara kom dibûn.

Wê rojê jî dinya sayî bû û dîsa şervan li derdora Gîvara kom bûn û bi hev re dest bi lîstinê kirin. Lîstok, lîstokeke leşkerî bû ku mentiqê lêxistin û nîşana mirov xurt dikir. Wiha bû: pênc kevir bi navberên yek metreyî di rêzekê de li erdê dihatin danîn. Hevalan kevirên biçûk ji xwe re kom dikirin, piştre bi dorê xwe nizim dikirin, ditewandin û kevirên xwe davêtine wan pênc kevirên ku li ser erdê di rêzekê de hatine danîn.

Yilmaz tevlî şahiya lîstokê nebû, li ber siya darekê rûniştibû û bi coş û kelecan li wan mêze dikir. Her carê dema wisa li lîstokên wan mêze dikir xwe di temenê wan de hîs dikir, kelecan digirt, hê zêdetir ji wan hez dikir û bi wan ve dihat girêdan. Ji bo şûm nebin tedbîrên pêwîst digirt, ji ber ku dizanîbû ku şûmbûn astengeke mezine li pêşiya pêşketina kadro. Lê hezkirina wî ya ji bo şervanan jî bêsînor bû û bi gelek awayan xwe dida der. Qelebalix, coş û liv û tevgera şervanên ciwan rengeke taybet dida wê sala temenê wî. Di navbera wî û şervanan de cudahiya temen rabibû, ji ber ku ew ji bo hevdû "heval" bûn û peyva "heval" peyveke bêtemen bû. Mirovên ku xwedî yek al, yek giyan û yek armanc bûna di çi temenekê de bin bila bibin "heval" bûn. Peyva heval di nav PKK´ê de zûde temen ji holê rakiribû. Lewre Yilmazê 52 salî û şervanên 15-23 salî di yek temenî de bûn.

Dema şervanan dilîstin bala Yilmaz kişand ku di nav hemû şervanan de di keviravêtinê de yê herî serkeftî Simko ye. Kevireke Simko vala nediçû. Mîna fîşekên wî. Her carê bi kevirekê herî kêm çar kevirên erdê radikir. Pir caran jî her pênc kevir bi kevirekê radikirin. Şervanên dî jî serkeftî bûn û kevir radikirin, lê bi qasî Simko na.

Simko jixwe ciwanê dewreyê bû. Hemû hemdewreyiyên wî pir jê hez dikirin û weke çavên xwe ew diparastin. Serkeftinên hemû hevalan bi çepikan dihat pîrozkirin. Çepikên herî zêde jî ji Simko re dihatin lêxistin. Simko piştî her serkeftinekê çepikeke xurt jê re dihat lêdan,

ew jî bêdeng diçû li goşeyekê li benda doreke din radiwestiya û li hevalên xwe yên din meyze dikir.

Dewreya wan hemû ciwanên bi molotof kokteylî û çalakvanên bajaran bûn. Lewre heya astekê serweriya hemûyan ser nîşan û hedefa xwe hebû. Lê carna nîşana wan şaş jî diçû. Wê demê Simko bi dilnizmî awayê kevirgirtinê, dereceya xwetewandin û eyarkirina enîşka dest ji wan re digot. Şervanan dema bi gotina wî dikirin, bi kevirekê çar pênc hedef dixistin erdê û şa dibûn.

Piştî ku lîstoka wan qediya Yilmaz gazî Simko kir û bi coş û henek jê re got: “Çepikên herî zêde ji te re hatin lêxistin. Xûyaye tu pir ji çepikan hez dikî.” Simko bi dilnizmiya ku ne li gorî temenê wî bû bersiv da: “Tenê ez serkeftî nebûm. Hemû hevalan baş kevirên xwe avêtin û serkeftî bûn. Çepik ji bo me hemûyan hatin lêdan.”

Yilmaz ku li benda ewqas giran û dilnizimbûna wî nebû bi dengê bilind keniya, destê xwe danî ser milê Simko û got: “Başe başe! Tu pêwîste her tim wisa serkeftî bî. Lê hinekê jî qelebalix bikî ne xirabe. Tu pir enerjîk, hîperaktîf û bi liv û tevgerî. Lê tu pir bêdengî. Ev bêdengî ne ayîdê temenê te ye. Başe? Ciwan pêwîste weke te mîna agir bin, lê pêwîste qelebalix jî bikin.” Simko bi giranbûna xwe ya her timî di bersiva fermandarê xwe de serê xwe hejand û erê kir.

Simko bi her tişt û hemû taybetmendiyên xwe ve li ber dilê her kesê bû. Hema bêdengiya wî jî dihat hezkirin. Gerdûneke zana û temenbiçûk, agireke geş û gurr û bêdeng, aveke bicoş û bi pêl û xuroşan bû. Simko yanî temeneke biçûk, lê tijî tijî...

### Qedandina Xebatên Salê

Di hefteya duyemîn a heyva Cotmehê de Hemze çû ba rêveberiya şervanên nû û ji wan re ragihand ku ew xebat tê bidawîkirin. Lewre ew jî pêwîste xebat û tiştên noqteya xwe kom bikin û biçin ba taxima Besta Navîn. Roja din Yilmaz, Berbang û Gîvara karên xwe qedandin û çûn ba taximê.

*****



**Nasnav: Aso Berxwedan**
**Nav û Paşnav: Puyan Rezayî**
**Dîrok û Cihê Jidayîkbûnê: 31.3.1985/Sine**
**Dîrok û Cihê Tevlêbûnê: 9.11.2006/Sine**



**Nasnav: Dengtav Amed**
**Nav û Paşnav: Nedîm Denîz**
**Dîrok û Cihê Jidayîkbûnê: 24.6.1987/Amed**
**Dîrok û Cihê Tevlêbûnê: 15.5.2007/îstanbul**

**Pratîka Aso Ya Li Botanê**

Aso Berxwedan, bi navê malê Puyan Rizayî sala 1985'ê li Rojhilatê Kurdistanê, bajarê Sine ji dayîk dibe. Heyva Mijdara 2006'an ji Sine tevlî partiyê dibe. Sala 2009'ê ji Herêmên Parastina Medyayê derbasî qada Botanê bû.

Aso di aliyê kesayetî de ketîbû. Gelo ji aliyê dijmin ve bi taybetî hatibû xistin û sîxurkirin an na, ev nayê zanîn. Lê ev tê zanîn ku

kesayeteke pir ketî, lewaz û ji exlaq bêpar bû. Ji ber vê jî kiryarên wî ji kiryarên sîxûrekê cuda nebûn. Ji sala 2006'an ve ku tevlî rêxistinê bû, pir zêde ked di ber de hat dayîn. Lê xweguherandinekê tê de xûya nekir û kesayeta wî ya sivik her weke xwe ma. Lewre her tim bi taybetmendiyên xirab û neyênî, dûrbûna ji exlaq û çanda şoreşgerî û rawestîna çewt û lewaz xwe di rojevê de girt. Heta carekê ji ber vê, bîst rojan hat girtin jî. Lê her cara ku diket rojevê û helwestên cidî li hember dihatin girtin jî, dîsa rêxistinê şans didayê ji bo ku wî qezenc bike û rake. Lê belê Aso wekî ku bixwaze tola xwe ji jiyana PKK'ê hilde wisa di jiyanê de tevlîhevî çêdikir û guh nedida hişyarî û rexneyên ku jê re dihatin, ji ber ku di wî de ti nirx û çandeke ku pê ve hatibe girêdan tinebû.

Sala 2009'ê şanseke dî jê re hat dayîn û vesaziya wî ji bo qada Botanê hat destnîşankirin. Aso bi endamê fermandariya qada Botanê Heval Îrfan Amed re derbasî Botanê bû. Heval Îrfan çû kûderê pê re çû û geriya; ji Kato Jîrkayê derbas bû, heya payîzê li Bestayê pê re geriya. Zivistanê pê re derbasî Cudî bû û heya biharê li wir ma. Li Cudî dema Heval Îrfan li her sê alanên Navser, Bilika û Girê Hirmo civîn çêkirin, Aso jî pê re bû. Biharê careke dî vegeriya Bestayê û di taxima wir de cih girt. Tevlî çalakiya 30.06.2010´an ku ser paygeha gundê Aqêrê yê girêdayî navçeya Berwariya Sêrtê pêk hat bû.

Dema diçûn vê çalakiyê di rê de ji Berbangê re got: “Ev çalakî bi destê me hevalên ji Rojhilat bê kirin xwedê dizane çawa derbas bibe û çi bê serê vê çalakiyê!” Berbangê nekarî ti mentiqekê ji vê gotinê re bibîne, lê dema gihiştin cihê çalakiyê, ji ber ku hê nîvdemjimêr ji wexta diyarkirî re mabû derfet dît û çû ji Heval Qehreman re got. Şehîd Qehreman dibê qey niyeta vê gotinê xwendibû, ji Berbang re got: “Niha em ser çalakiyê ne. Ji kesî re nebêje, bila heval bandor nebin. Dema em vegeriyan, emê ser rawestin.”

Di vê çalakiyê de Aso û Şoreş Hêşatî ku hevaleke ciwan û di jiyana gerîlatî de bêtecrube bû, BKC dixebitandin. Di wexta pevçûnê de ji ber nehişyariyên Aso di demeke pir kurt de qovana vala di ber BKC´ê de ma û BKC rawestiya. Fermandarê vê qolê Şehîd Qehreman Erdal neçar ma bi derxistina qovana nav BKC'ê ve mijûl bibe da ku bide xebitandin. Jixwe di kêliya vê mijûlahiya bi BKC´yê ve fîşekeke A-6´ê ji çepereke dijmin hat û li Heval Qehreman ket. Bi vî awayî şehîd ket.

Arêz ku li ser bombavêjê bû, di destên xwe de birîndar bû û nekarî bombavêjê bixebitîne. Aso kêmekê ji bombavêjê fêm dikir. Dema ku Heval Qehreman li ba Şoreş bû û bi çêkirina BKC'yê ve mijûl bû, Aso ji bo xebitandina bombavêjê hat bangkirin. Aso bê haya ti kesê, bêdestûr û bi serê xwe klaşînkofa xwe li wir hişt û çû cihê bombavêjê, lê li wir jî ji tikesî re negot ku klaşînkofa xwe hiştiye. Jixwe diviya nehişta. Hemû hevalên ku çekên giran dixebitînin klaşînkofa wan jî heye ji bo ku pê parastina xwe bikin.

Aso li cihê bombavêjê ji ber nehişyarbûna xwe gelek liv û tevgerên bêcih kirin, lewre bi fîşekekê re rûbirû hat û li çoka wî ket. Aso bi birîndariyê re yekser cihê xwe berda, bombavêj jî li wir hişt û ji wir daket. Du heval ji bo ku zêde xwîn ji birîna Aso neçe pevçûn berdan û çûn bi birîna wî ve mijûl bûn û ew hinekê ji cihê pevçûnê dûr xistin. Lê Aso ji wan re negot ku bombavêj û klaşînkofa xwe li cihên pevçûnê hiştiye. Dema heval Qehreman şehîd ket Rubar Goyî çek û rexta wî rakir gel xwe. Haya Berbangê ji vê nebû, çeka Aso li wir dît û got qey çeka Heval Qehremane, rakir gel xwe û bi xwe re bir. Bi vî awayî li wir kes pê nehesiya ku Aso çeka xwe li wir hiştiye.

Hevalên li gel Aso jî digotin qey bombavêj li ba hevalên dî maye û ew tînin. Heya du roj şûnde ku hevalan li ser milên xwe ew gihandin ba hevalên din, haya ti kesê tinebû ku bombavêj li cihê çalakiyê hatiye hiştin. Ji ber ku dijmin bi tank, obîs, A6, A4, panzêr û kobrayan êrîş dikir, heval neçar man weke komên du sê kesî û belave paşve vekişîn. Lewre haya kesê ji hiştina bombavêjê nebû heya ew gihiştin ba hevalan û li wir ji Aso hat pirskirin. Dema jê hat pirskirin Aso got ku klaşînkof û bombavêj li wir hiştiye û ji kesê re negotiye.

Di paşvekişînê de ji ber birîna ling Aso nedikarî rehet bimeşe. Lewre çend heval her bi wî re mijûl bûn; geh ew li pişta xwe dikirin, geh ji her du aliyan ve diketin bin milên wî û giraniya wî radikirin ser bedena xwe. Di paşvekişînê de carekê hejmareke zêde heval li dora wî kom bûn û her yekê hewl dida tiştekê bike ji bo ku xwîn jê neçe. Di vê wextê de obîs li nav wan ket û kobrayê jî êrîşî wan kir. Heval eger hişyar û lezgîn nebûna wê li wir nêzî pênc şeş heval ji bo Aso şehîd biketana.

Piştî ku ew vegerandin gel hevalan jî, tevahî heval ji bo ku ew rehetiya xwe bistîne û ser xwe ve bê çi ji destên wan hat kirin. Wê salê

di warê erzaq û pêdiviyên madî de li Bestayê hinekê tengasî hebûn. Tevî vê jî, ji bo ku birîna Aso zû baş bibe, ji Şehrîban û Herekolê erzaqên taybet jê re anîn. Ev, exlaqê PKK'ê ye: ji bo ku birîndarekê xelas bikî û ji nav dijmin derxî eger pêwîst bike tuyê xwe feda bikî û ji bo wê şehadeta xwe jî bidî ber çav. Ji bo ku birîndarek baş bibe çi jê re pêwîst be, rê çiqas dûr jî be tuyê pêdiviya wê pêk bînî! Heval bi vê rêgez û pîvanê nêz bûn. Çi dibe bila bibe, çiqas tîpeke bêkesayet jî be û çiqas di şer de rola xwe jî nelîstibe Aso hevalê wan bû û birîndar bibû.

Ji ber ku Aso li hember BKC´ê hişyar nêz nebibû û di encama xirabûna BKC´ê şehadeta Heval Qehreman li pey xwe anîbû, herwiha ji ber ku Aso du çek li cihê çalakiyê hiştibûn û heval jî agahdar nekiribûn, di civîna nirxandina encama çalakiyê de rexneyên cidî û tûnd ji aliyê hemû hevalan ve ji bo wî hebûn û hemû pir jê aciz bibûn. Lê belê dan ser xatirê birîndariya wî û zêde hişk ser de neçûn. Vê acizî û hêrsê di dilê hemû hevalan de cihê xwe parast. Lê belê ji ber pîvanên şoreşgeriya Apoyî jî neçar bûn pê re hevaltiyê bikin.

*****

Payîza heman salê (2010) piştî ku koçer ji alana Bestayê çûn, beriya ku pelên daran tam biweşin tîmek heval hatin erkdarkirin ji bo ku biçin kampekê ji bo zivistanê çêbikin. Ji ber tedbîrên ewlekariyê ji bilî vê tîma erkdar diviya ti kesê cihê kampê nezanîba. Ev, weke rêse û qanunekê ye û her kes ji ber xwe de pêk tîne. Heta ti kes cihê kampê pirs jî nake. Jixwe dema tîma erkdar diçin kampê çêkin jî, ji tîmên din re nayê gotin ku ev tîm ji bo vî karî çûye. Ji ber ku şert û mercên zivistanê, taybet eger berf pir li erdê be ji bo pevçûnê ji gerîla re dijware, li hember dijmin ewlekariya kampên zivistanê di asteke jor de tê girtin. Pareke vê tedbîrê dikeve ser milê hişyarbûna navxweyî.

Hevalên din ên taximê jî erzaq û kelûpelên pêwîstiya zivistanê heya cihekê kişandin. Tîma ku kamp çêdikirin dihatin ji wî cihî tişt dikişandin hundirê kampê.

Carekê Aso di bin navê nêçîrê de çû eraziyê û li pey şopa hevalên ku ji bo çêkirina kampa zivistanê ji taximê veqetiyabûn ket. Wê rojê Xelat çûbû serdana vê tîmê. Demjimêr 10:20 ji tîma ku kampê çêdikirin hevalê ku bi çêkirina firavînê ve mijûl bû Aso li girê jorî kampê dît û fêm kir ku Aso ew dîtiye. Bi lez çû hundir û agahî da hevalan. Xelat pir aciz bû û got: "Çi îşê Aso li van deran heye?" Piştre ji hevalê aşpêj re got ku gazî Aso bike, bê vir. Heval çû bi îşaretan gazî wî kir.

Dema hat, Xelat jê pirs kir ku çima hatiye van deran. Aso got ku ji bo nêçîrê derketiye eraziyê, nezaniye ew li wê derê ne, ji nişka ve, yanî bi rasthatî (tesaduf) hatiye wir. Lê hevalan jê bawer nekirin. Ew ji bo xwarina firavînê li gel xwe hiştin, piştre rê kirin noqta taximê, lê beriya ku biçe pir tûnd ew hişyar kirin ku cihê kampê ji tikesî re nebêje.

Piştî ku Aso çû, hemû hevalan bi yek dengî gotin: “Aso rast nabêje. Ji bo keşfa cihê kampê hatiye vir, nêçîra çi?!” û pir aciz bûn jê. Piştre jî rêveberiya taximê rexne kirin ji ber ku destûra derketina eraziyê daye wî.

*****

Zivistanê mîna hemû kampên din wan jî di kampa xwe de perwerde didîtin. Aso di nav perwerde û jiyana kampê de jî rawestîneke pir lewaz û ne li gorî pîvanên şoreşgerî nîşan da. Wî bi van taybetmendiyên xwe gelek ziyan digihand jiyana rêxistinê û texrîbat çêdikir. Lewre her di rojevê de bû. Careke din acizî û nehezkirinên hevalan, taybet jî ya şervanên nû û ciwan ku di wê kampê de bûn li ser xwe kom kir. Hevalan tev bi hemû hêza xwe hewl didan pê re bibin alîkar û wî biguherînin. Şervanên ciwan û bêtecrube jî bi qasî hevalên kevin di vê mijarê de ji dil hewl didan. Lê çi sud! Aso heman Aso bû.

Serhed jî di vê kampê de bû. Jixwe Serhed jî ji bajarê Sineyê bû. Ev ji hemû hevalan re pir balkêş dihat, ji ber ku kesayeta Serhed temamen di noqteya beramberî Aso de bû, ango bi temamî berovajî kesayeta Aso bû. Serhed bi ked, rihê fedayî û rêhevaltiya xwe dihat naskirin, bi van taybetmendiyan cihê xwe di dilê hemû rêhevalên xwe de çêkiribû, hemû hevalan ji dil ji wî hez dikirin û nirxeke zêde didanê. Lê belê Aso berovajî bû. Yekane xala hevbeş a di navbera de wan ew bû ku her du ji Sineyê bûn. Ji bilî vê, ti hevbeşiyeke wan tinebû. Di taybetmendî, kesayet, şêwazê jiyan, exlaqê şoreşgerî, pîvanên rêhevaltiyê, hezkirina ked, parastina jiyan û hema her mijareke din de van du kesayetan qet hevdû nedigirtin û bi qasî erd û ezman ji hev cuda bûn.

Heya perwerdeya kampê qediya jixwe êdî bihar jî hat. Beriya ku kampê berdin û derkevin derve, weke encama perwerdeyê platforma hemû endamên kampê çêbû. Platforma Aso jî hat çêkirin. Heval ku pir ji wî tijî û hêrs bibûn gelek rexneyên tûnd lê kirin. Serhed ku qet bi wî re li hev nedikir, ango bi gotineke kevnar a Kurdewarî danê wî bi yê

Aso re di qoşxanekê de nedikeliya jî mîna hevalên dî rabû rawestîna Aso nirxand û rexneyên giran lê kirin. Serhedî di nav rexneyên xwe de wiha got: "...Hemû jiyan û rawestîna Aso foule!..." Hevalên din ku bi vê radîkalbûna Serhed pir kêfxweş bûn, tevlî vê nirxandinê bûn.

*****

Bihara 2011'ê piştî derketina ji kampa zivistanê vesaziya Aso ji bo Taxima Hereketî hat destnîşankirin. Ev taxim li hemû alanên Besta, Kato, Herekol û Garisayê digeriya. Bi vî awayî Aso erazî hê zêdetir nas kir, cihê gelek erzaqên veşartî dît, çû hin noqteyên ku hevalan dixebitandin, herwiha deverên ku guman dikir di pêşerojê de heval lê bimînin û bi kar bînin nas kir.

Di nav pratîkê de jî dîsa rexne ji bo wî pir bûn. Lê li şuna ku ser raweste her diçû zêdetir dest ji xwe berdida. Heval ji bo bawerî bigire da ku xwe komî ser hev bike, ew danîn ser tîmekê. Bi vî awayî Aso ket nav xebatên rêveberiya taximê. Bi rêya vê erkê ji hemû pilan û bernameyên taximê agahdar bû.

Payîza wê salê pilansaziyeke berfireh ji bo lêdana paygeha li gundê Hêşatî hat danîn. Taxima Hereketî jî tevlî vê çalakiyê bû. Êvara 27'ê Rezberê (îlon) çalakî pêk hat. Di vê çalakiyê de Aso bîsfîngçî bû û di qola parastinê de bû. Hê destpêka çalakiyê bû. Qet li derdora xwe nenêrî da ku bizane gelo hevalek li pişt wî heye yan na. Jixwe di mijarên wisa de qet hişyar nebû, berovajî pir xemsar û li gorî xwe bû. Rojdayê li pişt wî cihê xwe girtibû. Aso bi avêtina roketa yekemîn re bi agirê ku ji pişta bîsfîngê derket rûyê Rojdayê şewitand. Her du çavên Rojda bi awayê demî şewitîn û tarî û kor bûn. Jixwe çavên wê heya hefteyekê venebûn. Dema Rojdayê qîr kir, Aso nû bi xwe hesiya û fêm kir ku çi aniye serê hevala xwe. Rojda êdî nekarî tiştekê bike û ji vê zêdetir di çalakiyê de rol bilîze. Aso ew bir danî ber tehtekê û jê re got ku piştî qedandina çalakiyê ewê biçe wê jî bibe.

Di nava çalakiyê de Aso dîsa di çoka xwe de, li kêleka birîna berê, fîşekeke dî xwar. Vê carê jî bîsfînga xwe li wir ji dijmin re hişt û xwe hinekê ji cihê pevçûnê dûr xist. Agahî jî neda hevalên din. Ji bilî Aso du hevalên din jî birîndar bûn. Dema çalakî bi dawî bû û dest bi paşvekişînê kirin, hevalên sax birîndaran li ser pişta xwe rakirin birin. Aso bixwe jî yek ji wan birîndaran bû ku li ser milên çend hevalan hat rakirin.

Haya kesî ji birîndarbûna Rojda ya bi destê Aso tinebû. Ji bo ku derbe nexwin, kom bi kom ji hev belave paşve dikişiyan. Bi vî awayî her komekê digot qey Rojda bi koma din re ye. Piştî ku hinekê ji alana çalakiyê dûr ketin, li cihekê ku berê ji bo kombûnê hatibû destnîşankirin tev kom bûn. Pê hesiyan ku Rojda nîne. Ji ber ku cihê Rojda li nêzî Aso bû destpêkê ji wî pirsa Rojdayê kirin. Vê carê Aso wekî ku nû hatibe bîra wî got ku bi agirê bîsfîngê çav û rûyê Rojda şewitandiye û ew danîye ber tehtekê ji bo ku piştre biçin wê bibin.

Dema ev tişt digotin hevalan bi zorî xwe girtin ji bo ku axaftineke giran jê re nebêjin. Çend hevalan hemû rîsk, metirsî û egerên şehîdketinê dan ber çav û ber bi paygehê ve paşde vegeriyan. Ew der weke qiyametê lêhatibû û weke moriyan leşker kom bibûn. Di nav vê toz, duman û agirbaranê de  Rojda ji wir derxistin, li pişta xwe kirin û gihandin hevalên din.

Roja din heval pê hesiyan ku bîsfînga Aso li ba ti kesî nîne. Heya wê demê her hevalekê gotibû qey Aso bîsfîng daye hevalên din. Lê vê carê fêm bû ku Aso bîsfîng jî li cihê şer, ango di paygehê de ji dijmin re hiştiye. Van pratîkên çewt û dubare aciziya hemû hevalan gihand lûtkeyê. Lê careke din jî, ji ber ku birîndar bû erka xwe ya şoreşgerî û hevaltiyê li hember wî pêk anîn û ew li ser milan bi xwe re birin. Tiştên din jî ji civînê re hiştin.

Piştî ku heval tev paşve kişiyan û gihiştin cihên xwe, fermandara qada Botanê Heval Gulistan Gulhat civîna nirxandina çalakiyê li dar xist. Di civînê de çalakî bi hemû aliyên xwe yên erênî û kêmasiyan ve hat nirxandin. Aso bi serê xwe bû rojevek. Rawestîna wî ya nav çalakiyê, birîndarkirin û piştre jî hiştina Rojda, derbarî vê de agahî nedana ji hevalên din re, hiştina bîsfîngê û dîsa agahî nedana ji hevalan re di vê mijarê de jî, nehişyarî û hwd. tevahî nizîkatiyên wî hatin destgirtin û pir giran û neyênî hatin nirxandin. Tevî vê jî careke din dan ber xatira birîndariya wî. Lewre tenê rexnedayîn jê xwestin û şanseke din danê.

Ev, cara yekê nebû ku ji ber pratîkên çewt, neyênî û texrîbkar hesab jê dihat xwestin. Jixwe beriya biçe Bakur jî rewşa wî her ev bû. Bi armanca ku kesayeta xwe biguherîne ji bo Botanê hatibû şandin, lê xûya bû ku diyalektîka gerdûnê ku "guhertin û veguhertin di her kêliyekê de" di xwe de dihewîne di Aso de cemidîbû.

Hemû caran rêxistinê jê re gotibû “ciwaneke Kurd e. Çanda dijmin ew ji hal xistiye. Em rakin. Em şans bidinê”! Piştî evqas texrîbatên nav çalakiya Hêşatî jî dîsa şans! Gelo bi rastî Aso fêm dikir ku peyva “şans” ji bo kadroyekê tê wateya ku eger xwe neguherîne rêxistinê wî bi vê rawestînê naxwaze û napejirîne? Gelo bi rastî giraniya vê peyvê nedizanî yan her tiştek bi zanabûn dikir. Qet diyar nebû. Ewqas hewl û têkoşîna hevalan çima vala derdixist, nedihat zanîn.

Êdî li hember wî baweriya hevalan hêdî hêdî dişkest, ji ber ku ti carê ti rexneyek ser wî encam negirt. Gelo dê vê carê encam bigirta, kesê bawer nedikir.

*****

Piştî çalakiya Hêşatî, Aso ji ber birîna çoka xwe demekê li Besta Navîn ma. Wê demê jî dîsa pir hewl da di bin navê nêçîrê de biçe eraziyê ji bo ku cihê kampa ku tîma Serhed ji bo zivistanê amade dikirin nas bike. Lê belê rêveberiyê jî ku êdî ew baş nas kiribû, bi hênceta ku birîna wî hê baş xwe negirtiye destûr nedidayê.

Jixwe demek beriya wê jî keçên ciwan ên koçeran ji hevalan xwestibûn ku ji bo peywir û pêdiviyan Aso neşînin nav zomên wan! Aso ji ber ku kesayet pêve nînbû û ev yek ji aliyê hemû hevalan ve dihat zanîn, hin tedbîr li hember wî dihatin girtin. Her kesê kesayeta wî nas dikir û li hember wî dudil bûn. Dîsa jî Rêber Apo ev exlaq di PKK´ê de serwer kiribû: “Mirovek eger tenê tayeke pora wê/î paqij mabe ji wê tayê ve bigirin û rakin jorê. Hevaltiya rast ewe ku mirov eniya hevalên xwe bigihîne stêrkan!” Ji ber vê ferasetê ku çarçoveya rêhevaltiyê ji PKK´ê re diyar kiribû hem qezenckirina Aso esas digirtin, hem jî tedbîrên pêwîst li hember wî digirtin. Ji ber vê, piştî wê nêrîna keçên koçeran êdî heta eger ti kes amade nebe jî, Aso ji bo peywirên nav koçeran nedihat şandin.

*****

**Kombûna Hêzan Li Besta Navîn**

**Tîma Serhed**

Nîvê heyva cotmehê Serhed, Mehsum, Azad û Demhat ji Şehrîbanê hatin. Ev, tîma yekem bû ku ji Şehrîbanê hat ba taxima Besta Navîn.

Êvarê Berbang çû wan bibîne. Wê, Serhed û Mehsumî zûde hevdû nas dikirin û li gelek dever û xebatan bi hev re mabûn. Serhed sala pêştir, piştî çalakiya Aqêrê ji ber bandora Şehîdên vê çalakiyê û qutbûna ji Taxima Hereketî pir giriyabû û nekarîbû ji Norşîn û Gizîngê xatir bixwaze. Lewre tevî ku dizanîbû hevalên wî pir ji wî hez dikin û li benda wîne jî bêxatirxwestin, di nav rondikan û êşê de bi dizîka ji wir çûbû.

Van her sê hevalan jî pir bîranînên hevbeş ên xweş û nexweş bi hev re jiyan kiribûn. Hemû wan şehîdan jî nas dikirin. Lewre dema her sê hevalan hevdû dîtin, hevdû weke bîranîna wan şehîdan didîtin.

Dema Berbang çû ba wan, Mehsum û Azad amade nebûn, tenê Serhed û Demhat li wir bûn. Hevdû pir germ pêşwazî kirin û demekê bi hev re rûniştin, qala bîranînên kevin, taybet bîranînên wan şehîdan kirin. Piştre hevalên nas ji hevdû pirs kirin. Serhed pir pirsa Norşîn, Hebûn Têkoşîn, Bahoz Bandoz û hevalên din ên ku zivistana xwe ya yekem li Bakur bi hev re derbas kiribûn kir. Berbangê qala başbûna hemûyan û xebat û cihên ku lêne jê re kir. Piştre di nav axaftinan de jê re got ku dema Serhed bêxatir çûye heval hemû pir xemgîn bûne. Bi van axaftinan çavên Serhed dîsa tijî hêsir bûn. Lewre li pişt xwe zîvirî ji bo ku Demhat û Berbang nebînin û pê bandor nebin. Serê xwe daxist, çavên xwe ji erdê ranekir û her bi vî awayî bersiv da û got: “Min nekarî bêm we bibînim. Xatirxwestin li min pir giran dihat. Min zanî hûnê pê bêşên. Lê eger min hûn bidîtana ezê hê zêdetir hestewar bûma. Min hemû hevalên şehîd jî, hevalên sax jî di dilê xwe de rakir û bi xwe re anîn vir. Li vê taximê jî gelek caran min û heval Zîlan qala bîranînên taximê û kampa me ya zivistanê kir.” Serhed bi van axaftinên xwe re her carê tijî dibû, bêhnek dida û dîsa berdewam dikir.

Yeko yeko qala Şehîdên çalakiya Aqêrê kirin. Piştre Berbangê pirsa Zîlanê kir. Serhed got: “Rewşa wê pir başe. Tevlêbûna wê pir baş bû.” Berbang aciziyên demkurt û piştre poşmaniyên Zîlanê anîn ber çavên

xwe, keniya û got: “Hê jî zû aciz dibe û zû diçe lêborîn dixwaze? Ya rast ew tenê bi hevalên ku li hember wan rehete re wisa ye.”

Serhed: “Na, niha zû aciz nabe. Carekê ez aşpêj bûm, ew jî lojîstîkçî bû û hat aşxaneyê kontrol bike. Li wir hema em li ber agirê rûniştin û me qala wê kamp û taxima me kir. Heval Zîlan pir bi wan hevalan ve girêdayiye. Her carê dema em qal dikin pir hestewar dibe. Ev şehadet li wê jî pir giran hatin, lê her davêje hundirê xwe. Pir hesteware. Pir qala kampa we ya xweser a par û Hevala Arjîn, Sosin û Norşînê dikir.”

Piştre qala hevalên ku wê dawiyê şehîd ketibûn û wan nas dikirin kirin. Di yek heyva dawiyê de Heval Rojhat Îdir, Azad Sêrt û Rûken Cudî li Kato Jîrka, Heval Nûpelda Dogan li Garisa, Heval Zerdeşt û Ayhan li Berwarî, Heval Vejîn Soran, Azad Bedlîs û Rizgar Amed jî li Hêşatî di nav çalakiyan de şehîd ketibûn û pir bandor li wan kiribûn. Piraniya van şehîdan jî hevbeş nas dikirin. Vê hêj zêdetir bandor li wan dikir.

Her ku zêdetir qala hevalên şehîd dikirin hewayeke hestewartir ava dibû. Berbang ji bo ku vê hewaya giran biguherîne hinekê fikirî ku çi bike. Piştre rojev guhert û bi Demhat re ket guftûgoyê. Jixwe Demhatî heya wê demê bêdeng li wan guhdar dikir û bi bîranînên wan re dîmen di serê xwe zindî dikirin.

Ew jî di vî temenê ciwan de mîna Serhed hevaleke giran, aram û dilnizim bû. Hinekê jî şermok bû û heya pê re nehatiba axaftin nediaxivî. Berbangê jê re got: “Heval Demhat, tu ji min re biyanî nayê. Dibê qey min tu li derekê dîtiyî. Tu li kîjan alanan mayî?”

Demhat: “Ez piştî şervanên nû her li Şehrîbanê mam.”

Bi vê gotinê re Berbangê fêm kir ku Demhat hevaleke nû ye. Ji ber vê xwest hinekê pê re henek bike, lê destpêkê xwest bizane ku ew li kûderê dîtiye. Jê pirs kir: “Kengê tevlê bûyî?”

Demhat: “Havîna 2010'an.”

Berbang: “Ji kûderêyî?”

Demhat: “Ji Mîksê me. Lê hatim Şaxê. Ji ser Şaxê ve tevlê bûm.”

Berbang: “Tu destpêkê hatî Masîro?”

Demhat: “Raste. Hejmareke zêde heval li wir ez pêşwazî kirim. Du rojan li ba wan mam. Piştre ez şandim şervanên nû.”

Berbang: “Hat bîra min. Ez jî wê demê li wir bûm. Tu wê demê jî pir bêdeng bûy.” Piştre dest bi henekan kir: “Ez jî wê demê nû tevlê bibûm. Min pir hewl da heval min rêkin malê, lê ez rê nekirim. Ev

salekê zêdetire dikim nakim min naşînin. Çiqas dibêjim ku nikarim vê jiyanê rakim, jiyana we li min giran tê jî heval her dibêjin ‘tişt nabe, tuyê fêr bibî’. Ez biçim, ezê xebat bikim ji bo partiyê. Lê min naşînin.”

Demhat pir saf bû, bawer kir ku bi rastî Berbang şervana salekê ye û hê biryara xwe nedaye. Tevî ku li guftûgoyên wê û Serhed guhdar jî kiribû got qey ew bîranîn ne pir kevnin û zû ji gotina Berbangê ya bêbiryarbûnê bawer kir. Lewma jê re got: “Ma qey ji vê jiyanê xweştir jiyan heye?! Eger ji vê jiyanê hez nakî, çima tevlê bûyî? Di civakê de yên herî zêde tên perçiqandin jin in, pêwîste jin ji her kesî zêdetir bên tevlê bibin û bibiryar bin.”

Berbang: “Min nedizanî evqas zor û zehmetiyên wê hene. Di televîzyonê de wisa nîşan nedidan. Ji ber vê hatim. Min digot qey eger bi dilê xwe bêm dikarim bi dilê xwe biçim jî.”

Demhat: “Ma vir cihê turîzmê ye, kengê bixwazî bêyî, kengê bixwazî biçî!”

Berbang: “Min wisa dizanî. Li mala xwe min karê xwe dikir û pir jî dewlemend bûm. Hatim vir quruşek pere di berîka min de nîne. Carna av nîne vexwim, carna nikarim têra dilê xwe razêm, carna birçîbûn û westandin heye... Îstanbul çiqas xweş bû...”

Demhat (bi acizî): “Hezar Îstanbul û Îzmîr û Enqere qurbana guniyeke vir bin. Dibê qey me ew der nedîtine. Li wir taybet jî ji bo jinan ti jiyanek nîne. Ma te nedidît jin di çi rewşekê de bûn! Jin ne di nav malê de, ne li derve di nav civakê de, ne jî li cihê kar xwedî ti azadiyê û mafekê nînin... Te çi kar dikir?”

Berbang: “Parsek bûm. Tenê diçûm taxên welatparêzan. Her roj diçûm taxekê.”

Demhat (bi dilşewitandin, nefreta ji pergalê û hêrseke hê zêdetir): “Te xêr ji jiyan û mirovbûna xwe nedîtiye. Bi xêra partiyê bi mirovbûna xwe û nirxa jinbûna xwe hesiyayî. Li malê te bi parsektî xwe têr kiriye, lê binêre, tu li vir tu karekê jî nakî, parsektî jî nakî û hemû pêdiviyên te jî pêk tên. Partiyê tu ji wê jiyana hetik ketî rizgar kirî. Lê tu dîsa jî bêriya wê jiyanê dikî!”

Berbang: “Li malê têra xwe digeriyam, li vir nahêlin biçim her derekê bigerim. Yek sale li virim, hevalan nehiştiye serdana mala xwe bikim.”

Demhat: “Hevala min, tu hatiyî şoreşgertiyê, nehatiyî gerê. Tu neçarî xwe fêrî şert û mercên jiyana me bikî. Naxwe partî wê te biqewitîne, tuyê dîsa biçî bibî parseka kolanên Îstanbulê.”

Berbang: “Vê dawiyê hevalan pêşniyara min a çûna malê pejirandin. Li benda balefirême bê min bibe. Hevalan got emê te bi balefirekê bişînin’.”

Demhat: “Hevalan henek kirine. Balefir û balefirgehên me nînin. Tiştên wisa li ser van çiyayan li çi digerin...”

Berbang: “Hevalan got 'balefira me çûye peywirekê. Wê bizivire vir.’ Gotin balefir wê bê vê meydana pêşiya paygeha xirabeya Xirbika Bestê. Ez bawerim balefirgeh ew dere.”

Heya wê demê Serhed her di dilê xwe de dikeniya û qet nediket navbera axaftinên wan. Bi zorî kenê xwe ditepisand. Lê êdî hew karî xwe bigire. Vê carê têra xwe keniya. Her li Demhat nêrî û keniya. Demhat destpêkê fêm nekir ku Serhed ji ber çi dikene û matmayî li wî nêrî. Piştre Serhed jê re got: “Hevala Berbang duwanzdeh sale gerîla ye. Bi te re henekan dike. Te çawa bawer kir! Partî wê bişîne jî naçe, bêbiryariya çi.” û kenê xwe domand.

Demhat mat ma. Carekê li Serhed, carekê li Berbangê dinêrî. Nezanî ji kîjanê bawer bike. Ji Serhed re got: “Ê... uslûb û axaftinên wê hê weke ya gerîla lê nehatiye!” Serhed bersiv dayê: “Ew îsal li ba şervanên nû bû. Ji wan fêrî ziman û gotinên herêmî bûye.” Vê carê Demhat bawer kir, keniya û ji Berbangê re got: “Dema te israr kir min ji te bawer kir. Ji ku bizanim heneke. Niha saeteke vala vala min xwe bi te re westand ji bo ku tu biryara xwe bidî.”

Vê safî û paqijbûna Demhat, ew li ber çavê Serhed û Berbangê hê şîrîntir û delaltir kir. Dîsa jî jê re gotin ku bila vê cewhera xwe ya paqij her tim biparêze, lê belê divê hişyar be da ku kes nekaribe wî bixapîne. Bêguman, ev henek bû, xapandin nebû lê hişyarbûn jî teqez pêwîst bû.

*****

**Tîma Aysel**

Çend rojan piştî tîma Serhed, vê carê tîma Ayselê ji Hêzilê ve hat Besta Navîn. Ji berê de hatibû biryargirtin ku tîmên YJA-STAR´ê yên li Hêzil û Şehrîbanê jî ji bo zivistanê li bal tîma Besta Navîn kom bibin, da ku bi hev re bikevin kampeke xweser de.

Bi vê armancê êvara roja 15’ê Cotmehê Aysel, Şerda û Evîndar di bin baraneke dijwar de ji taxima xwe xatir xwestin û ber bi Besta Navîn, alana Mewîjkê ve bi rê ketin. Ber destê seherê beriya ku dinya vebibe, gihiştin biniya çiyayê Mêrgûmarê. Piştî çend demjimêr keşfa eraziya derdor zêrevan derxistin. Ewên din jî çûn bêhna xwe vedin û vehesin. Bi dorê zêrevaniya xwe kirin heya nîvro.

Piştî nîvro hin noqteyên ku ji berê de nas dikirin kontrol kirin û li taxima Besta Navîn geriyan. Lê belê kes nedîtin. Heya êvara dereng her geriyan. Hin caran dengên derdor guhdar kirin, hin caran bixwe dengê çûka derxistin. Xwe pir westandin lê dîsa ne kes dîtin, ne şopek ji hevalan ket ber çavên wan.

Êvara 16’ê mehê bû û beriya tarî bibe baraneke dijwar ji nû de dest pêkir. Hê dema li Hêzilê bûn, naylona ku ji bo taximê peyda kiribûn li ser tîmên xwe belav kiribûn, ji ber ku êdî payîz bû, baran û şilopê dest pê kiribû û diviya xwe ji şilbûnê biparêzin. Tîma wan para naylona xwe bi xwe re birin Besta Navîn. Ji ber baranê şev tarî qetriyan bû, ango bi gotineke gelêrî ya Kurdî “çavan çav nedidît” û baran jî pir dijwar ser wan de dihat xwarê. Lewre bi şev nekarîn li şopên hevalan bigerin. Dema baran tûnd bû, hema li cihê ku lê bûn naylona xwe vedan û heya seherê di bin de razan.

Sehera roja 17'ê Cotmehê baran rawestiya. Rabûn keşfa derdora xwe kirin. Dema ji asayîbûna rewşê bibawer bûn agirek biçûk pêxistin û çaya xwe li ser çêkirin. Taştê xwarin û rabûn dîsa li pey şopa hevalan ber bi Mewîjkê ve bi rê ketin. Li wir jî çend noqte kontrol kirin, lê dîsa hevalan nedîtin. Xwestin ji bo ku hevalan bibînin ber bi Ramuranê ve rêkevin.

Dema ji Mewîjkê derketin û Çiyayê Şehîd Diyana derbas kirin, guman kirin ku ji ber ku baran bariye û rêlên avên ku ji bilindahiyan serberjêr diherikin tev bi xîz û şêlone heval wê biçin ji çavkaniyan ava pêwîstiya xwe bigrin. Bi vê gumanê berê xwe dan çavkaniyeke avê. Li wir li nêzî kaniyê şopa lingan dîtin; şopên ku çal bûne û bi ava baranê

tijî bûne. Wê demê hê koçer bi tevahî ji alanê derneketibûn û hin şivanên koçeran bi pezên xwe ve hê di eraziyê de bûn. Ji ber vê, tam dernexistin ku gelo ev şop ên hevalên wanin an yên şivananin. Lê dîsa jî ji ber ku çareyeke dî nînbû, li gorî rêgeha ku ji şopan bi dest xistin rêya xwe domandin. Gumana wan rast derket. Beriya bibe nîvro gihîştin bal taxima Besta Navîn.

Hevalên wir ji dûr ve ew dîtin û çûn pêşwaziyê. Barên wan ji wan girtin û birin ba xwe. Hê di silavdanê de hin heval ku tam bûyer nedizanîn Aysel rexne kirin ji ber ku neçûye birayê xwe li Katoyê bibîne û bi henek şemaqek lê dan û jê re gotin: "Dogmatîk! Ma birayê mirov tevlê bibe mirov naçe nabîne?" Ayselê sedema neçûna xwe ku ji ber şaşfêmkirinên ser cîhazê bû ji wan re vegot.

Êvarê beriya hewa tarî bibe kasêteke stranên dîlanê dan ser teybê û rabûn govendê. Aysel, Şerda û Sorxwînê ji her kesî xweştir dilîstin. Demjimêrekê zêdetir dîlan kirin, lê nedikarîn bi dengek bilind tilîliyan bidin û bikenin. Ji ber ku payîz bû û êdî bi weşandina pelên daran re erazî tazî dibû neçar bûn bi dengê nizim biaxivin, bikenin, stranan bibêjin, tilîlî bidin û hwd. Lewre qehir dibûn. Lê belê şahiyên xwe jî paşçav nedikirin û hema her roj dîlan dikirin û li dora agir stran û bîranînên xwe digotin. Heta rojên ku baran dibarî jî, yan di bin naylonê de dîlan dikirin yan jî li ber baranê, piştre jî diçûn agirek mezin pê dixistin û xwe li ber ziwa dikirin.

*****

**Tîma Rewşen**

Havîn û Rewşen piştî hevdîtina bi malbata Havînê re yekser derbasî Besta Navîn bûn, lê çanteyên wan li Şehrîbanê, li ba Zîlan û Hêvî man. Ji ber ku cihê hevdîtinê rêya wan pir dûr dikir, nekarîn tiştên xwe bi xwe re bibin û ji wir jî bibin Besta Navîn. Ji neçarî li ba Zîlanê wana hiştin. Dilê Zîlan ranekir çanteyên Havîn û Rewşenê li Şehrîbanê bihêle û biçe. Barê wê û Hêvî hinekê giran dibû û wê pêve biwestiyana, lê ji hiştin û veşartinê çêtir bû.

Rabûn barên xwe şidandin. Her yekê çanteyê hevalekê xistin nav çanteyê xwe û êvarê ber bi Besta Navîn ve bi rê ketin. Fîzîka her duyan xurt bû û ti pirsgirêkeke wan nebû, lê belê wê rojê hem tendirustiya Zîlanê baş û di cî de nebû, hem jî westandina karên pratîkî yên çend rojên derbasbûyî hê li ser wan bû. Ji ber ku çend roj bû tişt vedişartin, tiştên ku berê veşartine kontrol dikirin û erazî kontrol dikirin, tevî vê rast û dirust bêhna xwe nedabûn. Westandina wan çend rojan tev li ser wan mabû. Ser vê westandina xwe û nexweşiya Zîlanê re jî, ji bo rêya xwe Girê Gîvara hilbijartin.

Girê Gîvara rêzeçiyayeke mezin û firehe, lê tepeyên wê bi hevdû ve girêdayî nînin, tev ji hev belavin. Yanî di navbera hemû tepeyan de dolên kûr hene. Lewre eger bixwazî ji wir ve derbas bibî divê heya wir biqedînî carekê hilkişî, carekê dakevî. Ev jî mirovan pir diwestîne.

Bi sedema nexweşî û westandina heyî û barê giran yê ku rakiribûn, Zîlan zû ji taqetê ket. Di rê de çend caran navberên kurt kurt dan, lê pir bandor nedikir. Hêviyê hinekê ji barê Zîlan girt li ser çanta xwe girê da ji bo ku barê wê sivik bibe. Lê wê jî fayde nekir, ji ber ku Zîlan pir nexweş bû. Tenê demjimêrek mabû bigihîjin gel hevalên Besta Navîn ku çokên Zîlanê êdî ew ranekirin û tam ket.

Di nava gerîla de carna dema hevalek pir pir ji taqet û hêz bikeve û êdî halê meşê tê de nemîne, weke nîşaneya asta westandina xwe dibêje “ez mirim” an “ez şehîd ketim”. Zîlan jî hîngî westiyabû û ji hal ketibû ku ji Hêvî re got: “Êdî nikarim bimeşim. Ezê şehîd bikevim”.

Hêvî şervana du salan bû û hê hemû axaftinên mecazî ku di nav gerîla de tên bikaranîn nedizanî. Lewre dema Zîlanê got “ezê şehîd bikevim” ew wateya mecazî ya vê gotinê fêm nekir û got ku qey bi rastî Zîlan wê şehîd bikeve. Ji ber wê pir tirsiya û dest bi giriyê kir. Ji ber ku ew û Zîlan bi tenê bûn tirsiya ku eger Zîlan şehîd bikeve ewê çi

bike. Jixwe êdî berdestê seherê bû û dinya vedibû. Şevê dema dimeşiyan bayê sar pir li wan xistibû. Hêvî difikire ku belkî ji ber sermayê gurçikên Zîlanê jan girtibin û biteqin. Ji bo ku Zîlan germ bibe her çar tulumên tîmê davêje ser û bi girî jê re dibêje: “Ez diçim hevalan bibînim. Tu xwe germ bike, şehîd nekeve, ezê bi lez û bez biçim hevalan bînim gel te.” Û hê Zîlanê bersiv nedaye ku baz dide berê xwe dide cihê ku guman dike heval lêbin.

Bi bazdanê rê dikeve û di rê de her hêsirên xwe paqij dike. Ditirse ku heya ew bizivire gel Zîlanê, şehîd ketibe. Lewre bênavber û bêyî ku bêhna xwe bide bi girî û îsk dibeze. Hîngî dibeze ku rêya demjimêrekê di bîst deqeyan de qut dike. Digihîje ku derê gazî hevalan dike, lê ti bersivek nayê guhên wê. Hinek din dibeze ku heval dengê wê dibihîsin û diçin pêşiya wê. Rewşen dema wê dibîne pir ditirse ku di rê de ketibin kemînê û tiştek bi Zîlanê hatibe. Jê dipirse: “Çi bûye? Ka Zîlan? Çima digirî?” Pirs li pey hev tên, lê Hêvî ji ber girî û îske îskan nikare bersiv bide.

-Hûn ketin kemînê? Kemîn li pêşiya we hebû?

-Na.

-Qezayek çê bûye? We qezayek kiriye?

-Na.

-Tiştek bi hevalan hatiye?

-Na.

-Ê çi bûye heval, de bêje.

Hêvî ji ber ku pir beziyabû bêhna wê çikiyabû û bi zorî henase digirt. Desteke xwe danîbû ser sînga xwe, destê din jî bi darekê girtibû ji bo ku karibe ser pêyan raweste û nekeve erdê. Giriyê wê ranediwestiya û nedikarî bersiv bide. Tenê peyvên “na” û “Zîlan” ji devê wê derdiket. Ji bo ku ser xwe ve bê hevalan av jê re anîn. Hêviyê avê vexwar, hinek av jî bi dest û rûyê xwe de kir. Hinekê rûnişt, henaseya wê rehet bû. Piştre ji hevalan re got: “Heval Zîlan şehîd ketiye!” û bi vê gotina xwe re rondikên wê careke din hatin xwarê.

Çawa ev gotin ji devê wê derket, her kes mat ma û reng jê çû. Rewşen û du hevalên din ber bi aliyê ku Hêvî jê hatibû ve beziyan. Hêvî jî li pey wan. Bi lez xwe gihandin wê derê. Di rê de ji tirsa şehadeta Zîlan hew mabû dilê wan raweste. Wate nedidanê ku Zîlan çima û çawa şehîd ketibe. Ne kemîn û pevçûnek li holê heye, ne qezayekê rû daye, sedema şehadetê dibe çi be nedizanîn. Derfet jî nebû ku ji Hêvî

bipirsin. Lewre bênavber beziyan. Reng di rûyê wan de nemabû. Sed fikarên cur bi cur di serê wan de dihatin diçûn. Lê nedikarîn bersiva yekê jî bidin.

Bi evqas tirs û fikaran dema gihiştin wir dîtin ku Zîlanê ji xwe re agir pêxistiye, çay danîye ser, bi tîna tava ku derketibû û germaya agir germ bûye û ser xwe ve hatiye. Ji tirsan re rih ji wan çûbû, lê dîtin ku kêf kêfan Zîlanê ye. Dema li şûna bedeneke şehîd Zîlaneke ser pêyan dîtin ji kêfa re yekser reng li rûyê wan vegeriya û ken ket ser lêvên wan. Wekî ku çend sal be hevdû nedîtibin germ germ hevdû himêz kirin. Hêvî şoq mabû ku Zîlan çawa ser pêyane, ma ne wê gotibû ku wê şehîd bikeve. Ma ne ser gotina wê re ew çûbû ewqas heval xistibûn nav tirs û panîkê! Hêvî piştî ewqas girî û îskê ji her kesê kêfxweştir bû ku tiştek bi hevala wê ya rê nehatiye û hevala wê ew tenê nehiştiye.

Dema Rewşenê rewşa Zîlanê pirs kir wiha bersiv da: “Çend roj bû nexweş bûm. Hê tam ser xwe ve nehatibûm. Ji ber ba û sermaya rê jî gurçikên min jan girtin. Lê dema germ bûm baş bûm.” Heval vê carê ji kenan re mirin. Hêvî mat mabû ku çima gotina Zîlanê rast fêm nekiriye.

Piştî evqas tirs, bazdan û westandina rê ji bo ku tola xwe ji Zîlanê rakin çayek pê dan çêkirin. Çaya xwe vexwarin, barên wan ji wan girtin û ber bi noqta xwe ve ketin rê.

*****

Piştî çend rojan Felat û endamên din ên taximê jî hatin Besta Navîn. Ronahî û Sarya Gever jî dema Heval Gulistan ji bo cara dawiyê hat serdana alanê pê re hatin, li wir man û tevlî hêzên wir bûn. Bi vî awayî hêzên ku li Besta Navîn zivistanê derbas bikirana li alanê kom bûn. Hevalên ku li alanên din bimabana jî, ji bo cihên xwe hatin şandin. Bi vî awayî alan bi endamên xwe re ma.

***Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!***

Koçerên ku biharê ji Hezex, Cizîr û Êlihê hatibûn ser Bestayê re derbas bibûn û heya zozanên Kêla Memê, Feraşîn, Masîro, Girê Ezmana û Kato Jîrkayê çûbûn hêdî hêdî vedigeriyan û dîsa ji ser Bestayê re derbasî cihên ku ji bo jiyana zivistanê diyar kiribûn dibûn û alan berdidan.

Dijmin mîna her payîzek, wê payîzê jî di navbera koçeran de agehiyeke wiha belav kir: “Di demeke nêz de wê li van deveran operasyoneke leşkerî li dijî gerîla dest pê bike, lewre bila koçer zû biçin.” Lê vê carê pir zû, ji heyva Rezberê (îlon) ve ev gotin belav bû. Jixwe gelek bihar û payîzan operasyon li Bestayê dihat kirin; kêm caran bêyî operasyon derbas dibû. Lewre weke rewşeke cidî lê nehat meyzandin. Jixwe êdî şert û mercên hewayê diguherîn, zozan dihatin girtin û bi vî awayî wexta çûna koçeran hatibû. Zom diçûn û şivan bi pezên xwe ve di eraziyê de diman da ku pezên xwe hineke din jî di xwezaya şîn de biçêrînin. Ew jî êdî her diçû kêmtir dibûn. Tenê çend zom û şivan di eraziyê de mabûn.

Heval Gulistan ku wê payîzê careke din serdana hemû herêman kir, ji Katoyê zîvirî û hat xebatên dawiyê yên Bestayê jî bi rê bixe û biçe cihê xwe yê zivistanê. Beriya wê bi Fermandariya Biryargeha Navendî ya YJA-STAR´ê re nêrîna xwe di vê mijarê de hevbeş kiribûn ku wê zivistanê li Bestayê hevalên jin xweser bikevin kampê. Jixwe çend sal bû li hin herêmên din ên Botanê kampên xweser hebûn, lê li Bestayê ewê bibûya cara yekê. Heval Gulistan ev biryar bi Evîn û Hemze re parve kir. Ji bo cihên kampan nêrîn hatin parvekirin. Ser vê bingehê wê keşfa erazî dest pê bikira.

Heval Hemze ji berê de ji bo ku cihekê ji bo kampan bibîne her di tevger û keşfan de bû. Di encamê de hin ciyan dît. Kampa wî jî wê kampeke tenê ji hevalên xort pêk bihata û bixwe bi tevî Felat, Serhed û Rênas wê di desteya rêveberiya kampê de cih bigirtana.

Rojekê Hevala Gulistan ji bo dîtina cihê ku Hemze guncav dîtibû pê re çû wir. Cihê ku hatibû guncav dîtin xîz bû û dar zêde lê nebûn. Lewre di warê leşkerî de qet bal nedikişand, lê eger eşkere bibûya jî kes nedifilitî. Heval Gulistan fikara xwe ji ber tijî û tarînebûna daristana derdora wir û xîza heyî anî ziman. Vê, fikar di Heval Gulistan de ava kir.

Lê belê Hemze got: "Jixwe ji ber ku daristana vir tijî nîne û gelek xîz heye heya niha kamp lê nehatiye çêkirin. Ji ber vê jî dijmin qet guman nake ku li vir kamp hebe. Vir bala tu kesê nakşîne."

Di encama guftûgo û hin keşfên din de Heval Gulistan wir ji bo kampa hevalên xort erê kir. Piştî vê, bi tevî Evînê ji bo kampa xweser a hevalên jin jî giftûgo kirin. Ser daristana tarî ya binarê Mêrgûmarê nêrîneke hevbeş derket.

Çend roj şûnde berdestê sibeyekê, demjimêrek beriya ku dinya vebibe Heval Gulistan û Evîn rabûn çûn keşfa cihê ku ser axivîbûn. Li wir ciheke guncav ji bo kampa hevalên jin dîtin. Evîn wê ser vê kampê rawestiyaba û bi tevî Aysel, Rewşen û Ronahî Sêgirkê desteya rêveberiya kampê pêk bianiyan.

Hemze piştî keşfa ku bi Heval Gulistan re ji bo kampa wan kiribûn biryar da cih biguherîne û ciheke nû keşf kir. *(Nayê zanîn Heval Hemze çima cih guhert; dibe ku piştre ser fikarên Heval Gulistan fikirîbe û biryara guhertina cih dabe, dibe ku şivan û gundiyên nêçîrvan û mêşvan li van deran ew di dema keşfê de dîtibin û Heval Hemze bi wan hesiyabe, û hwd. gelek egerên din hene, lê evana hemû egerên ku heval piştî şehadeta wan didan in, lewre yekane kesekê ku sedema vê biryarê dizanî Heval Hemze bixwe bû, ji ber ku derbarê vê de ji kesekê re tiştek negotibû nedihat zanîn çima cih guhertin.)*

Cihê nû li jêra Çiyayê Mêrgumarê, li jora Aşê Tuşîmyayê, li pala dolikekê bû. Yanî ji cihê berê bi qasî sê dolên mezin pêşvetir û bi qasî demjimêrekê li jêra cihê kampa Heval Evîn bû. Jixwe ew dolik dadiket ser dola Xirbikê Bestê. Gelek dolikên biçûk ji rast û çep ve ber bi dola mezin ve vedibûn. Di dola mezin de çemê Xirbik ku çemeke mezine her demê diherikî, lê di dolikên derdor de tenê di demên baran û berfê de av diherikîn. Kampa Hemze wê ava xwe ji wê dolika ku tê de bûn bigirtana û bi ti awayî daneketana ser çemê Xirbik.

Qet haya Evîn ne ji cihê kevin û ne ji wî cihê nû yê kampa Hemze tinebû. Her tim fermandariya hemû herêman tev ji navnîşana kampên hevdû agahdar dibin, lê ji kesî re nabêjin. Ev agahdarkirin ji bo vêye ku eger rewşeke awarte ji bo kampekê derket holê kampên din karibin xwe bigihînînê, destwerdana rewşê bikin û alîkariyê bidinê. Lewre ev, pêwîstiyeke ewlekariyê ye û di nav gerîla de weke resm û qanûn lê hatiye. Tevî vê jî Evîn qet cihê kampa Heval Hemze pirs nekir. Li bendê bû Hemze jê re bibêje, lê dema ku wî negot, wê jî pirs nekir û her li

bendê ma. *(Dibe ku Heval Hemze xwestibe di wexteke guncav de cih nîşanî Heval Evîn bike lê ji ber şert û mercên awarte yên ku ser hev rû didan derfet nedîtibe û pê re negihiştibe û hwd. gelek egerên din hene. Lê evana jî hemû egerên ku heval piştî şehadeta wan didan in, yanî tam sedema vê negotin û agahdar nekirinê jî nayê zanîn. Careke din yekane kesekî ku sedem dizanî Heval Hemze bixwe bû, ji ber ku derbarê vê de jî ji kesekî re tiştek negotibû.)*

*****

Tenê du konên koçeran û du şivan di eraziyê de mabûn. Ew jî hinekê dûrî cihên ku ji bo çêkirina kampê hatibûn destnîşankirin bûn. Hemze û Evîn bi hev re axivîn û ji bo çêkirina kampê li ser hin hevalan nêrîn parve kirin. Her kes ji bo vî karî guncav nebû. Hişyarî, hesasiyet, dîsîplîn û jidilbûneke pir zêde di vê mijarê de pêwîst bû. Kesên ku kamp çêbikirana diviya di van mijaran de bi temamî ji wan bihata bawerkirin. Ji bilî vana, rewşên fîzîkî ya hevalan jî dihat berçavgirtin.

Di guftûgoyan de ji derveyî Aso, hemû hevalên din guncav dîtin lê hin heval di warê fîzîkî de lewaz bûn û zorî dikişandin, hin heval xebatên wan hebûn û pêwîst bû bi lez ser rawestin û biqedînin. Di encamê de Serhed weke berpirsyar, Mehsum, Demhat û Amed guncav dîtin. Dema nêrîneke hevbeş derket, Hemze gazî Serhed kir, pilansazî jê re ragihand û ew erkdar kir. Piştre gazî sê hevalên din jî kir da ku pilansaziyê ji wan re jî ragihîne. Di vê çavçovê de agahiyên pêwîst da wan, hişyariyên pêwîst li wan kir û ser hesasiyeta xebata ku bimeşînin qederekê bi wan re axivî.

Êvarê ev tîma erkdar ji bo destpêkirina xebata xwe bi rê ketin. Beriya ku tarî bikeve erdê hemû hevalên noqtê rabûn noqteya xwe guhertin û ber bi noqta nû ve bi rê ketin. Tîma Serhed jî hin kelûpelên pêwîstiyên xwe li pişta hêstirekê girêdan. Bêr, das, tevir û birek jî xistin destên xwe de û amadeyî çûna cihê ku Hemze nîşanî wan dabû bûn. Ew, veşartî diçûn û kesê nedizanî ji bo çi diçin, ji ber ku dema pirs bikirana wê ji wan re bihata gotin ku ev tîm çûne peywirekê û ewê vegerin. Lewre piştî hemû heval ji noqtê derketin û çûn noqta nû, ev tîm rabûn tiştên xwe amade kirin.

Ronahî Sêgirkê, Sorxwîn û Berbang piştî ku hin tişt birin noqta nû, careke din ji bo birina tiştên mayî vegeriyan. Piştî ku tiştên xwe girtin û xwestin derkevin, çavên wan bi tîma Serhed ket ku qoşxane û torbeyê

erzaq li ser pişta hêstirê girêdidan. Guman kirin ku Serhed wana wê biçin kampê çêkin, lê bi rûyê xwe neanîn.

Sê şev beriya wê dema ji noqteke din hatin wir, piranî heval pêş de hatibûn. Silav, Serhed, Beşîr û Berbang jî ji bo anîna kelûpelên noqtê û hin erzaqên zêde bi hêstiran, li paş mabûn. Li cihekî pêwîst bû bi lez dakevin û derbas bibin, di vê bazdanê de lingê Berbangê li kevireke dolê qelibîbû, ketibû xwarê û çoka wê êşiyabû. Ji pêş ve Silav, ji pişt ve jî Serhed bi lez ber bi wê ve beziyabûn û ew ji erdê rakiribûn. Serhed xwestibû hefsarê hêstira wê jî bigire û bi hêstira xwe ve girê de da ku Berbang rehet bimeşe, lê Berbangê nehiştibû. Dîsa jî dilê Serhed rehet nebibû û ji bo ku eger alîkarî ji Silav û Berbang re pêwîst bibe karibe bi lez xwe bigihîne wan, ji wan dûr neketibû.

Roja dî dema hevalan pirs kiribûn ku çima Berbang dikule, ev bûyer ji hevalan re vegotibûn. Bi vî awayî Ronahî Sêgirkê jî agahdar bibû. Vê carê dema tîma Serhed li ser rê mijûlî girêdana hêstirê bûn, ev bûyer hat bîra wan. Ronahî ku ji fedakariya Serhed a di vê bûyerê de bandor bibû ji wî re got: “Heval, ji we re alîkarî pêwîste?”

Serhed: “Na heval, gelek spas. Barê we giran dixuyê, eger ji we re alîkarî pêwîst be em amadene.”

Berbang: “Em barê bi we re rakin, serê hêstirê bigirin heya hun girê bidin.”

Mehsum: “Na, spas. Em evqas kesin, dikarin. Serbar hinekî pirsgirêkê derdixin. Em destpêkî têrrê girê din, piştre serbar girê din, temame.”

Serhed (bi henek ji Berbang re): “Ev hêstir êdî te nas dike, nêzî wî bibî wê dîsa ser te de bê. Hema xwe nêz neke çêtire.”

Ronahî dît ku hêstir aram ranaweste, nêzî bû da ku serê wê bigire, lê dît hêstir bixwe rawestiya. Kêfa wê hat, mijarek ketibû destê wê ji boy bela xwe li Berbang bixe û bibêje “hêstir dema ez dîtim di cihê xwe de aram bû lê dema te dibîne ser te de tê.”

Hevalan hinekê bi wan re li ser pêyan axivîn, dema dîtin ji wan re alîkarî pêwîst nîne ji wan re gotin “qewet bê” û derbas bûn çûn. Ev, hevdîtin, henek û guftûgoya dawî bû di navbera Serhed, Mehsum û Demhat bi Ronahî, Sorxwîn û Berbangê re. Ewê weke dîmen û awirên herî dawî ya wan maba di zîhnê zindiyan de û careke din dê wan tenê di wêneyan û xewnan de bidîtana. Lê di wê kêliyê de kê/î dizanî ev ji hev cudabûn êdî cudabûn û ji hev qutbûna dawiyê ye û şansa dubare

pêkhatina wê êdî nabe. Kê/î dizanî careke din ev axaftin wê neyên kirin û axaftina wê rojê bixwe jî çend heyvên din wê bibe bîranîneke pir hêja û pîroz ku her cara dema bê bîra yên sax bimînin wê çavên wan tijî hêsir bibe. Dîmena herî dawî ew kêlî bû ku Serhed û Mehsum her yek li aliyeke hêstirê rawestiyabûn û bi werîseke stûr barê ser pişta hêstirê girê didan û dişidandin...

Ronahî wana dema vedigeriyan noqta xwe ya nû, Sorxwîn ku şervana salekê bû got: “Ev heval Serhed çiqas hevaleke dilnizim û hêja ye. Me bihişta ewê barê me ji me bigirta, bixwe bianiya noqtê. Mirov ji rawestîn û gotinên wî pir bandor dibe.” Ronahî û Berbangê jî van gotinan erê kirin.

Tîma Serhed wê şevê çûn û sibê seherê dest bi xebatên xwe kirin. Çend roj şûndetir Cudî jî li wan hat zêdekirin da ku zû karên xwe biqedînin, ji ber ku eger çêkirina kampê dirêj bajota wê metirsiya ewlekariyê derketa holê.

Di pala çiyê de kampa xwe çêkirin. Kamp bi awayê pênc mangehên li kêleka hev kolan. Mangehek ji bo hevalên jin, du ji bo hevalên xort, yek ji bo rêveberiyê, yek jî ji bo çêkirina xwarin û nan û bicîhkirina erzaq û ard destnîşan kirin. Di navbera mangehan de dîwarên bi qasî 50-60 santîm stûr dihatin hiştin. Her carê mangehek dikolan û serê wê digirtin, piştre dest bi mangeheke din dikirin. Piştî ku hemû mangeh yek bi yek qedandin û ser girtin, îcar nayloneke dirêj û yekpare ser hemû kampê de kirin û ji nû de ser girtin. Bi ax, pûş û çilo dîmena wir li gorî reng û dîmena derdor eyar kirin.

Koma ku kamp çêdikir di warê ewlehiyê de berpirsiyartiya hemû kampê radikir ser milên xwe. Lewre hewl didan di asta herî jor de bi dîsîplîn tevbigerin. Li gorî vê jî hewl didan bi agireke pir biçûk xwarin û çaya xwe çêkin, di dema şilahî û heriyê de şopa lingan li ser erdê nehêlin, deng dernexin û bi dengê nizim bi hev re biaxivin. Heta dema cil û bergên xwe dişûştin jî, ji bo ziwabûnê bi şev radixistin, ew jî li nêzî xwe û li ser çiqlên nizim ên daran. Dema ziwa dibûn jî beriya bibe roj bi lez radikirin. Çûnhatina ba wan bi giştî qedexe bû; ne ew ji cihê xwe derdiketin û diçûn ba taximê, ne jî hevalên taximê serdana wan dikirin. Tenê Hemze hatinçûn dikir, xebatên wan çavdêrî dikir û pêdiviyên wan pirs dikir. Dema pêwîstiyeke wan bi erzaq û tiştekê hebûya, Hemze cih

ji wan re nîşan dikir ji bo ku biçin ji wir bigirin, hin caran jî bixwe ji wan re dibir.

Tevî hemû hesasiyet û ziravkariyên hemû hevalan di vê pêvajoya çêkirina kampê de hin bûyeran rû da:

Rojên destpêka kar, yanî piştî ku kolandina mangehekê qedandin ji bo sergirtina wê çûn ji ciheke dûr dar jê kin. Destpêkê hemû eraziya derdora xwe keşif kirin. Ti kes xûya nebû. Dema dilê wan rehet bû ku kes di eraziyê de nîne, dest bi jêkirina daran kirin. Ji ber ku pêwîst bû zêde ax bavêjin ser kampê, diviya darên ku ji bo ban jê bikirana stûr û qayîm bûna. Lewre birek, das û hin car bivir jî xebitandin. Bi lêdana her bivirekê re deng derdiket. Êvarekê şivanek çû ba wan û ji wan re got ku dengê bivirê wan bihîstiye. Hevalan jî jê re gotin ku ji bo veşartina erzaqê cih çêkirine.

Di pêvajoya kar de rojekê dema ku mijulî kolandinê bûn di demjimêr 10:00'ê sibê de skorskyek ji Şirnexê rabû û ser wan re derbasî Elkê bû. Di rastiyê de wê salê skorsky gelek caran ji wê derê ve derbas bûn û ew der weke xeteke xwe xebitandin. Lewre dema vê carê jî ser wan re firiya, wan wiha guman kirin: "jixwe ev der xeta skorskyê ye. Her tim ji vir ve derbas dibin. Asayî ye". Bi vî awayî fikarek neket dilê wan de. Piştî hefteyekê careke din skorsky ji ser wan ve firiya û ji Şirnexê derbasî aliyê Elkê bû. Heval dîsa jî bi heman awayê berê fikirîn û bêfikar tevgeriyan. Her du caran dema skorsky ji ser wan re derbas bû, li derdora cihê kampê ti tişteke derveyî rengê xwezayê tinebû. Ew bixwe jî heya skorsky derbas bûn di bin daran de rûniştin. *(Gelo skorsky cara yekem weke her carê bi awayeke asayî ji wir ve derbas bû û dîmen dît, lewre cara duyemîn ji bo keşf û zelalkirina dîmena ku girtiye dîsa ji wir ve hat? Ev nayê zanîn. Bi giştî nayê zanîn ku gelo skorsky dîmena kampê û hevalan li wir girt an na.)*

*****

Demeke kurt piştî ku tîma Serhed ji bo çêkirina kampê ji taximê veqetiya, Ronahî Sêgirkê û çar hevalên jin ên din jî ji bo çêkirina kampa xwe hatin erkdarkirin. Her du kamp di xetekê de bûn. Hevalên din erzaq û kelûpelên pêdiviya kampê bi şev heya cihekê dikişandin û di bin daran de vedişartin. Evînê ji berê de ev cih nîşanî Ronahî kiribû. Tîma Ronahî ku kampê çêdikirin jî, bi şev dihatin ew pêdivî ji wir radikirin dibirin kampê.

Bi heman awayî ji bo kampa Hemze jî pêdivî bi şev heya cihekê dihat kişandin, tîma Serhed jî ew dikişandin nav kampê. Ji ber vê, rêya hatinçûna hevalan ji bo her du kampan heya cihekê yek bû û di wexta birina tiştan de dem dem hevalên jin û xort li ser rê hevdû didîtin.

Carekê dema heval ji erzaqbirinê dizîvirîn, di vegerê de rastî Aso hatin. Jê re negotin ku ji bo çi çûne û ji kûderê ve tên. Lê Aso fêm kir ku her du kamp di yek xetê de ne. Ji vê pêve dema heval ji bo peywirekê (kîjan peywir dibe bila bibe) ji taximê qut dibûn, Aso bi dizîka saet digirt da ku bizane ew heval di çi demekê de diçin û vedigerin. Bi vî awayî hema hema guman dikir ku erzaq heya kî derê tên birin û hevalên di kampê de dixebitin jî rêya çiqasî tên ji wir erzaqê dibin. Van dem hesabkirinên wî bala hevalan kişand, lê Aso înkar kir. Hemû hevalan dizanîn ku kampên wê zivistanê wê xweser bin. Aso jî dizanî.

Carekê Hemze di bin navê gera eraziyê de çû ji dûr ve li cihê kampê binêre, da ku bi temamî ji ewlebûna wê bibawer be. Aso jî wan deman pir daxwaza derketina erazî û çûna nêçîrê dikir, lê ji ber bêbaweriyên hember wî bi hinceta ku birîna çoka wî xwe negirtiye û baş nebûye destûr jê re nedihat dayîn. Vê carê ji bo ku gumanên cuda di serê xwe de çêneke, Heval Hemze ew bi xwe re bir. Heya cihekê meşiyan û li derdora tepe û dolan zîvirîn. Hemze dema çavên xwe li hemû eraziyê digerand veşartî li cihê kampê jî mêze dikir. Berê xwe dida aliyekê, lê çavên wî li aliyeke dî dinêrîn. Di dawiyê de xwest bi dûrbînê jî baş li derdora kampê binêre û kontrol bike.

Bi vê mebestê li cihekê ji Aso re got: “Tu li vir bimîne. Ezê niha vegerim.” Ew li wir hişt û daket dolekê û xwe ji ber çavên Aso winda kir. Piştre hilkişiya cihekê û ji beramber ve bi dûrbînê baş kampê çavdêrî kir. Dema jê ewle bû, dîsa daket dolê û ji wir ve hilkişiya ba Aso. Bi vî awayî rêya hedef berovajî nîşan da. Nêzî deh xulekek derbas bibû. Li wir Aso jê re got: “Ez guman dikim cihê kampê li kîderê ye.”

Heval Hemze ku li benda gotineke wisa nebû, mat ma û reng avêt. Her kesê cihê kampê taybet ji Aso diparast. Ji bo parastina ewlekariyê weke qanûn û dîsîplîneke gerîlayî cihê kampê ji ti kesî re nedihat gotin, naxwe di rastî de fikara ku li hember Aso hebû li hember ti hevalek din tinebû. Lewre Hemze li hember gotina wî mat ma û bi acizî ser de çû û jê re got: “Eger gotin ji devê te derkeve, ezê bi vê zivistanê çantê te

bidim pişta te û te bişînim Başûr.” Piştî ku vegeriyan noqtê Hemze, ev mijar bi rêveberiyê re parve kir û fikarên xwe anî ziman.

*****

Fermandariya Qada Botanê li Kato civiyan û pilan û vesaziyên xwe yên zivistanê diyar kirin. Li gorî vê pilansaziyê Heval Rubar Mêrdîn wê derbasî Cudî bibûya û zivistan li ba hêza wir derbas bikira. Bi vê armancê, heyva mijdarê ku li cihê bilind ên weke Kato, Herekol û navsera Cudî berf ketibû erdê, Heval Rubar ji Kato Jîrkayê zîvirî Bestayê da ku derbasî Cudî bibe.

Wê demê Hemze mijara naskirina Aso ya cihê kampên wir bi Heval Rubar re parve kir û fikara xwe ya li hember wî anî ziman. Bi sedema lewaziyên îradeyî yên Aso, guman û nerehetiya hêzên Bestayê li hember wî, herwiha bi sedema ku Aso wê payîzê heval di anîn û birina pêdiviyan de dîtiye ji Heval Rubar xwest ku bi lez Aso ji Bestayê derxe û bişîne herêmeke ku cihê kampan nas nake.

Heval Rubar pêşniyar û fikara Hemze di cih de dît û li vê fikirî ku Aso ji bo wê zivistanê bişîne ku derê. Di dawiyê de biryar da ku wî bigire gel xwe û bi xwe re bibe Cudî. Jixwe Dengtav jî li ba wî bû. Lê belê ew, ser erdnîgariyê pir serwer nebû û gelek cih nedizanîn.

Panzdeh roj beriya wê, Heval Rubar serdana Herekolê kiribû, Dengtav jî bi xwe re biribû wê derê. Bi vî awayî Dengtav cihê kampa hevalên xort ku Rubar Qamişlo ser radiwestiya nas kir, lê belê neserweriya wî di naskirina eraziyê de vê carê bi kêrî rêxistinê hat; ji ber ku dema îxanet kir nekarî dijmin bibe ser wê kampê. Aso berovajî Dengtav, di naskirina eraziyê de xurt bû. Heval Rubar Mêrdîn li Bestayê ji bo ku metirsî ji ser vê herêmê rabibe, di kêleka Dengtav de, bi behaneya sivikkirina hêza Bestayê Aso jî girt ba xwe. Jixwe çoka wî jî baş bibû.

Tirs û fikara Hemze û hêzên Bestayê rast û di cih de bû. Ew ditirsiyan ku eger Aso zivistanê bireve, li wir dijmin bîne ser hevalan û her du kampên Besta Navîn bide dest. Lê belê ti carê ji hişê tikesî re derbas nebû ku Aso li Cudî îxanetê bike û li wir bi tevî Dengtav dijmin bibe ser sê kampên hevalan. Piştre jî pêşengtiyê ji operasyon û serdegirtina kampa Bestayê re bike. Kes nefikirî ku Aso ji Cudiyê ve dijmin bibe ser Bestayê. Tirsa ku Hemze ji bo Bestayê jiyan dikir li Cudî pêk hat û weke pêlên lehiyeke wêranker ber bi Bestayê ve herikî û kampa Hemze jî da ber xwe. Kê/î dizanîbû îxanet evqas bi lez heya vê

astê kûr bibe û îxanetkar evqas zû hemû rûmet û nirxên xwe winda bikin û bi dijminê xwe re bibin yek!

Di kêleka evqas meraq, lêkolîn û hewldanên Aso yên ji bo naskirina cihê kampan, ewqas hevalên din hebûn ku rojekê pirsekê ku ewlekariyê bixe metirsiyê nekirin. Heta şervanên nû û ciwan jî ev hesasiyet ber çav digirtin û dema hevalek xûya nebûya pirs nedikirin çûye kû. Heta Evîn ku fermandara hêzên YJA-STAR ´ê ya vê herêmê bû jî, tevî ku pêwîst bû cihê kampên din bizane bixwe pirs nekir û li hêviya agahîdana Heval Hemze ma. Ji bilî Aso her kes pir hesas tevdigeriya.

Carekê Evînê xwest hinekê eraziyê çavdêrî bike. Jixwe hevalên rêveberiyê ev kar bi taybetî dikirin û her çend rojan carekê ji bo çavdêriyê diçûn digeriyan. Evîn, Ronahî Murad jî bi xwe re bir. Evîn li pêşiyê dimeşiya. Bi Ronahî re çend metrekê navbera wan hebû. Heya cihekê meşiyan. Ji nişkave çavên Evînê bi metareyeke şîn ê gazê ku bi pûş û çiloyan hatibû veşartin ket. Fêm kir ku ev, tiştên kampa Heval Hemze ne û kamp pêwîste li nêzî wan deran be. Tirsiya û reng avêt. Beriya ku Ronahî bigihîje wê, bi lez ber bi Ronahî ve paşde vegeriya. Ronahî jê pirs kir: "Çima paşde hatî? Çi bû, çima rengê te zer bûye?" Evîn rastiyê neda der, xwe nexweş nîşan da û bersiv da: "Ji nişka ve serê min gêj bû û çavên min tarî bûn. Xwe li ser pêyan nagirim. Were em vegerin noqtê." Û bi lez ji wir dûr ketin.

Kampa Heval Hemze di bîst rojan de hat temamkirin. Kampa Evînê jî ku ji du mangeh û cihek ji bo aşxane û erzaqan pêk dihat, di sêzdeh rojan de qediya.

Piştî ku xebatên her du kampan bi dawî bûn, komên Serhed û Ronahî Sêgirkê ku kampên zivistanê amade dikirin vegeriyan ba taximên xwe. Endamên kampên Hemze û Evîn ji hevdû veqetiyabûn û her yek li ciheke cuda bicih bibûn. Eger rewşeke awarte derneketa holê, wê heya dema ku berf giran biketa erdê û bi temamî derbasî kampa zivistanê bibûna li wir mabana. Ji wan deran re Noqta Payîzê dihat gotin.

Bi vî awayî koma hevalên jin ku bi Evîn re biketa kampê li cihekê, koma hevalên xort ku bi Hemze re biketana kampê jî li ciheke dûrî wan Noqta Payîzê ji xwe re çêkirin û lê man.

*****

***Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!***

**Zivistana 2012 – Ketina Kampan**

Heval Rubar tevî Dengtav, Aso û du hevalên rênas ber bi Cudî ve bi rê ketin. Heya wê demê li Besta Navîn du car teyrok û berf barîn, lê zû heliyan. Zêdetir baran dibariya. Lê li hin deveran berfê erdê girtibû, li cihên bilind jî hê zêdetir bû. Dema gihiştin Çiyayê Fileh, berfa wir pir zêde bû û bagerê nedihişt wir qut bikin û derbasî aliyê Cudiyê bibin. Lewre neçar man paşde vegerin ba hêza Bestayê. Çend rojan li wir man û careke din xwe li berfê dan. Vê carê bi serkeftî wir derbas kirin û xwe gihandin Girê Hirmo.

Hevala Binevş Êzîdî û Hevalê Serbest Harûnî fermandarên herêma Cudiyê bûn. Heval Rubar li wir bi rêveberiyê re civîn çêkir û bi hev re pilan û vesaziyên zivistanê destnîşan kirin. Li gor vesaziyê, Aso û Dengtav ji ber ku li ba Heval Rubar bûn û bi wî re tevdigeriyan li ba wî hatin hiştin, ji bo ku bi wî re di kampekê de bin.

Wê zivistanê destpêkê li Navsera Cudî operasyoneke mezin dest pêkir. Berxwedaneke mezin li wir derket holê. Çend heval şehîd ketin, lê derbên giran jî li dijmin dan. Ji ber berxwedana zede ya hevalan, windahiyên cidî yên ku dijmin didan û berf û hewaya sar û dijwar leşkerên Tirk nekarîn zêde xwe bigirin. Neçar operasyon bi dawî kirin û paşve vekişiyan.

Dema di Navserê de şkestin, demeke kurt şunde berê xwe dan Girê Hirmo. Li wir berfê hêj erd negirtibû. Yek du caran kêmekê barîbû, lê zû heliyabû. Destpêkê bi balefirên şer êrîşên hewayî hatin kirin. Di encamê de Heval Binevş û Heval Haşim (xalê Havîn) şehîd ketin.

Piştre ji bejahiyê ve operasyoneke berfireh hat destpêkirin. Dijmin li çend cihan bazin û xelek çêkirin. Xelekek bi rasthatî li derdora kampa Heval Rubar bû. Xelekeke teng nebû, ji ber ku dijmin qet nedizanî heval li kûderê ne ango li wirin an na. Agahî û keşfeke zelal di destên wan de tinebû. Lewre operasyon bi awayê lêgerandinê bû; yanî erazî didan ber fîşekan û li hevalan digeriyan.

Bi dengê skorskyan heval bi operasyonê hesiyan û li gorî vê xwe amade kirin. Heval Rubar, Zîlan Bagok, Sema Selmas, Zana Amed, Berxwedan Roboskî, Aso û Dengtav di vê kampê de bûn. Dijmin erazî dabû ber xwe û pêşve diçû heya bazina xwe teng kir.

Dema bazina leşkeran teng bû, berxwedan û îxanet li hember hev rabûn. Li aliyekê Aso û Dengtavî îxanet kirin. Li aliyê din; Heval Rubar di nav êşên birînên kûr û dijwar de, di lûtkeya girêdayîbûn û qehremaniyê de şehîd ket. Heval Zîlan û Heval Sema bi evîna Rêbertî û Rêhevaltiyê li ser şopa Jandarka Kurd, Fermandar Bêrîtan Hêvî li ser lûtkeya helwestê firiyan. Heval Zana û Heval Berxwedan bi vîna ku ji Rêber û şehîdên xwe girtibûn xeleka dijmin qetandin. Kê dizanîbû ku biharê, Heval Zana dema ji bo tola van şehîdan biçe li Şirnexê çalakî bike li wir di lûtkeya biryardarî û wefadariyê de şehîd bikeve.?!

Aso û Dengtav piştî kampa Heval Rubar, dijmin birin ser kampa Heval Serbest jî. Heval Serbest û çend hevalên din jî li wir şehîd ketin. Dijmin piştî van encaman ji Cudî vekişiya û operasyon bi dawî kir. Ji bo êrîşeke dî pêwîstiya wan bi agahiyên ku ji îxanetkaran bigirin hebû. Lewre Aso û Dengtav bi xwe re birin Emniyeta Şirnexê. Piştî çend roj lêpirsînan ew birin Kun Mişkê.

Kun Mişkê li başûrê Şirnexê di ciheke dûrî avahiyên medenî de hatiye çêkirin. Tê gumankirin ku çar qat di bin erdê de û du sê qat jî li ser erdê be. Ya rast, ji bo ku kes nezane çend qate û hundirê wê çawaye, çadireke spî ya mezin ku xetên sor li ser bû pêde kiribûn. Hejmara qatan di nav gelê Şirnexê de dev bi dev digeriya, lê ji derveyî dijmin, ji bo ti kesê tam zelal nîne.

Çadira spî ya xetsor bi salan bû bi ser Kun Mişkê ve bû. Di wir de xebatên sîxûrkirin, kontrgerîla, perwerdeya sîxûrên MÎT û JÎTEM´ê, polîs û hwd. dihat meşandin. Di heman demê de kesên ku ji nav gerîla reviyabana û îxanet bikirana li wir perwerdeya kontrabûnê didîtin û di kontra û sîxûrbûnê de dihatin pisporkirin.

Aso û Dengtav heya demekê li wir hatin ragirtin û ji lêpirsîn û elaqedariyên taybet re derbas bûn. Ji bo kesên ku nû dikevin nav xebatên dijmin de armanca van elaqedariyan ew bû ku, wan kesan bi temamî bêhest û bêwîjdan bikin û ji her awayê hestên mirovî qut bikin, ji ber ku eger wisa nebûya dewletê nedikarî ewqas kadroyên pispor û serkeftî bi dest bixe.

Hest tişteke pir girînge; mirov bi hestên xwe mirove û bi hestên xwe dibe ayîdê civakekê. Mirov bi hest hez dike, bi hest nefret dike, bi hest berpirsyartiyê nîşan dide û bi hest êşên wîjdanî dikşîne. Mirov bi hest ji serkeftinan kêfxweş û ji binketinan şerm dike! Heste ya ku reng û şêwe dide dinyaya mirov û wê/î bi tiştekê ve, bi nirxekê ve, bi

baweriyekê ve girê dide. Heste ya ku fikir û aqil çavdêrî dike û nahêle har bibin. Lewre dijmin jî taybet ser hest radiweste û di şerê taybet de giranî û girîngiyeke zêde didetê.

*****

Besta... Dayîka pîroz! Xwedawenda ku tînê dide rojê, ronahiyê dide gerdûnê, şînahiyê dide ezmanan, bêhnê dide gulan, jiyanê dide jîneweran, hezkirinê dide mirovan...

Besta... Deryayek ji daristan. Daristanek tijî darên bilind û biheybet. Darên wek himêza dayîk...

Besta... Volqanek ji agir. Agirek wek dilê evîndaran. Dilek tijî roj, tijî evîn...

Besta... Axek tijî gul û giya. Gulên ser tijî perperik...

Besta... Welatek ji newalên kûr û çiyayên bilind. Newalên tijî çem. Çiyayên tijî şoreşger û şervan...

Besta... Ew dayîka dilsoz ku surên derdora xwe; Cudî, Gabar, Herekol, Kato, Kaplan, Şanstêr û Kêla Memê li dora xwe civandiye û dihewîne...

Besta... Ew biheşta biçûk ku ji aliyê dijminan ve bi dehan caran hat şewitandin, ruxandin, wêran û talankirin. Ew evîna ku ji boy nebe warê xayîn û neyaran bi hezaran canê xwe jê re gorî kirin...

Besta... Axa bedew ku bi hezaran evîndarên AGİR û ROJ´ê di himêza te de raketin...

Besta!... Te çend ferman dîtin? Te çend caran koçberî, zilm û talan dîtin? Hêsirên çend zarokan daristanên te av dan? Axîna çend dayîkan dilê te hejand? Şewata çend gundan ezmanê te tarî kir?...

Di bin her bihust axeke te de, di bin her şitla giyayeke te de, di bin her dar, her gûnî, her kevireke te de çend term veşartîne? Ji Biryan heya Hiryan, ji Avyan heya Axyan, ji Xirbikê Bestê heya Mêhrê, ji Rêsor heya Pîran, ji Hîlal heya Ramûran çend gund şewitîn û talan û wêran bûn? Çend zarok pêxwas reviyan, lê nekarîn xwe xelas bikin?...

Li ser axa te hê dengê lorîna dayîkan, qêrîna zarokan, hewara pîr û kalan tê. Qetên landikên zarokan, lingê pêlav û goreyan, kevirê mizgeftên Misilman û dêrên Ermen û Aşuriyan hê çîrokên wan rojên bêbext vedibêjin...

Besta!... Kabeya evîndaran! Ji bo rizgariya te û derxistina dijminan ji ser axa te ya pîroz çend leheng, çend dilsoz, çend keç û xortên te ji

bo te canê şîrîn gorî kirin? Çend evîndaran berê xwe dan Qîbleya te? Xweşikbûna te dilê çend hezar şoreşgeran revand, bi xeml û narîniya xwe ketî xewna çend hezarên din? Çend gerîla bi te şa bûn, çend gerîla ji dûrketina ji te giriyan, çend gerîla hê bi hesreta dîtina te rojan dihejmêrin?

Ji Fermandar Egîd, Ezîma Mezin, Agirî, Meryem û Erdal heya Diyana, Sorxwîn, Armanc û Şervan; ji Nûda, Ferhad, Kurtay, Ekîn û Xelîl heya 15 HEYVÊN ŞEVA ÇARDEH çend şoreşgerên dilpak û hogir ji boy te ji dijmin re nehêlin, ji boy tu bi azadî û ew bi te şa bibin xwe feda kirin?

Besta, tu çawa bûyî evîn ji bo evqas dilan? Te çawa dil û mejî ji serê hemûyan revand? Te çawa ewqas mirov evîndar û şeydayê xwe kirin?

Evîndarên te, wê tim û tim bi te re jiyan bikin û te bikin biheşta xwe. Ey Biheşta Şehîdan Besta! were bejin bitewîne li hember evqas hezkirinên ji bo te, evqas xwînên ji bo te dirijin û evqas canên ji bo te dikevin erdê...

*****

Nûçeya îxaneta Aso û Dengtav bi lez belav bû. Hêzên HPG û YJA-STAR´ê yên li Bakur tenê ji radyoyê nûçe dişopandin. Lewre HPG´ê nûçeya îxaneta wan kesan ji medyayên nêzî xwe re ragihand da ku hêzên Botanê bibihîsin û li gorî vê tevger bikin. Radyoya Dengê Mêzopotamya roja 23.12.2011´an di bultena êvarê de ev nûçe ragihand: “Di şerê li herêma Cudî de du kesên bi navê Aso ku ji Sine’ye û Dengtav ku ji Amedê ye radestî leşkerên dagirker ên Tirk bûne û niha li Emniyeta Şirnexê tên ragirtin.”

Herwiha bi rêya cîhazê jî Fermandariya Biryargeha Navendî ya HPG´ê ev agahî bi hemû deryayên Botanê, taybet deryayên Besta, Herekol û Katoyê re parve kir, di şîfreyan de navê gelek noqte û deveran da û ji hêzên Botanê xwest ku li hemû deran, taybet jî li van cihan tedbîrên pêwîst bigirin ji ber ku îxanetkar navê wan deran dane dijmin.

Agahiya “li Şirnexê tên ragirtin” bala hemû hêzên Botanê kişand. Heya wê demê bi giştî kesên îxanet dikirin û radestî dijmin dibûn ji bo lêpirsînê yekser derbasî Amedê dikirin, lê evana li Emniyeta Şirnexê û Kun Mişkê hatibûn ragirtin. Hemû hêzan fêm kirin ku ev rewşeke asayî nîne, eger hê li Şirnexê tên hiştin ev tê wateya ku ser agahiyên wan re

wê operasyonên mezin bên destpêkirin û du îxanetkar jî tê de bên bikaranîn.

Jixwe ev fikara hevalan rast derket. Piştî hefteyekê, li Bestayê li alanên Hêzil û Gundikê Melê operasyon dest pêkirin. Bi operasyonê re berf jî giran bû. Operasyona ku ji Gundikê Melê ve ber bi Besta Meryemê diçû, di roja sêyemîn de bi dawî bû. Lê operasyona Hêzilê ber bi Serkê Mihemedê Uso, Serkê Hiriyan û Diriyan ve belav bû.

Ji ber van rewşan li Kato Jîrkayê kampa Egîd Civyan cihê xwe berdan û tevlî kampa Sosin Alan û Bêrîtan Silopî bûn. Aso nedizanî ku kamp li wir hene, lê ji ber ku ev erazî bi giştî nas dikir tedbîr hat girtin û di nav berfa 2 metre û nîv, mij û bablîsoka giran de kampa xwe guhertin.

Li Herekolê dilê hevalan rehet bû ku Dengtav ser eraziyê serwer nîne, Aso jî li wî aliyê Herekolê negeriya ye. Lê dîsa jî li derveyî kampê hin tedbîran girtin.

Li Hêzilê ji bilî lûtkeyên bilind berf tinebû, lê erd tev herî bû û eger meş çêbibûya şop derdiketin. Kampa Fîraz cihê xwe berdan. Jixwe hê neketibûn kampa zivistanê û li Noqta Payîzê xwe bicih kiribûn. Bi operasyonê re wir jî berdan.

Şerê zivistanan gerîla pir mehkumî xwe dike û windahiyên mezin bi wan dide, lê ji bo dijmin havîn wisa ye. Dijmin zivistanê îradeya şer nîşan nede jî, bi teknolojiyên şer dikare serkeftinê bi dest bixe; çawa ku li Cudî madeyên kîmyewî xebitand ji bo ku heval gêj bibin, bitevizin û nekaribin şer bikin û bersiv bidin. Lewre gerîla zivistanan heya ji destên wan bê hewl didin xwe ji çavdêriya dijmin dûr bixin da ku bi dijmin re neyên beramberî hev û nekevin pevçûnê.

Kampa Fîraz jî bi vê armancê demeke dirêj di tevgerê de bûn û li ciheke sabît neman. Heya operasyon paşve vekişiya, her di nav avê de, di nav çemên Çeqçeqo û Çemkê Tehlo de meşiyan. Erzaqên xwe li ser pişta xwe gerandin û di nav avê de li hewraz û nişîvan xistin. Sermaya nav avê dan ber çav lê ji bo ku li ser erdê şopa lingên wan dernekeve, dijmin ser şopan re pey wan nekeve û tiştek bi hevalên wan neyê, bêyî gazind û dudilî û bi vîneke ji polayê rêya xwe dewam dikirin.

Li Besta Navîn jî berf tinebû lê erd şil û herî bû. Heval Hemze agahiya îxaneta Aso û Dengtav û hişyariyên rêxistinê girtibûn, niha jî haya wî ji operasyona Gundikê Melê û Hêzilê hebû. Çû ba Evînê ji bo

ku rewşên heyî binirxînin, da ku li gorî wê vesazî û bicihbûna xwe nû bikin û pilansaziyên pêwîst deynin.

Di encama guftûgoyê de nêrîneke hevbeş derket; biryar dan ku hêza her du kampan dîsa tevlîhev bikin û pozîsyona şer bigirin, eger operasyon neyê alana wan û rewş asayî bibe jî, careke din vegerin ser awayê berê û xweser bibin. Ser vê bingehê, pênc hevalên jin (Aysel, Ronahî Murad, Zîlan, Şerda û Havîn) wê ji ba Evîn çûbana ba Hemze. Şeş hevalên xort (Egîd, Rênas, Beşîr, Amed, Cudî û Baz Silopî) jî ji ba Hemze wê derbasî ba Evînê bibûna.

Hemze ji ber ku Aso baş nas kiribû, hîs û guman dikir ku operasyon bê ser wan jî. Nedixwest ti tişteke wan bikeve destên dijmin û dijmin pê kêfxweş bibe. Ji bo tedbîra vê yekê jî hin tiştan fikirî. Ev fikra xwe bi Evînê re par kir û got: “Emê hemû tiştan carekê de nebin kampê. Emê deh deqekê dûrî kampê cihekê çêbikin û erzaq û tiştên xwe têxin wir. Hê me cih çênekiriye, tam nizanim emê kûderê guncav bibînin, emê biçin lê meyze kin. Cilên ku Heval Mehsum dirûtin jî emê têxin wir. Her carê emê erzaqê panzdeh bîst rojan bibin hundir ji bo ku pir çûnhatin jî çênebin.” Di rastiyê de tecrube, hest û hîsên xwe di van tedbîran de da der.

Piştî vê pilansaziyê Hemze vegeriya noqta xwe, pilan bi rêveberiya xwe re parve kir, bi şeş hevalên diyarkirî re axivî û ew şandin ba Evîn.

Evîn jî bi pênc hevalên ku bişanda gel Hemze re axivî. Ji ber ku biryar bû ew piştî operasyonê vegerin cihê xwe, ji bo ku li wan nebe bargiranî rojnivîs, album û kelûpelên xwe li wir hiştin, bi xwe re nebirin. Dema ku rabûn rêkevin hevalên din jî ji bo rêkirina wan rabûn ser pêyan. Pir germ ji hevdû xatir xwestin û hevdû himêz kirin. Nedixwestin ji hevdû qut bibin. Yên ku diçûn ditirsiyan tiştek bê serê ewên dimînin û careke din wan nebînin. Nedizanîn ku tiştên çêbibin wê li ser wan bixwe rû bide. Hîs dikirin ku careke din hevalên xwe nabînin, lê nedizanîn ku ew nedîtin wê ji ber şehadeta wan bixwe be.

Di hevdû himêzkirinê de bêyî xwesteka xwe hêsirên wan rijiyan û hinekê giriyan. Evîn, Evîndar, Ronahî Sêgirkê, Rewşen, Sarya, Sorxwîn û Hêvî ku li cihê xwe diman jî, ji ber vê qutbûnê hestewar û xemgîn bibûn, lê dîsa jî hewl didan wan rehet bikin û giriyê wan rawestînin.

Ronahî Murad dema çavên xwe paqij dikir keniya û ji Evînê re got: “Ka were te jî himêz bikim, dibe ku biharê em hevdû nebinin.”

Wê payîzê Evîn deh şeleme ji bo hevalên jin kirîbûn. Zîlanê heya wê demê ti carê şeleme li xwe nekiribû. Her tim şûtik girê dida. Ji şelemê hez nedikir. Cara yekê Zîlanê ji wan şelemeyan yek girt, lê xistibû çantê xwe û hê girê nedabû. Dema ku biçûna ba Heval Hemze şelemeya xwe derxist û girê da. Hevalan jê re gotin: "Pîroz be, pir li te hatiye. Rastî jî şeleme li bejna te pir xweşik e." Zîlanê spas kir û got: "Dibê qey ez vê şelemê naqetînim."

Xatirxwestin bi dawî bû û bi rê ketin. Aysel li pêşiyê dimeşiya. Piştî wê Havîn, piştre Ronahî, piştre Zîlan, di dawiyê de jî Şerda hebû. Ev rêz bi awayeke xwezayî çêbû. Ji ber ku Şerda kevin û xwedî tecrubeyeke zêde nebû, Zîlanê dixwest wê biparêze. Ji ber vê, xwe ji rêzê da kêlekekê, berê xwe da Şerda û bi awirên tijî hezkirin jê re got: "Heval Şerda, bikeve pêşiya min." Şerda ket pêşiya wê, Zîlan jî li dûv wê meşa xwe dewam kirin. Heya ji ber çavên hevalan winda bûn, dem dem li pişt xwe zîvirîn, li hevalên xwe yên li wir dimînin meyze kirin û ji wan re dest rakirin. Yên diman jî destên wan li hewa, bi çavên tijî hesret heya winda bûn li wan nêrîn.

Operasyon li Gundikê Melê piştî sê rojan bi dawî bû, lê li Hêzilê heya hefteyekê dewam kir. Piştre bê encam bi dawî bû. Lê leşker qet nêzî Besta Navîn nebûn.

*****

Sal derbasî 2012´an bibû û pazdeh roj jê derbas dibû. Baran û şilopê cihê xwe dabûn berfê. Carekê de berf pir ket û bablîsok rabû. Li çiyayên bilind bagerê berfa ku barîbû digerand û bilind dikir. Berfa metrekê bi bayê dibû sê çar metir. Li cihên nizim jî berf qederekê ket. Lê belê hê destpêka barîna berfê bû ku careke din operasyonan li Gundikê Melê û Hêzilê dest pêkirin. Dema leşker ketin eraziyê, di roja duyemîn de berfa aliyê Gundikê Melê bilind bû. Lewre leşker bi lez paşve kişiyan.

Li Hêzilê, destpêkê berf li çiyayên bilind zêde, lê di geliyan de kêm ket. Lewre leşkerên dijmin berê xwe dan geliyan. Lê belê hêdî hêdî berfa geliyan jî zêde bû. Pênc rojan ser hev berf bariya. Berf êdî wisa bilind bû ku li sînga mirov dida. Jixwe mij û bahozan jî bêhn li mirovan diçikand. Lewre, kampa Fîraz derketina ji kampê metirsîdar dîtin. Lê biryar dan ku eger dijmin cihê kampa wan bibîne û ser wan de biçe, ewê ji kampê derkevin û bikevin pevçûnê.

Fîraz bixwe ji kuna ku ji bo çavdêriya derve li jorî derî hiştibûn derve dişopand. Leşkerên dijmin cilên berfê li xwe kiribûn û dimeşiyan. Di navbera leşkeran û kampê de herî zêde deh metrek hebû. Nedizanîn cihê wan eşkere bûye yan jî dijmin bi rasthat ji wir ve derbas dibe, lewre sebir kirin heya vê mijarê fêm bikin.

Ji ber ku berf giran bibû leşker tep û rep li erdê diketin, radibûn, dîsa diketin. Nedikarîn bimeşin. Bahozê, berfa ku barîbû radikir û li nav çavên wan dida. Nedikarîn rehet henaseyê bikşînin. Ew zarokên çiya û zorî û zehmetiyan nebûn û vîna wan têrî nedikir ku di hewayeke wisa de xwe li ser pêyan bigirin û bijîn. Lewre ji taqetê ketin. Jixwe hevaltî û girêdayîbûnek jî di navbera wan de nebû ku ji hev re bibin alîkar, lewre dema yek diket erdê, yê li pişt wî ji kêleka wî re derbas dibû û yê ketiye li pişt xwe dihişt. Ew leşkerên pereyî bûn û bi pere şer dikirin, ne bi vînê. Hem jî ew dagirker bûn û li welateke ne ayîdê xwe, ji bo text û taceke ne ayîdê xwe şer dikirin. Çima li ber xwe dabana?!

Fîraz û Şiyar li leşkeran dinêrîn û didîtin ku berê wan her li cihekê ye û qet li derdora xwe nanêrin. Ji zehmetiyên ku leşkeran dikişandin fêm kirin ku cihê wan ewleye, dijmin pê nehesiyaye û bi rasthat ji wir re derbas dibin. Lewre ji kampê derneketin û metirsî derbas kirin. Leşkerên Tirk piştî ku hinekê di nav berfê de man pê hesiyan ku nikarin xwe bigihînin lûtkeyên bilind û cihên stratejîk bigirin. Lewre ji kêleka kampê re derbas bûn û xwe berdan dolekê. Hê nebibû êvar ku hejmarek skorsky hatin leşkerên xwe rakirin birin.

Ev operasyon jî bi vî awayî bi dawî bû. Heval Hemze dema agahiya paşvekişîna operasyonê girt hevalên li gel xwe bir kampê. Pergala kampê dan rûnişkandin û dest bi perwerdeyê kirin.

Evînê jî heman agahî ji nûçeyan guhdar kir. Du operasyon bêyî ku bên alana wan, derbas kirin. Vê carê pêwîst bû dîsa rewşê binirxînin, ji ber ku pilan û bernameya ku ji bo xwe danîbûn ji bo heya wê demê bû. Evîn ji bo ku ji nû de rewşê binirxînin, notek ji Hemze re nivîsand: “Operasyon di berfê de vala derket. Dijmin paşve kişiyaye. Vê carê em çawa bikin? Gelo em vegerin ser rewşa xweser a berê yan niha bi vî awayî dewam bike? Nêrîna we çiye?”

Nota xwe pakêt kir û Rênas û hevaleke din ji bo birina notê erkdar kirin. Dema Rênas çû ba Hemze dît ku ew ketine kampê, pergala nav kampê damezrandine û dest bi perwerdeyê kirine. Hemze nota Evînê xwend û di bersiva wê de wiha nivîsand: “...Li Cudî îxanet çêbûye... Li

herêma me operasyona dijmin paşve kişiya. Lê Aso bi wan re ye. Aso alana me nas dike. Dibe ku dijmin ser me de jî bê. Lewre tedbîrên we bila her tim hebin. Heta eger em hemû şehîd bikevin jî, pêwîste bi ti awayî ji nav me îxanet rû nede. Şervanên nû li gel me pirin. Em jî, hûn jî, eger pir tengav bibin, em hemû narincokên xwe bi xwe de biteqînin... Em ketine kampê. Me niha dest bi perwerdeya xwe kiriye. Hûn jî perwerdeya xwe dest pê bikin. Vê zivistanê bila wisa be. Bila vê carê jî xweser nebin, tişt nabe... Rewşa hemû hevalan pir başe. Rewşa hevalên jin jî pir başe. Meraqa wan nekin... Eger ti Parêznameyeke Rêbertiyê û belgeyeke rêxistinê li ba we nebe ku perwerdeyê ser bibînin jî, TENÊ LI SER RÊHEVALTIYÊ LÊHÛRBÛN BIKIN BESE!..." Nota xwe pakêt kir û da Rênas ji bo ku ji Evîn re bibe. Bi devkî jî hin tişt jê re gotin.

Hevalên jin dema hatibûn vê kampê ji ber ku ji bo demekê hatibûn tiştên pêwîstiya xwe bi xwe re neanîbûn. Hin pêwîstiyên wan hebûn. Aysel û Ronahî ku rêveberiya hevalên jin bûn, bi navê xwe û her sê hevalên gel xwe notek ji Evîn û hevalên ba wê re şandin û hin tiştên pêwîstiya xwe xwestin. Nota xwe bi Rênas re şandin.

Rênas her du not dan Evînê. Evînê ser nota Aysel û Ronahî re tiştên ku xwestibûn bi notekî re ji wan re şandin. Û ser nota Heval Hemze re pergala kampa xwe diyar kirin û dest bi perwerdeyê kirin.

*****

***Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!***

**Kampa Hevalê Hemze**

Dinya pir sar bibû. Êdî baran û şilope nemabû, her berf dibariya. Ti zivistanek bi qasî wê zivistanê sar û biberf nebû. Li eraziyên daristan cara yekê bû ku ewqas ser hev û zêde berf dibariya. Salên berê berfa ku li daristanan dibarî di yek du rojan de diheliya û erd careke din reş dibû. Ji ber vê, li tevahî qadên Botan, Garzan, Amed û Dêrsimê heval li gorî zivistanên berê nêz bûn; kamp, tedbîrên ewlekariyê, erzaq û hemû liv û tevgerên xwe li gorî wê eyar kiribûn. Lê ew zivistan weke zivistanên berê nebû. Berfa wê zivistanê surprîzeke nexweş bû ji bo gerîla.

Di kampê de perwerdeyan dest pê kirin. Bi vê mebestê, waneyên ku bihatana dîtin destnîşan kirin û di nav xwe de ji bo waneyan komîsyon diyar kirin. Hemû hevalan di komîsyonên waneyan de cih digirtin, heta hevalên nû jî. Heta Simko ku şervanê çar mehan û pir ciwan bû jî. Hin heval di du sê waneyan de komîsyon bûn. Ji bo ku danasîna waneyan li hevalên nû giran neyê, hevalên kevin jî bi wan re di komîsyonan de cih digirtin. Heval baldar nêzî vê mijarê dibûn. Parêznameyên Rêber Apo dixwendin û ser guftûgo dikirin.

Mehsum cil û bergên hevalan didirutin û nedikarî weke hevalên din her tim bi rêkûpêkî tevlî perwerdeyan bibe. Heyvek berê pîvana cilên hemû hevalên herêmê girtibû. Niha jî di kampê de dest bi dirûtina cilan kir. Jixwe tenê destgehek biribû ba xwe. Destgehên din li derve bi tiştên dî re veşartibû. Ser daxwaza Heval Hemze, cilên ku didurî dibir datîna wir. Ew cih li aliyê din ê dolikê, deh deqeyan dûr bû. Darên navbera kampê û wê derê xweş û mezin bûn. Lewre çûnhatina wir rehet û ewle bû. Dîsa jî baldar nêz dibû û heya çend dest cil nedirûtiba nedibir wir, da ku şop çênebin. Jixwe çûnhatina wê derê di demên bibahoz û bablîsok de diyar dikirin. Heya dema operasyona dawî bîst dest cil dirûtibûn û danîbûn wir.

**Operasyona Dawî Û Şehadeta Panzdeh Hevalan**

Bi salan gelek xayînên mîna Aso û Dengtav kengê ji nav refên rêxistinê reviyabûn derbarê şêwaza livûtevgera gerîla ya di demsala zivistanê de ji dijmin re agahiyên cur bi cur dabûn. Aso û Dengtav jî agahiyên dawiyê dabûn û gotibûn ku gerîla di hewayên xweş de ji bo

pêwîstiyên herî girîng û lezgîn jî ji kampê dernakevin û pêwîstiyên xwe yên derveyî kampê di hewayên biberf û bahoz de pêk tînin.

Ji bo vê, dijmin ku dizanî gerîla nûçe û rewşên hewayê ji radyoyê dişopînin, wê zivistanê taktîkeke nû bi kar anî; ragihandin û medyayên xwe ji boy rewşa hewayê şaş bidin bitevger kir. Rojên 9, 10, 11 û 12'ê Rêbendanê (Sibat) kanala TRT´ê li gorî fermana ku girtibûn, rewşa hewayê ji bo berjewendiyên leşkeriyên dewletê şaş da, ku hêzên gerîla li hemû qadan bixe xefkê. Wan rojan hewa qet xira nebû, her sayî bû. Bi roj taveke germ, êvaran jî tevî sermayeke dijwar ezman dîsa sayî û tijî stêrk bûn. Heta pele ewreke biçûk jî li ezmanê xuya nebû û stêrk geş geş diberîqîn. Lê belê TRT´ê ragihand ku li Şirnex, Sêrt û Colemêrgê hewa mije û dibare. Diyare ku heta ragihandin ku saziyeke demokratîke jî ketibû xizmeta şer û tevkujiyan. Ragihandinê serxwebûna xwe winda kiribû û leşkereke stuxwar ê fermanên desthilatdariyê bû. Jixwe TRT kanaleke desthilatdariyê bû û di rêgeheke faşîst de dimeşiya. Ya kanalên din?

Roja 11'ê Rêbendanê careke din operasyonê dest pêkir. Lê operasyona vê carê ji yên berê berfirehtir bû. Ne di operasyona yekemîn de, ne di ya duyemîn de û ne jî vê carê dijmin qet berê xwe neda Şehrîbanê, ji ber ku Aso û Dengtav agahî dabûn dijmin ku hêz li wir nînin. Di operasyonên yekemîn û duyemîn de nehatin Besta Navîn jî. Di vê operasyonê de cara yekê hatin Besta Navîn. Dijmin di du operasyonên berê de bêencam paşde zîvirîbû. Xûya bû nedixwest vê carê jî wisa vegere.

Lewre bi amadekariyeke pir mezin hatin; pênc hezar tîmên taybet, fermandar û komando hatin vî şerî. Heta yek leşkerê asayî di nav wan de nînbû. Artêşa ku ji bo her liv û tevgereke herî biçûk jî çete û cerdewanan bi kar tîne, vê carê bêyî wan hat. Dest ji wan berde, leşkereke asayî jî bi wan re nebû. Pênc hezar payebilind + Aso!

Ji bo pênc hezar kesan hejmareke zêde skorsky pêwîst bûn. Skorsky bi hejmareke zêde kobrayan dihatin parastin. Skorsky her carê leşkerên anîne peya dikirin û careke din vedigeriyan leşkeran bînin. Hêza Şirnexê bi serê xwe têrî operasyoneke evqas mezin û fireh nedikir. Lewre ji Sêrtê jî leşker dianîn. Gurrîniya skorsky û kobrayan guhê ezmanan kun dikir.

Hêzên dagirker û xwînmij du xelek pêk anîn. Xelekek li sêkûça Hêzil- Serkê Mihemedê Uso- Çala bû. Xeleka din jî li sêkûça

Mêrgûmarê- Tûşîmya- Çala hat çêkirin. Pênc hezar tîmên taybet, fermandar û komando + Aso bi tonan çekên giran û ferdî û kobra ser Bestayê de hatin û weke moriyan li ser axê belav bibûn.

Hatina evqas dijmin bêguman rewşeke asayî nebû, lê pir awarte jî nebû, ji ber ku di dîroka PKK´ê de gelek caran dijmin wisa har bibû û bi hejmareke wisa giran û heta ji vê girantir jî ser hevalan de hatibû. Lewre ev, pir biêş nebû, ji ber ku ew dijmin û neyar bûn û ji bo ji holê rakirina Kurdeke azadîxwaz her tişt dikirin. Heta gelek caran bi vê mebestê rêse û danezanên navdewletî yên şer jî binpê dikirin. Jixwe li Cudî wisa kirin; madeyên kîmyewî bi kar anîn. Dîsa jî di encamê de dijmin bû û helwesteke mirovane jê nedihat hêvîkirin.

Lê belê Aso hem Kurd bû, hem jî heya meh û nîvek beriya wê hevalê wan hevalan û endamê vê rêxistinê bû. Heya heyv û nîvek berê hevalên wî ji bo parastina wî canê xwe kiribûn mertal û xwe didan ber, ji bo ku fîşek lê nekeve. Cîgirtina keseke wisa di vî şerî de ji her tiştekê girantir û biêştir bû.

Axa Bestayê di bin lingên qirêj ên dagirker û xayînan de jan girtibû. Ax, dar, kevir, erd û ezmanan ji dîtina vê dîmenê şerm kirin û naliyan. Besta hewar dikir û nedixwest zarokên wê ji destên wê biçin...

Aso di sêkûça Mêrgûmarê- Tûşîmya- Çala de cih girt. Aso piştî bûyerên Cudî ku bixwe bi tevî Dengtav dijmin biribû ser çend kampên din ên hevalan, vê carê jî li Besta Navîn careke din dibû kujer û qatilê mirovên xwe û xayînê gelê xwe. Di heman demê de dibû xizmetkar û kontrayeke baş ji bo dijminên rêheval û gelê xwe. Leşkerên ev xeleka ku bi hezaran bûn, weke du qol tevgeriyan. Qolekê lûtkeya Mêrgûmarê û derdora wir da ber xwe. Qolê din taybet dola Tûşîmya ku kampa Heval Hemze tê de bû da ber xwe. Aso di vê xelekê de, di nav vî qolî de bû.

Skorskyê hejmarek leşker li ser lûtkeya çiyayê Mêrgûmarê peya kirin. Leşkerên dijmin bi şêwaza lêgerandin û lêxistinê tevdigeriyan û buhust buhust li kampa hevalan geriyan. Ev qol bin her dar û kevirekê geriyan, lê kampa Heval Evîn nedîtin, derbas bûn. Ji ber ku nedîtin her ber bi jêrtir ve gerandinên xwe domandin.

Berf bi qasî 80 santîm li erdê bû, lê hewa sayî û zelal bû. Pelek ewrê biçûk li ezman xûya nedikir. Radyoyan derew kiribûn. Kampa Heval Hemze li gorî radyoyê nêz nebûn, ji ber ku derfeta wan dest dida

ku ji kuna jora deriyê kampê rewşa derve bişopînin. Lewre nehatin xapandinên ragihandina ku di xizmeta faşîzmê de dixebitî.

Şev tarî qetriyan bû. Destpêkê hejmareke zêde leşkeran jora dola Tûşîmyayê girtin. Li her du aliyên dola Xirbikê Bestê, yanî li pişt û beramberî Tûşîmyayê leşker sîlsîle bi dirêjahî girtin. Sîlsîleya beramber seranser bi leşker û çekên giran hat tijîkirin. Nav dola Xirbik jî bi kemînan hat dagirtin. Hejmarekê ji jêr ve devê dolê girtin. Doçkayeke 14.5 danîn devê dolê. Bi vî awayî dolika ku kamp tê de bû ji çar aliyan ve hat dorpêçkirin.

Kampa Heval Hemze her ji destpêkê ve dema dengê skorskyê bihîstin fêm kirin ku leşkeran peya dike û ser wan de tên. Lewre xwe ji bo şereke dijwar û giran amade kirin û tedbîrên pêwîst girtin. Bi gotina Heval Hemze re yekser hemû belge, pirtûk û tiştên rêxistinî û çante û tiştên şexsî di hundirê kampê de dan ber agir û şewitandin ji bo ku nekevin destên dijmin û dijmin bi wan kêfxweş nebe.

Heval Hemze bixwe jî destpêkê cîhaza mezin şikênand ji bo ku bi kêrî dijmin neyê û dijmin nekaribe bi xwe re bibe. Piştre remzên nivîskî yên navbera alanan tev xistin nav qutuyeke plastîka biçûk de û dema ji kampê derketin bi xwe re bir di bin berfa bin darekî de veşart û qederek berfa dî avête ser, da ku biharê hevalên wî karibin van remzan bibînin û HPG neçarî guhertina remzan nebe. Ew, di dema şehîdbûnê de jî bi vî awayî li hevalên xwe difikirî û nedixwest wan bixe zorî û zehmetiyê û wan biwestîne.

*(Piştî operasyonê cîhaz bi awayê şkestî li goşeyeke kampê li erdê bû. Weke din tiştek pê nehatibû. Biharê dema berf heliya qutuya plastîk ku hemû remzên nivîskî tê de hebûn di bin dareke qaçê de ku qovanên fîşekên M-16 lê hebû hat dîtin. Ji bilî vê, bi gumaneke mezin beriya ku ji kampê derkevin Heval Hemze heval kom kirine û ser rihê fedayîtiya Apoyî, wateya berxwedanê û şehadetê, bêrûmetiya îxanetê, parastina hevalên ciwan, eger pêwîst bibe ji bo ku nekevin dest xweteqandin û mijarên din ku pêwîst dîtibe bi kurtî bi hevalên din re axiviye û vesaziyên pêwîst çêkiriye, ji ber ku di nota ku ji bo Heval Evîn şandibû de qala van mijaran kiribû.)*

Piştî ku tiştên girîng şewitandin û ji holê rakirin, Hemze beriya ku leşkerên dijmin tam bicîh bibin bi tevî çar hevalên din çûn jora pala ku kampa wan tê de bû girtin, da ku li wir bala dijmin bikşînin ser xwe û

deh hevalên din di vê fersendê de karibin ji wir derkevin. Li wê derê ew li benda hatina dijmin man.

Şev qulibî 12’ê rêbendanê. Demjimêr 2:00 yê şev bû. Destpêkê du kobrayan bênavber tevahî dolika Tûşîmyayê dane ber xwe û kun kunî kirin. Koma Heval Hemze di bin daran de, di nav berfê de rûniştibûn û li bendê bûn dijmin nêz bibe. Bayeke sar rûyê wan dialast, lê dil û rihê wan germ bû û serma hîs nedikirin, ji ber ku agirê şoreşê di dilê wan de pêketibû.

Dema dijminî berê xwe da wir, koma Hemze bibandor li wan xistin. Pevçûnê dest pêkir û hejmarek dijmin ku vîna wan têrî nedikir di sermayê û berfê de li ber xwe bidin hatin kuştin. *(Heval Hemze çeka M-16 radikir. Ji qovanên fîşekên M-16 û qovanên fîşekên klaşînkofan ku li çar cihên nêzî hev li erdê mabûn xûya dike ku Heval Hemze û çar hevalên din ji bo balkişandina dijmin xwe dane jora kampê, da ku heval ji jêr ve karibin xwe berdin dolê û di nav daran de xwe xelas bikin. Xûyaye di dawiyê de her pênc heval li wir şehîd ketine.)*

Li derdora çemê Xirbik ku jêra dolika Tûşîmyayê bû dar hebûn. Deh hevalên din li gorî fermana ku ji Hemze girtibûn dixwestin dakevin nav wan daran û di nav daran de wî geliyî derbas bikin û rêya xwe bidomînin heya xwe ji bin çavdêriya dijmin derxin. Bi vê mebestê di nav xwe de bûn pênc kom. Her hevaleke kevin hevalek nû girtibû ba xwe. Xwestin kom bi kom bi awayeke ku hevdû biparêzin dakevin nav gelî û bi awayê ku hatibû gotin xwe ji nav xeleka dijmin derxin. Lê belê dema xwe berdidan bi kemînên dijmin hesiyan. Ji ber vê, kê/î li kûderê bû hema li wir; hin heval nêzî kampê, hin heval jî kêmekê li jêrtir di nav darên qaç û berûyan de çeper girtin û bi dijmin re ketin pevçûnê. Bi vî awayî hemû heval êdî di nav pevçûnê de bûn. Hevalên kevin û xwedî tecrube yên nû û kêmtecrube diparastin. *(Ji qovanên fîşekan ku li erdê mabûn fêm dibe ku heval dema bi kemînê dihesin li kûderê bûne her li wir çeper girtine û ketine pevçûnê.)*

Bi roj ji ber ku dinya sayî bû, heval diçûn kûderê kobra pey şopa wan diket û li wan dida. Şev çiqas sar jî be, ji bo hevalan sûda wê zêdetir bû, ji ber ku derfeta êrîş û lêdanê diket destên wan û derbeyên giran li dijmin didan. Lê belê bi roj tevger ji bo wan zehmet dibû. Di nav şer de hem bi kobra, hem bi fîşek û rokêtên dijmin hin heval birîndar bûn. Hevalên sax bi kefî û şûtikên xwe birînên hevalên xwe

yên birîndar dipêçan... *(Piştî pevçûnê tiştên pansman, kefî û şûtikên bixwîn ên li birînan pêçayî li erdê mabûn. Ev, nîşan dide ku birîndar çêbûne û hevalên sax bi wan re mijûl bûne.)*

Wan bi can û dil ji armanc, rewabûna têkoşîna xwe, doza azadiya gel û welatê xwe, mafê jiyaneke azad û birûmet bawer dikirin û ji bo bi destxistina vana amade bûn xwe feda bikin. Wan ji şer, îxanet û radestbûnê, neyartî, dagîrkerî û talanê nefret kiribûn û ji bo ku şer, înkar û qirkirin bi dawî bibe derketibûn serê çiya. Ew ji bilî azadiya Rêber Apo, tola şehîdên xwe, têkşikandina îxanetê û kurtkirina destên dagirkeran ji ser axa dayîka xwe li tişteke din nedihizirîn. Wan bi avêtina her fîşekekê re derbeke giran li îxanet û dagîrkeriyê didan û ew têk dibirin. Wan bi hesreta pêşwazîkirin û himêzkirina Rêberê xwe û ji nû de dîtina rêhevalên xwe şer dikirin. Wan dizanîbûn ku welateke parçebûyî û geleke bênasname bêbedel ji talan, zilim û dagirkeriyê rizgar nabe. Wan dizanîn ku şehadeta wan pêşerojeke ronî û tijî ken û xweşî ji bo zarokan tîne. Wan dizanîn ku berxwedana wan wê bibe felsefeya jiyaneke nû ji bo geleke azadîxwaz û wê bibe mijara roman, helbest, stran û sirûdan. Wan dizanîn ku navê wan wê li hezaran zarokên Kurd bên kirin. Wan dizanîn ku navê wan wê bikeve ser zimanê mîlyonan wîjdanên zindî û şiyar...

Pevçûn demjimêr 2:00´yê 12’ê Rêbendanê dest pêkir û heya demjimêr 18:00’ê 13’ê heyvê dirêj kir. Yanî çil demjimêr sax şereke dijwar û bêeman qewimî. 40 demjimêr yanî du şev û du rojan serma û seqema dijwar, bêxwarin, bêxew, bêvehesîn û bênavber di nav berfeke nêzî yek metreyê de li ber xwe dan û bi vîn, bawerî û hêvî şer kirin.

Di destên dijmin de hezaran çekên giran, navîn, ferdî, LAW, RPG, BKC, bombavêj, doçka û kobra hebûn, lê di destên wan de tenê BKC´yek û çardeh çekên ferdî hebûn. Wan ne bi çeka destên xwe, berovajî, bi çeka armanc, bawerî û wijdanê şer dikirin.

Wan felsefeya berxwedanê wergirtibûn. Şehîdê mezin Mazlum Dogan ew fêrî waneya “berxwedan jiyane”yê kiribûn. Çi tişt, kîjan hêz, kîjan çekê dikarî wan ji berxwedanê biwestîne! Ew; 15 Rêhevalên Roja Bilind. 15 şewqên berbanga sibê. 15 evînên çiyayî. 15 evîndarên jiyanê. 15 awirên di aso de kilîdbûyî. 15 xelatên azadiyê...

Wan ji Rêber Apo bawer kirin, ji wî hez kirin, evîndarê wî bûn. Rêber Apo ji bo wan dihat wateya jiyanê. Dihat wateya berxwedanê.

Dihat wateya Kurdistana bêkes. Dihat wateya azadiyê. Dihat wateya têkoşînê. Dihat wateya yekane evîn...

Ew di Rêber Apo de bi wateya jiyanê hesiyan. Di Rêber Apo de bi jiyanê ve hatin girêdan. Di Rêber Apo de wateya mirovbûna xwe dîtin...

Kîjan çekê dikarîbû awirên van 15 evînên Bestayê biçilmisîne û kenên ser lêvên wan vemirîne! Tilîliyeke wan, "Berxwedan Jiyane"yeke wan, bêhneke wan bihayê her tiştê ser rûyê erdê bû, ji ber ku ew, di nav hemû xweşikiyên cîhanê de yên herî xweşik bûn!

Ahuramazda û Ehrîmenên hemdem, Kawayê Hesinkar û Zehakên hemdem tam 40 demjimêrî di nav berfa Rêbendanê de şer kirin. Roja 12 û 13'ê Sibata 2012'an li Besta Navîn du xet, du bîrdozî û du felsefe li hember hev rabibûn. Li aliyekê rihê ku bi eşqa azadiyê xemilî û dagirtîbû, li aliyê din faşîzma ku wîjdan qerisandibû û reş kiribû hebû...

Wê rojê çiyayên derdor ku di dîroka xwe de tim bibûn kelha berxwedanê, ken ji xwe re heram kirin û mîna volqanan dixwestin ser dijmin û xayînan de biteqin. Wê rojê erd û ezman, dar û ber, ax û berf, çiya û newalên Bestayê ji dilê xwe birîndar bûn. Wê rojê tavê rûyê xwe girt û nexwest termên ciwan ên 15 keç û kurên Xwedawendên Agir û Rojê li ser darbestên faşîstan bibîne. Wê rojê Arêna matmayî li hovîtiya pênc hezar celladan û berxwedana panzdehan temaşe kir û li xwe mikur hat ku Arênaya Romayê di sedsala 21'an de li Kurdistanê têkşikest...

Heya wê rojê ti mîtolojiyekê nedîtibû ku 15 kes bi eşq û bawerî, bêyî dudilî li beramber 5000 zebaniyên dojehê 40 demjimêran di nav berf û sermaya dijwar de li ber xwe bidin û heya kêliya şehadetê dest ji têkoşînê bernedin... Bestaya ku hatibû pilankirin ku bi êrîşa pênc hezaran bibe dojeh, bi berxwedana panzdehan bû BIHEŞTA ŞEHÎDAN. Agirê dojeha pilankirî bi lehengiya panzdeh fedayiyên Apoyî pêtên xwe avêt nav dilê xayîn û neyaran û mejî, dil û rihê wan şewitand.

Rihê cangorî, evîna azadî û hesreta Rêberê azad û welateke bêşer dilê pazdeh Rêhevalên Roja Bilind germ dikirin û nedihişt ew bi seqema Sibatê bihesin; ew zarokên Agir û Rojê bûn û bi pêtên agir û tîna rojê germ dibûn.

Ew, panzdeh zarokên Mîtra û Starê bûn û li çiyayên ku Xwedawendan textên xwe lê danîne di fêrgeha Apoîzmê de fêrî

waneya “parastina nirxa mirovbûn û têkbirina îxanetê û radestiyê” bibûn. Di nav çil demjimêran de berdewam dengê Elî Çîçek ku di dadgehên bêdad ên faşîstan de digot “Em ji PKK fêrî berxwedanê bûne, ne teslîmiyetê” di guhê wan de zingînî dikir...

Çil demjimêr bi rihê xwe qeşa qetandin û berfê helandin. Panzdeh rêwiyên pêşeroja azad silav dan berxwedana Cudiyê Miradan. Silav dan rihê rêhevaltiya Rubar Mêrdîn, qêrîna “Bijî Serok Apo” ya Zîlan Bagok û Sema Selmas. Silav dan Ahuramazdaya Binevş Êzîdî û eşqa Serbest Harunî. Silav kirin li wêjeya berxwedana ku Haşim, Nurhaq, Zîlan Heleb, Sadun Ûrfa û hemû Rêhevalên Nûh û Lawikê Xerîb meh û nîvek berê li Cudî nivîsandin.

Ew, rêhevalên “rêhevaltiyê” bûn, xwe bi ava dîrokê şûştibûn û ji bo pêşerojê xemilandibûn. Wan di lûtkeya girêdayîbûnê de weke gula berfîn dilê berfê qelişandin, çerxa zilmê şikênandin û bi tilîlî û dirûşmên xwe romana evîneke Apoyî, vîneke şoreşgerî û îlhama rêhevaltiyê nivîsandin. Agirê şoreşê ku di dilê wan de pêketibû û wîjdanên qerisî diheland berxwedana wan geştir û gurtir dikir.

Di berxwedana van du şev û du rojan de dijmin li hember hevalan bêçare mabû, ji ber ku ser hev derbe dixwar. Nedikarîn şer bikin û hember hevalan rawestin. Jixwe her bi kobra û çekên giran şer dikirin. Dîsa jî pir kuştî û birîndar didan. Êvara roja duyemîn dema dîtin nikarin berxwedana hevalan bişkînin, vê carê leşkerên xwe ku heya wê demê newêrîbûn nêzî hevalan bibin bi temamî ji dolik û derdora wê kişandin û ew hinekê dûr xistin. Piştre bi hemû çekên xwe yên giran êrîş kirin. Gurrîniya çekên giran û kobrayan perdeya guhê ezman diqetand û dilê erdê dilerizand. Heya her panzdeh Rêhevalên Roja Azad şehîd neketin, çekên giran û kobrayan bêdeng nebûn...

Heya demjimêr 18:00´ê weke har û hovan bi teknolojiyê bênavber ser hevalan de hatin. Dema dîtin êdî ji aliyê hevalan ve bersiv nayê, guman kirin ku hemû şehîd ketibin, lê dîsa jî ji bo ku bi temamî zelal bibin heya çend demjimêrên din jî lêdanên xwe domandin. Dîsa bersiv ji beramber tinebû. Hineke dî jî lêdan. Piştre çek bêdeng kirin. Vê carê zelal bûn ku hemû heval şehîd bûne.

Tevî vê jî wê şevê ku êdî şeva sêyemîn bû, newêriyan xwe nêzî hevalan bikin; heta ji term û bedena bêrih a hevalan jî ditirsiyan. Roja din seherê bi tirs û lerz çûn xwe nêz kirin û li termê hevalan geriyan.

Her panzdeh heval dîtin. Xwîna pak a şehîdan li ser berfê rijiyabû û berfa spî kiribû kiraseke sor.

Dema hin heval birîndar bibûn, ewên dî ji bo pêçandina birînên wan çûbûn gel wan, herwiha dema cihê wan eşkere bibû, cihê xwe guhertibûn. Bi vî awayî şopa lingan li ser berfê çêbibû. Dijminî li pey rengê xwînê û şopa hevalan termê hemû hevalan bi dest xistin.

Dewleta Tirk û desthilatdariya AKP´ê ku dewlet û desthilata şerê taybetin, heya wê demê ti carê li gorî yasa û pîvanên navnetewî yên şer tevnegeriyabûn. Gengaz nebû ku vê carê bi exlaq nêz bibin. Dema çûn ser termên hevalan çi muameleyeke dijmirovî dizanîbûn tev dîsa pêk anîn; kefiya reş û spî ya Şehîd Felat ji serê wî derxistin. Laçika koçerkî ya Şehîd Aysel ji sukra wê kişandin û derxistin. Şelemeya Şehîd Zîlan vekirin û pê lîstin. Şehîd Ronahî û Şehîd Havîn tazî kirin, şal, gomlek, atlêt û taytê ser wan derxistin û bi wan lîstin. Tiştên nav berîkên hemû Şehîdan derxistin û li ser berfê agir bi hinek ji wan xistin, lê agir ji ber berfê zû vemirî û hemû tişt neşewitîn. Piştre termên pîroz ji bin darên qaç û berûyan yek bi yek li pey xwe, li ser erdê xirikandin û daxistin dolê. Di xirikandinê de şopa laşê hin hevalan piştî ku berf heliya jî li ser erdê ma. Hevalên ku li ser keviran hatibûn kaşkirin şopeke xirikandinê li pey wan nemabû.

Pora Şehîdên jin dirêj bû. Taybet a Şehîd Şerda pir dirêj bû. Dijmin şehîdên jin ji pora wan ve pey xwe de xirikandibûn. Ji ber vê di xirikandinê de berbiskên Şehîd Şerda û Şehîd Havînê li erdê man. Di nav berbiska Şehîd Havîn de hinek tayên porê jî mabûn. Tiştên hemû hevalan li cihên ku lê çeper girtibûn û şer kiribûn û li cihên ku lê hatibûn xirikandin li ser erdê mabûn...

Dijmin piştî revandina termên şehîdan ket hundirê kampê. Tiştekî ku bi kêrî wan bê tê de nedîtin. *(Piştî şer çanteyên hemû hevalan bi awayê qetiyayî û şewitî li erdê mabûn. Xûya dike ku hevalan beriya ji kampê derkevin heya ji destên wan hatiye hewl dane tiştek sax nehêlin ku dijmin bi xwe re bibe.)* Dehfikek tê de danîn û ji derve de teqandin û ji hêrsa ku tiştê bi kêrî wan bê tineye tiştên mayî tev ji holê rakirin. Her tişt; firax, birandayên şîn, cil, tiştên raxistinê û hwd. tev pirtik pirtik bûn û firiyan ser daran û li eraziyê belav bûn.

Dijmin bi vê jî rehet nebû; guman dikirin ku eger kampên nêzî wir hebin bên destwerdana rewşê, lewre dehfikeke bidem ê 24 demjimêrî

jî di nav de çandin, da ku dema hevalên din bên wir bi wan de biteqe û ew jî şehîd bikevin. Xeyala dijmin vala derket û dehfik di dema xwe de vala vala teqiya.

Di rastiyê de kampa Heval Evîn (li biniya Mêrgumarê) rêya saet û nîvekê dûr bû, lê ew bixwe jî giran di nav operasyonê de bûn û qoleke mezin ê dijmin bi şêwaza lêdan û gerandinê ser wan de jî dihat. Ew qol, li derdora kampa wan hîngî teqandinan çêdikir ku Evîn wana bi dengê pevçûna kampa Heval Hemze nehesiyan ku biçin destwerdanê bikin.

Hejmareke zêde skorsky hatin. Termê 15 şehîdên azadiyê û kuştî û birîndarên xwe bi skorskyan revandin. Şehîd destpêkê birin nexweşxaneya Sêrtê. Li wir gel ji bo dîtina termên şehîdên xwe li dora nexweşxaneyê kom bûn. Dijmin tirsiya ku gel êrîş bike û bikeve nexweşxaneyê, lewre term revandin û birin morga Meletiyê.

Pênc hezar celladên xwe ku ji Hêzilê ve heya Mêrgûmarê bi cih bibûn jî tev kişandin û bi skorskyan rakirin birin. Bi vî awayî giştî operasyon bi dawî kirin.

Piştî paşvekişîna dijmin ji ser axa birîndar, balefirên şer ên F-16 hatin hemû derdora Kampa Şehîdan dan ber rokêtan. Xûya bû pir hêrs bibûn; hem ji ber ku tevî ewqas teknolojiya şer ku bi kar anîbûn jî, kuştiyên wan pir zêde bûn û gelek payebilindên wan miribûn, hem jî dijmin pilan kiribû ku di hemû qad û herêman de ji hemû kampên gerîla hin xayîn û teslîmkaran bi dest bixe û wan jî mîna Aso û Dengtav li hember berxwedêran bide şerkirin. Lê belê ev xeyal û daxwaza wî vala derket û hevalên kevin û nû, mezin û ciwan pir bi lehengî li ber xwe dan, ew pilana qirêj di qirika wan de hiştin. Hevalan derseke baş dabûn Aso û dijmin, û bi bihayê canê xwe îsbat kiribûn ku ewê nehêlin dîroka ku tê de her tim berxwedan û îxanet bi hev re meşiyane dubare bibe.

Di vî şerî de zêdetirî çil fermandar, tîmên taybet û komandoyên artêşa dagîrker a Tirk hatin kuştin. Lê belê hejmara rast nehat zanîn, ji ber ku dijmin yekser wan terman rakir bajarên wan. Tenê ewên ku gel bi çavên xwe dîtibûn çil term bûn. Şehîdên doza azadiyê beriya ku şehîd bikevin tola xwe hildabûn.

Dijmin termên kuştiyên xwe bi dizîka veşart, pere û baceke zêde dan malbatên wan da ku serexweşî daneynin û ti kesê bi mirina zarokên xwe nedin hesandin, da ku kes bi derbeyên ku dewlet di vê

zivistana dijwar de jî ji gerîla xwariye nehese. Dewletê gef li wan xwar ku eger malbatên kuştiyan vê şertê pêk neynin wê bi muameleyên xirab re rûbirû bimînin. AKP´ê nerazîbûn û hêsirên malbatan bi pere kirîbû...

Dewleta Tirk ya faşîst piştî ku termên şehîdan revandin morgê, li wir biryara xwe ya payîza derbasbûyî ku di medyayan de deng veda pêk anîn. Payîzê, artêş û desthilata siyasî bi hev re biryar dabûn ku zivistanê li hemû qadên gerîla êrîş bikin ser kampan û kamp kamp wan şehîd bixin. Di nav vê biryarê de jî du biryar hebûn: yek; heya ji wan bê hewl bidin gerîlayan teslîm bigirin da ku bikin kontra û bi rêya wan kampên din bi dest bixin û wan li hember gerîlayên ku li ber xwe bidin, bidin şerkirin. Didu; nexweşxaneyan ji nexweşên medenî vala bikin, termên şehîdan li wir parçe bikin û organên wan ên hundirîn derxin, bifiroşin. Xûya bû ku wê salê dê çerxa mafyaya dewleta Tirk li ser bedena şoreşgerên Kurd geriyaba û organên nav bedena gerîla bibûya xezîneya herî baş û dewlemend ji bo fînansa sermayeya dewletê.

Bi vê mebestê li nexweşxaneyê pir bi termên şehîdan lîstin. Termên hemûyan qelaştin û hemû organên wan derxistin, bi awayeke ku term hemû pir sivik bûn. Heta çavên hinek şehîdan jî derxistin. *(Dema malbatên şehîdan çûn termên zarokên xwe wergirin bi van dîmenan re rûbirû hatin: çaveke Şehîd Havîn hatibû derxistin û nedihat naskirin. Her pênc hevalên jin destdirêjiya fîzîkî ser wan hatibû kirin, pir bi beden û rûyê wan hatibû lîstin û nehatibûn naskirin. êşkence li beden û rûyê hevalên xort hatibû kirin, rûyê wan xira bibûn û nehatibûn naskirin. Bedena hemû hevalan pir sivik bibû û ji qirikê heya navikê, ji kêleka çepê heya kêleka rastê tev hatibûn qelişandin û ji nû de hatibûn dirûtin.)*

Lewre kaseya aboriya dewletê bi pereyê ku bi firotina van organan tijî kir. Tenê termê Şehîd Hemze ji van êrîşên hovane filitî, ji ber ku hema di roja yekem de malbat çû termê wî girt û rakir Goristana Şehîdan a Şirnexê.

Malbatên ku di nav şehîdan de zaroka/ê xwe nas nekirin tenê ji bo ku şehîd di destên dijmin de nehêlin her yekê şehîdek birin. Di feraseta wan a welatperweriyê de şehîd şehîd bû, di navbera zarokên wan û şehîdên din de ferq tinebû û hemû şehîd weke zarokên xwe didîtin. Ev, bibû çanda hemû welatparêzên PKK'yî. Ser bingeha vê çandê hemû

malbatên welatparêz xwedî li hemû Şehîdan derdiketin û cudahî nedixistin navbera wan de. Nas bikin an nekin, girîng nebû. Yek armanc hebû; Şehîdên vê axê diviya di destê dijmin de nehatana hiştin. Exlaq ev bû.

Sibeya 14’ê Rêbendanê 15 termên ciwan bi awirên tijî hêvî û hesret li morga Meletî razabûn. 14’ê Rêbendanê rojek beriya pilangeriya navnetewî li dijî Rêber Apo û gelê Kurd bû. Kurdistanî û Kurd wê rojê weke roja reş bi nav kiribûn û her sal ji bo protesto û lanetkirina pilangeriya navnetewî di tevahî cîhanê de radibûn ser pêyan û alên reş hildidan.

Dijminî dixwest vê roja ku ji bo Kurdan, jin û hemû gelên azadîxwaz rojeke bi lanet bû, bi bidestxistina xayînan û şehîdxistina van pazdeh Rêhevalên Rojê pîroz bike. Lê gelê Kurd ê şiyarbûyî ev xeyal jî di qirika wan de hişt, ji ber ku berxwedan û şehadeta van rêhevalan hêz, coş, kelecan û vîn da serhildan û raperînên gel ên di 15’ê Sibatê de. Gelê Kurd ê daxdar û êşkişandî di raperînên xwe de ev hovîtî gihand guhê raya giştî ya navnetewî û wijdanên şiyar.

*****

Dijmin Newroza 2012'an dîsa ev xayîn bi kar anîn û li Cudî bir ser kampa Heval Refîq.

Dijmin piştî ku Aso û Dengtav tam ji nirxan qut kirin, tam ji mirovbûnê derxistin, kir kontrayên baş û têra xwe ew bi kar anîn, îcar ew avêtine quncikeke tarî di nav girtîgeha Amedê de.

*****

Şehîd Gulan Çekdar: ji Êlihê. Sala 2014'an di berxwedana Kobanê de şehîd ket.

Şehîd Zozan Kobanê: ji Kobanê. Sala 2014'an di berxwedana Kobanê de şehîd ket.

Şehîd Sema Efrîn: ji Efrînê. Sala 2014'an di berxwedana Kobanê de şehîd ket.

Şehîd Artêş Bokan (Seydo): ji Bokanê. 23.03.2014'an di berxwedana Rojava de şehîd ket.

Şehîd Aram Agir (Seidî Miradî): ji Merîwanê. Sala 2008'ê li Botanê, herêma Gabarê şehîd ket.

Şehîd Berfîn Ronya: ji Mêrdînê û mezinbûya Qonyayê. Di berxwedana 24.03.2012'an de li Garzanê bi tevî 14 hevalên din Şehîd ket.

Şehîd Arjîn Garzan (Leyla Altan) ji Êlihê. Di berxwedana 24.03.2012'an de li Garzanê bi kampa xwe ya 15 kesî re Şehîd ket.

Şehîd Dîdar Gabar: ji gundê Banê ya Gabarê. Zivistana 2015'an di berxwedana Rojava de şehîd ket.

Şehîd Feraşîn Delîla Wan (Aysel Demîr): ji Wanê. Rezbera 2012'an li Elkê şehîd ket.

Şehîd Rojda Tirbespiyê: ji Tirbespiyê. Sala 2014'an di berxwedana Rojava de Şehîd ket.

Şehîd Berxwedan Muş: ji Muşê. Bihara 2015'an di berxwedana Kobanê de Şehîd ket.

Şehîd Rojbîn Mahîr (Rewda Mihemmed Yusif): ji gundê Rihanîkê ya girêdayî Dêrika Hemko. Cotmeha 2015'an di berxwedana Rojava de Şehîd ket.

Şehîd Evîn Zana: ji Dêrika Hemko. Roja 5-6’ê Tebaxa 2014'n li Rabîe dema weke YPG korîdoreke mirovî ji bo derbaskirina gelê Şengalê vedikirin bi tevî çend hevalên dî şehîd ket.

Şehîd Qadir Usta: 2008'ê di koma Derya Reş de, li Botanê şehîd ket.

Şehîd Silav Xumarê: ji Wan, navçeya Şax, gundê Xumarê. Sala 2015'an di berxwedana Rojava de şehîd ket.

Şehîd Hêvarîn Efrîn: ji Efrînê. Sala 2012'an li Geliyê Zapê şehîd ket.

Şehîd Evîndar Gever (Aysel Bor): ji Geverê. Payîza sala 2015'an li Botanê şehîd ket.

Şehîd Leşker Ciwanro (Umîd Ezîzî): ji Ciwanroyê. 03.10.2008'an li Şemzînanê di çalakiya Bêzelê de bi tevî heşt hevalên din şehîd ket.

Şehîd Amara Gever: ji Geverê. Sala 2014'an di berxwedana Rojava de şehîd ket.

Şehîd Cesur Wan: ji Wanê. Sala 2012'an li Botanê, herêma Kato Jîrkayê şehîd ket.

Şehîd Kemal Ûrmiye: ji Ûrmiyê. Sala 2014'an di berxwedana Kobanê de şehîd ket.

Şehîd Nevres Kobanê: ji Kobanê. Sala 2014'an di berxwedana Rojava de şehîd ket.

Şehîd Harun Sêrt: ji Sêrtê. Sala 2012'an li Botanê, herêma Kato Jîrkayê şehîd ket.

Şehîd Rûken Cudî (Heybet Güngen): ji gundê Gundik Remo yê Şirnexê. Rezbera 2011'an li Kato Jîrkayê şehîd ket.

Şehîd Qehreman Colemêrg: ji Colemêrgê. Sala 2011'ê li Kato Jîrkayê şehîd ket.

Şehîd Zinar Ewrex: ji gundê Ewrex a navçeya Berwariya Sêrtê. Zivistana 2015'an di berxwedana Rojava de şehîd ket.

Şehîd Beşîr Mêrdîn: ji Mêrdînê. Payîza 2012'ê li Gabarê Şehîd ket.

Şehîd Nûpelda Doğan: Payîza 2011'ê li Garisayê şehîd ket.

Şehîd Rubar Qamîşlo: Havîna 2015'an di berxwedana Rojava de şehîd ket.



























***Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!***














2 7:04





***Tenê Li Ser Hevaltiyê Biponijin Bes e!***